

T.C.
MUŞ ALPARSLAN ÜNİVERSİTESİ
SOSYAL BİLİMLER ENSTİTÜSÜ
KÜRT DİLİ VE KÜLTÜRÜ ANABİLİM DALI

Fehmi YEŞİLÇINAR

DENGBÊJ AHMED ALÎKSAN'IN HAYATI VE ESERLERİ

YÜKSEK LİSANS TEZİ

DANIŞMAN

Doç. Dr. Abdülcelil BİLGİN

MUŞ-2016

K.T.
ZANÎNGEHA MÛŞ ALPARSLAN
ENSTÎTUYA ZANISTIYÊN CIVAKÎ
ŞAXA MAKEZANISTA ZIMAN Û ÇANDA KURDÎ

Fehmi YEŞILÇINAR

JIYAN Û KILAMÊN DENG BÊJ AHMED ALÎKSAN

TEZA MASTIRÊ

RÊVEBIRÊ TEZÊ

Doç. Dr. Abdülcelil BİLGİN

MÛŞ-2016

SOSYAL BİLİMLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜNE

Muş Alparslan Üniversitesi Lisansüstü Eğitim-Öğretim ve Sınav Yönetmeliğine göre hazırlamış olduğum “**Ahmed Aliksan Ji Dengbêjan**” adlı tezin tamamen kendi çalışmam olduğunu ve her alıntıya kaynak gösterdiğimi taahhüt eder, tezimin kağıt ve elektronik kopyalarının Muş Alparslan Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü arşivlerinde aşağıda belirttiğim koşullarda saklanmasına izin verdiğimi onaylarım.

Lisansüstü Eğitim-Öğretim yönetmeliğinin ilgili maddeleri uyarınca gereğinin yapılmasını arz ederim.

- Tezimin/Raporumun tamamı her yerden erişime açılabilir.
- Tezim/Raporum sadece Muş Alparslan Üniversitesi yerleşkelerinden erişime açılabilir.
- Tezimin/Raporumun yıl süreyle erişime açılmasını istemiyorum. Bu sürenin sonunda uzatma için başvuruda bulunmadığım takdirde, tezimin/raporumun tamamı her yerden erişime açılabilir.



22.11.2015

Fehmi YEŞİLÇINAR

TEZ KABUL TUTANAĐI
SOSYAL BİLİMLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĐÜNE

Doç. Dr. Abdulcelil BİLGİN danışmanlığında, Fehmi YEŞİLÇINAR tarafından hazırlanan bu çalışma 22/11/2015 tarihinde aşağıdaki jüri tarafından Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı'nda Yüksek Lisans Tezi olarak kabul edilmiştir.

Başkan : Doç. Dr. Abdulcelil BİLGİN

İmza :

Jüri Üyesi : Yrd. Doç. Dr. M. Zahir ERTEKİN

İmza :

Jüri Üyesi : Yrd. Doç. Dr. Canser KARDAŞ

İmza :

NAVEROK

NAVEROK	I
KURTE	XI
ÖZET	XII
ABSTRACT.....	XIII
PÊŞGOTIN.....	XIV
KURTEBÊJE	XVI
ÎNDEKSA WÊNEYAN	XVII
DESTPÊK.....	1

BEŞA YEKEM

JİYANA AHMEDÊ ALÎKSAN

1.1. JİYANA AHMEDÊ ALÎKSAN.....	20
1.1.1. Ji dayîk bûn û Zaroktiya Ahmedê Alîksan	20
1.1.2. Ciwantiya Ahmedê Alîksan	20
1.1.3. Gundê Ahmedê Alîksan.....	21
1.1.4. Eşîra Ahmedê Alîksan	21
1.1.5. Zewaca Ahmedê Alîksan	21
1.1.6. Jiyana Ahmedê Alîksan a Rojane	22
1.1.7. Wefata Ahmedê Alîksan.....	23
1.2. KESEYATIYA AHMEDÊ ALÎKSAN	23
1.2.1. Dengbêjiya Ahmedê Alîksan.....	23
1.2.2. Kesên Ku Jê Sûd Girtiye.....	25
1.2.3. Perwerdeya Ahmedê Alîksan	26
1.2.4. Comerdiya Ahmedê Alîksan.....	26
1.2.5. Di Nezera Ahmedê Alîksan de Wekhevî.....	27

1.2.6. Xwedî Qonaxiya Ahmedê Alîksan	27
1.2.7. Rewşenbîriya Ahmedê Alîksan	28
1.2.8. Ahmedê Alîksan Xwedî Dengê Akûstîk e.....	28
1.2.9. Di Kilamên Ahmedê Alîksan de Rola Jinê.....	28
1.2.10. Terza Ahmedê Alîksan	30
1.2.11. Di Jiyana Ahmedê Alîksan de Otêla Seyîdan.....	30

BEŞA DUYEM

BERHEMÊN AHMEDÊ ALÎKSAN

2.1. BERHEMÊN WÎ	32
2.1.1. Klamên şer/mêrxasî/kuştiya.....	32
2.1.1.1. Bavê Celal	32
2.1.1.1.1. Mijara Kilamê	32
2.1.1.1.2. Lehengên Kilamê.....	32
2.1.1.1.3. Naveroka Kilamê.....	32
2.1.1.1.4. Teşeya Kilamê	32
2.1.1.1.5. Nirxandina Kilamê	32
2.1.1.2. Bavê Sureya Kekê Kinyas.....	35
2.1.1.2.1. Mijara Kilamê	35
2.1.1.2.2. Lehengên Kilamê.....	35
2.1.1.2.3. Naveroka Kilamê.....	35
2.1.1.2.4. Teşeya Kilamê	35
2.1.1.2.5. Nirxandina Kilamê	35
2.1.1.3. Dewran e	41
2.1.1.3.1. Mijara Kilamê	41
2.1.1.3.2. Lehengên Kilamê.....	41
2.1.1.3.3. Naveroka Kilamê.....	41

2.1.1.3.4. Teşeya Kilamê	41
2.1.1.3.5. Nirxandina Kilamê	41
2.1.1.4. Fehim Felemez	46
2.1.1.4.1. Mijara Kilamê	46
2.1.1.4.2. Lehengên Kilamê.....	46
2.1.1.4.3. Naveroka Kilamê.....	46
2.1.1.4.4. Teşeya Kilamê	46
2.1.1.4.5. Nirxandina Kilamê	46
2.1.1.5. Ferzende	50
2.1.1.5.1. Mijara Kilamê	50
2.1.1.5.2. Lehengên Kilamê.....	50
2.1.1.5.3. Naveroka Kilamê.....	50
2.1.1.5.4. Teşeya Kilamê	50
2.1.1.5.5. Nirxandina Kilamê	50
2.1.1.6. Kerem û Nazê.....	52
2.1.1.6.1. Mijara Kilamê	52
2.1.1.6.2. Lehengên Kilamê.....	52
2.1.1.6.3. Naveroka Kilamê.....	52
2.1.1.6.4. Teşeya Kilamê	52
2.1.1.6.5. Nirxandina Kilamê	52
2.1.1.7. Lê Can	57
2.1.1.7.1. Mijara Kilamê	57
2.1.1.7.2. Lehengên Kilamê.....	57
2.1.1.7.3. Naveroka Kilamê.....	57
2.1.1.7.4. Teşeya Kilamê	57
2.1.1.7.5. Nirxandina Kilamê	57

2.1.1.8. Lê Here.....	60
2.1.1.8.1. Mijara Kilamê	60
2.1.1.8.2. Lehengên Kilamê	60
2.1.1.8.3. Naveroka Kilamê.....	60
2.1.1.8.4. Teşeya Kilamê.....	60
2.1.1.8.5. Nirxandina Kilamê	60
2.1.1.9. Mala Misto Mala Qaso.....	62
2.1.1.9.1. Mijara Kilamê	62
2.1.1.9.2. Lehengên Kilamê	62
2.1.1.9.3. Naveroka Kilamê.....	62
2.1.1.9.4. Teşeya Kilamê.....	62
2.1.1.9.5. Nirxandina Kilamê	62
2.1.1.10. Mîro.....	69
2.1.1.10.1. Mijara Kilamê	69
2.1.1.10.2. Lehengên Kilamê	69
2.1.1.10.3. Naveroka Kilamê.....	69
2.1.1.10.4. Teşeya Kilamê.....	69
2.1.1.10.5. Nirxandina Kilamê	69
2.1.1.11. Mûsa Kazim	76
2.1.1.11.1. Mijara Kilamê	76
2.1.1.11.2. Lehengên Kilamê	76
2.1.1.11.3. NaverokaKilamê.....	76
2.1.1.11.4. Teşeya Kilamê.....	76
2.1.1.11.5. Nirxandina Kilamê	76
2.1.1.12. Nabî.....	79
2.1.1.12.1. Mijara Kilamê	79

2.1.1.12.2. Lehengên Kilamê	79
2.1.1.12.3. Naveroka Kilamê.....	79
2.1.1.12.4. Teşeya Kilamê.....	79
2.1.1.12.5. Nirxandina Kilamê	79
2.1.1.13. Seyît Betal	81
2.1.1.13.1. Mijara Kilamê	81
2.1.1.13.2. Lehengên Kilamê	81
2.1.1.13.3. Naveroka Kilamê.....	81
2.1.1.13.4. Teşeya Kilamê.....	81
2.1.1.13.5. Nirxandina kilamê	81
2.1.1.14. Hewê	86
2.1.1.14.1. Mijara Kilamê	86
2.1.1.14.2. Naveroka Kilamê.....	86
2.1.1.14.3. Lehengên Kilamê	86
2.1.1.14.4. Teşeya Kilamê.....	86
2.1.1.14.5. Nirxandina Kilamê	86
2.1.1.15. Taşlıçay	88
2.1.1.15.1. Mijara Kilamê	88
2.1.1.15.2. Lehengên Kilamê	88
2.1.1.15.3. Naveroka Kilamê.....	88
2.1.1.15.4. Teşeya Kilamê.....	88
2.1.1.15.5. Nirxandina Kilamê	88
2.1.1.16. Mîrze Beg.....	91
2.1.1.16.1. Mijara Kilamê	91
2.1.1.16.2. Lehengên Kilamê	91
2.1.1.16.3. Naveroka Kilamê.....	91

2.1.1.16.4. Teşeya Kilamê.....	91
2.1.1.16.5. Nirxandina Kilamê	91
2.1.1.17. Herba Çeneqelê	95
2.1.1.17.1. Mijara Kilamê	95
2.1.1.17.2. Lehengên Kilamê	95
2.1.1.17.3. Naveroka Kilamê.....	95
2.1.1.17.4. Teşeya Kilamê.....	95
2.1.1.17.5. Nirxandina Kilamê	95
2.1.1.18. Surmeli Memed Paşa	98
2.1.1.18.1. Mijara Kilamê	98
2.1.1.18.2. Lehengên Kilamê	98
2.1.1.18.3. Naveroka Kilamê.....	98
2.1.1.18.4. Teşeya Kilamê.....	98
2.1.1.18.5. Nirxandina Kilamê	98
2.1.1.19. Mîrê Min (Şêx Seîdê Palo).....	101
2.1.1.19.1. Mijara Kilamê	101
2.1.1.19.2. Lehengên Kilamê	101
2.1.1.19.3. Naveroka Kilamê.....	101
2.1.1.19.4. Teşeya Kilamê.....	101
2.1.1.19.5. Nirxandina Kilamê	101
2.1.2. Kilamên Evînê	104
2.1.2.1. Besra.....	104
2.1.2.1.1. Mijara Kilamê	104
2.1.2.1.2. Lehengên Kilamê	104
2.1.2.1.3. Naveroka Kilamê.....	104
2.1.2.1.4. Teşeya Kilamê.....	104

2.1.2.1.5. Nirxandina Kilamê	104
2.1.2.2. Evdal	106
2.1.2.2.1. Mijara Kilamê	106
2.1.2.2.2. Lehengên Kilamê	106
2.1.2.2.3. Naveroka Kilamê.....	106
2.1.2.2.4. Teşeya Kilamê.....	106
2.1.2.2.5. Nirxandina Kilamê	106
2.1.2.3. Gewrê	110
2.1.2.3.1. Mijara Kilamê	110
2.1.2.3.2. Lehengên Kilamê	110
2.1.2.3.3. Naveroka Kilamê.....	110
2.1.2.3.4. Teşeya Kilamê.....	110
2.1.2.3.5. Nirxandina Kilamê	110
2.1.2.4. Gula Ber Qefayê.....	112
2.1.2.4.1. Mijara Kilamê	112
2.1.2.4.2. Lehengên Kilamê	112
2.1.2.4.3. Naveroka Kilamê.....	112
2.1.2.4.4. Teşeya Kilamê.....	112
2.1.2.4.5. Nirxandina Kilamê	112
2.1.2.5. Wer Helîmê	114
2.1.2.5.1. Mijara Kilamê	114
2.1.2.5.2. Lehengên Kilamê	114
2.1.2.5.3. Naveroka Kilamê.....	114
2.1.2.5.4. Teşeya Kilamê.....	114
2.1.2.5.5. Nirxandina Kilamê	114
2.1.2.6. Lawko.....	116

2.1.2.6.1. Mijara Kilamê	116
2.1.2.6.2. Lehengên Kilamê	116
2.1.2.6.3. Naveroka Kilamê.....	116
2.1.2.6.4. Teşeya Kilamê.....	116
2.1.2.6.5. Nirxandina Kilamê	116
2.1.2.7. Lê Bedewê.....	118
2.1.2.7.1. Mijara Kilamê	118
2.1.2.7.2. Lehengên Kilamê	118
2.1.2.7.3. Naveroka Kilamê.....	118
2.1.2.7.4. Teşeya Kilamê.....	118
2.1.2.7.5. Nirxandina Kilamê	118
2.1.2.8. Lê Dîlberê	120
2.1.2.8.1. Mijara Kilamê	120
2.1.2.8.2. Lehengên Kilamê	120
2.1.2.8.3. Naveroka Kilamê.....	120
2.1.2.8.4. Teşeya Kilamê.....	120
2.1.2.8.5. Nirxandina Kilamê	120
2.1.2.9. Limin Siwaro.....	122
2.1.2.9.1. Mijara Kilamê	122
2.1.2.9.2. Lehengên Kilamê	122
2.1.2.9.3. Naveroka Kilamê.....	122
2.1.2.9.4. Teşeya Kilamê.....	122
2.1.2.9.5. Nirxandina Kilamê	122
2.1.2.10. Lorî Lorî.....	124
2.1.2.10.1. Mijara Kilamê	124
2.1.2.10.2. Lehengên Kilamê	124

2.1.2.10.3. Naveroka Kilamê.....	124
2.1.2.10.4. Teşeya Kilamê.....	124
2.1.2.10.5. Nirxandina Kilamê	124
2.1.2.11. Mûso Mere	126
2.1.2.11.1. Mijara Kilamê	126
2.1.2.11.2. Lehengên Kilamê	126
2.1.2.11.3. Naveroka Kilamê.....	126
2.1.2.11.4. Teşeya Kilamê.....	126
2.1.2.11.5. Nirxandina Kilamê	126
2.1.2.12. Seyranê.....	130
2.1.2.12.1. Mijara Kilamê	130
2.1.2.12.2. Lehengên Kilamê	130
2.1.2.12.3. Naveroka Kilamê.....	130
2.1.2.12.4. Teşeya Kilamê.....	130
2.1.2.12.5. Nirxandina Kilamê	130
2.1.2.13. Yar Felek.....	132
2.1.2.13.1. Mijara Kilamê	132
2.1.2.13.2. Lehengên Kilamê	132
2.1.2.13.3. Naveroka Kilamê.....	132
2.1.2.13.4. Teşeya Kilamê.....	132
2.1.2.13.5. Nirxandina Kilamê	132
2.1.2.14. Zerya	136
2.1.2.14.1. Mijara Kilamê	136
2.1.2.14.2. Lehengên Kilamê	136
2.1.2.14.3. Naveroka Kilamê.....	136
2.1.2.14.4. Teşeya Kilamê.....	136

2.1.2.14.5. Nirxandina Kilamê	136
2.1.2.15. Ferzê û Hekarî	139
2.1.2.15.1. Mijara Kilamê	139
2.1.2.15.2. Lehengên Kilamê	139
2.1.2.15.3. Naveroka Kilamê.....	139
2.1.2.15.4. Teşeya Kilamê.....	139
2.1.2.15.5. Nirxandina Kilamê	139
ENCAM	174
ÇAVKANÎ	176
PÊVEK.....	180
KURTEJİYAN	
ÖZGEÇMİŞ	

KURTE
TEZA MASTIRÊ
AHMED ALÎKSAN JI DENG BÊJAN
YEŞILÇINAR, Fehmi
Şêwirmend: Doç. Dr. Abdulcelil BÎLGÎN
2015, 254 Rûpel

Li hemû welatan û di nav tevahî gelan de wêjeya devkî di saziyekê de tê xwuyakirin. Wêjeya devkî ji roja dîroka mirovahiyê dest pê kiriye hetanî îro bi riya van saziyan hatiye. Di vê demwariyê de neqilkarî malê keseyatiya vê saziyê ye. Li warê Kurdan li Kurdistanê ji vê saziyê re dibêjin dengbêjî. Yê ku wî karî dikin jî dengbêj in.

Li erdnîgariya Kurdan hin war di vê derbarê de derketine pêş. Di nav van erdnîgariyan de ya herî pêşketî Serhed e. Agirî jî giraniya xwe di dengbêjiya Serhedê de nîşan dide. Agirî bi dehan dengbêj gihandine. Wek mînak Evdalê Zeynikê, Şakiro, Nûro Meter û hwd. Dengbêjê me Ahmedê Alîksan li vê qonaxê (Agirî) cihê xwe girtiye û qewî kiriye. Di kilamgotinê de hozaniya xwe bi awayekî xurt di hûnera xwe de bang dike û dide zanîn.

Dengbêjan bi riya dengbêjiyê bûyerên hemdemên xwe li bîra dîrokê nexş kirine. Ew bûyerana bi neqilkariya wan heta îro hatiye. Daxwaz ewe ku ev hozaniya hêja bigihîje nîfşên din û ew nîfş jî hay ji serpêhatiyên bav û kalan hebe.

Pêyvên Sereke: Wêjeya Devkî, Kilamên Kurdî, Dengbêjî, Dengbêj

ÖZET

YÜKSEK LİSANS TEZİ DENGBÉJLERDEN AHMED ALİKSAN

Fehmi YEŞİLÇINAR

Tez Danışmanı: Doç. Dr. Abdulcelil BİLGİN

2015, 254 Sayfa

Milletlerin sözlü edebiyat geleneği kendi ülkelerindeki sosyal örgütlenmelerden meydana gelmiştir. Böylece sözlü edebiyat insanlık tarihi ile başlamış ve bu örgütlenme sayesinde günümüze kadar ulaşabilmiştir. Bu dönemlerden günümüze aktarılan sözlü edebiyat malzemeleri bu örgütlenmeyi vücuda getiren şahısların malıdır. Kürdistan’da ve kürtler arasında bu şekildeki aktarım örgütlenmesine “dengbéjlik” ve bu işi icra edenlere de “dengbéj” denmiştir.

Kürt coğrafyasında bazı bölgeler dengbéjlik müessesesi ile önplana çıkmışlardır. Bu bölgeler arasında özellikle önplana çıkan Serhat bölgesidir. Dengbéjlikte Ağrı’nın da büyük bir payı vardır. Ağrı, Evdalê Zeynikê, Şakiro ve Nûro Meter gibi onlarca dengbéj yetiştirmiştir. Tezimizin konusunu teşkil eden Ahmedê Alıksan da Ağrı mıntakasındandır ve bu müessesede önemli bir yer edinmiştir. Seslendirdiği kamlar ile hozanlığını güçlü kılmış ve sanatsal bir başarı ile onları dile getirmiştir.

Dengbéjler, dengbéjlik vasıtasıyla kendi dönemlerindeki olayları tarihin mantalitesine nakşetmişlerdir. Bu olaylar onların anlatımları sayesinde günümüze ulaşmıştır. Amacımız odur ki, bu müesseseyi günümüz nesline aktarıp onların da kendilerinden sonraki nesillere aktarımını sağlamaktır. Böylece gelecek nesiller, atalarının anılarından ve tarihi hafızalarından haberdar olacaklardır.

Anahtar kelimeler: Sözlü Edebiyat, Ahmedê Alıksan, Dengbéj, Dengbéjlik.

ABSTRACT
MASTER'S THESIS
THE LIFE AND WORKS OF AHMED ALÎKSAN
Fehmi YEŞİLÇINAR
Advisor: Doç. Dr. Abdulcelil BİLGİN
2015, Page 254

It is the social institutions of countries that shape the oral literature tradition of nations. Thus, oral literature begins with the history of mankind, and thanks to these institutions, it is available to today. The oral literature materials that reach us from the earlier periods are the works of people who formed that institution. This institution is called Dengbêjî in Kurdistan, the hometown of Kurds, and the person who does this job is called Dengbêj.

There are some prominent locations in the Kurdish region regarding dengbêj institution. The most important leadership occurs in Serhat region. In this sense, Ağrı is the city that bears the stamp of SerhatDengbêjî. Ağrı has well known dengbêjs such as EvdalêZeynikê, Şakiro and Nûro Meter. Additionally, Ahmedê Alîksan, the subject of this study, lives in Ağrı and he is one of the prominent figure of dengbêjîinstitution. The way that he voices his klams (songs) is so successful that he becomes well known among dengbêjs.

Dengbêjs imprint the events happened in their period to the history via the art of dengbêjî. These events have survived owing to their expressions. The aim of this study is to introduce dengbêjî institution to the present generation so that it can be transferred to the future generations. In this manner, future generations will be aware of the memoriesand historical memory of their ancestors.

Key Words: Oral literature, Ahmed Alîksan, Dengbêjî, Dengbêj

PÊŞGOTIN

Edebiyata Kurdî sedsala 20an bi awayekî xurt dest bi nivîsê dike. Nivîskarên Kurd edebiyata devkî derbasî edebiyata nivîskî dikin. Lewra edebiyata devkî dibe biguhire lê edebiyata nivîskî naguhire. Nivîskarên edebiyata Kurdî ji kar û xebatên xwe yê di vê derbarê de gelek astengî didîtin û carinan bi mecbûriyetî navber jî didane nivîsandinên xwe. Van salên dawî jî ji bo edebiyata nivîskî xîretek heye. Bi awayekî fermî dikare bê tomarkirin.

Di nav civaka Kurdan nûnerên edebiyata devkî do hebûn, îro hene û em hêviyê ne ku sibehê jî hebin. Ji wan nûneran yek jî dengbêjin. Dengbêj, xemla welêt bi xeyalên gel ve dineqîşîne. Rindî, bedewî û spehiyan derdixe holê. Dibin bîra gel, dîroka mirovahiyê, destanbêjên welêt. Her yek li gorî qewlên heremên xwe derketine pêş çav. Bi dîtinên xwe pêşeroja gelên xwe ronî kirine.

Dengbêj ne ji gel, ne ji çanda welêt, ne ji bûyerên dîrokî, ne jî ji nexşa sirûştê dûrin. Pêşbîniyeke ecêb li bal wan heye. Ji beriya karbeşiyê hetanî niha dengbêjan him kar û xebatên xwe kirine him jî wêfên dengbêjiyê di xwe de parastine û ragihandine nifşên din. Ku em jiyana û xebatên dengbêjan dinêrin ya ku ev kar bi wan daye kirin eşqa dengbêjiyê ye. Ew evîndarên gel û welêt in. Bi awayekî hezkirî û bi dil û can dibêjin.

Yek ji wan nûnerên birûmet jî, mijara teza me Dengbêj Ahmedê Alîksan e. Me di vê tezê de jiyana Ahmedê Alîksan nivîsî û ji berhemên wî 34 heb di bin pênc serenavan de nirxand.

Ji ber ku di derbarê Ahmedê Alîksan de likolîn an nivîsek pêşiya me tunebû me jî ji bo nasandina jiyana Ahmedê Alîksan him zar û zêçê wî him hevalên wî him jî yên ku Ahmedê Alîksan nasdikin re hevpeyvîn kir. Hevpeyvîna ku bi van kesan re hatiye kirin rabeî hev kir û agahî di derheq jiyana Ahmedê Alîksan de derxist holê. Bê guman şexsiyeteke wuha muhîm bi gelek aliyan ve divê bihata kolandin. Lê em li ser nasandina jiyana û keseyatiya Dengbêj Ahmed û nirxandina berhemên wî sekinîn.

Di destpêkê de edebiyata devkî û ya nivîskî li gor çavkaniyên dest me da me amade kir. Dengbêj, dengbêjî, dîroka dengbêjan û perwerde bûna dengbêjan jî di bin vê sernavê de hat dayîn.

Beşa yekem di derbarê jiyana Ahmedê Alîksan de ne.

Beşa duyem berhevkirina berhemên Ahmedê Alîksan û analîzê berhemên wî ne.

Ez ji bo vê xebatê di serî de spasiya herî mezin ji bo camêrî û rêberiyê li Şêwirmendê xwe birêz Abdulcelil BİLGİN dikim. Peyra di trankirîbsiyona kilaman de ji bo alîkariya wê ya mezin spasiyê hevjinê xwe Gulsun xanimê dikim. Di vê xebatê de ji bo kar û keda wî Mamoste Hanîfî TAŞKIN, ji bo pişgiriya Mehmet BOZKOYUN, Ayhan ÖZDEMİR, Müslîh SEZER, Şenay ÖZDEMİR, Dengbêj Xalê Bekir, Dengbêj Cesîmê Dengzêrîn, Şevki BURAK, Paşa TAŞTAN û bi kesên dinên û ku min bi wan re hevdîtin kirye re spasdarim. Spasiyekê jî ji bo mijar bijartinê Doç. Dr. Metin BARLIK dikim.

22.11.2015

Fehmi YEŞİLÇINAR

KURTEBÊJE

- amd. : Amadekar
b.n. : Berhema Navborî
bnr. : Binêrin
b.z. : Berî Zayînê
c. : Cild
ç. : Çap
h.b. : Heman Berhem
hwd. : Her Wekî Din
j. : Jimare
nql. : Neqil
r. : Rûpel
wer. : Wergêr
weş. : Weşanxane

ÎNDEKSA WÊNEYAN

1. **Wêne 1.** Dengbêj Ahmedê Alîksan
2. **Wêne 2.** Dengbêjê Kurdistanê Xalê Bekir
3. **Wêne 3.** Ali Haydar Can
4. **Wêne 4.** Mala Dengbêj Ahmedê Alîksan
5. **Wêne 5.** Dengbêj Cesîmê Dengzêrîn
6. **Wêne 6.** Şevki Burak
7. **Wêne 7.** Qebra Dengbêj Ahmedê Alîksan
8. **Wêne 8.** Denbêj Elbarî
9. **Wêne 9.** Xêzkirina Wêneya Dengbêj Ahmedê Alîksan
10. **Wêne 10.** Otêla Seyîdan
11. **Wêne 11.** Paşa Taştan
12. **Wêne 12.** Ayhan Özdemir

DESTPÊK

Dengbêjî şaxeke edebiyata devkî ye. Dengbêj Ahmedê Alîksan nûnerê vê şaxê ye. Ji ber ku dengbêjî û edebiyata devkî têkildarin emê li ser edebiyata devkî, ya nivîskî û hêmanên dengbêjiyê bisekinin.

1. Edebiyata Devkî

Di detspêka hunera devkî de bêje esasê edebiyata devkî datîne. Veguherînên bêjeya devkî edebiyata devkî derdixe holê û digihîne astên nû. Ev veguherînên edebiyatê li ser zimên çêdibe. “Ziman berhemeke mirovî ya hizrî ye. Her ziman (ji bilî Esperantoyê*) wekî navgîna bazirganî û ragihandinê ji qonaxa devkî destpê dike. Şert û mercên dîrokê derfetê bidin, zimanekî wisa devkî dikare bikemile ku bibe zimanê nivîskî.”¹ “Berhema nivîskî nayê guherîn, lê ya devkî dikare gelek caran were guherîn. Ji vî aliyê ve berhemên devkî serbixwe ne. Berhemên devkî bê çarçove ne. Lê yên nivîskî sînoren wan diyarin.”² Têkiliya di navbera edebiyata devkî û ya nivîskî têkîlîke xurt e. “Em bidevgotina cureyên wêjeyê -roman, çîrok hwd.- wek peywîr girtina çanda nivîskî dibînin. Lê bi rastî çîrokbêjî, bi zanetî nebe jî pêwendiya di navbera xwe û dinya çanda devkî de xwe diparêze û bandora xwe ya li ser jiyana çanda nivîskî didomîne.”³

“Jiyana gelê Kurd xwedî zargotîneke wêjeya devkî ye û dewlemendiya stran û kilamên dengbêjan li gor rastiya jiyana gelê me derxistiye holê.”⁴ Li Kurdîstanê di nava netewa Kurd e edebiyata devkî xwadî cihekî bi rûmet e. “Me’lum e di civakên devkî de mîrasa gelêrî bi riya guh çêdibe û bi hişekî civakî jî tê parastin. Yê ku vê mîrasê diparêze elbet dengbêj e.”⁵ Di nava gelên din de jî yên ku peywîra dengbêjan pêk tînin hene. Di Keltan de bard, di Tirkan de ozan û di nava gelên Afrîkî de jî groît e hwd.) dengbêjan bi rûkî spî heta vê demê edebiyata devkî anîne.

Bêguman di edebiyata devkî de ziman cihekî giring digre.

*Esperanto: Zimanekî çêkirî û hêsa ye. Bi aliyê Dr. L. Zamehat ve li Polonyayê 1887de ji bo hemû gelan ku pêk bînin hatiye çêkirin. Gremara û 16 qaîdeyên wê zimanî heye.

¹ Jemal Nebez, **Kurd(Dîrok û Kultura Wan)**, İstanbul: Avesta, 2007, r.60

² Tekin Çifçi, **Kilam û Jin**, İstanbul: Nûbihar, 2014, r. 25

³ Barry Sanders, **Öküzün A’sı, Elektronik Çağda Yazılı Kültürün Çöküşü ve Şidetin Yükselişi**, Şehnaz Tahir (çev.), İstanbul: Ayrıntı, 2013, r.15-16

⁴ Hayrettin Ekinci, **Dengbêjî**, İstanbul: J&J, 2013, r.145

⁵ Remezan Alan, “Dengb’ej(î) û Helbesta Gelêrî”, **Wêje û Rexne**, Hejmar 4, 2015, r.10

“Kurd dibêjin; ‘ziman digere, dev dibêje.’ Dev û ziman taybetmendiye mirov in, mirov bi wan lebatan kesayetiya xwe vedibêje û dide nasîn. Di serencama mirovahiyê de dema ku bi tevgera zimên deng bi dev ket, mirovan jî wate li wan dangan bar kirin, bi vê yekê ‘bêje’ hate pê. Bêjeyê, hîm û bîngeha hûnera devkî danî, çî çax ku hûnera devkî, veguherî wêjeya devkî, wê demê wêjeya devkî rê li ber jiyana mirovahiyê vekir. Mirovahiyê di serencama xwe ya dirokê de hemû deriyên girtî bi efsûna bêjeyê li ber xwe vekir, bi hêza bêjeyê xwe gihand qad û qonaxên nû⁶

“Edebiyata devkî şewe û awayê “vegötina çandî” ya xelkê ye. Ji ber vê yekê ye ku li Kurdistanê, dengbêjî û çîrokbêjî pir pêşketî ye û li her dera Kurdistanê, dengbêjî û çîrokbêjî hene.”⁷ Ev dengbêjana li qonaxên ku Kurd lê dijîn bi gotinên xwe yê bi jarte dîsa bi awa û awazên xwe di navbera do û îro de bûne pir û nedane windakirin. Bi şahîdiya wan haya me ji rabirdûyê çêbû, bi çîroka kilamên wan jî bîra me zindî ma.

Di bîngeha kilamên dengbêjan de çîrok hene. Her kilamek li ser hîmê çîrokekî ava bûye. “Çîrok temara giyana çanda devkî ne. Lê çîrokbêjî qelbê eşîr û civaka ne. Çîrokbêjî çîrokên xwe bi temamî sazûmana digêrîne û pêk tîne.”⁸ Di nav civaka Kurdan de edebiyata devkî ku tê gotin gelekî xurt e. “Her tiştê Kurdan di nav wan kilaman de bi esasî veşartî ye. Qehremanî(lehengî), welatperwerî, berxwedan, eşq û evîn, xiyamet, tiştên ilmî, trajediya me hemû di nava çîrokê de ye.”⁹

“Di dinyaya biyanî ya gotinê de, agahî û erka belavkirina agahiyê, ne di tu saziyê de bi tenê di dil û giyana yek mirovî çîrokbêjî de cih digirt.”¹⁰ Li Kurdistanê jî ev giyan di dengbêjan de cih girtiye.

Di hîmê çanda devkî de “axaftin” heye. Axaftvanê çanda Kurdan yê sereke dengbêj in. “Her tişt bi hêza axaftinê ve girêdayî ye. Tiştên ku tene axaftin, hest, evîn, xem, eş û hwd. hemû bi riya stran, dûrik, lorîk, çîrok û hwd. tene ragihandin, bi kevneşopiyên çandî hatine dorpeçkirin.”¹¹

⁶ Mehmet Öncü, **Antolojiya Dengbêjan**, Şaredariya Mezin a Diyarbekirê, 2011, r.21.

⁷ Mehmed Uzun, **Destpêka Edebiyata Kurdî**, İstanbul: İthaki, 2010, r.31.

⁸ Sanders, **h.b.**, 2013, r.15.

⁹ Ekîncî, **h.b.**, r.7.

¹⁰ Sanders, **h.b.**, r.21.

¹¹ Çifçi **h.b.**, r.23.(Eser Köker, Kitapta Kurutulmuş Çiçekler, Ankara: Dipnot, 2010, r. 42)

“Navgîna ragihandina çanda devkî ziman e. Ziman, dema ku axaftvanê xwe wenda dikin dimirin. Tixûbên temenê jiyana zimanekî, axaftvanê wî ne. Îro bi bikaranîna amûrên ragihandinê, peyvên devkî, ji ber ku cihêrengî zêde bûye, hatine qerisandin, peyv qelibîne ser grafîkan.”¹² Di çanda devkî ya Kurdî de barkêşê herî mezin dayîk in. Paşê jî dengbêj in. Dengbêj bûne berdevkê çanda devkî.¹³

Di civatê de edebiyata herî kevn edebiyata devkî ye. Edebiyata devkî, berî edebiyata nivîskî destpêdike û hê jî li kêleka wê hebûna xwe berdewam dike.

“Nexwe meriv dikare wan form û cureyên edebî yên ku ji demên herî kevn ve bi riya gotinê tên veguhastin wekî “edebiyata devkî” bi nav bike. Kilam, destan, şerên ku dengbêj dibêjin, gotinên pêşyan, lawij, mamik, biwêj, lorîk û hwd. dikevin nava van cureyên edebî yên edebiyata devkî. Mehsûlen edebiyata devkî ne malê nivîskarekî/ê ye, malê gel tevî ye.”¹⁴

Ku ev xebata me li ser edebiyata devkî ye û em nizanin dê ka kengê û ji hêla kê ve hatiye gotin, Ji ber vê yekê jî, jê re edebiyata gel a hevpar’ tê gotin. “Ev edebiyata hevpar; serpêhatiyên bêdawî, qiset, çîrok, destan, bîranîn, efsane û hemû rewş û şertên tiştên aîdî jiyana sirûştî ne û di nav xwe de dihevine.”¹⁵ Evîn, şer, koçberî, qehremanî, jiyana rojane, şerên bêdawî yên di navbera gelê Kurd û dagirkeran de, çavkaniyên edebiyata devkîne.

“Bi rastî jî dewlemendiya zimanê me, dewlemendiya gotina Kurdî di wan de ye, yanî di edebiyata devkî de ye.”¹⁶ Em edebiyata devkî di kesayeta dengbêjan de dibînin. Ev dewlemendî bi riya peyv û gotinên wana bûye vegotinek xwedî giyan. “Vegotin, têkiliyeke zimanî ye ku bi dinê re tê avakirin. Zîra dema insan verastkirinên huquqî, ûtopiyayên siyasî, tezên îlmî, pêşniyazên felsefî, pejnên şexsî bi cil û berg dike, zimên saz dike.”¹⁷

“Di nav Kurdan de nebûna çanda nivîskî û hebûna/jiyîna folklorê zînde sedem û encamên hev in. Di veguhastina ji bo roja me ya hêmanên çanda devkî ya navborî de,

¹² Çifçi h.b., r.23.

¹³ Çifçi h.b., r.29.

¹⁴ Abdurrahman Adak, **Destpêka Edebiyata Kurdî ya Klasîk**, İstanbul: Nûbihar, 2013, r.25.

¹⁵ Kendal Nezan, Newzat Çelebî, Vedat Yıldırım, Aytekin G. Ataş, “Li Muzîka Kurdan a Kevneşopî Nêrîneke Giştî”, **Zend**, bihar-havîn, 2008, r. 7-21.

¹⁶ Firat Cewerî, **Kultur, Huner û Edebiyat**, Stockholm: Nûdem, 1996, r.131.

¹⁷ Alan, **Bendname**, r.280.

para herfî mezin (heke em dema nêz nehesibînin) aîdî dengbêjan e.”¹⁸ Edebiyata devkî bi taybetî dengbêjî di sazkirina nasmeya Kurdî de roleke sereke digre. “Jiyana Kurdan, guherînên civakî, di zaraveyên cuda de, bi awayekî domdar ji nifşekî gihaye nifşekî din. Bi kurtî her tişt, lehengî, qewîmîn, adet, kevneşopî, rê û rism, destan û çîrok bi awayekî rêk û pêk bi strankî honandin û bîreke hevpar ya civakî hatiye sazkin.”¹⁹

2. Edebiyata Nivîskî

Ji wê edebiyata ku di demeke diyar de, ji aliyê nivîskarekî/ê ve hatiye dayîn re edebiyata nivîskî tê gotin. Destpêkirina tarîxa edebiyata gelekî/miletekî li gorî destpêkirina berhemên nivîskî tê hesibandin. Berhemên nivîskî yê gelekî/miletekî çiqas kevn bin, edebiyata wî gelî jî ew qasî kevn e. Edebiyata gelekî kevin be, nirxê wê edebiyatê jî ewqas bilind dibe.²⁰

Nivîs di gelên kevn de bi piranî di karên fermî de derdiket pêş. Jiyana rojane an di pêkanîna baweriyên de giraniya nivîsê naxuyê. “Di dewrên modern de payebilindkirina nivîsê, bi netewiyê re dest pê kir. Ji ber ku di civakên kevn de pîroziya nivîsê tunebû. Persên mecûsî jî, hînduyên Veda-hebîn jî baweriyên xwe spartibûn tradîsyona devkî.”²¹

Her çiqas nivîs li axa mezarbota bi destê Sumeriyan ve derketibe jî Kurd nebûne xwedî nivîs. Ji vê mîrata (mîrasa) pêşiyên xwe, bêpar an kêmpar mane. Dîroka bînivîs mehkûmê jibîrkirinê ye. Gotineke tirkan de dibêje; peyv diçe/difire nivîs dimîne. Ev gotin giringiya nivîsê derdixe pêş. Lê dengbêjan bi karê dengbêjiyê ve ev gotin bi pêkanîna xwe ve bê wate kirine. Lewra tiştên ku em niha agahdarin bi riya saziya dengbêjiyê ve gihîştine me.

Di navgîna edebiyata kurda de nivîs bi awayekî gumreh nebe jî em dikarin heta Baba Tahiri Êryan biherin. Di destnivîsên dubeytiyên wî de nivîsê dibînin lê ku mirov edebiyata nivîskî bi edebiyata devkî ve dide berhev gelek lawaz dimîne.

¹⁸ Nezan, Çelebî, Yildirim, Ataş, h.g., r. 7-21.

¹⁹ Çifçi, h.b., r. 31.

²⁰ Adak, h.b., r.26.

²¹ Alan, Folklor û Roman, r. 66.

3. Dengbêj û Dengbêjî

3.1. Dîroka Dengbêjan

Em di derheq dîroka dengbêjiyê de xwedî agahiyên têr û tije nînin. Em nizanin kengê bi aliyê kî/ê ve dest pê kirî ye. Lê em wisa bawerin ku temenê dengbêjiyê bi temenê Kurdan ve eynî ye, hemtemenin. Lewra Kurda hestên xwe yê her alî ve bi şêwazên cur be cur anîne ziman. Şahiyên xwe an kul û derdê xwe her tim ji hev re strane û vegotine. Mirov dikare bêje ku bingeha dengbêjiyê hê li landikê dane çêdibe. Dayîk li ber landika zarokan rûdinên û jê re lorik, lavêk û biwêjan dibêjin.

“Kevnariya dîroka destanan qasî dîroka mirovahiyê ye. Çiyayên Zaxrosan erdnigariya destan û efsaneyan e ku li Mezopotamyayê cih digire. Mezopotamya jî ew devera bi bereket e ku di geşedana şaristaniyan de ristekî mûhîm lîstiyê.”²² Bi baweriyeke xurt kevnariya hebûna Kurda ya Mezopotamyayê qasî kevnariya Mezopotamyayê ye. Kurd him xwediyê axa Mezopotamyayê him jî xwediyê çanda Mezopotamyayê ne. Dengbêj xwediyê bîra Kurdan e. “Çand û hûnera Kurdan jî wek ya hemû gelên din, bi pêşketina şaristaniya wan ve hevrast e. Nemaze di stranên Kurdan de, gelek motif û hêmanên berbiçav ên di jiyana civakî û sirûştî ya îroyîn de tîr bikaranîn û taybetiyên heyama neolîtîk tîr dîtin.”²³

“Bela ku xebatekê bi zanistî li ser dengbêjan nehatiye çêkirin mirov nikare bibêje dengbêjî di filan dîrokê de dest pê kiriye. Li gorî ku ji devkî hetanî niha hatiye, dîroka dengbêjiyê kevnar e.”²⁴

Dengbêjî, bikaranîna edebiyata devkî a di nav Kurdan de ne. Dîroka destpêka dengbêjiyê ne diyarbe jî Mehmet Öncü vê saziya qedîm di Sumeriyan de dide destpêkirin û digihîne Gutî, Qasit, Mîtanî û Medan.²⁵

Mehrdad R. Izady jî digihîne serdema Partan (B.Z. 247-MS227) û dibêje;

“Li herêmê toreke hozan û çîrokbêjên (gosan) gelêrî ya ku bi hostatî hatibû birêxistinkirin û di repertuara wan de efseneya afirandinê ya Mîtraîk ku Mîtrakan tîr

²² İhsan Çolemergi, “Sözlü Kürt Edebiyatında Destanlar”, İnatçı Bir Bahar, Vecdi Erbay(drl.) , Ayrıntı, r. 315-320.

²³ Cewad Merwanî, **Kilam & Stranên Kurdî**, İstanbul: Avesta, 2010, r.17.

²⁴ Ekîncî, **h.b.**,r.162.

²⁵ Öncü, **h.b.**,r.25.

de xwediyê roleke berbiçav bû, hebû. Hozan û çîrokbêjên bi heman rengê di nav hemû gelên Rojhilata Navîn de hebûn. Di nav Kurdan de nûnerên vê toreyê dengbêj in.”²⁶

Dengbêjan ku bûyerên dema xwe neqil dikirin û mîran jî hez dikir ku di dîrokê de cih bigrin rûmet didan dengbêjan û di dîwanên xwe de cihekî pêwîst ji dengbêjan re vediqetandin. “ Lê dema dengbêjana herf popûler di nava sedsala 14 û 19 de ye.”²⁷

3.2. Dengbêj

Îroya mirov; bi rabirdûya do û xeyalên paşeroja wî ve bi wate ye. Jiyan li ser esasê duhê bi ramanên sibeyî ve îro şikil digre. Ne jiyan mirovahiyê, ne jî fikr û ramanên mirovan bi baskekî nabe. Dengbêjan ev girîngiya jiyanê dîtine û gotinên xwe li gor van rastiyan hûnandine, neqîşandine.

Dengbêj; ew kesên ku bi dengê xwe ve stran û kilaman dibêjin in. Dengbêjan ji civaka xwe re stran û kilam pêşkêş kirine. Di kilamên xwe de rewşa civakê anîne zimên. “Kilam bi taybetî xwedî leheng e, bi mîrxasî, évînî, xiyaneî, maldarî, xîzanî û erdnîgariyekê ye. Bi taybetî rewşa tevekê ji civakê re dide xuyakirin. Gelê Kurd jî hêza xwe ji van kilaman girtine, xwe nas kirine û pêşiya xwe ronî kirine.”²⁸

Dengbêj ser axa bav û kalan, bi hestên xwe, dîroka kevnare ji me re parve dike. Bargirên çanda devkî a yekemîn dayîk û dengbêj in. Mijarên kilamên dengbêjan bi piranî li ser bûyerên afakî nehatine gotin. Di bingeha mijarên kilaman de di mûtlaq sûretê de bûyereke qewumî heye. Dengbêj jî wê bûyerê li gor dîtna xwe dihûne û ji civakê re vedibêje. Dengbêj bi angorî hîskirina bûyerê di dilê xwe de berhemên bi bandor derdixe holê.

Dengbêj li welatê qedîm, di gundê qûntara çiyayên serbilind de di şevbihirka gundiyan a şevên zivistanê reş û dirêj de xwe dide nîşan. Dengbêj ser birîna civata xwe dibêje, diqîre û dikelîne. Dengbêj bîr e. Dengbêj dîrokzan e, dengbêj bîranîna bûyera ne.

“Peyva ‘dengbêj’ ji ‘deng’ û ‘bêj’ê pêk tê, peyveke hevedudanî ye û bi Kurdî ye. Wateya ‘bêjevaniyê’ dihûndirîne. Dengbêj, kesê ku bûyerên dîrokî û çandî bi şewaza

²⁶ Mehrdad R. Izady, *Bir El Kitabî Kürtler*, İstanbul: Doz, 2013, s.427.

²⁷ Ekîncî, *h.b.*, r.17.

²⁸ Ekîncî, *h.b.*, r.17.

dengî li gor meqamekî taybetî, stranê bi hûnereke wêjeyî radigihîne civaki ye.”²⁹Ango dengbêj, gotinê li gor xwe dinêrxîne û peyvan dixemilîne û raberî gel dike. Ew gotinên xwe yên efsûnî radigihîne nişên nû.

“Bi sed salan e dengbêj tenê bi zimanê xwe yê dayikê kilaman dibêjin, çîrokan dibêjin. Ziman û çîrok bi kilamên wan li ser lingan mane.”³⁰

Ku di nav civata Kurdan de nivîsar tunebû an kêmbû bîra gel bi alîkariya dengbêjan ve didoma û nedihat ji bîr kirin. Ku mirov li ser dengbêjan de hûr dibe, dibîne ku dengbêj ne tenê stranbêj in. Gelek karan di kesayetîkî de cih girtiye. Dengbêj di beriya karbesiyê de ji aliyekî ve metranên Zerdeştin, ji aliyekî din ve jî sêhrbazin, helbestvanin. Di nav civatê de rolên wan ê cuda cuda hene. Hîn caran şewirmendê desthilatdaran in, carinan jî stranbêj in. Yanî dengbêj waqebêj e, neqilkar e, dîrokzan e û rexnekar e. Lê em dizanin hûner û qabîliyeta dengbêjan ne ev tenê ye. Dengbêj di heman demê de aqilbend in jî.

Hêza hozaniya dengbêjan di parastina zimên û karên ku gel pêk tînin de pêwîst e. Hozan, li beriya dîrokê him hozan him zana him jî metran in. Remezan Alan di gotara ku ‘Dengbêj(î) û Helbestên Gelêrî’ de dibêje; ‘Îcrakarên wê di ayînên kevn de miqamkî helbest dixwendin, ji xeybê xeber didan, nexweşî û bêyomî dahf dikirin... an di nezara pir gelî de dengbêj, di heman demê de metran, remildar û hekîm bûn jî.’³¹ Em dikarin karê dengbêjiyê hetanî Magiya biherin. Wana ol bi distûrên Zerdeştîyê bi şewazên xwe dixwend û belav dikirin. Di jiyane de bêje û rewşa gel bi dengbêjiyê ve di nav pêwendiyê girîng de ne. “Di heman demê de Magî çawa ku tê zanîn tê wateya sêrbaziyê. Di vê derbarê de belkî sêrbazê yekem, rahîbên yekem û degbêjên yekem di kesayetiyekî de kom bûbe û vucût girtibe.”³²

Dengbêjan waqebêjî kirine. Lê hezkirine ku dinê fahm bikin. Ev gerdûna çî ye, çawa çêbû ye. Di kilamên wan de em dibînin terîfa erd, asîman, stêrk û kevir û beran heye. Hîn caran mesiyar terîf dike, carinan jî behsa karxezalan dike. Çanda dengbêjan da dinêke bêbinî heye. Di vê dinya bêbinî de li gor dîtin û şîroveyan xwe em agahdar

²⁹ Öncü, **h.b.**, r.23.

³⁰ Ekîncî, **h.b.**, r.33.

³¹ Alan, “Dengb’ej(î) û Helbesta Gelêrî”, r.10.

³² Bedran Hikmet, “Dengbêj Geleneği” **Înatçı Bir Bahar**, Vecdi Erbay(drl.) , İstanbul: Ayrıntı, r. 288-308.

kirine. Mahsûlên edebiyata devkî malê wan e. Ji ber ku di civaka Kurdan de çanda nivîskî tunebûye û riya çanda devkî bi zargotinê ve heta roja îro gihaye.

Ew di nav karê xwe de rewşenbîrîn jî. Belê aqilmendê mîr û began, rewşenbîrên civaka Kurdan in. Gelek cih û waran da rexneyên xwe kirine û îtîrazên xwe anîne zimên. Xwestine ku mîr, beg û rêvebiran hişyar bikin û bi derdê civakê bihisînin.

Heya kengê ev pir-alî û rûmet domiya? Elbet heya dewra karbeşiyê! Ji ber ku li dû karbeşiyê, ji bilî dengbêjiyê, erkên vî kesî ji dest çûn. Ya rast, karên din ketin destê yên ku di karbeşiyê de hostatî û pîşesaziyekê bi dest xistin.

Kûrbûna karbeşiyê ji bo hemû dengbêjan û elbet ji bo yê Kurd jî mîladek e. Nezera feodalî, piştewaniya mîrî û serok-eşîrî, di vê heyamê de xwe lê dipêçe. Di vê dewrê de ye dengbêj/hozan ji bo xwendina destanan ji wê serayê diçe ya din. Ji vê peywendiyê, elbet afdiyetek diwêlîde. Ev afdiyet, di devê gelek dengbêjan de dibê *ez dengbêjê filan mîr / paşa / eşîrê bûm*. Di vê pêvajoyê de hozan, hostayê deng, li ser sifra piştêkê xwe ye; li pêşberî mîr, paşa, beg û axayan diqîrin. Dawiya vê pêvajoyê jî mîladek e. Ji ber ku têkçûna mîrektiyên Kurdan (ku rastî sedsala 19an tê), ji bo dengbêj, qedandina *bohemyayê* ye. Ew ê ku heya vê demê di dîwanên giran de ciyekî maqûl girtibû, êdî sazbandekî dîlan û şahiyên e. Bi gotineke din, dengbêjê ku wextekê serboriyên mîr û serhewayên cengan dikir *waqayîname*, êdî yekî ji rêzê ye û bêpiştêk e. Bi “wextê rabûnê re bexşîşa cotek gayê sor î çavreş” li dû maye. Ji bo wan xelata Serdema Navîn, li panayîr û qehwexanan, êdî îcrakirina hûnerê ye.³³

Di vê derbarê de Remezan Alan di heman gotarê de rewşa dengbêjan û ketin û rabûna dengbêjan girê dide piştewaniyan û dibêje;

Piştî têkçûna piştewan, dengbêj êdî firoşê malekî ye! Ev veguherîn bi xwe re çi tîne? Bi xwe re xerabûna epîkê tîne. Ji ku dengbêj ji dîwanxaneyê dadikeve ciyê dîlan şahiyên, ji parastineke feodalî jî mehrûn dibe! Ev hal, di straneke Evdalê Zeynikê de gellek xweş kîrîstalize dibe:

“Ez ê Evdal im, Evdalê Zeynikê bûm

Bavê Temo, siwarê Nîjdê bûm

³³ Alan, “Dengb’ej(î) û Helbesta Gelêrî”, r.13.

Dengbêjê oda Sirmelî Memed Paşa (ê) teyrê dewletê bûm

Dilê gelek qîz û bûkên xelkê di min de hebûn

Berdevkê mîr û hakimî, çavîşê xortan bûm

Roja îro kor bûme çavên min nabînin

Mame li ber hêt û dîwarên xelkê

Bûme pêkenokê qîz û bûkên Zîlan û Heyderan

Li min wayê, li min wayê....”

Ferqa navberê çiqas mezin e: duh bi refê giregir re difriya dengbêj, serbilind bû, hêlîna wî xweş bû; lê îro baskîşestî ye, belengaz e û bûye pêkenok.³⁴

Do û îroya dengbêjan cudatiyeke mezin dihûndurîne. Do xwedî rûmet bûn, serkêşê dîwanan bûn, îro bêkes û tenê mane.

“Derbarê dengbêj û dengbêjiyê de ferhenga me bi belaxatê tije ye. Dema ev peyvên ser ziman, gotinên wek ‘lehengê çandê qedîm’, ‘avakarê hişekî civakî’, ‘hostayê peyvê’, ‘hêza kelamê’, ‘dengê çanda bav û kalan’ li pey hev rêz dibin.”³⁵ Rêzê gotinan di nav dil û rihê dengbêjan de diherike û civakê efsûn dike. “Çaxê dengê xwe pifî peyva dike dengbêj, dibê qey dem diqerise. Peyvên herî lêhatî li gorî şewazên xwe bi jest û mîmikên bi cî da bandor li guhdaran dike.”³⁶ Dengbêj bi vî aliyê xwe ve bi peyva seranomiyeke dîrokî raberî gelê xwe dike.

“Çawa ku em li ser keseyatiya dengbêjan an cihê wan a di nav civakê de hûr dibin divê em aşkere bikin ku ger di wêjeyê de cihekî pewîst bigre (Feqiyê Teyran), ger jî di mûzîka Kurdî de alîkariyeke wî/ê qêrîna hebe (Şivan Perwer), xwe bi navê dengbêj dane nasîn. Ev xwestek dide nîşan ku dengbêjî di nav gel de cihekî çiqas bi rûmet digire.”³⁷

Ev mînak rûmeta dengbêjan a di nav gel de dide nîşan. Kesekî ne dengbêj be jî xwe ji bo rûmeta dengbêjiyê wek dengbêj dide nasîn.

³⁴ Alan, “Dengbêj(î) û Helbesta Gelêrî”, r.13.

³⁵ Alan, “h.g.”, r.9.

³⁶ Sinan Akçan, Anlatıcı Olarak Dengbêj Ve Dengbêj Anlatılarındaki Kahramanın Makûs Talihi Film Ve Drama, *Yüksek lisans Tezi*, Kadir Has Üniversitesi, SBE, 2014, s.29.

³⁷ Hikmet, h.g., r. 288-308.

Di derheq dengbêjan de gelek pêname hene em dikarin li vira çend heb pênameyên dengbêjan bidin;

“Dengbêj bi kilam û stranên xwe, wijdanê gelê xwe ne. Wijdanî û bêwijdanî çî ye, ji hev cuda kirine. Yanî heqî û niheqî ji hev derxistine û bûne bingeha civaka Kurdan. Civak bi stran û kilamên xwe agahdar kirine.”³⁸

Dengbêj xwediyê bîreke xurt e. Serpêhatiyên xwe yan yê civakî vedibêjin. Dengbêj çavkaniyên dîrokî yê mûzîka Kurdî ne.

Dengbêj hîn caran kul û derdên me bi me dide jibîrkin, carinan jî derd û kula ji me nû dike. “Ew hunerên wan ê mezin û bilind da dilxweşî û keder tevlihev dibe. Armoniyeke dewlemend a bi sedan nexş û motîva dihûndirîne derdixê holê.”³⁹

“Li gor hinekan, feylesofên peyvên Kurdî, li gor hinekan hostayê gotinên wêjeya Kurdî û li gor hinekan jî bîra mîrata dîrok û zimanê Kurdan e dengbêj. Gelek nirx û rûmetên dîrokî, çandî û mîtolojîk bi peyvên xwe ve hûnandine, neqşkirine û gihandine îro.”⁴⁰

Efrandarê zargotina Kurdan berê pêşîn gundî û cotkar in, yê ku şevên zivistanê yê dirêj li odada berav dibin distirên û dibêjin. Di nava wan de gelek dengbêjê profesîonal, 12 aşiq û çîrokbêj hene. Dengbêj bêyî zirne, meya, dutar û tembûr distirên, ew bi deng, tenê bi deng distirên, lê aşiq sazê dixin û pêra distirên.⁴¹

Dengbêj bi piranî amûran naemilînin. Amûrên wan ê ku nayê guhurandin dengê wan e. Bi piranî bi tenê dengê xwe û bi merîfeta gewriya xwe kilaman dibêjin. Ew bi dengê xwe vedijyan, civat bi dengê wan şad dibû.

“Di kevneşopiya dengbêjiyê de bi navê ‘dengê serî’ û ‘dengê qirikê’ du cure deng hene. Dengê serî pêwîst tê girtin û giraniyê nade ser qirikê. Dengbêj dibêjin yê ku bi

³⁸ Ekîncî, **h.b.**, r.23

³⁹ Kaşkar Oremar, “Dengbêjlik, Edebiyat ve Kadın Dengbêjler”, **Înatçı Bir Bahar**, İstanbul: Vecdi Erbay (drl), Ayrıntı, s. 309-314.

⁴⁰ Ronî, Mîraz, “Dengbêjlik ve Edebiyat”, **Înatçı Bir Bahar**, Vecdi Erbay (drl), İstanbul: Ayrıntı, s.280-287.

⁴¹ Ordîxanê Celîl, Celîlê Celîl, **Zargotina Kurda**, Diyarbakır: Aram, 2013, r.11.

gewriyê dibêjin piştî demekê gewriya wan dihincire û dest ji karê dengbêjiyê berdidin.”

⁴² Dengbêj ji bo dengê xwe biparêzin hertim antremanan dikin.

Dengbêj, berhemên xwe bi zimanê Kurdî dixwînin, Kurdiya ku dengbêj bi kar tînin xwerû û zelal e, şewaza wan resetîf û herikbar e. Raza hûnera wan di bikaranîna dengê wan de veşartî ye, heta ku dengbêjek berhemekê meşk dike, heta ku ew berhem xilas bûye, bi sedan babet û tonên deng derdixin û bi vê rêbazê dilê guhdarên xwe feth dikin.⁴³

Bi gotinên xwe yê bi jarte û arastî, bi awazên xwe yê bêhempa civat li devdorên xwe kom dikirin. “Kesên dengbêj peywên xwe wek liben tizbiyê berdidan ser hev û doralîyên xwe jî ji xwe re heyran dihîştin.”⁴⁴

Gotinên dengbêjan fenanî mûzîkeke ku amûrên dîrokî dihewîne ye. Di qorîdorên wê yan refên wê de bêhneke mistîk, hesteke giranbiha heye. Her gotinên wan mirovan dibe demekê, dibe welatekî di nav bûyerekê de digerîne. “Hestên mûzîkal û goftogoya ku melisiye li ser vegotinê dibe hêzeke ku raste rast bang dike li mirovan û dilê wan. Vegotinên dengbêjan re (ên bi awaz) kilam tê gotin.”⁴⁵ Kilam ji kelam tê. Dengbêj kelamê dixwe kilam dineqîşîne, dixemilîne û raberî gel dike.

“Dengbêj di erdnîgariyên cuda de xwe raberî gel kirine. Mirov dikare bêje herema Serhedê (Qers, Îdir, Mûş û dorhêla wir) cihê bingehîn ê dengbêjan e. Ev herem bi taybetî ji bo dengbêjan çavkaniyên helbestane.”⁴⁶ Dengbêj, ew kes e ku giyanê dide deng. Bi gotinên xwe ve denga di gewriya xwe de wek melodyeke mûzîkal derdixe.

Dengbêj nêvanê tamamî gundan û waran bûn. Digeriyan kilamên xwe digotin. Bi vî awayî him karê aboriyê pêk dianîn him jî bi buyer û serpêtiyên gel dihisiyan û dikirin kilam radigihandin nîfşên din. “Dengbêj; di dema tarîtiya dîroka Kurda de hetanî îro hatina qada gotinên arkaîk de aktorekî pêwîst e. Ew, di piraniya gelan de ne”.⁴⁷ Her gelek navekî cuda lêke jî Kurd jê re dengbêj dibêjin.

⁴² Yusuf Uygur, “Kültürel Bellek ve dengbêllik: Doğu Anadolu’daki “Dengbêjlik” geleneğinde Belek Üretimi”, **Yayımlanmamış Yüksek Lisans Tezi**, Mimar Sinan Üniversitesi, SBE, 2009, s.27.

⁴³ Öncü, **h.b.**, r.23

⁴⁴ Öncü, **h.b.**, r.23-24

⁴⁵ Zelal Özağaçhanlı, 2013). “Kürtlerde Sözlü Kültür ve Hikaye Anlatıcılığı: Dengbejlik Geleneği”, **Kimlik, Kültür ve Değişim Sürecinde Osmanlı’dan Günümüze Kürtler**, Bingöl: r.788-807.

⁴⁶ Özağaçhanlı, **h.g.**, r.789

⁴⁷ Alan, “Kürt Halk Şarkıları İçin Küçük Bir Poetika”, **Kovar War**, hejmar 2, İstanbul

Dengbêj bûyerên civakî bi baldarî dişopandin, wana ne tenê pesnê bûyerên mîr û hakimî didan, her wisa wek mînaka *Ajdehak û Aranges* bi riya hûnera xwe li wan rexne jî digirtin û aqilmendî dikirin. Dema Surmeli Memed Paşayê Elaşgirî di sala 1865an de bi daxwaza Osmanîyan ji Serhedê gelek şerkar berhev kiriye û çûye aliyê Edeneyê ji bona şikestandina Xozandaxê, dengbêjê wî Ewdalê Zeynikê wiha gazine li wî kiriyê:

'Hezar mêrî nebe li Xozandaxê wînda neke

Perdê bûka li dar ve neke

*Me li welatê Serhedê rûreş neke'*⁴⁸

"Dengbêj bi ciwata xwe re hebûn, gotinên bav û kalan jî bi saya ceribandîna û zimanê Kurdî dibûn xwedî naverok li civatê belav dibûn. Tevgerêdanên ku di van xalan de hebûn, bi etîka ciwata Kurdan ve hatibûn meyndin."⁴⁹

Dengbêj û destanbêjên Kurd, gelek destanên gelên din bi motîfên Kurdî ve dewlemend kirine. Li Kurdistanê rengên van destanan peyda bûne. Bi motîfên Kurdî û bi xemilandîna nû ve bûne rengêkî edebiyata Kurdî.

"Dengbêj bi tenê çîrokbêj nînin. Divê bi hiş û dilê xwe ve mirova bibîne û raçav bike. Bi daxwaziya xwe bîra dîrok û civakê biparêze û dewr bike."⁵⁰

"Dengbêj stranên xwe vedibêjin û popularize dikin û di heman demê de vediguhêzin kesên dîtir û dibin wesîle ku gelek mirov bi heman riyê stranê îcra dikin û di nav gel de belav dikin."⁵¹

Romanûsê navdar ê Kurda Mehmet Uzun di derbarê dengbêjiyê de wiha difikire "dengbêj, nefes û jiyane dide deng. Dengbêj, yê ku denga dixê stran û kilam. Dengbêj, gotûbêj û axaftvan e".⁵² Yaşar Kemal jî di derheq dengbêj de wiha dibêje; "Ewî bi Kurdî digot, lê Tirka jî, Ereba û Ecema jî, Uris û Îngilîza jî ji strana wî fehm dikir. Ew hîkmeteke şîrî bû û tu kesekî nizanibû ku ew çî ye."⁵³ Dema em dengbêjiya Kurdan dinihêrin dibînin ku her heremek xwediyê taybetmendiyekî ye. Ligor taybetmendiyê

⁴⁸ Mehmet Gültekin, *Zargotîna Kurdên Serhedê*, İstanbul: Avesta, 2013, r. 18-19.

⁴⁹ Şerefxan Cizîrî, *Edebiyata Devkî û sşyalîzasyon*, İstanbul: Aram, 2011, r.15.

⁵⁰ Uzun, *Dengbêlerîm*, r.12.

⁵¹ Nezan, Çelebî, Yildirim, Ataş, "h.g.," r. 7-21.

⁵² Uzun, *Dengbêlerîm*, r.11.

⁵³ Yaşar Kemal, *Yer Demir Gök Bakır*, İstanbul: Yapı Kredi, 2004. r.124.

wan hereman dengbêjên balkêş û hejayî derketine. “Di nav herêman de herî balkêş ku dengbêjên herî zêde û navdar gihandî herema Serhedê ye ku navê wê heremê wekî ‘hêlîna dengbêjan’ tê bilêv kirin.”⁵⁴ Ew dengbêjanan di jiyana edebiyata Kurda ya devkî de cihekî bê hempa digrin.

Ew Homerosên nûjen û hemdemên me ne, dinya wan a çandî û hûnerî taybetî ye, ew hem di nav xelkê de ne û hem jî ji wan cihê ne. Ew reh û rêçên civata Kurdî ya belengaz, perçiqî û perçekirî ne û jiyane didin gotin û vegotina Kurdî û civata Kurdî dewlemend dikin. Ew bi edet û ûsilan ve girêdayî ne, wan dewlemend dikin û radigihînin rojên bê.⁵⁵ Em bi saya wan xwediyê vê kelepora dewlemendin.

Ku em dizvirin bi nêrîna îro li dengbêjan mêze dikin em dibînin ji bo edebiyata devkî di nav çavkaniyên yekem de nin. Îro dengbêjan serdestiya muzîkê winda kiribe jî zimanê Kurdî hebûna xwe deyndarê wan e.

Dengbêj bi aliyê xwe yê efsûnî bandor li mirovan dike. Mirov her çiqas dûrê huneriya dengbêjiyê be jî piştî guhdarkirina çend caran dibe efsûndarê dengbêjan. Êdî dengê herî melodîk yê dengbêjan in.

Peyv ji jiyane dertê û bi lafzê jîndaran ve pêktê. Lê bi gotinên dengbêjan ve dixemilin. Di vê xemlê de dengbêj gelê xwe di diyarê edebiyatê de digerin û vê kelepora serbilind, qedirşînas û bi rûmet diparêzin.

Pêşiyên Kurda rûmeteke zêde zêde dane dengbêjan û wan hertim li kêleka mîran û began dane rûniştandin. Di nava civakê de jî qedrekî bilind nîşanê dengbêjan dane. Lewra ewan parêzvanê zimanê gel bi pêşdînekî ecêb ve kiribûn sartaçê gel.

Di nava van parêzvanê zimanê qedîm de rolek jî ya dengbêjê herema Agiriyê Dengbêj Ahmedê Alîksan e. Wek her dengbêjî Ahmedê Alîksan jî di havirdora xwe de hay bi vê erka xwe hebû û pêk dianî.

⁵⁴ Öncü, **h.b.**, r.27.

⁵⁵ Uzun, **Destpêka Edebiyata Kurdî**, r.32.

3.3. Dengbêjî

Edebiyata Kurda li ser du şaxa avabûye û domandiye. Ji wan yek medrese ye ya din jî dengbêjî ye. Ku bi piranî edebiyata devkî ye, ew jî bi riya dengbêjiyê ve hatiye hetanî îro. Ji gelên din cudatir gelê Kurd bi riya damerizandina hûnera dengbêjiyê ve zimanê xwe parastine, şopa dîrokê gerandine û gihandine paşeroja xwe. Çanda civakî mihafaze kiriye û bûye perwerdeya keseyetîya gel. Ku di nav Kurdan de wêjeya nivîskî kêm e çand devkî jî bi destê dengbêj û çîrokbêjan ve ragihiştîye vê demê.

“Li Kurdîstanê dengbêjî şaxeke folklorê ya herî girîng e. Li gor Îbn-ul Erzeq di qesra Nesredewle de 360 cariyeyên bijarte, dengbêj, reqase û hûnermendên curbicur ku di serayên sultanên din de nedihat dîtin hebûn.”⁵⁶ Tê dîtin ku Kurda payeke bilind daye dengbêjiyê û dengbêj parastine.

Dengbêjî di nav xem û xeyalan de bi hezkirineke xweser dildayîna peyva ya dîrokî ne. “Helbestên gelek hûnermendan diyariyên bihara ne, rûbar û kaniya ne. Ciwaniya tabîatê bi berhevdana dêm û kêrsima dilbera horî wan kar-xezalên serê çiya, ber destê hostayên peyva reng û rewşeke nû wergirtiye û jiyandar bûye.”⁵⁷ Gel bi wasita wan li vê diyariya sirûştê dihisiyan û gencineya bêdawî agahdar dibûn. “Xuya dike ku çîroka dengbêjan, çîrokgotina wan û derdê wan di dîrokê de şaxvedaye. Derdê wan ê aboriyê tune ye. Ya wan xwedî dike ziman e, çand e. Gelemperiya dengbêjan di xîzantî û tunebûnê de jiyana xwe ji dest dane.”⁵⁸ Wana canfida û parêzerê zimanê Kurdî yê dîrokî ne.

“Çanda Kurdî weke avahiyeke dîrokî ye, sirûştî ye, bi civakî şiklê xwe girtiye, mîna asasê binê xaniyan ku xanî bê asas nikare li ser nigan bimîne; asasê vê zargotina civaka Kurdan jî dengbêjî ye.”⁵⁹ Dengbêjî bikaranînan zindiya ziman a civakê û dewlemendiya civakê ye. Ji her aliyên jiyana gelê Kurd di kilamên xwe de dihewîne û bi şewazekî xurt anîne zimên.

Bi hezaran dengbêj bi navê xwe negihîştin dema me lê ji me re bi hezaran kilam/berhem hîştin û koçkirin. “Wana xilaskerê zimên, dîrokzanên kesên dîroka wan

⁵⁶ Îbnül Esir, *El Kail fi't Tarih*, (çev.) Heyet, Bahar, c. 10/1 r. 13. Nql. Zülkûf Ergün, *Bajar-Edebiyat û Cizîra Botan*, İstanbul: Nûbihar, 2014, r.70.

⁵⁷ Celîlê Celîl, *Keşkûla Kurmancî*, Wîen: Ayhan Matbaası, 2004, r. 10.

⁵⁸ Akçan, *h.t.*, 2014, r.22.

⁵⁹ Ekîncî, *h.b.*, r.163.

hatine şewîrandin in. Wana qêrîna kesên ku li nefitîyê û hatine talankirin in. Wana di vê qêrînê de cudatî nedikirin nava neseb û dînan.”⁶⁰ Stran û awazên Kurda ji kêrîhiya dewr û zemanê hatine gihîştine me. Mor û şopa dîrokê li ser wana mane. Dinênasîna Kurda di nava zargotina wî de, di nava sazbandî û awazên wî de tê kifşe kirin.

“Mirov bi saya gelek strana dikare pêbihese, ka gelê Kurd di nava dirêjahiya dîrokê de çî rê qedandî ye, meşa wî ya dîrokî çawa bûye, jiyana wî ya herroj bi çî awayî derbas bûye, xem û xiyalên wî çî bûne. Stranên Kurdî tê bêjî ansîklopediya jiyana gel in.”⁶¹

Dengbêjî saziya tomarkirina jiyana gel e. Xîzanî, dewlemendî, evînî, şer û koçberkirina gel di kilamên xwe de bi cih dikin. Dengbêjî zimanekî muzîkal e. Hevokên bi serwa bikar tînin. Dengbêjî zindî girtin û parastina qewumandina jiyane ye.

“Wexta ku dengbêjan li ser bûyerên civakî kilam afirandine, kilam bi hostetî û bi qaîde û bi meqamên xweş anîne zimên, gel ew ecibandine, di nav xwe de xwedî kirine û ew derbasî deverên din kirine. Çawa ku mirov kevirekî davêje gola avê, çiyê ku kevir lêdikeve, av pêl dide, ew pêl fire dibe, diçe xwe digihîne qeraxa golê, dengbêjî jî ji wisa ye.”⁶²

Roja ku Kurdan hestên xwe bi şewazeke xweser dengveda û hetanî îro ev pêlvedan berdewam kiriye û dike.

“Hûnera dengbêjiyê di nav Kurdan de wek kaniyê ye, namîçiqe û hertim dikişe. Ji ber vê yekê ye ku ev hûner di destpêka dîroka Kurdan heya îro di dil û hişê wan de zindî maye.”⁶³

Dengbêjiya Kurdan bi kilam û stran, di jiyana civakê de jiyaneke herî pêşketî ye. “Di nav Kurdan de, ji bilî dengbêjan du hêmanên din ên ku muzîk li ser piyan hîştine hene; ya yekem dayik in, a din jî feqiyên îcrakerên muzîka olî ne ku di medreseyan de li ser muzîka olî perwerde bûne.”⁶⁴ Dayikan xîmê dengbêjiyê danîne. Avahî û saziya dengbêjiyê li ser vê esasê bilind dike. Feqiyên jî ev sazûmana bi aliyê stranên olî ve neqîşandine li ser piya hîştine û di berdewamiyê de roleke girîng lîstine.

⁶⁰ Sinan Akçan, *h.t.* 2014, r.5.

⁶¹ Cemîla Celîl, Naza Celîl, *Stran û Awazên Kurdî*, Wien: Înstîtûya Kurdzaniyê, 2011, r.5.

⁶² Ahmed Aras, “Kilama Kurdî û Denbêjiya Serhedê”, *Kovarabîr*, Hejmar 7, Şubat 2010, r.26

⁶³ Oremar, *h.g.*, r. 309-314.

⁶⁴ Nezan, Çelebî, Yıldırım, Ataş, *h.g.*, r. 7-21.

Nivîskar Mehmet Öncü di pêşgotina pirtûka Hayrettîn Ekîncî a bi navê dengbêjiyê de dibêje ;

“...Diyar dibe ku di dîrokê de forma dengbêjiya kevn li ser bûyer û mijara olî bû, lê di nav demê de çend beş ne tê de, berhemên ku dengbêjan afirandî bi gelemperî li ser kar û bûyerên dinyayê ne. Bi piranî mijara berhemên ku dengbêj diafirînin evîn û evîndarî, xweza, qencî, neqencî, şer û pevçûn û hê di gelek mijarên weke van de, gotin li ser gotinê, bi Kurdiyeke herikbar û bi şewazeke wêjeyî dirêj dibe û diçe. Bûyer carinan doza di nav mîran de ye, carinan di nav du hezjêkiriyên belengaz de ye, carinan jî doza di nav du gel an eşîran de ye.”⁶⁵

Mijara kilamên dengbêjan li ser qewimandina bûyereki bilind dibe.

Dengbêjî ne bi tenê kilamên kevn gotine. Lewra dengbêj divê kilamên nû çêkin û derxin holê. Bi van berhemên zimanê dengbêjiyê dikin zimanê netewê.

“Her dengbêjek xwedî stîlekê ye. Hinekan bi qirikê, hinekan bi poz, hinekan bi dengê zirav, hinekan bi dengê qalind, her yek bi dengê xwe, terzeke xwe daye xebitandin. Car caran di bin bandora hev û dû de jî mane. Bi meqamên xwe xemilandine, xweş kirin e.”⁶⁶

‘Hin dengbêjan ji mezinekî xwe îcazet stendine û beşdarî vê kevneşopiyê bûne, hinekan jî bi deng û mezinaya hestên dilê xwe daye ser vê riyê. Dengbêjên ku hin caran bi kilamgotina xwe, hin caran bi çîrokbêjiya xwe, hin caran jî bi aliyên xwe yên şairane sertacê dîwanan bûn, bêyî ku estrumanekî bi kar bînin, destê xwe didan ber guhên xwe, şikil didan dengê xwe û fonetîk û melodî dianîn cem hev’.⁶⁷

Fonetîk û melodiya deng di nav rêbazê saziya dengbêjiyê de sereke ye. Lewra bandora dengbêjiyê bi bikaranîna deng ve derdikeve holê.

“Saziya dengbêjiyê saziyeke serbixwe ye ku rê û rêbazên wê siruştî ne. Dengbêjî jî aliyê kesên ku dengê xwe bi jîrekî dikarin bi kar bînin û bîra wan xurt e ve tê kirin. Dengbêjî bi hezkirinê tê pejirandin.”⁶⁸ Kesên ku di dilê wan de geşedana dengbêjiyê hebûn û hez dikirin bibin dengbêj, carinan li ber destên dengbêjên hoste xwe fêrî hin

⁶⁵ Ekîncî, h.b., r.36.

⁶⁶ Ekîncî, h.b., r.36.

⁶⁷ Osman Baydemir, “Pêşek”, *Antolojiya Dengbêjan*, Şaredariya Mezin a Diyarbekirê, İstanbul: Gün Matbaacılık, 2011, r.9.

⁶⁸ Öncü, h.b., r.23.

taybetiyên wê hûnerê dikirin. Wek karê din lazime dengbêj re jî rêberê hebe û wî/ê biemilîne, fêr bike. Ku ew bikaribe çavênîna sirûştê bihûne, bixemlîne û rabeft hawirdorê bike.

“Çima ku dengbêjî û sirûşt di hembêza hev de ye û li hev xwedî dibin, bajarên Serhedê jî xwedî avhewayeke paqij û erdnîgariyeke bi taybet in, Kurdên Serhedê êş û kulên xwe, derd û kederên xwe, şahî û dîlanên xwe zêdetirîn bi stranên anîne ziman vê yekê jî li heremê peywendiya bi dengbêjan re derxistiye pêş.”⁶⁹

“Her çiqas ku di derheq dengbêjiyê de senîfandineke zanistî tune be jî, tê zanîn ku sê cure dengbêj hene. Ji van a yekemîn denbêjên gel in. A duyemîn dengbêjê mîr û began in. A sêyemîn jî mitribên gerok in ku dengbêjiyê dikin in. Ji van hindêk berheman diafirînin, hindêk jî berhemên dengbêjên li berê xwe dibêjin, lê her dengbêjek li gor uslûba xwe wan berheman vedibêje.”⁷⁰

“Di devgotinan de tiştan bi heman tîpa ve jibîranîn tune ye. Di çanda devkî de bîr; ne depo ye ku çiçax bixwezî zanîne tê da bibînî û derxî, ne mora şimayê ye li ser ceribandîne, ne jî kaxiza parşomenê ye ku peyvên sereke li ser hatibe nivîsandin.”⁷¹ Bîr di karê dengbêjiyê de cihekî girîn û asteke bilind digre. “Bîr ji nûve sazîkirin e. Serpêhatî di wê bîrê de weke xwe namînin. Li gor pêşveçûna demê, ji aliyê mêjî ve ji nû ve tene afirandin.”⁷² Dengbêj bi hunera xwe van berhemên kevn bi terzek din pêşkêşî civaka xwe dike. Wek mînak “Çîroka Zembilfiroşê ji aliyê dengbêjan ve hat gotin û paşê di serdema mîrekiyên Kurdan de ji aliyê Feqiyê Teyran, Melayê Bateyî û Muradxan Beyazîdî ve careke din hat hûnandin û gihîşt heta roja îro.”⁷³ Dengbêjî bi gotinên dengbêjan ve di çêbûna hafizaya çandê de roleke sereke dileyîze. Ev rewş weke peywira nivîsê pêwîst e.

Di kevneşopiya dengbêjiyê de wek çanda devkî yê din-çîrokbêjî- xîmê çanda Kurda digerîne, çêdike û dewrdike. Dengbêjan di gotinên xwe de mijara şer, evîn, eşq, têkiliyên netewî û mijarên civakî dihûnandin û dihûndirînin qada bîrê. Dengbêj bûyeran bi kilaman, bi dûrikan, bi lawijan, bi çîrokan, bi lorikan û bi

⁶⁹ Öncü, **h.b.**, r.27.

⁷⁰ Öncü, **h.b.**, r.23.

⁷¹ Sanders, **h.b.**, r.25.

⁷² Çifçi, **h.b.**, r. 25.

⁷³ Zülküf Ergün, **Bajar-Edebiyat û Cizîra Botan**, İstanbul: Nûbihar, 2014, r.70.

axavtinan ve ku tal kirinê esas hildide, ji ber vê yekê bi çanda kevneşopî ve hatiye dorpêçkirin.⁷⁴

“Ew lêkolînerên ku ser wêjeya Kurdî hûr dibin û dişopînin, bêhed amûrên foklêrê dibînin.”⁷⁵ Dr. Oskar Blau di xebata xwe a ji sala 1858an bi sernavê ‘Eşîrên li Bakurê Kurdistanê’ de dinivîse ku, “Kurd xwediyê kevneşopiyeke dewlemend a kilam û destanên bi mijarên şer, evîn û ên mayîn in. Ew li herêma Bazîdê guhdariya du dengbêjên bi navên Çetoyê Heyderî û Emer Axayê Hesen ji Diyadîne dîke û kilameke wan bi wergera almanî jî diweşîne.”⁷⁶

3.4. Perwerdeya Dengbêjan

“Li herema Kurdan da di sedsala 17an de dibistanên dengbêja hebûn û dengbêj li wir fêrf çîroka dibûn û di derbarê dangan de perwerde dibûn.”⁷⁷ Ku em van gotinan didin berhev em tê digihîjin ji bo perwerdekirina dengbêjan hin sazî di nav civakê de derketine. Belkî li gorî dema guhirîbe jî dengbêjî her demê bandor li ser gel kiriye.

Lê belê her dengbêjek bi taybetî ji zaroktiya xwe perwerdeya devkî an jî ya nava malê ku ji bav û bapîrê xwê girtine, bi pêşketine. “Murîdî cureyek şagirtî tê hesêb. Guhdarîkirin, dubarekirina gotinan, gotinên pêşyan û hakîmiyeta ji nû ve rêzkirina wan, metoda perwerdeya wê çandê ye.”⁷⁸ Ev li ber destê dengbêjên hoste dihat fêrkirin. Namzetê dengbêjan di cimaeta de digihîştin. “Ew kesên ku dixwestin bibin dengbêj, salê carekê ji hêla dengbêjên bi nav û deng, an jûriya dengbêjan ku dihatin li dengbêjên şagirt guhdarî dikirin, ka serkeftî bûne an na. Fahm dikirin, dawiyê wekî îcazete dengbêjiya wan dida wan.”⁷⁹ Pêwendiya mamoste û şagirtiyê ji hêla dengbêjiyê ve jî derdikeve pêş çavê me. Mirov têkiliyên hoste û şagirtan di şîretên Evdalê Zeynikê de ji bo şagirtan de wiha dibihîze;

Şagirtno, dilgeşino.... hûn dengê xelqê ne. Hûn bendewarê ruhê wî,
qasidê hîs û canê wî ne. Bilivînine, bilezînine, mîna min gotina do û pêr

⁷⁴ Özağaçhanlı, **h.g.**, r.26.

⁷⁵ Bazil Nikitin, **Kürtler, Özgürlük Yolu**, 1986, r.445, nql, Mehmed Uzun, **Despêka Edebiyata Kurdî**, İstanbul: İthaki, 2010, r.30.

⁷⁶ Gültekin, **h.b.**, r.22.

⁷⁷ Wadie Jwaideh, **Kürt Milliyetçiliğinin Tarihi**, İstanbul: İletişim, 2012, r. 7.

⁷⁸ Walter J. Ong, **Sözlü ve Yazılı Kültür**, (çev.) Sema Postacıoğlu Banon, İstanbul: Metis, 2013, r. 21.

⁷⁹ Ekîncî, **h.b.**, r.138.

werbigirine, gotina xwe lê zêde bikine, li gora xwe biguhurfnine û bi pêşerojê biguhezînine. Hûn bi xwe bi afirînine, siûda merivan û halê bûyeran bikine kilam û stranine. Bila kimaniya hûnermendiye tê de nîn be û ew lihevhatî bine. Li xelqê guhdarî bikine, pê alaqedar bine, bala xwe bidinê û wan seh bikine, bi gotina xwe, bi rabûn û rûniştina xwe nerm bibine, qedrê gotina xelqê bizanine, li zexelî, xeletî û çewtiyên xwe mukir werine, gotina xelqê mebirine, bîhnfireh û bisebr bine. Xêr, feyde û sûda welat, xelk û zimanê xwe li ser her tiştî bigerîne.....⁸⁰

Mirov di van şîretan de qaîdeyên dengbêjiyê dibîne. Bêguman dengbêj hostayên wêjeya devkî ne û xwedî bîreke bêhempa ne. Ew di nava îcrayên xwe de şagirtan jî perwerde dikin. Bi neqilkirina hoste û şagirtan ve, ev hûnera dengbêjiyê gihîştîye dema ku em tê de nîn.

Destpêka dengbêjiyê digîhîje zarokatiyê. Ew zarokên ku di dîwanxaneyê de stranên dengbêjan guhdar dikin îcar piştî demekî wana teqlît dikin. Zarên ku di dilê wan de eşqa denbêjiyê hebin û xwedî qabîliyetbin dibin şagirt û rîya dengbêjiyê li ber wan vedibe. “Dengbêj bi şagirtê xwe ewil di nava civatê de kilama pê nade gotin. Dema ku şagirt di warê dengbêjiyê de xurt bû hin caran destûra gotinê didê. Şagirtan bê destûr di civatandan de kilam nedigotin. Dengbêjê ku êdî bûye hoste beriya kilam gotinê navê hostayê xwe dibêje.”⁸¹ Dengbêj pir qîmet didin hosteyên xwe û rîya dengbêjiya xwe di şopa wan de didomînin. Em di nav hûrgiliyên dîrokê de digihîjin hin agahiyên perwerdekirina dengbêjan.

⁸⁰ Uzun, **Destpêka Edebiyata Kurdî**, r.32.

⁸¹ Sûleyman Öz, “Doğu ve Güneydoğu Anadolu Sözlü Kültüründe Hikaye Anlatıcılığı”, **Yüksek Lisans Tezi**, Mimar Sinan Üniversitesi SBE, 2014.

BEŞA YEKEM
JİYANA AHMEDÊ ALÎKSAN

1.1. JİYANA AHMEDÊ ALÎKSAN

1.1.1. Ji dayîk bûn û Zaroktiya Ahmedê Alîksan

Dengbêj Ahmedê Alîksan di sala 1938 de li Alîksanê hatiye dinê. Lê di nasnameyê de 1940 dinivîse. Ji ber şert û mercên wê demê du sala piçûk nivîsîne⁸². Alîksan gundekî girêdayî navenda Agiriyê ye. Navê wî di nasnameyê de Ahmed Cemil Özdemir e. Navê gund ji dengbêj Ahmedê Alîksan re dibe maxlas.

Zaroktiya xwe jî dîsa li Alîksan derbas dike. Di nav malbata xwe de û bi taybetî ber destê kalkê xwe Eslan mezin dibe. Hîm û esasê dengbêjiya wî jî digihîje wê demê.⁸³

1.1.2. Ciwantiya Ahmedê Alîksan

Di dema ciwantiya xwe de jî niştecihê dîwana û kêfxweşiyê dengbêjiyê ye. Li gor neqilkirina Dengbêj Xalê Bekir bîranîneke Ahmedê Alîksan bi lêv dike; “di gundê me de dewatek hebû. Ez jî çûm û min hezkir ku kilaman bêjim. Min ew daxwaz ji dengbêjê dewatê re şand û destûr xwast ku ez jî kilam bêjim. Dibe dengbêj pirskir ew kî ye dibêjin Ahmedê lawê Îbrahîm e. Dibe min dest pê kir û got. Dengê min ser xwe ye lewra ez ciwanim. Dibêje ku civatê zêde kilam xwast dengbêjê ji bo dewatê rûniştî aciz bû û got ev çî ye we ev zaroka aniye kî dikare bi wî re bêje.” Bi vî rewşê hê xort bûye li kêleka dengbêja bûye.

Dîsa di dema xortaniya xwe de dizewuce. Wexta ku dizewuce hê leşkeriya xwe nekiriye. Dengbêj Ahmedê Alîksan leşkeriya xwe ya dema ecemitiyê li Tekirdağê, ya dema hostatiyê jî li Trabzonê dike. Bi karê mala xwe mijûl dibe.

⁸² Ayhan Özdemir, Hevpeyvîn, 22.09.2014, Ağrı

⁸³ Nigar Özdemir, Hevpeyvîn, 22.09.2014, Ağrı

1.1.3. Gundê Ahmedê Alîksan

Dema ku em li ser gundê Ahmedê Alîksan da bi hûrgilî bisekinin çend nav dertên pêşiya me. Ev navana Aleksandir, Hêlikan û Alîksan in. Di vê derbarê de navê gund di pirtûka Mehmed Uzun de wiha derbas dibe. “Ev gund gundê Êrmena ne. Di dema Êrmenan de gund bi navê Aleksandir tê binav kirin. Piştî koçkirina Êrmenan ku Kurd li Aleksandir bi cih dibin navê gund jî diguhurînin û dikin Hêlikan.” Li Serhedê hin kes jî Hêlikan re Alîksan dibêjin. Me jî nave Alîksan di tezê de bikar anî.

1.1.4 Eşîra Ahmedê Alîksan

Dengbêj Ahmedê Alîksan jî eşîra Xelesiniyê ye. Eşîra Xelesinî şaxeke eşîra Sîpka ye. Dengbêj Ahmed bi xizm û eşîra xwe ve li Alîksan dijî. Bi gotina Ayhan Özdemir* dengbêj Ahmed jiyana xwe tev li Alîksan derbas dike.

1.1.5. Zewaca Ahmedê Alîksan

Ahmedê Alîksan beriya leşkeriya xwe bi Nîgar Özdemir re dizewice. Ji vê zewacê heyşt zarok çêdibin. Sê law û pênc heb jî keç in. Em di derheq xanima Ahmedê Alîksan Nigar Özdemir de agahiyan jî Şenay Özdemir** hildidin.”Diya min bi eslê xwe jî Colemêrgê ye. Ji eşîra Pinaşiya ne. Li gor gotina diya min, kalkê diya min xizmê Ehmedê Xanî ye. Hemû tevayî tên Bazîdê hûn dizanin Ehmedê Xanî jî ji Colemêrgê ye. Bavê diya min, bavê bavê wî û yê wî tev mela ne. Ji ber ku mela gund bi gund digerin kalkê min jî tê Diyadînê. Diya min digo nêzî mirina wî ku di Qur’anêde hin ayet ku dihat xwendin digo ev ayet di Încîl, Tewrat an Zebûrê de wiha derbas dibe. Kalikê diya min zanayek bû ye. Bavê wê zivistanekê Qurana pîroz bi dest dinivîse. Dîsa nêzî mirina kalkê min dewlet ezmûnekê vedike û dibe miftî. Îcazeta miftîtiyê hildide û çend meh şûn da jî diçe ber emrê Xwedê. Dema ku kalkê min dimre di malbatê de mêr namînin. Apanên diya min jî Alîksan tên û dibin gund.” Piştî ku Nigar Özdemir tê gundê Alîksan bi Dengbêj Ahmedê Alîksan re dizewice. Dengbêj Ahmed di vê derbarê de kêfxweşiya

* Ayhan özdemir, lawê Dengbêj Ahmedê Alîksan e

** Şenay Özdemir, keça Dengbêj Ahmedê Alîksan e

xwe wiha tîne zimên; “tizbiya xwe hildide nav tiliyên û xwe bi kêfxweşî dibêje filankesî xwest, filankesî xwest, filankesî xwest lê min ji xwe re hilda.”⁸⁴

Ahmedê Alîksan di jiyana xwe de qîmeteke herî mezin dide Nigar Xanimê. Ji bo ku xanima wî aciz nebe cixarê berdide û nakişîne. Dengbêj Ahmed her daîm hineka Nigar xanimê dike û carinan ji re dibêje abla. Hin hinekên wî yê di zêna hevalên wî de mane hene; li cihekî bernamek hebe û giro bibe dibê ka destûra min bidin êdî dereng e abla derî li min venake.⁸⁵ Em ku li van agahiyên dinihêrin bala me qîmetdayin û hezkirina Ahmedê Alîksan a Nigar Özdemirê dibînin.

1.1.6. Jiyanê Ahmedê Alîksan a Rojane

Dengbêj Ahmed bi kilam gotina xwe bi şêwaza xwe di nav gel de cihekî girîng girtiye. Ku mirov li kolanên Agiriyê digere çend dost û ehbaba pirs dike bandora wî ya ser gel xwe nîşan dide. Di jiyana xwe ya kurt de gelek kilam û serpêhatî bi cih kiriye. Hinek kes, serpêhatiyên xwe û mamoste Ahmed bi kêfxweşî vedibêjin, hinek jî wek Apê Elbarî bi behskirinê ve digrî.

Ya ev xwaşiya derxistiye holê sewta wî ya bê hempa û hevaltîya wî ya dil û can e. Xwedî qedrekî mezine dengbêj Ahmed. Ev rûmeta wî wextê jiyana domandîye jî hebûye. Çi çax pisgêrêkek derkeve, li hevanîna wan de Ahmedê Alîksan xwadiyê roleke serekeye. Çûyîna ji bo çareserîya waqeyan de bi serfirazî paşve ziviriye. Em van agahiyên li devê dostên wî dibihîzin.

Dengbêj Ahmedê Alîksan xwedî jiyaneke taybet e. Li gorî gotinên Şenay Özdemir, Ayhan Özdemir, Şevki Burak û Paşa Taştan Dengbêj Ahmed li xwe dinihêrî. Ji xwarin û vexwarina xwe re baldar bû. Cil û berg xwe kirinê re jî ev baldariya wî hebû. Mirovekî zana ye. Ahmedê Alîksan zarên xwe dide xwendin û bi xwe jî pirtûk dixwîne. Him hezdike zarên wî bixwînin him jî pêşîya xwendina keşan vedike. Lewra di gundê wan de wê demê qîza ku dixwand a yekemîn qîza Ahmedê Alîksan Şenay Özdemir e.

Dengbêj Ahmedê Alîksan di jiyana xwe ya rojane de him dengbêjiyê dike him jî wek gundiyên xwe karên rênçberiyê pêk tîne, zevî-zîyanê xwe hildide datîne û ajalan

⁸⁴ Şenay Özdemir, Hevpeyvîn, 09.05.2015, Van

⁸⁵ Paşa Taştan û Şevki Burak, Hevpeyvîn, 22.09.2015 Agirî

xwedî dike. Ayhan Özdemir ku behsa xebata Dengbêj Ahmed dikir û digot bavê min xebateke zêde nedikir. Dengbêj ji bo wî karekî sereke bû.

Ahmedê Alîksan di nav van kêmdarfetan de jî zarên xwe daye xwendin. Ji zarên wî yek mamoste ye yek jî serhevşîre ye. Dîsa ji bo xwendina zaran Şevki Burak behsa fedakariya Ahmedê Alîksan dike û dibêje; “Rihmetiyê Ahmedê Alîksan deyn bikira jî kêmasî nedixiste hewcetiye zara xwe.”

1.1.7. Wefata Ahmedê Alîksan

Dengbêj Ahmedê Alîksan di dawiya emrê xwe de nexweş dikeve. Li gor gotinên Şenay û Ayhan Özdemir nexweşiya Ahmedê Alîksan penceşêra kezebê ye. Dibêjin li ser teşhîsa nûjdarî apanên me bavê me hildan birin Denizliyê û zanîngeha Akdenizê. Lê tu çareyê ji vî derdê wî re nabînin. Dîsa em di van agahiyan de têdigihejin ku dizivire mala xwe û di demeke kin de diçe ber dilovaniya xwedê. Bi gotina Şenay Özdemir piştî hatina xwe neh ro şûn de wefat dike. Dema wefat dike 64 salî ye.

Dengbêjê Kurdistanê Xalê Bekir* li ser mirina dengbêj Ahmed dibêje;”di wextê mirina wî de ez li cem wî nebûm ji ber vê yekê ez li hember Ahmedê Alîksan şermîdarim.” Di hezkirin û bandor dayîna ser gel de ev mînak pêwîst e.

Mexberê Dengbêj Ahmedê Alîksan di nav mexberê gund de ye. Li kêleka mexberê bav û kalê xwe ye.**

Diyare ku Ahmedê Alîksan mirovekî cimaetî ye. Emir didome, temen mezin dibê Dengbêj Ahmed jî dîwan, cimaet û di devdorê xwe de di nav rûmeteke bilind de cih digre û cihê xwe qewî dike. Di jiyana xwe de xwedî qaîde û rist e.

1.2. KESEYATIYA AHMEDÊ ALÎKSAN

1.2.1. Dengbêjiya Ahmedê Alîksan

Ayhan Özdemir di derheq destpêkirina dengbêjiya bavê xwe de dibêje; “Ahmedê Alîksan di 8-9 saliya xwe de bi kalîkê xwe Eslan re diçe dîwanan. Û dibêje Eslan jî

*Dengbêjê Kurdistanê Xalê Bekir hevalê Dengbêj Ahmedê Alîksan e.

** Bnr. Wêne 7

dengbêjî dikir.” Nigar Özdemir ji bo vê destpêkirinê dibê birê kalkê Ahmedê Alîksan, Hesên dengbêjiyê fêrî Dengbêj Ahmed dike. Di van agahiyan de tê zanîn ku dengê malbatê dengê xweş û irsîye. Vê zanînê Şenay Özdemir jî teyîd dike.

Ahmedê Alîksan piştî leşkeriyê dengbêjiya xwe berdewam dike. Eşqa dengbêjiyê di dilê wî de cih girtiye. Em van zanîna di xebardana Ayhan Özdemir û Ali Haydar Can* de têdigihîjin. Ayhan Özdemir dibêje; “hine rojan bavê min digot dîsa îro polêsa ez aciz kirim. Gotin careke din em nebînin ku tu bi Kurdî kilaman bêjî. Dibêje bavê min aciz dibû û digot ev der welatê me ye, ev ziman jî zimanê me ye ka em ê kuda herin.” Dîsa Ali Haydar Can dibêje; “em li malê benda xalê min (Ahmedê Alîksan) disekinîn dereng dima. Gava ku dihat me jê pirs dikir ev sê- çar saet e tu li ku mayî? Digo polêsa ez birim qereqolê gotin carek din kilamên Kurdî nebêje. Wana ez li wir aciz kirin.

Ahmedê Alîksan ji van astengiyan qet netirsiya ye û dev ji dengbêjiyê bernedaye. Dengbêj Ahmedê Alîksan hostatiya dengbêjiya xwe nîşanê gel daye. Ayhan Özdemir serpêhatiyeke xwe wiha tîne ziman; “ez zar bûm bi bavê xwe ve em li nava mêrga bûn. Erebe hat, gotin dewata me heye divê tu werî di dewatê de kilaman bêjî. Dibêje bavê min got ka ev zara tenê ye ez nikarim werim. Dîsa jî xwe ji wan xilasnekir li gund gazî yekî kirin hat ez birim, wana jî bavê min birin dawetê.”

Li ser dengbêjiya Ahmedê Alîksan Dengbêjê Kurdistanê Xalê Bekir dibêje; “Ahmed mirovekî hezkirî bû. Gava şerek çêbûya dengbêj Ahmed biçuya wê derê bi tenê ji bo dirustiya wî, ji bo dengbêjiya wî, ji bo hurmeta wî ewa kara seba xatirê Ahmed di hate çêkirin nedihîşt têda xeta çêbe. Yan jî bavê keçikê hêrs dibû û digo ez bûkê nadim. Dibirin digotin me Ahmedê Alîksan aniye, Ahmed ber digeriya wê şevê dibû mivanê wî jê re stran digot nesihat lê dikir ewa karê wan çêdikir.” Di vê serpêtiyê de jî em dibînin ku asta dengbêjiya Ahmedê Alîksan di nav gel de bilind e û xwedî rûmet e.

Li ser pirsê me Dengbêj Elbarî** got li ser Ahmed re ez dengbêjan nabînim. Ez jî dengbêj im lê ne weke wî. Dengê wî mîna dengê Mistefayê Çiftborî*** bû. Di derheq dengbêjaya Ahmedê Alîksan, Şevkî Burak jî van gotinan bi lêv dike;” Ez aşiqê dengê rihmetî Ahmed bûm. Şairekî zehf mezin bû. Beriya wî Mistefayê Erebalî hebû dengê wî jî xweş bû lê di vê heremê de kilamên Ahmedê Alîksan zêde zêde di hate guhdarkirin.

* Ali Haydar Can xwarziyê Dengbêj Ahmedê Alîksan e. Bnr. Wêne 3

** Dengbêj Elbarî hevalê Dengbêj Ahmedê Alîksan e. Bnr. Wêne 8

*** Mistefayê Çiftborî dengbêjeki herema Agiriyê ye.

Dengê wî zehf xweş bû kilamê wî ya di civatê de xwedî rûmet bû. Ez nedîtî bûm aşiqê dengê wî. Dengbêj Ahmed bi dengbêjiya xwe, bi keseyatiya xwe û bi hunerê xwe ve di dilê kesan de cihekî pêwîst girtiye. Dengbêj Elbarî ku derheq Ahmedê Alîksan de xeber dida digiriya û behsa mirovî, camêrî û comerdiya wî dikir.

Ahmedê Alîksan bi dehan qaset tijî dike lê kêma qaset digihîjin destê me. Sedema negihîştina qaseta him wê demê qasetên Kurdî qedexe bûn him jî hin qaset di malan de nehatine parastin. Li ser tijîkirina qasetan Şenay Özdemir dibê; “ di mala me de hertim qaset dihate tijîkirin. Hema wisa digotin me, xwe kerkin lewra ji mivana re qaset tê tijî kirin.” Dîsa di vê derbarê de bîranînê Paşa Taştan hene; “ji gundan dihatin qaset, lîsteya kilaman û pîl datînîn dikanê digotin bira dengbêj Ahmed ji me re evê qasetê tijî bike. Dengbêj Ahmed jî ku derfet hebûya eynî rojê tijî dikir û dida xwediyê wana.” Him ji karê denbêjiyê hez dike û him jî karê xwe pêwîst digre û pêk tîne.

Ahmedê Alîksan bi tenê kilam negotiye di eynî demê de şagirt jî perwerde kiriye. Dengbêj Cesîmê Dengzêrîn*** dibêje; “Dengbêj Ahmed rê û rismê dengbêjiyê nîşanê me dida. Rastiya meqamê kilama bi me dida fêrkin.” Cesîmê Dengzêrîn dibêje; “ li ser bûyeran di heman demê de kilam dinivîsî û digot.” Vê gotinê Ayhan Özdemir û Şevkî Burak jî dipeytînin.

Dengbêj Ahmedê Alîksan bi dengbêjên hemdemên xwe re dostaniyeke bi qîmet didomîne. Ji wan hinekan jî sûd digre.

1.2.2. Kesên Ku Jê Sûd Girtiye

Di vê lêkolîna me de yên ku ji Ahmedê Alîksan re mamostefî kiriye em rast pê nehatin. Li gorî gotina Ayhan Özdemir, Şenay Özdemir, Dengbêj Ahmedê Alîksan destbirayê Nûroyê Meter e. Dengbêjiya Nûroyê Meter pir diecibîne. Ji bilî wî Cesîmê Dengzêrîn dibêje min ji Ahmedê Alîksan suwal dikir tu kîjan dengbêjî diecibînî digo Evdalê Zeynikê. Dengbêjê Kurdistanê Xalê Bekir jî behsa têkiliya Dengbêj Ahmed û Nûroyê Meter dike û dibêje rihmetî Ahmed dengbêjiya Nûroyê Meter pir dieciband. Di dewama gotinê xwe de dibêje, lê ez kesî ser di Ahmedê Alîksan re nabînim. Ku dengbêj Xalê Bekir dengbêj e jî dîsa di bin bandora Ahmedê Alîksan de maye.

***Cesîmê Dengzêrîn şagirtê Dengbêj Ahmedê Alîksan e. Bnr. Wêne 5

Dengbêjê Kurdistanê Xalê Bekir ku behsa dengbêjiya Ahmedê Alîksan dike serpêhatiyên xwe parve dike; “wextê min qaset difrot min du payî qasetên Ahmedê Alîksan difrot. Gel bi pirayî qasetên wî distandin.”

1.2.3. Perwerdeya Ahmedê Alîksan

Li gundê xwe dibistana seretayiyê heta pola sêyemîn dixwîne. Ku di gund de dibistan tunebûye di xaniyên tendûrê de perwerde dibin. Xwedî xwendin û nivîsandinê bû. Ayhan Özdemir dibêje kilamên xwe kite kite dinivîsand û paşê jî digot. Ev xwendina sê salan jî ji bo dildariya xwendinê besî dengbêj Ahmed bûye. Lewra him zehf ji xwendinê hez dikir him jî zarên xwe dide xwandin. Şenay Özdemir dibêje “bavê min li malê pirtûk dixwand. Hin caran cînarên jî dihat guhê xwe didanê. Ez wisa bawerim me jî hezkirina pirtûk xwendinê ji wî hildaye.” Belê Ahmedê Alîksan di wê demê de jî li mala xwe rûdinişt pirtûk dixwend. Xwe jî pêş dixist li heval û hogirên xwe re jî dibû mînak.

1.2.4. Comerdiya Ahmedê Alîksan

Em dixwazin di vê derbarê de guh bidin keça wî Şenay Özdemir; “gava ku bavê min li dikanekê danûstandin bikira li wir dostekî wî hebûya ji xwe re çî bîstanda ji wî dostê xwe re jî eynî tişt distan. Mêvanek bihata malê li mal çî hebûya ew îkram dikir. Ez dixwazim serpêhatiyêke xwîşka min a di vê derbarê de ji we re bêjim. Ev jî rojek mabû wefata wî ez ne li mal bûm. Xwîşka min a ji min mezintir malê paqij dike. Êdî yê ew roj jiyana xwe ji dest bide. Gelek mêvan tên diçin. Ji Agiriyê, ji navçeyan û ji derdoran. Xwîşka min dibê li şibakê mêze kir go “ew kî ne” min nihêrî tukes tune ye. Dibê, bavê min go ew zarên Îsamîl in an yê Îbrahîm in. Êdî em nizanin Îbrahîm û Îsamaîl pêxember dît çawa bû. Lê di malbata me de jî bi navê Îbrahîm an Îsamaîl kes tune ne. Hûn dizanin Hz. Îbrahîm bi comerdiya xwe jî tê naskirin, ez jî dinêrxînim comerdiya wî.”

Ji bo comerdiya Ahmedê Alîksan Dengbêjê Kurdistanê Xalê Bekir dibêje “ku Ahmed bihata qehwekê tu kesî nikaribû perê çaya wî bida. Divê ewî perê çaya hemûyan bida.” Dîsa di vê derbarê de Mamoste Paşa Taştan di serpêhatiyên xwe parve dike”

wexta min dikan dida xebatê tu carî bazar nedikir. Bazarvanî li cem tunebû.” Bi nêrînê hemû hevalên wî jî mirovekî pir comerd bû.

Dengbêj Elbarî digot; Ahmed camêr bû, comerd bû, qonax bû. Deriyê wî ji herkesî re vekirî bû.

1.2.5. Di Nezera Ahmedê Alîksan de Wekhevî

Em dîsa ji devê Şenay Özdemir vana dibihîzin; “Ku mêvan dihatin malê şivanekî gundê me hebû Kerem, belkî hêjê şivanê gund be. Bi salan şivantiya gund kir. Kerem ku jî bihata, mamoste Şevkî Burak, rêvebiriya Fen Lisesiyê jî kir, jî bihata tu cudahî nedikir navbera wana ji herduyan re jî heman sifre radixist. Bifikirin li gundekî mêvanekî mamoste be, rêvebir be an şivan be çawa tê muamelekirin tê zanîn. Li cem wî ew ferq û cudahî tunebû. Ahmedê Alîksan ji mamoste Şevkî re çawa rêz digirt wisa jî şivan Kerem re jî rêz digirt. Carînan diya min îfraz dikir digo çima tu du qat xizmet didî kirin bavê min qebûl nedikir. Li mal çî hebûya îkram dikir, nedigot ev rêvebir e, ev şivan e, evê kêrî min were, qet wisa lê mêze nedikir. Tevaya yek digirtin û wisa jî muamele dikir. Ew aliyê wî pir baldar bû.” Li ser wan gotinên Şenay xanimê hevalên wî û şagirtê wî jî behsa hezkirina wî ya mirovan dikin. Ev nêrina wekhev ewî di havirdora xwe de dike mirovekî hezkirî.

1.2.6. Xwedî Qonaxiya Ahmedê Alîksan

Dengbêj Apê Elbarî digot Ahmed qonax bû, camêr bû. Dengbêj Xalê Bekir ji bo Ahmedê Alîksan digot “Hatî û çûyîna me hebû, di mala xwe de jî zehf merd bû. Niha ew xuyê wî di kurê wî Ayhan da dewam dike.”

Di serpêhatiyên qîza wî de bîranînek wuha heye; “Ku feqîrek an parsekçiyek bihata gund, gundiyan digotin herin mala dengbêj Ahmed, nedigotin herin mala mixtar. Tev dihatin mala me. Carekî qumaşfiroşek ji Rihayê tê, ez wî çaxî li pansiyonê dimam, rêvebirê wir jî destebirakê bavê min bû, ez hatim malê min dîna xwe dayê mal tijî qumaş e. Mêrik di gund re derbas dibe cihê mayîna wî tune, dibên here mala dengbêj Ahmed. Mala mele na, mala mixtar na, ew çax oda gund jî hebû, wisa mêvan dihatin

malê. Mal tev bibû qumaş. Me ev tişt tev ji bavê xwe dît. Diya min an jinbira min hêrs bin jî ewî qet ev xuyê xwe neguherand.”⁸⁶ Deriyê me herdem ji herkesî vekirî bû.

Diyar dibe ku dengbêj Ahmedê Alîksan çiqas dengbêj e ewqas qonax e jî.

1.2.7. Rewşenbîriya Ahmedê Alîksan

Dengbêj Ahmedê Alîksan taybetiyên dengbêjiyê di xwe de dihûndirîne û bi wî aliyê xwe rê û risma nîşanê gelê xwe dide. Em ewî aliyê wî jî di perwerdekirina zarên wî yê qîz de dibînin. Ew yekemîn yê ku qîza xwe dişîne lîseyê ye di hawirdora xwe de. Cesîmê Dengzêrîn pêşdîtinên wî wuha neqil dike; “ Dengbêj Ahmed ji me re digot êdî emrê me çû em nabînin lê pêşiya dengbêjiyê jî û ya Kurdiyê jî wê vebe. Hûnê bibînin li vê çanda xwe xwedî derkevin û bigihînin yên pey xwe. Îro min dixwast ku mamostê min ev rojana bidîta.” Pêşdîtinên wî em niha dibînin ku derketiye.

1.2.8. Ahmedê Alîksan Xwedî Dengekî Akûstîk e

Xwadî dengekî akûstîk e. Guhdaran aşiqê dengê wî ne. Guhdarkirina kilamên wî gel hildide bin bandora xwe.⁸⁷ Dengê wî irsî bû, ez wisâ difikirim. Bi rastî jî di malbata me de dengê tevaya xweş e. Ev dayîneke xwedê ye. Hûn dizanin helbestnivîsîn û gotin qabîliyeteke hûnerî ye. Bi min ew jî di bavê min de hebû.⁸⁸ Ku em jî li ser kilamgotina Dengêj Ahmed vekolîn dikin em dibînin ku Ahmedê Alîksan dengbêjekî şareza ye. Dengê xwe bi dehan meqaman ve dineqîşîne.

1.2.9. Di Kilamên Ahmedê Alîksan de Rola Jinê

Di kilamên Ahmedê Alîksan de wek kilamên dengbêjên din, rola jinê giraniya xwe nîşan dide. Jin bi piranî bi dilsojiya xwe derdikeve pêş. “Mijar/çîrokên xwedî leheng da modelek e, ji bo civata xwe. Ji bo alîkariya civata xwe karên mezin dikin û dibin xwedî navdariyeye nemir.”⁸⁹ Dengbêj Ahmed jî lehengê di nav gel de li gor hestên

⁸⁶Şenay Özdemir, Hevpeyvîn, 09.05.2015, Van

⁸⁷Şevki Burak, Hevpeyvîn, 22.09.2015, Agirî

⁸⁸Şenay Özdemir, hevpeyvîn, 09.05.2015, Van

⁸⁹Akçan, h.t., r.43.

xwe bi şêwazeke taybet ristiye. Dengbêjê me lehengiya jinê bi hûnandineke serkeftî pêşkeş dike. Em dikarin di kilamên Ahmedê Alîksan de rola jinê wiha binirxînin;

Jin di kilama *Bavê Celal* de sedama bûyerê ye. Ya *Bavê Sureya Kekê Kînyas* da dengbêj jinê hem dixê sedem hem jî belangazî û bêçaretîya du jina dihûne. Di kilama *Besrayê* de xwe pêşkêşî dilketyê xwe dike. Cecê û Cemîlê di kilama *Dewrane* de di kilixê şervanan de derdikevne meydanê. Dengbêj di kilama *Evdal* de danberhevdana jina baş û xirab/nebaş bi şêwazeke taybet tîne ziman. Jin di kilama *Fehîm û Felemez* de li pey kuştina du ciwanan qêrîneke bêçaretîyê ye. Dengbêj Ahmed kilama *Ferzende* bi çavê jina dinêre û ji devê jinan raberî me dike. Di kilama *Gula Ber Qefayê* de bêçaretîya jinê dişibîne gulekê. Kilama *Wer Helîmê* pesindayîna jinê ye. *Kerem* kilama dilsojiya dayîkê ye. *Lawuko Werdê* xwestina keç û xort a ku werin bal hev e. Di *Bedewê* de kilam li ser bedewbûna jinê û ji bo jinê hildana astengiya ya ber çawa ne. Kilama *Mûso Mere*, ji bo dilketyê xwe bi dest bixê jin çawa têkoşîneke dijwar hildide pêş çawê xwe, nîşanê me dide. Kilama *lê can* ji ber bêkesiyê hawar daxistina dê ye. Kilama *Mala Misto Mala Qaso* di navbera xal û xwarziya de qêrîn, gazîn û fixana dê ye. *Nabî* kilama li pey kuştina mêrê xwe dilşewatiya jinê ye. Asta dilsojiyê ya bilind e kilama *Seyîd Betal*. *Taşliçay* tolhildana jinê, *Mîrze Beg* birîna dilê dê, hesret û kesera jinê ye. *Herba Çeneqelê* kale kal û zare zara dayîkê ye. Ji ber fesad û şeytana negihîştina keç û xort e *Lê Dîlberê*. Kilama *Li Min siwaro* daxwaza miraz xwestinê ya bi keçîka delalya dilê xwe re ye. *Lore Lore* kilama ji ber xîzantî û feqîriyê dîr hevketina dilketya ye. *Zerya* bi me dide nîşan zewaca bi dil çawa serfiraziye û ya bê dil çawa kambax û xirab e.

Dengbêj Ahmed di kilamên xwe de pesn dayîn û terîfa jinê jî bi serfektî daye. Ji bo vê gotinê mînakê kilama *Lore Lore* besî me ye.

Lê lê bedewê tê bala xwe bidê îro devê te dikan e,

Diranê te hiba mircan e

Çavê te leylan e , Pozê te ji niklê kewan e

Tilî û pêçiyê te mûm û şemdan e, Lêvê te kaxizê ser masa ne,

Zimanê te hubra qelema ne,

Enya te medyan e,

Singê te zozan e

Mînanê zozanê ber û çiya ne

Hûn dibêjin çawa mor û îmza bîst û çar duwalê ecnebiya pêva ne

Em dibînin ku bê jinê ne kilam tête gotin ne jî bûyer diqewime. Jin di bûyerê de di mijarê kilaman de roleke sereke digre. Jin di heman demê de şervan e, xemxar e, evîn e, bedew e, xwedî pesn e.

1.2.10. Terza Ahmedê Alîksan

Ahmedê Alîksan terzeke xweser hûnandiyê. Hozanî, şairî û hûnermendiyeke xweser derxistiye holê. Him di kilamên bilind de him jî di yên nizm de serkeftî ye. Di deng û nêrxandinê de terzê xwe ava kiriye. Dengbêj Ahmedê Alîksan bi gelek rengan dengê xwe diguherîne. Ev guhurandin wisa bi hêz e ku mirov piştî kilamekê kilameke din guhdar bike dibê qey dengbêjekî din dibêje. Dengbêjê Kurdistanê Xalê Bekir dibêje ev hunera qabiliyeteke cuda ye. Ev merîfeta di her kesî de tune ye.

Taybetiyeke dengbêjiya Ahmedê Alîksan jî ew e ku kilam li kîjan heremê be bi terza wê heremê dibêje. Di vî warî de Cesîmê Dengzêrîn dibê “Ahmedê Alîksan digot bûyer li ku qewimî be divê ez jî bi terza wê heremê bêjim.” Di vê derbarê de mînaka herî balkêş kilama Taşlıçayê ye. Ji ber ku lehengên kilamê Tirkin, kilamê nivî bi Kurdî nivî jî bi Tirkî dibêje.

1.2.11. Di Jiyana Ahmedê Alîksan de Otêla Seyîdan

Me xwest Otêla Seyîdan*wek sernavekî bidin. Lewra di dengbêjiya Ahmedê Alîksan de cihekî pêwîst digre. Gele qasetên xwe li wir tijî dike. Nasîna Dengbêjê Kurdistanê Xalê Bekir û Ahmedê Alîksan jî li Otêla Seyîdan çêdibe;”nasya min û wî ya li vira qehwa Seyîda heye ez hatim mi dî millet top bûye dengêk tê. Wî çaxî Kurdî jî qedexê bû. Migo ev çiya gotin eva Ahmedê Alîksan e Ahmedê dengbêj xelkê Alîksan e. Min jî dixwest ku Dengbêj Ahmed nasbikim hele rengê wî, devê wî ya, qabiliyet wî ya, şexsê wî ya çika çî însan e. Ez çûme qehwa Seyîdan him jî otêl bû. Mi go ez dikarim dengbêj Ahmed bibînim gotin tu ji kuderêyî min go ez xelkê Bazîdê me gotin du hev

*Otêla Seyîdan bnr. Wêne 10

band anîne Dengbêj Ahmed tijî dike go ku tu herî divê tu dengê xwe nekî. Ez çûm mi dengê xwe nekir mi bi destê xwe selam da go were were niha di bandê de jî deng heye go were ez bi qurbana te tu ji kuyî birayê piçûk birayê delal.” Ji bo ku Ahmedê Alîksan tijî bike gundî lîsta kilaman datînin dikana Paşa Taştan. Dengbêj Ahmed lîsta kilaman hildide û diçe Otêla Seyîda tijî dike û datîne dikanê.

Dengbêj Ahmedê Alîksan kilamên xwe Kurdî dibêje. Zimanê Kurdî di malbata zimanên Hint- Ewropayî û mensûbê koma binî ya bakurrojava ya şaxa Îranê ye.⁹⁰ Dengbêj Ahmed li Serhedê bi devoka Agiriyê vedibêje. Ahmedê Alîksan di kilamên xwe de gotinê pêşyan, biwêj û hin peyvên ku bi tenê wî pêk aniye jî vegotiye. Herwiha;

Em ê li jêrê çend mînakên, gotinê pêşya, biwêj û gotinên dengbêj bixwe bidin

Di kilaman de gotinê pêşya:

Da avê ha li çokê ha li navê,

Mena garis werîs nedane.

Di kilaman de biwêj:

Çavê hêsir qelbê şikestî, stû xwar, bîst û çar heb kevçî, dara şikestî, etega xwedê, dara dinyayê, hirça kezêb peritî, gurê dilbirîn, nexşê kevira, xulqê şirîn, yanaxê ehmedî, kana keremê, gulîbir,

Di kilaman de gotinê dengbêj bi xwe:

Palepûlhol, kesûk, erfal, nîşewar, yawrî, dî û bala, paxsa mirinê, lêp, mixeyer, şev barana, şevetirs, şênî,

⁹⁰ Mehmet Bozkoyun, “1890î hetanî 2000an Rojname û Kovarên Kurdî”, *Semînare Lîsansa Bilind, Zanîngeha Bîngolê*, 2014.

BEŞA DUYEM

BERHEMÊN AHMEDÊ ALÎKSAN

2.1. BERHEMÊN WÎ

2.1.1. Klamên şer/mêrxasî/kuştiya

Kilamên li ser şeran bi pirayî di encamê wan de kuştin çêbûne. Li ser van kuştinane ku bûne mijarê kilaman. Ev şerana hin caran di navbera du malbatan an du eşîran carinan jî wek serhildanên hember desthilatdaran ve derdikeve pêşiya me. Mijarê van kilamana ser bûyerên qewumî hatiye ristin. Dengbêjan jî ev buyerên dilsoj bi şêwaz û meqamên cur be cûr hûnandine.

Kilamên ku Dengbêj Ahmedê Alîksan gotiye;

2.1.1.1. Bavê Celal

2.1.1.1.1. Mijara Kilamê

Mijar epîk e.

2.1.1.1.2. Lehengên Kilamê

Bavê Celal, Bavê Mihemed, Salih, Qemer, Nazê

2.1.1.1.3. Naveroka Kilamê

Bavê Celal mirovekî xwaşmêr e. Bûyer diqewime û ku sedem jin e Bavê Celal bi bira û pizmamên xwe ve dikeve şer. Ristên kilamê li ser drametîzeya bûyerê hatiye hûnandin. Behsa şer heye lê mixabin ku kilam tam nîn e haya me ji encama bûyerê çênabe.

2.1.1.1.4. Teşeya Kilamê

Teşeya nezmê kifş nîne.

2.1.1.1.5. Nirxandina Kilamê

Straneke ferdîye. Pergal bi serwa ye. Kêşa helbestê serbest e. Çeşnê wê yê edebî kilam e.

Ev kilam ji serî dest pê nake û zû jî qut dibe. Melûme ku Kurdî zimanekî qedexe bû ji ber vê yekê parastina qasetan dijwar bû. Qasetên dengbêjan an yên muzîkên Kurdî li ser ban an di bin erdê de vedişartin. Qaseta ku ev kilam tê de zirar dîtiye ev kilam û hîn kilamên din nîvcû mane. Ev kilam bi taybetî di naveroka xwe de şer û kuştinê dihûndirîne. Mala Êsibê Sinê Qero ji bo du jina bi xwe li nav hev dikevin û hev du dikujin. Di Kurda de jin û namûs yeksanê hev in. Ji bo namûsê jî car heye bira bi birê ve dibe dijmin. Ku dawîya kilamê tune ye em nizanin ka bi çî awayî qewumiye û dawî bûye. Lê eşkereye ku şer li ser jinan çêbûye.

Bavê Celal

.....gawûrê wêran

Ji bo şerê du jina xwe bidî ketine nava hevdu koma gado,

Îrfan li mi ji devan û bokeberan sereka li hev anîn eeeee

Ez ê herim xwe bavijme eee ber tore bextê Bavê Celal

Ez ê bêjim tu mêrekî nexirabî

Ji xwedê ve 'iyane tu mêrekî bi sed mêranî

Lawko ez ê pirsekî ji te re bêjim bila qelbê te neşkê dilê te ji mi nemîne, tu rojê oxilmê giran fenanî bavê Mihemed, Salihê mi beranê pezkuyiya simbêla reş e feyde nabîîîîî

Were hêyyyy heyyyy heyyyy

Mi dêna xwe didayê Qemerê bankirî go de lê lê

Go Nazê rebenê bi zozanê da gawûrê wêran ve diketim van hevsê giran

Mi dêna wayêê wayêê wayêê

Xwe didayê bûkeke derkete hêsiya 'Entaba şewutî kolezekî deve tûkê

Li desta da dengê xîzanê dikire fixan û zarîn digo axlo bira

Ez ê hêêê hêêê hêêê

Bi çavê hêsir qelbê şikestî diçûme pêşiyê, migo xayîngê mala te şewîtyê vê sibehê çima çî qewîmî çî hate serê te tu digirî dibê axlo bira

Go mala te bişewute mala Ûsibê Sinê Qero li zozanê dadê li gawurê wêran

Ji şerê du jina bi xwe ketine nava hevdu fenanî berxa li miha û gura

Birawo îro tifeka di destê bavê Celal de dişixule fenanî mûm û çira

Îro bira li qonaxa devê bêşliyê naguhêze ji pêşîrê bira

Ez ê herim xwe bavêjim ber tor û bextê bavê Celal, ez ê bêjim ez ketime ber bextê te û
xwedê, Îro derbeka lê nede bejn û bala bavê Mihemedê mi li kora Birşiryê xirab neke
rewşa her çar malê me mihacira bira yaêê yaêê yaêê

Ez ê bêjim bavê Celal tu mêrekî ne xirabî êêê

Ji xwedê ve 'iyane tu mêrekî bi sed mêranî

Lawko ez ê pirsekî ji te re bêjim bila qelbê te neşkê dilê te ji mi nemîn e, tu rojê oxilmê
giran fenanî bavê Mihemed, Salihê mi beranê pezkuyiya simbêla reş e feyde nabîîîîî

2.1.1.2. Bavê Sureya Kekê Kinyas

2.1.1.2.1. Mijara Kilamê

Mijara kilamê Kuştin û bêbextî ye.

2.1.1.2.2. Lehengên Kilamê

Qutfedîn, Zumrete, Kamoyê kardiyan

2.1.1.2.3. Naveroka Kilamê

Qutfedîn firarê dewletê û kaçaxê serê çiya ye. Qutfedîn mirovekî zewicî ye. Lê careke din qîzekî dixwaze û dergistî ye. Hezdike ku here dergistiya xwe li gundê Taşa hilde bîne. Diya wî dilnake ku bi vî halî Qutfedîn bişîne gundê Taşa dû dergistiya xwe lewra leşkerî li pey bûye. Lê ku eşqa dergistaniyê di dilê Qutfedîn de ye diya wî jî bi mecbûrî pê re diçe. Li gundê Taşa dilnexwazê Qutfedîn jî pir bûne û wana nedixwastin bila Qutfedîn bi dergistiya xwe re be. Muxbirî li dû wî hebûye. Leşker li dor gund digrin û Qutfedîn tê kuştin.

2.1.1.2.4. Teşeya Kilamê

Teşeyê nezmê kêşê serbest e.

2.1.1.2.5. Nirxandina Kilamê

Straneke ferdî ye. Li ser hûrdidine bûyerê sekiniye. Bavê Kinyas ji mala Hecî Ūsib Paşa ye. Li devê gelek kesan hatiye gotin. Ji bilî rihmetiyê dengbêj Ahmed me ev stran ji hîç kesekî nebihîstiye.

Dengbêj di vê kilamê de bi awayekî xurt li ser bêbextiyê sekiniye. Bêbextî him di dîroka Kurda de him jî di dîroka cihanê de bûye sedema şikestendina lehengan. Çavnebarî wesfekî mirovî ya neyînî ye. Di vê kilamê de jî ev wesf li ber çav e.

Kilam bi naveroka xwe li ser xîmê evîniyê ava bûye lê serhildanek û mêrxasiyê jî derdixe pêş. Qutfedîn mirovekî jêhatî bê tirs, çok û çeleng bûye.

Bavê Sureya Kekê Kinyas

Heyran hawar ha ho li min hawar li min mala minê

Birawo heyfa Bavê Kinyas Kekê Sureya tinebûnê xorta gula mala Sêrxwûn torinê* mala Hecî Êsib Paşa ne mêrê kuştinê

Bira qeda were li eslê dinê

Îro memleketê Qereyazê gundê Taşa da cinazê Bavê Kinyas Kekê Sureya tunebûnê xorta gula mala Sêrxwûn teqandine gule bi barûdê qulqurşûnê

Mi dêna xwe didayê Qutfedîn bankirî go Kamoyê kardiyan şofêr lawo cîpê bajo lo te bû şev e

Mi dî Zumreta diya wî revî hate pêşiyê destê xwe bilind kir go berxê' ez ê diakî li te bikim diayê mîrî mîra hizretî şah li dû te be

Derî cînara heval hogira digo Qutfedîn bego mala te şewîtyo tu diçî memleketê Qereyaziyê gundê Taşa were dê û jinê xwe re nebe

Miletê Taşa miletekî xayîn û bêbext e dibê bira Qutfedîn bi dergistya xwe şanebe

Mala mine êêêê

Lolo bira havîn e xweş havîn e

Mi dî Qutfedîn digote xulamê xwe gazî Şewket Ahmedê birayê mi ke hilde bîne

Wextê xulam gazî Şewket Ahmed dike hildide tîne

Go Şewket bira çima tu nizanî ez qaçax û firarê dewletê me here nişaniya** min ji memleketê Qereyaziyê gundê Taşa hilde bîne

Mi dî Şewket digo Qutfedîn bira çima tu nizanî wextê ziraetêye xelkê ziraetê xwe hildaye ziraeta me dimîne

Mi dî hêrsa Bavê Kinyas Kekê Suraya tunebûnê xorta gula mala Sêrxwûn torinê mala Hecî Êsib Paşa dihat digo bira bikeve bêminetiyê qe mineta mi ji te nîn e

Radibe sêsed paqanota destê Kamoyê kardiyan û şofêr ve dişidîne

*Torin:nevî

**Nişanlı: Dergîstî

Go Zûmretê dayê eşqeçe wisa li mi girtiye eşqa dergîstaniyê kesek tunîne peşiya min
def û zirnê xîne

Îja kê dîtiye kê bînaye meriv qaçaxê serê çiyê be dayê rabe dê û jinê xwe bi xwe re
bigerîne

Mi dêna xwe didayê Qutfedîn diya xwe û jina xwe Kamoyê kardiyan diketne cîpê berê
xwe didane Qereyaziya rengîne

Li wê rojê derê dîwana xezûrê Qutfedîn peya bû ne

Cimaet li dorê hevcivîne

Ji xwe re dikin kale kale lafê pir şîrîn e

Wextê cimaet dorê bela dibe mi dî Qutfedîn sê denga baltûza kir qêrîne

Go baltûzê bêna benzînê ji min girtiye ji mi re belgîkî bîne ez ê serê xwe bavêjim xewa
şîrîn e

Mi dî serê xwe davîte xewê qederekî serê xwe bilind kir bi sê denga li Kamo kir qêrîne

Go Kamo lawo hêca serê min çû ser belgiya çavê mi ketibû xewa şîrîn e

Mi gele xewnê xirab, eceyîbe giran tevlihev dî ne

Berxê benzîna jîpa me tunîne tu banzde ji jîpê re benzîn bîne mala minê

Mi dêna xwe didayê Zumreta diya wî digo berxê xwedê xewna te ser xêrê bigerîne

Birayê bavê min were xewna xwe diya xwe re bêje bizikrî ne

Go dayê îşev serê mi çûbû ser belgîya çavê mi hêca kete xewa şîrîn e

Mi dêna xwe didayê beranekî kelî qerqaş li goma me dizîne

Cote berdîr palepûlhol pişteke xwe peşiyê danîne

Mi xewnê de bala xwedidayê mufreza Dutaxê, Erzormê bi Qereyaziyê dor li gundê Taşa
birîne

Di xewnê de direvîm nedirevîm xilazbûna mi tunîne

Mi dêna xwe didayê du hev cendirmê bê îman di gundê Emîryê de di para berê quronca
mi dida

Mi destê xwe binê mêlkê xwe digerland mi bala xwe didayê devê birîna heye xwîn tunîne

Mi dêna xwe didayê Zumrete mîna qulingê der biharê kir qêrîne,

Mîna hirça kezevperitî gurê dil birîn e

Go ez ji berxê xwe re sond bixwum xewna berxê min xewna xêrê nîne mala minê

Birayo cimaet dîsa dora bavê Kinyas hevcivîne

Ji xwe re dikin kale kale lafê pir şîrîne

Belkî bayîsê Bavê Kinyas Kekê Sureya xêrê bike wayê nebîne

Mi dî mufreze rakirine ser gundê Taşa rastî Kamo hatine rê ji Kamo distînin berê Kamo çiyê dixîne

Hatine dor gund birîne, gund kirine mehserê îdara gund ji destê mufrezê tunîne

Wextê cahil ji xwe re dora bavê Sureya dikin kale kala lafê pir şîrîne

Baltûza Qutfedîn derkete ber derê balqona dîwanê gava ku mufrezê dibîne geriyê* dizvirî diqîre nav çavê xwe dixîne waêê

Go Qutfedîn bira ez ê pirsekî ji te re bêjim dilê xwe xirab neke neşewtîne

Ez dêna xwe dimê qewl û lêzima kesek li dora te tunîne

Belkî bayîsê Bavê Kinyas Kekê Sureya xêrê bike wayê nebîne

Mufreze rakirine ser gund îdara gund destê mufrezê tunî ne

Wextê evê kelîmê ji bavê Sureya re dibêje difikrîne

Mi dî bavê Kinyas radibû ser dîzê** çoka mina lokê girgîn e

Dest davê saralixê li nava zirav dilezîne

Go gelî cimaetê kese we ji yêra*** xwe ranebe ez tenê me ber derê balqona dîwanê çika ji hevadîsê dinyayê çi heye çi tunîne

Mi dî dest davîte sitemê ji nava ster dikişîne

*Gerî:paşve

**Diz:çok

***yêr/yer:dews

Wexta bazda hewlê dergîstiya wî direvî pêşiya laçik radixist

Digo bavê Kinyas kekê Sureya tunebûnê xorta gula mala Sêxwûn torinê mala Hecî Ûsib
Paşa eva keska pêxembere nereve xilazbûna te tunî ne

Go qîzê laçikê bilindke hetanî roja îro Bavê Sureya tu kesek ber şerê xwe nedîne

Wextê derdikeve ber derê balqona dîwanê serê qolqumandanê Erzurmê ber kevir de
dibîne

Du gula diavêjê serda diteqîne

Mi dî qolqumandanê Erzurmê serê xwe ber kevir bilind kir go Bavê Kinyas Kekê
Sureya kuro ez ji te re sond bixwum bi Qurana mubîne

Ez hatime ji bo girtina te rutbeke mi zêdebe 'efûya te heyê ji te re tişt tunî ne

Go mi reqî û şerab hiştiye ber serê te qawatî mi pêncezar da te, te go heta pênc sala
tayîna mi ranabe ez hetanî xweşbim mufreze dû te nîne

Birayo hey bi mufrezê re dixê şer hey berbi gelyê Taşa ve riya xwe digre diqedîne

Cendirmeyekî Siwazê yekî xelkê Mêrdînê xwedê îşî her du zilama li hev neyne deh ro
mane teskerecîne

Di kora kanyê di nava suhpêjeka de rûniştîne

Go em ji bona Bavê Kinyas Kekê Sureya tunebûnê xorta gula mala Sêxwûn hatine

Ji kûranya Êntabê mêranyê ji me her seriya ji me yekî re bimîne

Ah û gumanê Bavê Kinyas Kekê Sureya tunebûnê xorta gula mala Sêxwûn bi wana
tunî e

Di binya wana re derbas dibe ev her du dizvirin devê emîra dikutine qulonca bavê
Kinyas, çawa berdînê li ser çoka çepê ditewîne

Mînanî tak rihanê li devê şaxa û bîngola mîna sipindarekî li ser milê rastê weldigerîne

Mi dî diya Qutfedîn, jina Qutfedîn, dergîstiya Qutfedîn xwe ser Qutfedîn re digîhînin

Diya wî bala xwe didayê çavekî wî vekiriye,

Destê xwe dide ser çavê wî digo bexê bira çavê te pey nişanya te nemîne

Lawo de rabe ez, jina te û dergîstiya te ser te re sekinîne

Mînanî qulingê derbiharê kir qêrîne

Mina hirça kezevperitî gurê dilbirîne

Îja memleketê xerîb kesek tune xemê dilê her du porkurê bûka birevîne

Lawo te duhê van çaxa li gundê Nedenşêxê li kûranya Êntabê

Te digo dayê eşqeqa wisa mi girtiye eşqa dergîstaniyê kese tune pêşiya mi defê zirnê xîne

Wextê Zumrete him digrî him pêra dilorîne li ser milê xwe dizvire Kamo dibîne

Go Kamo jîpê serê xwe re raşietîne

Cinazê Bavê Kînyas bavêje jîpê bi jîpê bikişîne waêêê birêxîne

Kuro ji bona Bavê Sureya çavê cîpê vênexe çavê cîpê bitemrîne

Ji bona Bavê Kînyas perdeke reş li pêşiya cîpê bilefîne

Kesekî xwedanî xêra tunîne cabekî bihere kûranya Êntabê gundê Nedenşêxê

Ji Tahirxan begê kal re bê mala te bişewute hate kuştinê

Bavê Kînyas Kekê Sureya tunebûnê xorta gula mala Sêrxwûn torinê mala Hecî Ûsib Paşa dîreka li ber derê te hewar li min Qutfedîn e

Hewar li min mala minê

Birawo heyfa Bavê Kînyas Kekê Sureya ne mêrê kuştinê

Bira qeda were eslê dinê

Îro memleketê Qereyazê gundê Taşa cinazê Bavê Kînyas Kekê Sureya tunebûnê xorta gula mala Sêrxwûn torinê mala Hecî Ûsib Paşa, teqandine bi barûdê qulqurşûnê

2.1.1.3. Dewran e

2.1.1.3.1. Mijara Kilamê

Mijar serhildan e, lehengî ye.

2.1.1.3.2. Lehengên Kilamê

Evdilbaqî, Miheme Reşît, Seyîtxan, Feyzo û Elîcan

2.1.1.3.3. Naveroka Kilamê

Di derheqê Seyîtxan û birayê wî de ye. Evdilbaqî, Miheme Reşît, Seyîtxan, Feyzo û Elîcan pênc birane û li hember zagona şewqa serî hildane. Ev pênc birana ji Qereyaziya Erziromê ji gundê Hespresê ne. Piştî vê serhildanê dewlet ji bo girtina van her pênc biraya dozê digerrîne. Leşker hertim li dû wan bûne. Gelek cih û waran da şer di navbera leşker û her pênc birayan de derdikeve. Di vê bûyerê de ya balkêş ewe ku Elîcan herdu jinê xwe jî bi xwe re digerrîne. Ku Elîcan tê kuştin her du jin bê xwedî dimînin. Ebdulqadir bi şerekî giran her du jina ji nav qereqolê derdixe lê şer di dawiyê de bi kuştina Elîcan û birayên wî diqede û agirê serhildanê ditemire.

2.1.1.3.4. Teşeya Kilamê

Teşeya berhemê bi serwa ye. Kêşa wê serbest e. Pergala helbestê stran e. Çeşeyê edebî nezm e.

2.1.1.3.5. Nirxandina Kilamê

Dengbêj Ahmedê Alîksan hozaniyeke serkeftin nîşan dide.

Ev kilam ji aliyê gelek dengbêjan ve hatiye stran. Lê dengbêjê me ev kilam li gorî xwe cuda şîrove kiriye. Di navbera çîrokgotin û dengbêjiyê de maye. Helbeste wek destan e, lawêjiyê ye. Di derheq pesindayîn nav û dengê ya zarê mala Seydo de ye.

Dengbêj serpehatiyên mala Êsibê Seydo paşçav nekiriye û ewî jî di kilamê xwe de ev serpehatiyana bikar aniye. Jiyana mala Êsibê Seydo di nava Kurda de wek destan tê dîtin. Mirov dikare bêje dengbêjek ku vê jiyana lawêjî paşçav bike yê hunera xwe qels bike û kêmasiyan têxe hunermendiya xwe. Lewra ev jiyana di nav gel de cihekî girîng digre.

Dewran e

Lo lo bira dewran e dewran e wî dewran e

Lo lo bira qanûna me bû qanûna Tirka ne zagûna şewqa ne

Hildane şaş û pêş û serê şêxa û mela ne

Kîlît kirine derê medresa hurca û camiya* ne

Xwandina Qur'anê kirine yasax** banga erebî ji nava me hildane

Ez ji we re sond bixwum di dêriz û kavlê gunda de çiqas belengazî bikişîne tamam li serê me Kurdan e

Weêê dewran e

Lo lo bira ji bavekî pênc bira ne

Qebûl nakin vê qanûna ha ne

Were ji were bidim salixê birane hoyoyo yo

Birayê mezin Seyîtxan e,

Birayê li pey wî ya Miheme Reşît e qaçaxê serê çiya ne

Birayê li pey wî ya dîn û bala xwe bidinê Ebdilbaqî demança taqarûf di berde ne

Birayê li pey wî re Feyzo ye, birayê lap piçûk Elîcan e ee

Wî Elîcan e ax Elîcan e wî Elîcan e

Mi dîna xwe didayê dîsa mixbur rabû ji Kurda ne

Têlê li ser têlê didine Enqerê textê giran e

Go di derheqa berxê mala Seydo de yan kuştin e, yan ceza ye yan îdame, yan berdane wîî dewran e

Birayo mi dî cendirme millet topdike ji gunda ne

Anîne derê qereqola merkeza*** cendirma ne.

Bîst û çar saeta ev zilamana tamam li ser darê linga di îfadê de mane

*Cami: Mizgeft

**Yasak: qedexe

*** Merkez: Nazvend

Mi dî peyak rabû li ser darê linga ne
 Go taqetê me tine em xwe bine ser darê linga ne
 Mi dî yeko yeko îfadê wana bi ceyranê hildane
 Go werin bidin salix, nav û nîşanê mala Seydo çawa ne wêêêê dewran e
 Go were ji were bidim nav û nîşanê mala Seydo çawa ne
 Birayê mezin Seyîtxan e
 Li kumeytekî gulî kapreş çar salî siyare apincekî zirkildayê nava mila ne
 Digere nava miletê Kurda ne
 Dibê qebûlnekin vê qanûna ha ne
 Nene serê xwe şewqa ne
 Birayo birayê li pey wî ya Feyzo ye li xwe kiriye qate cilê bînbaşıya ne
 Cumle têla xwe girêda ye têla Şêxê Borîzan e wîîîî dewran e
 Birayê li pey wî ya Miheme Reşît e qaçaxê serê çiya ne
 Hetanî êvarê ji Tirka dikuje ne heftcan e
 Êvarê lêdixe li Eynûrferê li Dirmêskê li Qamûşokê li bin demirêxetê li derê mala Haco
 dibe mivan e weêêê dewran e
 Lo lo bira birayê li pey wiya Evdilbaqî debança taqarof di berda ne
 Dibe sibe digere li daîra qaymeqama li waliya ne
 Go heçka di derheqa berxê mala Seydo, Kurda de qanûn çawa ne
 Weêêê dewran e
 Birayê li pey wî ya birayo Elîcan e,
 Cecê û Cemîle du jinê wî hene her du pêre ne
 Li wana kiriye cilê mêra ne
 Da ye navê wana saralixê fişenga ne
 Dibe sibe digere li semtê Hîzan û Xerzan e

Dibe êvar davêje ser qereqolê Tirka ne
 Birayo dibire serê teresê rutbeliya* dikuje teresê cendirma ne
 Van bêbavê kurê bêbava du payî li ser Elîcan îfade da ne wîî
 Ax dewrane wîî ax dewran e
 Go nihaka yê rabe ji bereka Erzormê here li Çarmixelê Cecê û Cemîlê bibne mivan e
 Yê ji wê derê rabe li Qicixê li mala Adil Begê Miksî bibe mivan e dewrane
 Birayo teresê Romiya ji êvar de li dora Çarmixelê, Qicixê, Kozîkomezê xwe hildane
 Bi sihera sibê re Elîcan dikete herba giran e
 Heta du seat nîv êvar mane
 Fîşengê wî xilasbûne cebirxane wî qedya ne
 Weêêê dewran e
 Mi dîna xwe didayê derbeke kaviqeda berî bedana Elîcan da ne
 Cinazê wî didane ser ereba ga ne
 Ji Cecê Cemîlê kirin cilê mêra ne
 Ji navê wana vekirin saralixê fîşenga ne
 Weêêêê dewran e
 Mi dî Cecê êêêêê heêêêê ban kirîîîî
 Cemîlê bi diyarê Qicixê Çarmixelê diketin mi dî sira sibê mina bayê êvarê em dibirin
 Lê lê dayê van bêbavê kurê bê bava cilê me ji me kirin
 Saralixê fîşenga ji piştê me vekirin
 Em didane ber qûndaxê tivinga li çiyêda berjêrî deystê dikirin
 Lê lê dayê porkurê ji wan wetrê kesekî me tune ye em musilman nînin lê lê em gavûr in
 Lê lê dayê dewran e wîî dewran e ax wîî dewran e
 Mi dî peyakî xwe gîhan de Eldilbakî go kuro heyfa me nayê kuştina Elîcan e

*Rütbeli: Payedar

Heyfa me tê wê heyfê Cecê û Cemîlê bîst û çar saetê wan tamam bû nezaretê destê
kuçikê cendirma ne weêêêê dewran e

Wextê Evdilbaqî xwe gihande derê qereqola merkeza cendirma ne

Mi dî cinazê birayê xwe Elîcan e aqil diçû sewda serî de nema ne

Weêêêê dewran e

Mi dî demançâ teqarûf kişand qilifda ne

Xwe berda dara bînbaşî bala xwe didayê bînbaşî rûnîştiye li ber serê têla ne

Têlê li ser têlê dide Enqerê textê gira ne

Go di derheq berxê mala Seydo yan kuştine yan cezaye yan îdame yan berda ne

Birayo di dibê Eldilbaqî çawa pênc hev gule qapaxa sere bînbaşî dida weldigere ser
sandalye û masa ne

Orta demançâ teqarûf girt xwe ji jorda berda nava qereqola cendirma ne

Hetanî melê mexrebê cendirma re kete herba giran e

Mi dî destê Cecê û Cemîlê girt derxist ji nizereta cendirma ne

Dihatne ser cinazê Elîcan e

Go bira ez çibikim fîşengê mi xilasbû cebirxanê mi qedya ne

Mi destê her du namûsê te girt derxist nava sebaşî cendirma ne

Ez çibikim navê namûsa mala Seydo navekî giran e

Ez birayê xwe niha ji namûsa mala Seydo re dikim qurban e

Wîîîî dewran e wîîîî dewran e

2.1.1.4. Fehim Felemez

2.1.1.4.1. Mijara Kilamê

Mijar kuştina du birane. Her du bira qaçaxê dewletê ne.

2.1.1.4.2. Lehengên Kilamê

Fehîm û Felemez, Fatma, Besê

2.1.1.4.3. Naveroka Kilamê

Ev stran serpêhatiya zarê mala Cemilê Çeto ku ji eşîra Pencînarî ne. Ji Eynilqesranê ne. Felemez zavê Huseyn Paşayê Heyderî ye. Kurê Bişarê Çeto ye. Mala Faro ji eşîra Pencînariya ne. Bişar serekê eşîrê bûye. Heremê re deysta Xerzanê Qubîn (Bêşîrî) dibêjin. Niha girêdayê Êlih (Batmanê) ye.

Kilam li ser kuştina Fehîm û Felemez hatiye gotin. Sedemê kuştina her du bira di kilamê de kifş nîne. Bê sûc û bê xeta hatine kuştinê. Lê temenê herduya jî biçûk bûye û ev biçûkbûn bi dilşewatî di kilamê de hatiye hûnandin.

2.1.1.4.4. Teşeya Kilamê

Çeşnê edebî yê helbestê kilam e. Kêşa helbestê serbest e.

2.1.1.4.5. Nirxandina Kilamê

Dengbêjê me mala Dîbo mala Faro yek danîne lê yek nînin. Fehîm û Felemez ji mala Faro ne. Xinamiyê Huseyn Paşayê Heyderî ye.

Di kilamê dengbêjan de gotineke balkêş heye dibêjin “heyfa mi nayê kujtina filan kesê/î heyfa min tê wê heyfê” li vir da jî kujtina du ciwana pir dilsojiye lê tenê mayîna qîza Huseyn Paşa li xerîbiyê ya herî dilsoj e. Wê demê malbata Paşê û Paşa jî li Qeyseriyê mefitiyê ye.

Fehîm Felemez

Lê lê lê lê wayê lê lê lê lê wayê

Lê lê lê lê wayê lê lê lê lê wayê

Mi dî Fatimê ban kirî go Besê gulîbirê lawo ez hetanî xweşbim lê demeka dewrana riyê dinyayê

Derdê Fehîm û Felemezê Cemîl berxê mala Dîbo derdekî giran e,

Bê sûç û bê xeta hatine kuştinê heta mirinê ji dilê mi derna yêê hey wayêê waêê

Mi dî Fatimê ban kirî go Besê gulîbirê lawo

Îşev serê min çûbû ser belîva çavê mi ketibû xewê, Xwedê tu xêrbikî min xewnek dîtîbû gele gele dilê min ji bona xewna min tirsîya

Bira kula xwedê sed kulî be bikeve mala Xalitê Dewaz firrequmandanê merkeza Diyarbekir başçawûşê Têlanê şeva nîva şevê dor bi şera ve dora qesra mala bavê te girtîbû

Wî çaxî mi nizanîbû yê mêra mala bavê te bikujin

Mi destê Fehîm û Felemezê birayê te girtîbû ji nava cî û yataxa* ji xwe re rakirîbû piya yêê

Îja lawo mi destê Fehîm û Felemezê birayê te girtîbû ji nava cî û yataxa rakirîbû piya

Ez Gulîbira xelqêda ketîbû bi şereba qesrê kula xwedê sed kulî be bikeve mala Xalitê Dewaz

Mi dî çav dikire firreqûmandanê merkeza Diyarbekir bi hicûmê re lawo destê her du birayê te îro ji nava destê mi diqetya yêê

Îja lawo êê

Diya te bi reben be tenê di şera wê qesrê de mabû mînanî qaz û qulingê der biharê diqîriya

Lawo mi siwala birayê te kirîbû ji kerwana ji rêcala lawo ji rêwiya

Mi dî peyak zivirî go pey korayî diçava de hatê

*Yatak :cih

Li kileka behra wanê mi dî Xalitê Dewaz çav kire firreqûmandanê merkeza Diyarbekir
Devê hûnan û bazinbeleka li can û bedenê Felemez gerandin

Bi teqînya gulê re mi dî mineta wî nebû bi simbila xwe dileyîst li ber lêva xwe de
dikenya

Cara duduya mi dî devê hûnan û bazinbeleka li can û bedenê Fehîm gerandin

'Emrê Fehîm sêzdeh û çardeh bû zarokbû tiştê wisa nedîbû

Bi teqînya gulê re weyla li min korê mîna qaz û qulingê derbiharê ser birayê xwe re
diqîriya waêêêê

Îja lawooo waêêê waêêêê

Mînanî qaz û qulingê der biharê ser birayê xwe re diqîriya

Mî diçû eba Hezrayî ser her du birayê te bilindkir. Mî dêna xwe didayê cotê gurçkê van
her zilama mînanê cotê karê karxezala li erdê li ber çavê gulêbirê dilivya

Ax lê lê lê lê wayê lê lê lê lê wayê

Lê lê lê lê wayê lê lê lê lê wayê

Lê lê lê lê wayê lê lê lê lê wayê

Lê lê lê lê wayê lê lê lê lê wayê

Birayo ez hetanî xweşbim li demeka devrana riyê dinyayê êê

Derdê Fehîm û Felemezê Cemîl berxê mala Dîbo derdekî giran e, bê sûç û bê xeta
hatine kuştinê heta mirinê li dilê min dernayê hey wayêê

Îja kuro bejna Fehîm û Felemezê Cemîl wisane dayê fenanî taka vê rihanê,

Hêşîn dike li şereba qesra mala Baro birayo derê vê poxanê

Bira xwedê kula xwe têxe mala Xalitê Dewaz firreqûmandanê merkeza Diyarbekir
birayo başçavûşê vê Têlanê

Lê çawa cabeke nebixêr dane mida derbeka lê dane ji bejn û bala Fehîm û Felemeze
Cemîl berxê mala Dîbo

Cinazê her da maye li pişta Têlanê li Suryê li rasta 'Eraba vê meydanê

Birayo heyfa mi nayê li kuştina Fehîm û Felemezê Cemîl berxê mala Dîbo

Heyfa min tê li wê heyfê

Qîza Kor Huseyn paşa bûka mala Faro piştî kuştina van zilama li neftiyê de li Qeysera
şewîtyê destê her du zarokê xwe yê êtîm girtibû stûyê xwe xarkiribû ji xwe re xwe dabû
goşê vê dikanê

Lê lê lê lê wayê lê lê lê lê wayê

Lê lê lê lê wayê lê lê lê lê wayê

Lê lê lê lê wayê lê lê lê lê wayê

Lê birayo hetanî ez xweş bi li demeka dewrana vê dinyayê

Derdê Fehîm û Felemezê Cemîl berxê mala Dîbo êêê

Derdekî giran e hetanî mirinê ji dilê mi dernayê hey wayê waêêêwaêêê

2.1.1.5. Ferzende

2.1.1.5.1. Mijara Kilamê

Mijara kilamê serhildan û mêrxasî ye

2.1.1.5.2. Lehengên Kilamê

Ferzende, Silimanê Ehmed, Ehmedê Hecî Biro

2.1.1.5.3. Naveroka Kilamê

Behsa mêrxasiya mala Silêmanê Ehmed dike. Ferzende kurê Silêman e. Helbesteke lawêjiye. Lê dengbêj destaneke malbatî li dar dixê. Ferzende mêrxasekî eşîra Hesena ne. Tevî tevgera Şêx Seîd bûye. Paşê jî tevî serhildana Agiriyê dibe. 1941 li Kurdistana Îranê li bajarê Xoyê di girtîgehê de miriye. Piştî serhildanê koç dikin ku herin Îranê. Di rê de gele cîyan şer çêdibe û hinek ji wan tên kuştin. Dengbêj behsa ser jêkirina Elfesiyar dike lê em rastî vê agahiyê nehatin. Bi tenê di vê kilamê de ev agahî heye.

Ferzende, Kerem bi yê din ve digihîjin Îranê. Lê li Îranê hildine mehserê û bi tereffî Îraniya ve tên kuştinê.

2.1.1.5.4. Teşeya Kilamê

Kêşa helbestê serbest e.

2.1.1.5.5. Nirxandina Kilamê

Bi navê vê kilamê gelek kilam hene. Yek ji wan jî ya Şakiro ye. Lê ev kilam ne ya Şakiro ye. Mijar eyniye lê ev kilam bi gotin û peyvên xwe ve ji yê din cudatir e.

Di kilamê de navê gelek kesan derbas dibe. Ev keseyetana di civakê de şexşiyetne girîngin. Evdalê Mistê, Keremê Qolaxasî, Ferzende, Silimanê Ahmed, Ahmedê Hecî Biro, Rizayê Hiso û yê din tevaya giregirê dema xwe ne. Lê mecbûrê koçbûnê dibin. Hemû li ser hev jî nînin bela belayîne. Hêza wan dişkê li xeribêyê têk diçin.

Bi deve Asyayê vê serpêhatiya eşîra Hesena ne bi şêwazeke xweser dihûne û raberî guhdaran dike.

Ferzende

Asya yê digo lê lê Besrayê malxirabê tu deng nakî lê lê hû lê lê hû lê lê

Tu yazdiki* yazmişnakî ser Îranê û Tûranê meytê Kela Xoyê me rênakî wî lê lê

Malxirabê hatiye kuştinê Evdalê Mistê, Keremê Qolaxasî, Ferzende, Silimanê Ahmed,

Ahmedê Hecî Biro çima tu înnannakî hû lê lê hû lê lê hû lê lê hû lê lê

Malîxirabê serê Elfesiyar bi qemê di pêşiya bavê de jêkirine çima ji bawernakî hû lê lê hû lê lê

Asya yê digo lê lê Besrayê malxirabê îşev mîla şefeqê li me lê da hû lê lê hû lê lê

Malxirabê evî kafirî li boriyê de lê lê hû lê lê hû lê lê

Esker** îro nema li Îranê û Tûranê mekrib Kela Xoyê de hû lê lê hû lê lê

Girtiye ser berxê mala Emer di seat dazdê şevê de lê lê hû lê lê hû lê lê

Birayo evdal ezim Kerem bi du gula birîndare, maye Mûşê dane lê lê hû lê lê hû lê lê

Malxirabê Silimanê Ehmed maye li gola Nehirê li tixûbê Îranê sûka Salo

Bedena gawûrê Emir Tûmana çepera kilîskemê vê mehsenê da lê lê hû lê lê hû lê lê

Malxirabê Rizayê Hiso li Mûşê kêleka xwe daye kêleka Şerîf Paşa dirize bin axê de lê lê hû lê lê hû lê lê

Malşewityê Ebdilbaqî îro maye di qeyd û zincîrê de lê lê hû lê lê hû lê lê

Malşewityê serê Elfesiyar bi qemê jêkirine di pêşiya bavê de lê lê hû lê lê hû lê lê

Birayo heyfa min nayê li kuştina berxê mala 'Emer

Heyfa min tê wê heyfê çend hev peyayê mala Mistefa begê îro li gola Nehirê li tixubê Îranê li Sûka Salo

Bedena gewrê Emir Tûmana çepera kilîskemê li kirê Tendûrekê li berê Kelereşkê qemer dîkin mane li xwînê de lê lê hû lê lê hû lê lê

* Yazı: Nivîs

** A(e)sker: Leşker

2.1.1.6. Kerem û Nazê

2.1.1.6.1. Mijara Kilamê

Mijara kilamê şer e û egitiya Keremê xwarzî ye.

2.1.1.6.2. Lehengên Kilamê

Kerem, Nazê, Faîq

2.1.1.6.3. Naveroka Kilamê

Ev kilama danberhevdana dê û kur, bira û xwişkê ye. Li ser goma Xesîlê Mêrgekulavê şerê xal û xarziya bi dilsojî dihûne. Şer û dilsojî cegerparçebûna Nazê dide nîşan. Faîq xwarziyê xwe tevaya dikuje lê Keremê xwarzî bi qeleşî dikuje û bi xwe jî dimre.

2.1.1.6.4. Teşeya Kilamê

Nezma edebî serbest e. Kêşa helbestê bi serwa ye.

2.1.1.6.5. Nirxandina Kilamê

Ev kilam li ser şerê xal û xwarziya ne. Di nav kevneşopiya serpêhatiya Kurdan de pêwendiya xal û xwarziya cihekî muhîm digre. Xal nîvê bavê tê hesap. Gotineke pêşiyar heye dibêje “xal xwarziya radike, ap biraziya da dike.” Di kevneşopiya Kurda de carinan xal li ser apê dikeve. Hezkirina di navbera xal û xwarziya de hezkirineke mezin e. Lê ku li navbera wan xirab bibe, dijminiya wan jî wek hezkirina wan mezine. Ji bo mêrgekî xal û xwarzî dikevin pêşîra hev û hevdu dikujin. Di vê kilamê de ya herf giring rewşa Nazê ye. Nazê di navbera kur û birayan de maye. Herdu aliya jî winda dike.

Gotin û şêwaza dengbêj di giyana mirov de cih digre û pê hestiyar dibe. Serkeftina kilamgotinê guhdaran dorpeç dike û dixê bin bandora mijara kilamê.

Kerem

Yar yar yar yar Keremê min lawo

Keremê min lawo sibeye serê min dêşe dilê min lê dilanî dîne

Serê dilê min kule binê dilê min bi keder û keser û bi birîne

Here were gundê me gundê fila ne Musilmanetî tê de tunîn e

Ji bona riza xwedê ji bo hisa mi gulîbirê were bikeve nava şerê xal û xwarziya her du seriya li hev du bîne

Îja birawo Kerem radibe rextê romanî qeytanî hevde ji malê hiltîne

Lezdike dilezîne xwe goma xesîlê Mêrgekulavê re digîhîne

Lê ser kozîkê şeş hev birayê xwe digere bala xwe didayê

Şeş hev xalê wiya lê xistine şeş birayê wî kuştine

Birayo hemûkî tamam devê kozîka de mirî ne

Îja ku gava Kerem cinazê birayê xwe li ber çavê xwe dibîne

Mînanî hirçê kezev perêtî gurê dilbîrîne

Di bendê kozîkê de rûdinê xwe dihelîne

Pênc hev gule wexta pênc hev pênc hev li qûna bêşliyê dişidîne

Çavê cepê digre çavê rastê serda diniqîne

Nefesê kesik distîne

Pêşiyê pêra qerewilê dikşîne

Yê heft gula biteqîne yê heft xala ser kozîkêde weldigerîne

Gula diteqîne çawa gula ser hevdu li hêta Faîqo yê xalê xwe dixîne

Nazê lezdike dilezîne xwe ser kozîka Faîqê birayê xwe digihîne

Go Faîqo belkî xwedê îmanê ji te bistîne

Kuro mala te bişewite wele te şeş hev kurê min kuştiye

Keremê kurê min nekuje, bira ser ûrta her du mala bimîne

Min dî Faîq digo yar yar yar
 Ax yar yar yar Nazê xwûşkê
 Lê Nazê xwûşkê sibeye serê min dêşê dilê min dilanê dîne
 Gihayê goma xesîlê Mêrgekulavê rabûye bûne çîlpîne
 Ez ji te re sond bixum Qurana mubîne
 Şeş hev birayê te jî hatine kuştinê
 Ji te re sond bixum Qurana mubîne
 Bê fitar sond dixwum jin herne mala bavê sitar ji bonê tunî ne
 Ji te re sond bixwum bi navê Mihemed, reîsê dîne
 Gula birayê te jî bêbextî ji kurê te re tunî ne
 Here destê kurê xwe bigre ji bendê kozîkê derîne
 Ber bigund bişîne bira di nava gundê giran de ser ûrta her du mala bimîne xwûşkê wayê
 De birawo Nazê radibe lezdike dilezîne
 Xwe ser kozîka Keremê kurê xwe re digîhîne
 Van kelîmê birayê xwe hemû yek bi yek Keremê kurê xwe re dibêje dizikrîne
 Mî dî Kerem digo yar yar yar wê êê Nazê dayê
 Kerem digo dayê sibeye serê min dêşe dilê min dilanê dîne
 Ez ji te re sond bixwim bi Qurana mubîne
 Bextê bayî bo Faîqoyê xalê min tunî ne
 Were min ji kozîka min dernexe yê min bikuje
 Siya dara mala bavê min ji dinê biqelîne
 Min dî dike nake emanê destê porkura Nazê ya diya xwe nabîne
 Min dî Nazê destê Kerem digire ji bendê kozîkê derîne
 Kamil bira başqe rê û dêr tunî ne
 Destê wî digire ji ber kozîka Faîq re derbas dike

Belkî Faîq xêrê bike wayê nebîne
 Devê gewir alamanyê ji destê diya Kerem de li namila Kerem digerîne
 Hawû gumanê Kerem pê tunî ne
 Bi teqînya gulê re mi dî Kerem di destê diya xwe de weldigerîne
 Îja birayo min dîn û bala xwe didayê Nazê gava Keremê kurê xwe li ber çavê xwe
 dibîne
 Mînanî hirça kezev peritî gurê dilbîrîne
 Mîna qulingê der biharê kir qêrîne
 Hêsira ser hinarê sûreta de dibarîne
 Xwe ser kozîka Faîqê birayê xwe re digihîne
 Go Faîqo birayo belkî xwedê îmanê ji te bistîne
 Belkî birayê min di kortika cehnemê de postê xwe raxe li ber postê domiz* wirdê xwe
 pê kapê kerê bikişîne
 Wê dinê bibe hevalê şeytîne
 Ne te ji min re sond xwaribû bi Qurana mubîne sond xwaribû bi navê Mihemed, reîsê
 dîne
 Te nego gula min bê bextî Keremê kurê te re tunî ne
 Min dî Faîq di go yar yar yar yar waêê Nazê xwûşkê
 Lê Nazê xwûşkê sibeye serê min dêşe dilê min ji dilanê dîne
 Serê dilê min bi kul e bi keder e bi keser e bi birîn e
 Ji te re sond bixum bi Qurana mubîne
 Sond bixwum bi navê Mihemed, reîsê dîne
 Xêra birayê te ji te re tunîne
 Nîv saet maye birayê te emrê xwedê bi cî bîne
 Da tu lez bike bilezîne xwe kaniya goma xezîne Mêrgekulavê re bigîhîne

*Domuz: Beraz / xinzîr

Ji çadirê kaniya mêrgekulavê tase ava sar ji birayê xwe re hilde bîne
 Bira birayê te ava kaniya Mêrgekulavê bixwe bira hesreta ava Mêrgekulavê di dilê
 birayê te de nemîne
 Min dî Nazê digrî dilorîne pê re li nava çavê dixîne
 Go Faîqo birayo ez ji te re sond bixum bi Qurana mubîne av heye tas tunî ne
 Go xwûşkê ji tasê vegere were sola lingê birayê xwe lingê wî derîne
 Here avê di solê de Mêrgekulavê bîne bira ez bixwum bira dilê min de nemîne
 Min dî Nazê lezdike dilezîne xwe goma xezîne Mêrgekulavê re digihîne
 Solê tijî av dike hetanî dihat dêna xwe didayê Faîq bendê kozîkê serî daniye birayo îro
 emrê xwedê îro bi cî tîne
 Îja Nazê mîna hirça kezeb perîtî gurê dil birîne mîna qulingê der biharê kir qêrîne
 Li ser kozîkê şeş hev bira geriya
 Min dî zivirî ser kozîkê şeş hev kura devê xiste birîna Kerem
 Go Kerem lawo helane eeee
 Faîqo bira helaneeee e
 Îro gundê me gundê filan e e
 Hele were goma xezîne Mêrgekulavê sêrkin li şerê xal û xwarziya ne eeeeeee
 Misilmanetî di gundê me de nemaneeeeeee eeeeeee
 Îro ji goma xezîne Mêrgekulavê ji sibê heta êvarê girêdin erebane
 Bikşîne cinazê xala aaeeee û xarziyaneeee
 Ax yar yar yar weeee
 Ax yar yar yar weeee
 Ax yar yar yar weeee keremê min lawo

2.1.1.7. Lê Can

2.1.1.7.1. Mijara Kilamê

Mijara vê helbestê dîrokî ye.

2.1.1.7.2. Lehengên Kilamê

Yûsif(kurê Huseyn Paşayê Heyderî ye), Efd, Silêman (neviyê paşê ye) û Gefoyê Hemdikî(alîkarê wan e), Şêx Tahir, Seyran

2.1.1.7.3. Naveroka Kilamê

Li ser bêbextî û beçaretîyê hatiye gotin. Îxanet serkêşîya vê bûyerê dikşîne. Bela bêkesiyê zorbetî û îxanetî li wan tê kirin. Di vê bêçaretîyê de yên ku hawara xwe ragihînin û hewara wan werin dûrin û destê wan nagihîje ku hewarî daynin. Bi serê xwe têkoşîn dikin. Dîsa xwe dispêrin Xwedê û hewariya bêçaretîyê ji Xwedayê xwe re datînin. Zilm û zorbetîyê di erd û cihê xwe de û di warê bav û kalan de dibînin. Lê ya dijwar bêbextî ye.

2.1.1.7.4. Teşeya Kilamê

Şêwaza gotinan li cî ye. Wek du beş e. Beşa pêşînde çar ya paşî de pênc hemanên ahengê rêz kiriye. Kêşa wê serbest e. Helbesteke civakî ye.

2.1.1.7.5. Nirxandina Kilamê

1930da têkiliya zarê mala Huseyn Paşayê Heyderî bi sehildana Agiriyê ve heye. Du zarê mala paşê bi hevarekî wan ve li kirê Milazgirê Xuluke/Sûtê tên kuştinê. Vê bûyera dilsoj dengbêj bi şiroveke cuda distirê. Yûsif, Efd, Silêman û Gefoyê Hemdikî li Sûtê hatine kuştinê. Di vî şerî de bînbaşiyek tê kuştin. Cinazê wan herd çara davijine ser erbekeyekî dibine kela Milazgirê vedişêrin. Nahêlin bê şuştin û kefenkirin. Çima behsa eşîra Celalya kiriye nizamim. Celalya diha zêde li Qers û Bazîdê bi cih bûne.

Rewşa hozaniyê xwe bi karanîna peyvan ve dide nîşan. Di gotinên xwe de erdnîgariya cihê bûyerê bi cih û waran di kilamê de terfî dike.

Lê Can

Ax lê can lê can lê can lê can lê can lê can wayêêêê

Mi dî Seyranê hê ê hê ê hê ê ban kirî Hico, Hico ban kirî Cemîlê

Lawo mi diyarê Axrûkê Hozdemirê warê Salih begê

Diketim ji birîna dilê mi û te re li hafa kanîzerê

Le bira aa hooo ho oooo ho ooo

Şêx Tahirê Şêx Îsa daye pêşiya mufreza Kelê, Kopê, Elcewazê

Di newala Elika mi dî sibeye di ser konê mala bavê mi de hatî xarê

Le bira aa hooo ho oo ho oo

Heyfa mi nayê li hoza miya aa li koza berxa aaa li berê kavira aaa

Li tewla manegiyar

Li xurca zêra aaa

Li qeyterê deva li çolê lawo ji xwe re bê xwedî ne

Heyfa mi tê ye li heyfê îşev dor li xanî û mala paşê girtine

Ez korbim nebînim nahêlin kesek ji wana li malê derê lê can

Kesekî ho êêêêê ha êêêêêê

Xwedanî xêra tunîne cawabekî bihere kirê Gilîdaxê Nado Memo* re bişîne

Bê mala we bişewute Şêx Tahirê Şêx Îsa xulamê mala bavê ve yê siyarê yê bû

Daye pêşiya mufreza Kelê, Kopê, Xelatê, Elcewazê dor li xan û malê we girtiye nahêle
erz û eyalê ve ji malê derê lê can

Ax lê can lê can lê can lê can lê can lê can wayêêêê

Mi dî Seyranê hê ê hê ê hê ê bang kirî Cemîlê

Lawo mi diyarê Axrûkê Hozdemirê warê Salih begê

Diketim ji birîna dilê mi û te re eynê wê mi birekê

*Nadir Beg û Memed Beg du kurê Huseyn Paşa ne.

Mi dî ho êêê ho êêê

Gefoyê 'Hemdikî li serê meydanê ban kirî go Ehmed lawo

Tu destê xwe li ser mîrata Qerewula bêşliyê tu şaşneke

Berxê du tabûr eskerê Qerenizamê topeke devzer li ser me ye

Lawo li pêşiya me êrîşe gepo êrîşa Celalya ne

Berxê ez korbin nemînim îsal ji pêrebeledê me bû ye Mahirê birekêê

Lo mîro ooo ho o were wa nîne tu wa neke

Tu agirê kulê kula Helebê di ûrta xwe ke

Li Çaxirbegê bisekine bi du ciya cephekê veke

Li kirê Gilfdaxê bisekine li Enqerê re muhabreke

Cara dudiya berê xwe bide Mekka Munewer

Diakî bike belkî xwedê diayê mîrê mi qebûlke lê can

Ax lê can lê can lê can lê can lê can lê can wayêêêê lê can hey can

2.1.1.8. Lê Here

2.1.1.8.1. Mijara Kilamê

Mijar dîrokî ye.

2.1.1.8.2. Lehengên Kilamê

Ceco, Dewrêşê Gulik

2.1.1.8.3. Naveroka Kilamê

Keçik medhê bavê xwe dide. Lê daxwaziyê ji Hecî Îsmâîlê Qulî bavê Zahîdo dike û dibêje Evdalê bavê min di bin kon de rûniştiye ku kurê wiyê piçûk Ekrem jî li cem e bavê min nekuje. Dengbêj vê stranê bi dilsojiya Cecê dihûne.

2.1.1.8.4. Teşeya Kilamê

Teşeyê berhemê çar bend dixuyê. Benda dawî ya vê kilamê kême. Di bendan de hêjmara rêzan cuda cudaye.

2.1.1.8.5. Nirxandina Kilamê

Di kilamê de behsa hin waran dike. Yek ji wan jî Cilf Gol e lê em nizanin Cilf gol li kîjan heremiyê ye. Lê ku behsa Sînê Kela Xoy dike warê serpêhatiyê kilamê re navnîşan e. Di nav kilamê de behsa eskerê Hemoyî û Bekirî derbas dibe lê nizamim çima. Lewra Hemoyî û Bekira li Erdîşê ne. Mixabin ev kilam jî ji ber qaset saxlem negihiştine destê me kêma ye.

Ziman Serhed e û şewaz di vê kilamê de serkeftî ye. Pergala kilamê bi serwa ye.

Lê Here

Lê here lê here lê here lê dinyayê

Lê lê Ceco rebenê bi diyarê Cilî Golê diketin bêye berî bêye

Malxirabê Sînê maqûlê wêran li deystê ye

Bavê mi serkurê kela li rastê ye

Timo kim cara kirasê Hecî Şêx 'Ubeydullah li bejnê ye

Şahidê şuhûdê dewrêşê guliksarê Senemê di dara dinyayê kuro ooo pir geleke

Birayo îşev ji êvara Xwedê da orta beşê girtiye

Ajotiye ser kara Kela Xoyê dinyayêê wêê dinyayê bê wefayê

Were lê here lê here lê here lê here lê dinyayê

Lê lê Ceco rebenê bi diyarê Cilî Golê diketin kêşe li ber kêşe

Ez ê herme cem Hecî Îsmâîlê Qulî bavê Zahîdê ez ê bêjim ketime ber bextê te Zahir
kurê te Xwedayê te me

Îro gulekî beriyê Dewrêşê Guliksiwarê Senemê nede. Siyarê ser herî pêşiyê dinyayê
wêê dinyayê bê wefayê

Were here lê here lê here lê dinyayê

Lê lê Ceco rebenê bi diyarê Cilî Golê diketin çeme di berda çem e

Kuro eskerê Hemoya dikeşe Bekira leme leme

Ez ê herme cem Hecî Îsmâîlê Qulî bavê Zahîdê ez ê bêjim ketime ber bextê te Zahir
kurê te Xwedayê te me

Îro gulekî beriyê Dewrêşê Guliksarê Senemê nede, li bi nava şewitî di konda rûniştî
evdaleke kurê wî piçûk e li cem e dinyayê wêê dinyayê bê wefayê

Were here lê here lê here lê here lê dinyayê

Lê lê Ceco rebenê bi diyarê Cilî Golê diketin di mil da ha di mil da

Birayo eskerê Hemoya dikeşe Bekira di berda

2.1.1.9. Mala Misto Mala Qaso

2.1.1.9.1. Mijara Kilamê

Mijara kilamê şer e.

2.1.1.9.2. Lehengên Kilamê

Elîf, Alo, Şemseddîn, Necmeddîn, Îzeddîn, Qaso, Misto, Sebrî

2.1.1.9.3. Naveroka Kilamê

Misto zavayê Qaso û Sebrî ye. Ev bûyer li ser gengeşiya cihê kaxekî diqewime. Roja qewumandina bûyerê Qaso û Sebrî di nav gihayê kax de ne. Mistoyê zavayê wan jî ji bo anîna kewşê diçe Bazîdaxa.

Elîf bi rêzê zarên xwe dişîne ku ji xalên xwe re bêjin heta ku kewş hat dest ji kaxê wan berde. Şemseddîn, Necmeddîn û Îzeddîn bi rêzê her çar yek bi yek diçin û Qasoyê xalê wan, tevaya dikuje. Îzeddîn zavayê dest bi hine ye. Kilam bi dilsojî diqewume.

2.1.1.9.4. Teşeya Kilamê

Teşeyê berhemê serbest e. Şêwaz çîrokiye.

2.1.1.9.5. Nirxandina Kilamê

Ji bo cihê kaxekî şerkirina Mala Misto, Mala Qaso dihûne. Bazîdaxa Çaldiran e. ku mirov diçe Çaldiran/Bazîdaxa 15km dimîne riya Nêçîrvan li yalê başûr dikeve. Navê gund bi tirkî “Duyumalan Köyü” ye.

Mijara kilamê li ser kuştina xal û xwarziya ne. Mijareke dramatik e. Fenanî kilama Kerem ev jî şerê di navbera xal û xwarziya de ne. Ji bo zevîkî xal lêdide sê xwarziyê xwe dikuje. Kilam bi devê dayikê tê gotin. Ku em jibîr bînin kilama Kerem jî bi devê Nazê ya dayîka Kerem hatibû gotin. Di herdu kilaman de jî dayîk di nav kur û bira de maye. Ya herî bi kul û derd e, dîsa dayîk e. Di gotineke pêşyan de dibêje “kêr ji hesin natirse lewra ji hev in”. Xal û xwarzî ji hev in û ketine can û bedenê hev lêdane ûrt ocaxê hevdu qelandine.

Dengbêj di nava dilsojiya kilamê de ji kujtina her sê bira zêdetir li ser dergistiya Îzeddîn disekine. Lewra di kevneşpiya Kurda de mayîna bûka rû bixêlî di mala bavê de kedera herî girane. Xwadiyê cinaza li mirina kurê xwe zêdetir ji bo bûka xwe diqehire. Bûk jê re him ewlad e him jî emanet e.

Mala Misto Mala Qaso

Lêlê lê wayê lêlê lê wayê

Xwedêyo tu ser kesî de neynî mala Misto mala Qaso

Ji bo yêra du erebe gîha ûrt ocaxê hevdu korkirin ji bînîva tefandin dane bayê

Min dî Elîfê sê denga li Alo kir qîrîne

Go Alo lawo lez bike bilezîne

Xwe derê mala Şemsedînê birayê xwe re bigîhîne

Bê her du xalê te çûne serê kaxa jorîne

Here bêje xalo tişteki we di kaxê me de tunî ne

Bavê min çûye Bazîtaxa kewşê bîne

Bira were hûdûdê gundê me gundê Nêçîr ji hevdu biqetîne

Ax Lêlê lê wayê lêlê lê wayê

Xwedêyo tu ser kesî de neynî mala Misto mala Qaso

ji bo yêra du erebe gîha gundê Nêçîr de ûrt ocaxê hevdu temirandin ji binîva dane bayê

Lê Alo radibe lezdike dilezîne xwe derê mala Şemsedînê birayê xwe digîhîne

Go Şemsedîno bira diya min gotiye her du xalê wî çûne serê kaxê jorîne

Bira here bêje xalo tişteki we kaxê me de tunî ne

Bavê min çûye Bazîdaxa kewşê bîne

Bira were hûdûdê gundê me gundê Nêçîr ji hevdu veqetîne

Şemsedîn radibe lezdike dilezîne xwe serê kaxa re digîhîne

Bala xwe didayê Sebrî yê xalê wî nav palada sekîniye xebera wî tişteki tunî ne

Qaso yê xalê xwe dibîne sê denga li Qaso yê xalê xwe kir qîrîne

Go xalo tişteki we di kaxê me de tunî ne

Bavê min çûye Bazîdaxa kewşê bîne

Bira were hûdûdê gundê me gundê we ve ji hevdu biqetîne

Qaso agirê kulê kula Helebê ûrta xwe de datîne

Lêngê xwe xuroma gihê dixê weldigerîne

Gavûr alemanyê ji binê xuroma gihê dikişîne

Çawa gulê nîşan davê li serê kaxa Şemsedîn weldigerîne

Cinazê Şemsedîn li serê kaxa bê xwedî bê xwedan dimîne

Hey wayê hey wayê

Xwedêyo tu ser kesî de neynî mala Misto mala Qaso ji bo yêra du erebe gîha ûrt ocaxi
hevdu tefandin ji binî ve dane bayê

Nemayê hey wayê

Lêlê lê lê wayê birayo heta xweş bim lê demeke dewrana dinyayê

Mala Misto mala Qaso ji bo yêra du erebe giha ûrt ocaxê hevdu korkirin tefandin ji
binîve dane bayê

Hey wayê

Min dî Elîfê bangkir go Alo lawo rabe lez bike bilezîne xwe derê mala Necmedînê
birayê xwe re bigîhîne

Bê Necmedîno birayo Şemsedînî birayê min pey her du xala çû serê kaxa jorîne

Bê here destê birayê xwe bigre hilde bîne

Karê wî ji kara tunî ne

Bavê wî çûye Bazîdaxa kewşê bîne

Bira were hûdûdê gundê me û gundê Nêçîr îro ji hevdu biqetîne

Alo radîbe lezdike dilezîne xwe derê mala Necmedînê birayê xwe re digîhîne

Go diya min gotiye birayê wî pey her du xala çûye serê kaxa jorîne

Bira here destê Şemsedînê birayê xwe bigre hilde bîne

Karê wî ji kara tunî ne

Bavê wî çûye Bazîdaxa kewşê bîne

Bira were hûdûdê gundê me gundê Nêçîr birayo ji hevdu biqetîne

Necmedîn radibe lez dike dilezîne xwe serê kaxa re digîhîne
 Sebrî yê xalê wî serê kaxa jorîn sekîniye di nava pala de xebera wî haj ji tişteki tunî ne
 Qaso yê xalê wî di nava xuromê gihê de pê germoka digêrîne
 Ku gava cinazê Şemsedînê birayê xwe dibîne
 Aqil diçe sewda serî de namîne
 Go Qaso xalo te birayê min kuştiye
 Tişteki we di kaxê me de tunî ne
 Destê xwe ji kaxê me bikişîne
 Bavê min çûye Bazîdaxa kewşê bîne
 Bira were hûdûdê gundê me gundê Nêçîr ji hevdu biqetîne
 Qaso radibe agirê kulê, kula Helebê di ûrta xwe de datîne
 Lêngê xwe li xuroma gihê dixwe weldigerîne
 Gewro alemanyê ji binê xuroma gîhê dikişîne
 Ça gulê bi nîşan davê cinazê Necmedîn li kileka cinazê Şemsedîn dike xewa şirîne
 Cinazê her du bira li serê kaxa ber germa havînê ji xwe re bê xwedî bê xwedan dimîne
 Lê wayê lê wayê lê wayê
 Xwedêyo tu ser kesî de neynî mala Misto mala Qaso
 Ji bo yêra du erebe giha min dî di gundê Nêçîr de ûrt ocaxê hevdu tefandî ji binî ve
 dane bayê
 Lê wayê lê wayê lê wayê
 Lêlê dayê rebenê bi diyarê Nêçîr diketim bişewute daro bîne
 Min dî Elîfê bi sê denga kir qirîne
 Go Alo lawo lezbike bilezîne
 Xwe derê mala Îzeddîn zavayê dest bi hine re xwe bigîhîne
 Bê birayo herd birayê te pey xala çûne serê kaxayê jorîne

Here destê birayê xwe bigre hilde bîne
Karê wî ji kara tunîne
Bavê wî çûye Bazîdaxa kewşê bîne
Bira were hûdûdê gundê me gundê Nêçîrvan ji hevdu biqetîne
Îzeddîn radibe lezdike xwe sola re nagihîne
Xwe serê kaxa re bi tena gora xwe digihîne
Sebrî yê xalê wî di nava pala de sekînye xebera wî ji tiştêkî tunî ne
Dêna xwe didayê Qaso xalê wî di nava xuromê gîhê de pêgermoka digerîne
Di gava cinazê Necmedîn û Şemsedîn li ber çavê xwe dibîne
Mîta qulingê der biharê kir qêrîne
Mîta hirça kezeb peritî gurê dil birîne
Go belkî xwedê îmanê ji xalê min bistîne
Xalo te her du birayê min kuştiye
Tiştêkî we di kaxê me de tunî ne
Destê xwe ji kaxê me bikşîne
Bavê min çûye Bazîdaxa kewşê bîne
Bira were hûdûdê gundê me gundê we ji hevdu biqetîne
Qe nizane Qaso agirê kulê, kula Helebê di ûrta xwe de datîne
Lingê xwe li xuroma gihê dixe weldigerîne
Gawur alemanyê ji binê xuroma gihê dikişîne
Ça gulê nîşan davê birincî* digma Îzeddîn zavayê dest bi hine dixîne
Cinazê wî kileka cinazê her du bira dike xewa şirîne
Cinazê her sê bira serê kaxa bê xwedî bê xwedan dimîne
Hey wayê hey wayê

*Birinci : yekemîn

Xwedêyo tu ser kesî de neynî mala Misto mala Qaso ji bo yêra du erebe giha min dî di
gundê Nêçîr de ûrt ocaxê hevdu tefandin ji binî ve dane bayê

Hey wayê hey wayê

Lo bira sêbeye serê min dêşe dilê min dîne sed car bîst car dîne

Elîf sê denga li Alo kir qêrîne

Go lawo rabe hespê Îzeddîn zavayê dest bi hine ji tewlê bikişîne

Xwe Bazîdaxa jorîn re bigihîne

Sê denga Mistoyê bavê xwe têxe qêrîne

Bê ûrt ocaxê xwe ji binîve bişewtîne

Bayraqa ** reş derê xwe biçikîne

Destê xwe şert û şîkayata bikişîne

Were ereba ga girêde here xwe serê kaxa re bigihîne

Cinazê her sê kurê xwe hilde bîne

Cinazê her sê kurê xwe bi destê xwe hilîne

Hey wayê hey wayê

Lo birayê

Mi dî Alo radibe lezdike dilezîne hespê Îzeddîn zavayê dest bi hine tewlê dertîne

Siwar dibe lez dike dilezîne xwe Bazîdaxa ya jorîn re digihîne

Dêna xwe didayê bavê wê derê sereya hukumat bînasî* yê pê germokê digerîne

De dibê gava Misto Alo dibîne

Mîna qulingê der biharê kir qêrîne

Go Alo lawo te xêr e an xêr nîn e

Go bavo tişteki xêrê tê de tunî ne

*Bîna: avahî

**Bayrak: al

Tu were destê xwe şert û şikiyata bikişîne
Were ereba ga girêde here serê kaxanî jorîne
Cinazê her sê kurê xwe hilde bîne
Cinazê kurê xwe bi destê xwe hilîne bavoo
Alo di go wêlî wêlî wêlî
Bavo heyfami nayê kuştina Necmedîn û Şemsedîn li Îzeddîn zavayê dest bi hine malda
maye bûka rû bi xêlî
Wêlî wêlî
Heyfa min tê li heyfê her sê birayê min ji gundê Nêçîr ve bûne berdêlî
Wêlî wêlî wêlî
Lo bira sibeye serê min dêşe dilê min dilanî dîne
Min dîn û bala xwe didayê Misto li Qaso li savcî hakima sê denga kir qirîne
Go dewa min ji bûrayê min re tunîne
Siwar dibe Alo terkiya xwe de datîne
Lez dike dilezîne xwe gundê Nêçîr re digihîne
Ereba ga girê dide diçe cinazê her sê kurê xwe bi destê xwe hiltîne
Birayo Misto radibe li pey Sebrî Qaso û Mihemed teqîbatê îz û şopê digerîne.

2.1.1.10. Mîro

2.1.1.10.1. Mijara Kilamê

Mijara kilamê kuştin û lehengî ye

2.1.1.10.2. Lehengên Kilamê

Wehyedîn, Şeşo, Tîto, Rido, Silho, Eqo

2.1.1.10.3. Naveroka Kilamê

Wehyedîn bi malbata xwe ve qaçaxên dewletê ne. Ji ber bêçaretî û birçîbûnê Wehyedîn dişinin Qubînê ku ji wan re xwarinê bîne. Lê bi îxaneta mixtar re rewşa bûyerê diguhire. Mixtar hem Wehyedîn dixapîne dixê xewê hem jî cabê dide qereqolê leşker tîne û ezap pê dide kirinê. Wehyedîn bi îşkenceyê tê kuştin. Şemsedîn pê dihise ku birayê wî bi ezap hatiye kujtin tê efserê leşkera dikuje, mixtar û gundiyan ve jî dişewutîne. Dîsa jî ji ber kul û derde birayê xwe dibêje min heyfa biyarê xwe hilnedaye. Ev kirinên mixtarê Qubînê li heremê hertim tê gotin û mixtarê Qubînê hafizeke neyînî ye.

2.1.1.10.4. Teşeya Kilamê

Teşeyê nezmê bi serwa ye. Teşeya nezma helbestê serbest e.

2.1.1.10.5. Nirxandina Kilamê

Îxanet sedem û destpêka dilsojiya kilamê ye. Îxanetî tê li kêleka kuştinê di temaya kilamê de rûdinê. Ji bo berjewendiyê, zilma li hewcedarekî dike derdixê pêşiya me. Qubîn/Bişêrî girêdayê Êlihê ye û deysta Xerzanê ye. Ji heremê re deysta Xerzanê dibêjin. Ev bûyer li ser kirinê xayîntiya mixtarê Qubînê ye. Ji Kelê(Milazgirê) mala Kosan Eladîn Beg ji eşîra Zîlî ne. Mala Kosan ji ber mêrkuştinê 20 mêr û 4 jin barî kuraniya Xerzanê dikin. Helbesteke civakî ye. Dengbêjê me bi terzê xwe ev bûyera bi dilsojî hûnandiye.

Hinek standardê civakan hene. Di nav Kurdan de yek ji wan ew e ku ji bo camêriyê gotineke bi qîmet heye. Dibêje “ser sozê mêrê berê”. Kurd ji camêrî û xwaşmirovîyê re vê gotinê pêk tîne û yên xwaşmirov be li ser vê gotinê li sozê xwe nazivire. Lê em di kilamê de dibînin ku ev camêrî di mixtarê Qubînê de tune. Ji ber vê yekê ye ku di hafizeyê neyînî de ne mixtarê Qubînê.

Di vê kilamê de nakokiyek ewe ku cihekî dibê çil û pênc mêr cihekî din dibêje
bîst û pênc mêr hatine kuştinê.

Mîro

Mîro mîro mîro mîrooooooooo

Mîro mîro mîro mîrooooooooo

Mîro millet xayîn e

Lo mîro millet xayîn e eeeee

Em ji mala Kosanin eslê xwe Zîlî ne

Me li korta Milazgirê mêr kuştine

Em îro peyayî kora Bişêryê bûne

Em ji mala Eladîn begê bîst û çar hev kevçî ne

Çarê wê jinin kesûk in dara şikestî ne bîstê wî mêre

Qaçax û firarê dewletê ne îro li kanya Dîndarê li çemê Mamediyê li zozanê Hecî Esmer
li çiyayê Sêrxwûnê em îro ji xwe re tî û birçîne

Le mîroooo Mîro mîro mîro mîrooo

Ax Mîro mîro mîro mîroooo mîro mîro mîroo mîro mîro millet xayîn e

Le bira navê birayê ortê Şemsedîne eeee

Mi dî Şemsedîn bi sê denga li Vehyedîn kir qêrîne

Go bira di binya me de navê gung Qumdîn⁹¹ e

Lez bike bilezîne xwe gundê Qumdîniyê re bigihîne

Ji birçîna taqetê me erz û iyalê me tunî ne

Ji me re tayîn sinî qevrane nan bişîne

Le bira aaaa Vehyedîn radibe lez dike dilezîne

⁹¹ Salihê Kevirbirî, **Filitê Quto**, Stockholm: Nefel, 2002, r.88
Qumdîn: navê rast Qubîn e.

Xwe binê dara Silo Hezro kevirê qîza û bûka di kanya miraza pira re xwe digihîne
Bala xwe didayê sibeye muxtar derketiye birayo desmêja sibê hiltîne
Mixtar bang kirî lawo te vê sibê te xêre an xêr nîn e
Mîdî tivinga destê xwe danî kir lorîne go ez ji mala Eladîn Begê zemanê berê em bîst û
çar hev kevçîne
Em ji mala Kosanin eslê xwe Zîlî ne
Me korta Milazgirê mêr kuştine peyayî kora Bişêryê bûne
Ji birçîna taqetê çoka me tunî ne
Ji mere sinî qerwane firara gotiye bira bişîne
Mi dî wîmmîmîeêêêîêîêîê
Mixtar destê payayê digre li aliyê dîwanê dixîne
Peyê dixapîne dixewê şîrîne
Mi dî mekanîzma tivinga peyayê ji derxîne
Namekî dinvîse destê lawê xwe dixîne
Lawê wî lez dike dilezîne xwe qolqumandarê Diyarbekir tumena Sêrtê Alaya Bismîlê
başçavûşê Qumdînê hemû pê dishisîne
Birayo şeva nîvê şevê dor li peyayê birîne
Mi dî qolqumandarê Diyarbekir lingê xwe lingê peya dida, peya serê xwe bilind kir ji
xewa şîrîne
Bala xwe didayê qulqumandarê Diyarbekir tumena Sêrtê Alaya Bismîlê başçavûşê
Qumdînê hemû sera sekinîne
Peyê dest avîte tivingê bal xwe didayê tiving heye makarûma tede nîn e
Go yavrûm yêra yataxê xwe bêje yataxê te kê û kî ne
Go ez serê bavê tekim kesek yataxê mi tunî ne
Bira mêrikê musulman agirê mi de nemîne
Mi dî mixtarê Qumdînê çavê xwe başçavûşê Qumdiniyê re diniqîne

Go bi darê semawirê bigre hilde bîne
 Ava kel ser serê Vehyedîn de hilşîne
 Yê çend kelîma îro ji te re bêje bi bizikrîne
 Başçavûşê Qumdîne lez dike dilezîne
 Bi darê semawirê digre hilde tîne
 Ava kel li ser serê Vehyedîn de hildişîne
 Porê serê Vehyedîne zanibe tevî birî bijanga sifeta ser darê linga de dişqitîne
 Mîro mîro mîro mîro mîroooooooooo hoy mîro mîro mîro mîroooooooooo
 Mîro mîro mîro millet xayîne le mîroooo millet xayîn e
 Go qumandanê Diyarbekir ban kirî go yavrûm yataxê xwe bêje yataxê te kê û kî ne
 Go ez serê bavête bikim ez ê bimirim diha xêra mi tunî ne
 Bira mêrikê musulman di agirê mi de nemîne
 Mi dî û bala xwe didayê muxtar çavê xwe ji başçavûşê Qumdînyê re diqirpîne
 Go kuro bi mile darê barûdê bigre hilde bîne
 Li tendûra kartû de hiltîne
 Agir berdê lingê Vehyedîn bide ser yê te re çend kelîma ji te re bêje bizikrîne
 Başçavûşê Qumdîne lez dike dilezîne bi milê darê barûdê digre dilezîne
 Tendûra kartû de datîne
 Agir berdidê lingê Vehyedîn dide tamarê çoka lê dişewutîne
 Birawo saxî rihê wî zilamî distîne
 Le mîro ooooo
 Cinazêê Vehyedîn derdixne ber derê dîwana mixtar qolqumandarê Diyarbekir li ber
 serî pê germokê digerîne
 Navê birayê ortê Şemsedîne, Şemsedîn bi sê denga li Rido, Tîto, li Silho li her sê mamo
 li gevro, Ego kir qêrîne
 Go mala we bişewute bîst û çar sietê birayê mi tamam bû yeqîn birayê min xêr nîn e

Şeşo radibe lez dike dilezîne xwe binê dara Silo, Heso kevirê qîza û bûka kanya miraza
fêza gund re xwe diğihîne

Bala xwe didayê bûkekî li ser devê bîrê sekînye bi zincîrê avê hildikşîne

Go xwûşkê wêêêêê

Destê mi berya te, ya te etega xwedê be

Haya te ji peyayê duh êvarê heye yan tunî ne

Go birawo çima hûn ji hevin

Go xwûşkê em birayê hev qan qanî ne

Go bira reng û bez û zîmanê we ne yeke go xwûşkê ez ji te re sond bixum bi Qurana
mubîne

Bavême yeke dayîkê me dudune lema rengê me ji hev nîn e

Go bira hê wêêêêiibelkî xwîşka te xêrê ji te nebîne

Navê peyayê duh êvarê Vehyedîn e

Vehyedîn kirine tendûra kartû şewtandine

Birayê te tu cara dara dinyayê de sax nîn e

Mi dî Şeşo li devê hespê dixê dizvirîne

Mîna hirça kezêb peritî gurê dilbirîne mîna qulingê der biharê kir qêrîne

Go tu hêsîrî bira weêêêêêêêêêê

Tu delîlî bira weêêêêêê

Kuştiyê ber mixtarê Qumdînyê bira weêêêêêêêêêê

Mi dî Şeşo sê denga li Rido kir qêrîne

Rido li Tîto kir qotîne

Tîto digo Gevro Eqo lawo te di go mêrê fena mi tunî ne

Gava kozîkê ji hevala bistînin li dixin kozîkê ser hevela hildişîne

Lo Silho te di go mêrê fena mi tunîne

Te digoooo gava Silho dereca dûrbînê dûr bavê nêzik bikşîne

Teyrê xwedê gula bavê serê qanata berda diqutîne
 De îja rabe birayê me kirine tendûra kartû şewutandine
 Rabe bira heyfa Vehyedîn zavayê dest bi hine li erdê nemîne wîêêêêêê
 Her sê mamô li wê derê mewzî datîne
 Go Rido lawo riya diçe merkeza Diyarbekir bira li ser milê te bimîne
 Tîto lawo riya diçe kayna dîndarê bira li ser milê te bimîne
 Şeşo lawo riya diçe çemê Mamedyê bira li ser milê te bimîne
 Gevro Eqo riya diçe zozanê Hecî Esmêr bira li ser milê te bimîne
 Riya zokê pozê merzela diçe çiyayê Sêxwûnê li ser milê mi Silho kurê min gurê xwedê
 bimîne
 Ax Mîro mîro mîro mîrooooooooo Mîro mîro mîro mîrooooooooo
 Mîro mîro millet xayîne
 Le Mîroooo wêêêê millet xayîne yaêêêê yaêêêêêê
 Her sê Mamô derdikeve hêsyâ gund darê dûrbînê davê li ber çavê xwe digêrîne
 Dereca dûrbînê dûr davê nîzîk tîne
 Go Silho lawo weka te ferekî xwe ji bavê xwe re bitelîne
 Cinazê Vehyedîn derxistine ber derê dîwana mixtar qolqumandar li ber serî pê
 germonekê digêrîne
 Bavê te mîrata gewurbêşiyê ser milê te biedilîne
 Belkî heyfa Vehyedîn zavayê dest bi hine li erdê nemîne
 Silho weka teferekî xwe ji bavê xwe re ditelîne
 Bavê wî pêc hev gula quna bêşliyê dixîne
 Çavê çepê digre çavê rastê serda diniqîne
 Nefesê* kesîk** distîne pêşyê pê re qerewulê dikşîne

*Nefes: Bêhn

**Kesik: Birî

Çawa gulê nîşan davê qapaxa serê qolqumandanê Diyarbekrê ji binî ve difrîne
 Cinazê wî nerdewana çara tê nerdewana duduya dimîne
 Mi dî Rido, Tîto, Şeşo bi her sê mamo Gewro Eqo ser serê cendirma kirin qirçîne
 Go kuro cendirma nekujin cendirme emir qûlî ne
 Du hev sûbay kuştine şeş hevî wî revîne
 Go tivingê destê cendirma bişkênin, bînîn bişkênin bira tu gula neteqîne
 Mi dî dikevne nava gundê Qumdînyê birayo çil û pênc mêrê Qumdînyê tevê mixtar
 navê vetiqetîne
 Tivingê destê cendirma distînîn tu kes gula nateqîne
 Derdixine hêsyayê gund çil û pênc mêrê Qumdînyê tevî mixtarê Qumdînyê agir berdidê bi
 darê barûdê yek hev yek hev diweştîne
 Cinazê Vehyedîn dixine ber kendala, kendal serda hildiştîne
 Bira riya çiyayê Sêxwûnê digre diqedîne
 Mi dîn û bala xwe didayî Şeşo li pey firara mîna qulingê der biharê kir qêrîne
 Go tu hêsîrî bira weêêêêêê
 Tu delîlî bira weêêêêêê
 Kuştîyê ber mixtarê Qumdînê bira weêêêêêêêê
 Lo bira dilê min tu dila nahebîne weêêêêêêêê
 Me yê ji bona te bîst û pênc mêr derxîstîye hêsyayê gun bi darê barûdê yek hev yek hev
 şewutandîne
 Ez korbim nemînîm heyfa Vehyedîn birayê min îro li erdê dimîne
 Hey mîrooooo
 Mîro mîro mîro mîroooooooooo
 Mîro mîro millet xayîne

2.1.1.11. Mûsa Kazim

2.1.1.11.1. Mijara Kilamê

Mijar şerê di navbera çepgir û rasgiran a 1980ye.

2.1.1.11.2. Lehengên Kilamê

Mûsa Kazim, Kerem, Ahmed

2.1.1.11.3. Naveroka Kilamê

Mûsa Kazim avûqatê dewletê ye. Nû zewiciye. Di şerê çepgir û rastgir û di salên heyştî de tê kuştin. Dengbêj vê kuştinê dîsa bi devê diya Mûsa Kazim ve dibêje. Ya herdem kezêb peritî dayîkin û divê bûyerê de jî dertkêşê mezintirîn dayîk e.

2.1.1.11.4. Teşeya Kilamê

Teşeyê nezma helbestê serbest e. Hêmanên naverokî şer e. Çeşnê edebî kilam e. Pergala serwayê heye.

2.1.1.11.5. Nirxandina Kilamê

Wek helbesteke ferdî tê xûyanê. Ev bûyer ya zarê mala Riza Beg e. Riza Beg ji mala Sêrxwûn e. Mûsa Kazim weke pêncî mêtroyî nêzî parizgeha Agiriyê ya kevn tê kuştinê.

Di kilamê de sê xal dertêne pêşiya me. Ya yekemîn wextê Mûsa Kazim tê kujtin mirovên dorê tev direvin û bêkes dimîne. Ya duyemîn di jiyana mirovan de cih girtina xewna ye ku dengbêj jî vegotina bûyerê bi xewn dîtinê dixemilîne. Xala sêyemîn jî ew e ku ji bo Mûsa Kazim him dibêje “bavê Mihemed Elî” him jî dibêje “bûka dest bi hine malda mayo” em nizanin gelo zewiciye an dergistiye. Lazime bê kolandin.

Mûsa Kazim

Me gûlêbirê şereke li me çêbû

Şerê berxê mala Sêrxwûn

Şerê xumîdyê li kavila Qerekosê li pêşberê Yeşilyûrdê

Weyla mi rebenê fêza dayrê abûqatê* hêêee van girtiya yoyooûû

Îja minê xewnekî ji Mûsa Kazim abûqatê dewletê mihendizê**Tirkiyeyî

Gula mala Sêrxwûn kewê gozel bavê Mihemed Elî re dîtîbû

Gele gele dilê mi ji bona xewna mi tirsîya

Bira kula xwedê sed kulî be bikeve mala her sê lawê Riza Begê

Şêwrê mişêwra berxê mi kavila Qerekosê danîne

Sibê li rêzgê dikana li berê dîwara teqîbata berxê mi digerîne va bi sê ciya wê ûwê ûwê

Îja birayo melê mexrebê re mi dîna xwe didayê evana zilama destê xwe dixistine qebzê demança li nedîma pêşîya berxê mi xwe re rabûne piya

Devê demança li pêşîra berxê mi gerandin gule û barûd ser berxê mi da tê fenanî bayê ser kaniya

Birawo cinazê berxê mi dixemlînin ber fişenga li bejna xwîn laşê cinazê berxê mi dişkiya

Lismê çema û kaniya ew çaxa berxê mi dibû bikesiya mêra

Wî çaxî mi nizanibû xulam lawê xelqê ne temama berxê mi hîştîbû weyla li mi korê ji dorê direviya wîîî

Lê lê dayê tu bi rebenî temama hîştîbû li dorê direviya

Mi dî cinazê berxê mi girtin avîtnê makîne li jîpa li texsiyan

Berê berxê mi didane dewlet xestexana*** kavila Qerekosê tebîb û doxtor ser cinazê berxê mi li hev civiyan

*Abûqat (Avukat): Parêzer

**Mihendiz(Mühendis): Endezyar

***Xestexane(Hastahane): Nexweşxane

Baştebîbê kavila Qerekosê mi dî desmal derxistibû weyla mi rebenê ser bexê mi re
sekînbû axîn dikir digiriya eewayêêêê wayê

Lêlê dayê tu bi rebenî axîn dikir digiriya

Heyla tu dî û bala xwe bidê kesekî xwedanî xêra tunîne cabekî bihere bal Kerem bêje
mala te bişewûte xebera te tune ji tişteki derbeka lê dane bejn û bala Mûsa Kazim
avûqatê dewletê mihendizê Tirkiyeyê gula mala Sêrxwûn kewê gozel bavê Mihme Elî
koka Kado Fadoşeva li fêriza ewlada li te diqeliya

Ew çax li bexê mi dibû pêstîrtengiya mêra bira tere derketa Ahmed delalyê malê birayê
piçûk mînanî gurê sibatê detsê xwe bida ser qewza debançê derbiharê meriv xayî bikira
jorda berda nava birê van keriya yo yo yo yoooooooo

Axayo haêêêê haêêêêêê

Weyla çavê xûşk û diya te rijyayoooooooo

Bi xayînetî kuştîyê birayoooooooo

Dosya bexê mi li Enqerê di nava dosyada mayo ooooo

Bûka dest bi hine nîvê zivistanê li mala bavê vegeyayoooooooo

Kedera qesra belek kula bûka dest bi hine heta mirinê dilê Mûsa Kazim avûqatê
dewletê mihendizi Tirkiyeyê gula mala Sêrxwûn kewê gozel bexê dilê teda mayoooooooo

2.1.1.12. Nabî

2.1.1.12.1. Mijara Kilamê

Mijara kilamê şer e.

2.1.1.12.2. Lehengên Kilamê

Ahmed

2.1.1.12.3. Naveroka Kilamê

Dozeke Ahmed di dewlête de heye. Ahmed jî tê kuştin. Doz ji bo çî ye, Ahmed çima tê kuştin em pê nizanin.

2.1.1.12.4. Teşeya Kilamê

Teşeya nezmê serbest e.

2.1.1.12.5. Nirxandina Kilamê

Kilam li ser kuştina Ahmed e lê buyer çî ye ne diyar e. Zêde agahî di kilamê de naxuyê. Lê kifşe Ahmed mirovekî ber bi çav e û dilnexwazê wî hene. Dengbêj bi peyvên cûr becûr pesin dayê.

Nabî

Mi dî Xezalê mîmîmî

Ban kirî hê êêêê Gulê, Gulê ban kirî go de lê lê Hezarê

Bi qebra bavê tekim, bi gora bavê xwe kim

Mi dî eskerekî rabû ji merkeza Diyarbekir bi giranî fîfîfî

Îro kora Bişeryê li kevêrê bûkê û zavê li hubhubka şewutî li pozê Senemê mi dî derê qers konaxa bavê mi gulê birê weyla mi rebenê çadir kuta pê re hêwêr danî

Le birawo oooo wêfîfî

Çadir kuta hêwêr danî fîfîfîfî

Derbeka li bejin û bala bavê Ahmedê mi dane weyla li mi korê heyfa kevn û teze bi destê xwe hılanî

Heyfa mi nayê kuştina bavê Ahmedê mi heyfa mi tê li wê heyfê mi di derê qolordiya merkeza Diyarbekir ewraqê bavê Ahmedê min ê kevn û teze ji xwe birawo îro ji xwe re hevder anî

Ahmedê nabî,

Maqûlê mi nabî,

Paşayê mi nabî,

Wezîrê mi nabî,

Egalê mi nabî,

‘Erfalê mi nabî,

Nîşewarê mi nabî

Lê şeva tirsê mi wê tirsê derbekî bejn û bala bavê Ahmedê mi bixînin

Qesra berê cotê xanima bê bavê Ahmedê mi axa minê şekirî nayê mîro lo lo lo

Ax Ahmedo o he êêêê

Mi go te ra sed car bîst car bi mi te ra

Ahmedo ooo lawo te ra sed car te ra

Kuro were sê qol fişengê yûnanyê rextêke romarî girê nede li ser hev re aa

Berê xwe didî merkeza Diyarbekir kora Bişeryê çavê qîz û bûkê Giresîra dorê êê

Derê ser banê xanya yê îro lêxin ji bejna te re lawo êêêê ya êêêêewo êêêê

Ahmedê nabî, wele nabî

Nîşewarê mi nabî

Egalê mi nabî

‘Erfalê mi nabî

Qesra Pêrtavê qesreke girane

Bê bavê Ahmedê mi axa minê şekirî nayê mîro êêêê lo êêêê

2.1.1.13. Seyîd Betal

2.1.1.13.1. Mijara Kilamê

Mijar, lehengiya Seyîd Betal e.

2.1.1.13.2. Lehengên Kilamê

Seyîd Betal, Celal, Xêredîn, Quto, Mihemedê Qaniya, Malik, Emetulah, Dilşê

2.1.1.13.3. Naveroka Kilamê

Seyîd Betal diçe leşkeriyê; lê dijmin bi îxanetî hêviya çûyîna wî disekinin û paşê jî serê zarokên wî jêdikin. Jina Seyîd Betal bi tena serê xwe bi vî halê ve rû bi rû dimîne. Bûyer bi tolhildana Seyîd Betal xilas dibe.

2.1.1.13.4. Teşeya Kilamê

Taybetiyên teşeyên berhemê li ser heft bendan e. Wezin bi serwa ye. Herem Serhed e, helbesteke serbest e. Çeşnê edebî kilam e.

2.1.1.13.5. Nirxandina kilamê

Dîsa îxanetî serkêşiya bûyerê dike. Barê derd û kula serê dayîkê ye. Dayîk hertim xemxarê derd, kul û birînê ye. Başî û camêriya însanan bi nebaşî û ximkoliya însanan ve raberî hev kiriye.

Dengbêj axîn, zarîn û fixana dê dişibîne kale kala miha. Kilamê bi bêçaretîya jinê/dayîkê û tolhildana Seyîd Betal ve dihûne. Bi gotineke herikbar û sewteke bilind di hişê mirov de bi cih dike. Bi awayekî hestiyar pêşkeş dike.

Di gotinên pêşiyar de dibêje “bila mirov kujtiyê şêran be ne girtiyê roviyan be” yanî mirov dibe ku xwadî dijmin be lê bila dijminê mirov xwaşmêr be. Di gotinek din de dibê “filankes mirovekî ewqas însan e ku mirov bikuje yê veşêre jî” cesedê mirov li rastê/mezdanê nahêle. Li ser bêbextiyê ev rêzana jî balkêş in.

“Ez şêr bûm, niha bûme kalekî pirsal

Ez bi hêz bûm, niha bûme bêhal

Nave min dilerizand erd û ezman

Bi bêbextan re nema ne dîn ne jî îman”⁹²

Seyîd Betal

Heee mi dî Seedetê ban kirî go Hesretê Xanimê lawo felekê li me ha kir lo lo lo

Hey lo lawo felekê li me ha kir lo lo lo lo

Berxê eskeriya Romê qanatê* me şikênand felekê çepî xwe li ser me de bakir lo lo lo

Lawo Seyîd Betalê min diçû eskeriyê neyara ji kuştina he çar yawriyê mi re şêwr û mişêwre kir lo lo lo

Birayo şeva nîvê şevê deriyê li her çar yawriyê** mi vekir, serê her çar yawriyê mi di xewêde bi qemê jêkir lo lo lo lo

Mi dî Seedetê ban kir go Hêsetê xanimê lawo bi dîwarê Qereyaziyî diketim bilinciya lo lo

Lawo wê şevê zereqa tavê nemabû li serê çiya lo lo lo lo

Lawo dî û bala xwe bidê gundî raza şîrê me qeliya lo lo lo lo lo

Berxê ez nexwaş bûm serê mi nedigirt tu cî tu yastixa*** tu belgiya lo lo lo lo .

Mi dî û bala xwe didayê şeva nîvê şevê li mi peyda bû reçe reqê zirzê deriya lo lo lo

Birawo ji mi wetrê Seyîd dibêje Seyîd Betalê mi îzinê Miheme Seîdê mi di biniya mi de razabû di xewê de qêriya lo lo lol o lo

Mi dî û bala xwe didayê ji mi wetrê Seyîd Betalê mi îznê ji eskeryê zivirye şahî ketiye her çar yawriya lo lo lo lo lo

Ax lo lo lo lo waêê waêê

Lê lê dayê tu bi rebenî ji mi wetrê şahî ketiye nava he çar yawriya lo lo lo lo lolo

Birawo dî û bala xwe bidê ya dijmun anîbû serê yawriyê mi bira kafir neyne serê ecnebiya lo lolo lo

⁹²Abdurrahman Banek, *Gotinên Pêşyan Çîrokên Dawiyan*, İstanbul, Nûbihar, 2014, r. 27

*K(q)anat: bask

**Yavru: zarok

***yastık: belgî

Birawo serê her çar yawriyê mi bi qemê jêkirine xwîna yawriyê mi dikişiya lo lo lî lo lo
Dî û bala xwe bidê sibeye hevalê yawriyê mi ji nava ciya ji xwe re rabûne piya he çar
yawriyê, di nava ciya de ranebûya lo lolo lo

Wextê ez çav her çar yawriyê xwe ketim Seyîdê piçûk dî û bala xwe bidê ji mi wetrê
textê mêrgemîrê çotê qizila, tîrbê feqîra, cînara dewera ser porkira diya wanda
welgeriya lo lo lo lî lo lo

Li Qereyaziyê de di Pasînê de bû kale kalê berx û miha lo lo lo lo lo lo

Ax lo lo lo lo lo waêê waêê

Lê lê dayê tu bi rebenî di Qereyazyê de di Pasînê de bû kale kale berx û miha loo lolo

Min ê mektûbek distand binîva dinivîsiya davîte orta her du tiliya davîte postê Seyîd
Betalê mi li eskeriyê mektûba xwe hildida derdê xwe hisiya lo lo lo lo lo

De dibêje çawa yawriyê mi destê dibe qawûşa xwe re bir derbaskir go gelî hevalo îro
cîgera mi belabû dilê mi heliya loo lolo lo

Birawo Seyîd Betalê mi ji bona her çar yawriyê xwe bû qaçax û firarê serê çiya

Heke rêvîtiya riyabe heke qaçaxî û firariya serê çiya be, meriv hevalê mêrxasa be, nebe
hevalê kotiya lo lo lo lo lo

Seyîd Betalê mi hat gihîşte Celal, Xêredîn bavê Ahmed û Mihemedê Qaniya lolololo

Birawo tam du sal e ew berxê mala Muxlis du hev digeriyan rojekî li şorika kefilê bi
devê hûnan û bazinbeleka filîta li can bedenê hevdu direwiyên lo lo lo lo lo lo

Dî û bala xwe bidê Quto berxê mala Muxlis e ji bendê kozikê rabû piya go ji nava şerê
me derên lawo Mihemedê Qaniya lo lo lo lo lo lo lo

Mi dî û bala didayê Mihemed serê xwe bilind kir go Quto lawo xwedê firsendê bide ez
bi Seyîd Betal ve hatine derdê întiqamê* yawriya lo lo lo

Birawo dî û bala xwe bidê heêêê heêêêêê aaaaa

Xêredîn xwarziyê Mihemedê Qaniyan çû ser qiraja Quto, Malik da dianî geriyê direviya
lo lo lo lo lo

*intikam:tol

Birayo dî û bala xwe bidê Quto cacûr taxmîşê* sîtemê fikir dest davîte tetikê tofan rabû
zirzal kete erdê, erd hejiya lo lo lo lo

Dî û bala xwe bidê gulekê îro divêje berî Xêredîn xwarziyê Mihemedê Qaniya bendê
kozîkê ketibû xwîna wî rijiya lo lo lo lo li lo lo

Lê lê dayê tu bi rebenî dibêje çawa xwîna wî dikişiya lo lo lo lo

Îro dayê êê Miheme serê xwe bilindkir bendê kozîkê fenanî gurê nava keriya

Go Seyîd Betal lawo çumkî em hatine derdê îmtiqanê yawriya

Lawo dî û bala xwe bidê gulekê berî xwarziyê mi dane bendê kozîkê xwîna wî rijiya lo
lo lo

Lê lê dayê tu rebenî mi dî û bala didayê van zilama agir didayê destê Quto Malik ve ji
hev diqetiya lo lo lo lo l ol o lo

Quto ban fikir Malik lawo te digo ez mêrekî sed mêrîme xwe şaş neke bexê firara dor
li me girtiye bi sê ciya lo lo lo lo lo lo

Gulekê berî Quto dabû Malik reviya Seyîd Betal gazîkir go Malik lawo bizvire ser
cinazê Quto ez ji te bistînim întiqamê yawriya lo lo lo lo li lo lo

Lê lê dayê tu bi rebenî dibêje çawa îro gulekê berî Malik dabû cinazê wî ser cinazê Quto
de weldigeriya

Cinazê her duya digirtin davîtne benda Mîrze axa mifreza Parsînê bîst û pênc roja lê
digeriya lo lo lo lo

Ez korbim nemînim Seyîd Betalê mi bi destê xwe hildaye întiqami yawriya lololo lo

Ax lo lo lo lo lo lo lo lo lo waêêêê waêêêê

Mi dî Seedetê ban kirî go Hêsetê xanimê lawo bi dîwarê Qereyaziyê diketim wê li
henber e ee

Ez bi qurbana Seyîd Betalê xwe teyrê gerden zer e eee

Werin dî û bala xwe binê şerê Seyîd Betalê min Xêredîn, Celal bavê Ahmed û
Mihemed, Mihedê Qanya beranê kelî qemer e eeee

*Takmak: pê ve kirin

Îro întîqamê her çar yawriyê xwe bi destê xwe hildaye dereee

Lê lê dayê tu bi rebenî bûye qesasê serê Quto û Malik û Ahmed û Mihemed qemer e lo
lo ax lo lo lo waêêêê waêêêê

Mi dî Emetulah ban kirî go Dilşê xwayê rebenê diyarê Qereyazê diketim dar û bîn e eee

Xwayê serê mi çû ser belîva çavê mi ketibû xewa şirîne ee ee

Ax lo lo lo lo lo lo lo lo lo waêê waêê

Mi derheqa Celal kurê te de gelek xewnê xirabe ecêbe girane tevlihev dîneeeee eeee

Mala te şewityê dî û bala xwe bidê here siwarekî siwarke bişîne Qereyaziya rengîne

Çika kurê te heye yan tunîne çima tu nizanî Celal, Xêredîn îro Seyîd Betal bavê Ahmed

Mihemed, Mihemedê Qanya Quto bi Malik ve du sale pey hev digerin bi kuştine eeee

Siwarek siwarkirin şandin Qereyaziya rengîne siwar jorda tê kelogirîn e

Emetulahê serkurê tişteki xêrê tê tunîne eee

Seyîdê piçûk dî û bala xwe bidê go gulekî berdane Xêredîn hatiye kuştinê Quto bi Malik

ve Celal bi milê xwe birîndar e xema wî xwe jî nîne lo lo lo lo li lo lo

Ax lo lo lo lo lo lo lo lo lo waêêêê waêêêê

2.1.1.14. Hewê

2.1.1.14.1. Mijara Kilamê

Mijara kilamê pesindarf ye.

2.1.1.14.2. Naveroka Kilamê

Methê bavê ye. Lawêj e.

2.1.1.14.3. Lehengên Kilamê

Hewê, Filîto

2.1.1.14.4. Teşeya Kilamê

Teşeyê nezma helbestê du bend in û bi serwa ye. Kêşa vê kilamê serbest e. Jimarên rêza çar û sisê ne. Dîsgotin jî bi serwa sê rez in.

2.1.1.14.5. Nirxandina Kilamê

Hakîmiyeta hozaniyê pêşçav e. Hûnera gotinan de xweşhosta ye. Camêro canika methê bavê xwe kiriye. Çîroka helbestê hêjaye kolandiniye. Gelek wekhandinên baş hene wek mînak bejna bavê xwe dişibîne tûra nav kundira.

Di kilamê de behsa eşîra Elika û Bekira dike.

Hewê

Lê lê lê lê lê lê lê lê ax lê lê lê lê

Wî lê dayêê rebenê navê hespê bavê min betal e

Birayo navê hespê bavê min betal e

Min ê şandiye merkeza Diyerbekirê her çar linge wî çêkirî nalê

Le çawêê dibê loremo derdê nîga derdekane bejn û bala mala bavê min gulîbirê

Heft hene sekinî di go berda tîne debanca min di dest de tîne tîfinga Filîto wa navda ne

Heyla Hewê tu bi rebenê ew siwarê hanê çî siwarekî bê pergale

Hele birano yoo hûn navê min bidin bibêjên Hewê sed car û bîst carên bêjin Hewêêêê

Keko xwe avîtiye dev û lêvê bavê min paxsa mirinê

Xwe avîtiye ser çavê bavê min xwûdan û ximama xewê

Herdika ji êvara xwedê de xwe avîtnê ser darê anaxtara* gula di nîşandarê mêra li mala bavê min dikujin wî tu cara tu wexta şaşnakin lê lê çawî kewê lê lê ax lê lê mi dîne

Lê lê lê lê lê lê lê lê ax lê lê lê lê

Wey birano hûn dibêjin çawa bejna bavê min dirêje tûra nav kundira

Keko bejna kekê min zirave tûra nav kundira

Îro hêşîn dike li warê Moda li girê Nigadarê tu bi rebenî yê nav kevira

Le çawêê dibê loremo derdê nîga derdekane bejn û bala mala bavê min gulîbirê

Îro kuştine xortê Bekira li me winda kirine rewşa her çar malê lê lê mihacira wê li mi dîne

Wey birano ooo hûn navê min bidin bêjin Hewê sed car û bîst carên Hewêêêê

Keko xwe avîtiye dev û lêvê bavê min paxsa mirinê xwe avîtiye ser çavê bavê min xwûdan ximama xewê

'Elika ji êvara xwedê de xwe avîtnê ser darê anaxtara gula di nîşandarê mêra li mala bavê min dikulên wî tu cara tu wexta şaşnakin lê lê lê lê lê ax çawî kewê li mi dîne

*Anaxtar(anahtar): nifte

2.1.1.15. Taşlıçay

2.1.1.15.1. Mijara Kilamê

Mijar kuştin û tolhildan e.

2.1.1.15.2. Lehengên Kilamê

Sariye Xanim

2.1.1.15.3. Naveroka Kilamê

Bêdadiya dewletê û tolhildana jinê di hundirîne. Kilam bi heyfvekirina jinê ve xilas dibe.

2.1.1.15.4. Teşeya Kilamê

Teşeya nezmê serbest e. Pergal bi serwa ye. Çeşnê edebî berhemê kilam e.

2.1.1.15.5. Nirxandina Kilamê

Kilam yek bi Kurdî ye yek Tirkî ye. Dengbêj him bi Kurdî him jî bi Tirkî serdestiya hunera hozaniya xwe nîşan dide. Lehengê kilamê ku Tirkin, dengbêj jî kilamê him Kurdî him jî Tirkî dibêje. Ev kilam bêbextî û bêdadiyê tev dihewîne. Dengbêj Ahmed jî bi hozaniyeke serkeftî vedibêje. Li hember bêdadiyê jin wek şêrin kudkê xwe biparêze namûsa xwe diparêze. Sariye Xanim di vê derbarê de mînakeke bi qîmet e.

Taşlıçay*

Hû lê dayê lê dayê lê dayê

Hû lê dayê rebenê dilê mi kete diyarê Qerekosê di ji birîna dilê min û te re diliviyayê

Mi dêna xwe didayê xwayê bejna zirav îmana kamil rabû Taşlıçayê

Bejna xwe girêda fenanî qulingê derbiharê diqêriya

Ez diçûme peşiyê mi go xwayîngê mala te şewîtyê vê subekê çi bûye çi qewumiye yadê
çi giryabû go birayo xwayînga te birîndare ya bi sê ciya

Ya hatiye serê mi hurmetê bira neyê serê kevir û kuçika dar û ber gurê serê çiya

Kambaxa Taşlıçayê kuştine mêrê mi gulîbirê îro mi berê xwe dayê vilayeta Qerekosê ji
bona mehkema bavê her du yavriya

*Taşlıçay: Navçeyeke Agiriyê ye

Lê dayêêêêê

Îro mi berê xwe daye mehkema bavê her du yavriya

Mi dêna xwe didayê xwayê bejna zirav îmana kamil çente di mil dane ji yalê tirafê tê da derketye ber bi adliya Qerekosê dimeşiya

Şeref yazicî ceza reîsê, savciya birayo li hev civiya ceza didana qatil mehkûm û van girtiya

Mi dî eva hurmeta derî vekir kete hûndur savcî ça çav vê hurmetê ket qatilê mêrê wiya ji îfadê û durişmê re rakiribû piya

Dosya vî zilamî derxin ji binê dosya berbi xwe weldigeran bi van pêçiya

450 made qanûnê gore* tahliya vî zilamî dida mi dî eva zilama li ber liva ve dikeniya

Îjar vê hurmetê dest diavîte berîka xwe mektûbek derxist dabû orta her du tiliya

Destê ceza reîsî girt go ez ketime ber bextê we û xwedê ji par ve kuştiye mêrê mi gulîbirê, royê carekî li cezaeviya** Qerekosê da mektûba ji min re dişîne dibê şaşiya neke jinê derketim ez ê te bixwazim ceza reîsiyo çi bû namûs namûsa me hemûya

Mi dî sawcî siktirî dayê go “kizim çik dışarı”*** tu nizanî ez efûya vî zilamî didimê ma bi sê ciya

Mi dî evê hurmetê pişta xwe wanada kir destê yalê çepê ser zer memika bin kemerê digeriya

Gêrî zivirî bi teqanya gulê re qatilê mêrê wêya minanî sipindarekî di ser de ditewya

Hû laş û cinazê vî zilamî dikir dineqîşand bi qûrşûna bi mermiya

Qewilê milê mêrik rabûn tamam ji daîrê ji dorê direviya

Şereba dora mêrik bi tevî hakima revîn ketne binê masê sandûlya

Lêlê dayê rebenê mi dî ceza reîsê ji tirsra tîk rabû go teşkîleta emniyetê go ez ketime ber bextê we xwedê destê vê hurmetê lînexin qeyd û kelepça

Bê qeyd û kelepça berê wê bine cezaeviya Bazîdê nava qatil û mehkûm û van girtiya

*450 made kanuna gore: li gorî 450 madeya zagonê

**Cezaevi: Girtîgeh

***Kızım çık dışarı:Keça min derkeve derve

Mi dēna xwe didayê eva hurmeta li pêşiya teşkîleta emniyetê derxistin ber derê adliya
Qerekosê mina qulingê der biharê dikaliya
Mi go Taşlıçay da çıktım yaê yaê başım silamet*
Avluya vardım koptu kıyamet
Benim kanım neçe sawci niçin bana eder ğıyanet
Ben vururken Kosedağ da oldu destan oldu iranet
Benim önümde var haps u zindan u nezaret
Bundan sonra var olsun kanun adalet
Taşlıçaydan çıktık şöfür yavaş sür yavaş ağ bizi kırdınız
Zalim felek senin gözün kör olsun iki tane yavrum var evde öksüz koyduntiz
Anama söyleyin ben karaliyim
Kardaşıma söyleyin üç yerde ben yaraliyim
Babama söyleyin Taşlıçayliyim
Aslımı sorarsanız acem değilim karapağlıyim
Way li mine

*Mi go li Taşlıçayê derketim bi silamet
Hatim hewşê rabû qiyamet
Çıqa dozger, çiqas dadger ji min re dikin xıyanet
Bi lidana min re li Kosedaxê bû destan bû îranet
Li pêşiya min heye hefs û nezaret
Bira ji vir şûn de hebe qanûn û edalet
Hêdî bajo şofêr we em şêkandin
Çavê te korbe felek her du zarên min di mal de bê dê hîştin
Ji diya min re bêjin ez reş girêdayî me
Ji birayê min re bêjin bi sê ciya birîndarim
Ji bavê min re bêjin ez ji Taşlıçayê me
Ku hûn eslê min bipirsin ne Ecem im ez Qerepapaxim
Way li minê

2.1.1.16. Mîrze Beg

2.1.1.16.1. Mijara Kilamê

Mijara kilamê kuştine, şer e

2.1.1.16.2. Lehengên Kilamê

Mîrze Beg, Resûl(xalê), Zeyneb(diya Mîrze Beg e)

2.1.1.16.3. Naveroka Kilamê

Kilama Mîrze Beg; perîşaniya jinê, ya ku di navbera bira û kur de bi halekî perîşan dimîne stranek jî ev e. Fesadiya Bekoyên Mêrgeverî (Ewran) malekî dîsa xirab dike. Dilê diya Mîrze Beg bi du aliya ve wek kibaba disoje. Gundê Ewranê girêdayê Mûşê ye. Xalê Mîrze Begê hêla ku Mîrze Beg di hemla diya xwe de bûye bavê wî di kuje û diya wî dide mêr. Di 45 saliya Mîrze Begê de gundî dibêjin ku tu heyfa bavê xwe hilnedî tuyê li vir surgun bî. Mîrze Beg ser vê diçe gundê xalê xwe. Pêşiyê gulekî berdide xalê xwe lê zû poşman dibe û vê poşmaniya xwe ji xalê xwe re jî dibêje. Feqet xalê wî Mîrze Begê di kuje. Kilam bi dilsojiya Zeynebê xilas dibe.

2.1.1.16.4. Teşeya Kilamê

Teşeya nezma berhemê serbest e. Hêmanên ahengê bi serwa ye. Çeşnê edebiyê berhemê kilam e.

2.1.1.16.5. Nirxandina Kilamê

Şêwaz herema Serhedê ye. Sedema fesad û şeytanan xal û xwarzî dikevne bedena hev. Serpêhatîke dilsoj e. Helbesteke ferdî ye.

Ev behrem jî li ser xal û xwarziyane. Lê cudatiya vê kilamê li yên din ew e ku Mîrze Beg bê diya xwe mezin dibe, Zeyneb jî lawê xwe naznake. Maxdûriyeteke mezin li serê Zeynebê ye. Zeyneb hê wextê bûktaniya xwe de bî dimîne û birayê wê ewê dide mêr ji zara wê dûr dixê. Zeyneb bi vî halî temenekî didomîne. Di dawiyê de jî mirina kurê xwe dibîne. Dengbêj li ser vê serpehatiyê berhemekî derdixê holê û bi şêwazeke xurt dibêje.

Mîrze Beg

Wey lê minê weylê minê

Wey lê minê weylê minê

Wey lê minê weylê minê

Weylo bira ez ê hidûdê Ewramê seqav û Mûşê giravyê diketim dar û dînim

Birayo min dî û bala xwe didayê Çerkez Mûşê mehla afata li hevciwîn e

Baha bang dike Mîrze begê bike bilezîne digo çil û pênc salê bavê te tamam bû xalê te
bavê te kuştiye diya te daye mêr heyfa bavê te dimîne

Lawo diçî xalê xwe bikujî here bikuje hege tu nakujî mala xwe ji vir barke ji te re sirgûn
e mala minê

Birayo dî û bala xwe bidê Mîrze Begê radibe demanca bavê min di ber xwe de diçikîne
lezdike dilezîne xwe ser riya cedê re digîhîne

Pêşiyê texsiya* distîne sê denga şofîrê texsiyê kir qêrîne

Go lawo hetanî gundê Ewranê gundê xalê min e

Heqê we pêncî panote sed û pêncî panotî ji min bîstîne

Lawo min zûda hidudê gundê xalê xwe nedîtiye min bihere hidûdê gundê xalê min
bigerîne

Olo bira dilêm kêreeee sedcar kêr e eeee

Keko xwedê îşê wî zilamî lê hev bîne îro li Mûşê rêketiye berê xwe daye gundê Ewranê
ser Resûlê xalê xwe ji bona şer e

Mîrze Beg radibe lezdike dilezîne xwe kileka gundê Ewranê re digîhîne

Kekê Seyîd Mihemed wextê peya dibe ji texsiyê peya dibe

Dêna xwe didayê Resûlê xalê wî di nav zeviya mazûta av dide mer li ser mila pê
germoka digêrîne

Min dî û bala xwe didayê bang kir go xalo haj xwe hebe ev bêbextî kar û îşê mêra nîn e

*Taksi: maşîn

Lo xalo te çil û pênc salê bavê min tamam bû te kuştiye diya min daye mêr heyfa bavê min dimîne

Xalo ez ê te bikujim, xalo bêçare çavê xwe digerîne nagerîne riya revê nabîne

Zivirî bi sê denga Mîrze Begê kir qêrîne

Go belê lawo raste çil û pênc sale vûqûatek ji destê min derketiye emrê min heştê sale

Niha tu min bi kujî qîmeta min tunî ne

Lawo ez berdikevim gençlîxa te ya tê bibî qaçaxê serê çiya an bikevî hefsa Mûşê di pêstre çavê te ber riya gîrişê* de dê bimîne

Birawo dî û bala xwe bidê dibêje çavê Resûl direve eva debanca xwe dikişîne gula ser gula diteqîne

Gulekî li Resûlê xalê xwe dixîne

Gula xwedê sed gulî be bikeve mala xayê polisyê çawa lê dikeve orta çerm û hestî de dimîne

Resûl dêna xwe didê xilasbûn tinîne xwe di mirîtiyê de datîne

Diçû sera dîsekînî digo xalo koraya kor di çavê mi de hato ez ketime ber bayê fesad û şeytana firqa bavê û xalê tunî ne

Keko qe nizane Resûl agirê kulê kula Helebê orta kula dertîne li binê avê de destê xwe mîrata laganê digerîne

Kula kulê bikeve mala xayê laganê jarjûr jê re lazim nîne

Bîrden destê xweda tîne sê cara pêşiya xwe dihejîne

Mîrze beg mînanê takrihana devê şalûl û bîngola, mîna sipindarekî li ser xwe de weldigerîne

Ax li wayêêêêêêê

Birayo yekî mînanî Mihemed dijminê berxê minî bav û kalabû, wextê kuştina berxi min bihîst

*Giriş: şemîk

Li orta dîwanê pêgermoka li çoka xwe xist go sed heyf, sed yazix, lawo sed korayî
berxê

Lolo bira ez ê hududê Ewranê Sekavû Mûşê Gêravyê diketim ax dar kevotka

Min dî û bala xwe didayê peyakî hêsyâ gunda gote Zeynebê diya Mîrze Begê ji re
bigota

Go Zeynepê ser kurê cinazê birayê te xortekî nava zebiya mezin bi hev re bûne cota

Keko Zeyneb dike dilezîne xwe digihîne nava zebiya mezin da xwe cinazê kurê xwe re
digihîne

Kurê xwe naznake du peynekî qafê kurê xwe dixîne

Go min giyê sa gora tekîro ewa çi keseke hatiye birayê min bikuje îro heyfa mêrê min
bistîne

Weylê minê mala minê

Min dî Resûl serê xwe bilindkir go Zeynebê serkurê waye li min waye

Çavê min te ya birije tu evî xortî naznakî eva Mîrze Begê lawê te ye

Birayo wextê Zeyneb evê kelîmê di devê birayê xwe de dibihîze

Mînanê qulingê der biharê kir qêrîne

Mîna hirca kezeb peritî dil birîn e

Xwe ser cinazê kurê xwe re digihîne devê xwe dixiste birînê digo Mîrze Begê hayêêê li
min hayêêêê

Berxo min ê pêçûkîyê min ne hêjando ne mijando têr nedîto berxo nebînayî

Lawo kul û kedera û kesera qîz û bûkê çar bihurê Mûşê qijêldane Sekavû Ewran kilayê
berxê dil de mayê

Yekî mînanî Mihemedê Badikê dijminê berxê minê bav û kala wextê kuştina berxê min
bihîst

Li orta dîwanê pêgermoka li çoka xwe xist go sed heyf, sed yazix, lawo sed korayî
berxê

2.1.1.17. Herba Çeneqelê

2.1.1.17.1. Mijara Kilamê

Mijar şer e. Şerê cihanê ya yekemin e.

2.1.1.17.2. Lehengên Kilamê

Hisiyn

2.1.1.17.3. Naveroka Kilamê

Ev şerê cihana yekemîn ku 1915-1919 li tevgera Marmarayê qewumiye. Hisiyn di şerê Çeneqelê de şehîd dikeve. Diya Hisiyn bendê dimîne lê Hisiyn nayê.

2.1.1.17.4. Teşeya Kilamê

Çeşnê edebî kilam e

2.1.1.17.5. Nirxandina Kilamê

Ev stran li ser çar dîsgotin û sê beşa hatiye ristin. Lê mirov wek mersiye jî dikare binêrxîne. Dengbêj kul û kedera dilê diya Hisiyn bi devê diya wî ve dibêje.

Herba Çeneqeale di dinê de degn vedaye. Lehengekî herba meşhûr jî hisiyn e. Dengbêj bi peyvên li hev hatî rewşa Hisiyn vedibêje. Bi gotineke şareza halê diya Hisiyn û kedera dilê diya Hisiyn di kilamê de dirêse.

Herba Çeneqelê

Heyla lawo heyla lawo heyla lawo Hisiyn lawo

Heyla lawo heyla lawo heyla lawo Hisiyn lawo

Berxê diya te uçuncu ordiyê tevgerya yo

Qawîşa Filîtî mili berxê min kutya yo

Tifinga bejnê bêxayî darda mayo

Birayo mala giran hêviya kê mayo

Bûka dest bi hine nîvê zivistanê mala bavê vegerya yo

Îja seba berxê ûrt ocaxê diya te korbe herdu çavê diya te rijya yo

Heyla lawo heylo lawo heylo lawo Hisiyn lawo
 Hisiyn lawo Çeneqeje ji kula dile min û te re xweş Çeneqeje
 Bexê îro li erdê Çeneqelê xwîn dikele
 Ser ra çevkanîne di binyê de mêrg û kel e
 Îro dayka te dev û delingê xwe hildaye çûye pêşiya qolqûmandar seresker e
 Mi go we çikir Hisiynê min go pîrê gunê xwedê te hatê îro herbek li me çêbiye me
 Hisiynê te kiriye seresker daye cephê xwe nobetçî daye bere
 Heylo lawo heylo lawo
 Heyla lawo heylo lawo heylo lawo Hisiyn lawo
 Ciya te ûçuncu odriyê tevgerya yo
 Qawîşa Filîtî milê bexê min kutya yo
 Tifinga bejnê bêxayî darda mayo
 Birayo mala giran hêviya kê mayo
 Bûka dest bi hine nîvê zivistanê mala bavê vegerya yo
 Îja seba bexê min ûrt ocaxê diya te korbe herdu çavê diya te rijya yo
 Heyla lawo heylo lawo heylo lawo Hisiyn lawo
 Heyla lawo heylo lawo heylo lawo Hisiyn lawo
 Hisiyn lawo bi diyarê Çeneqelê diketim wê bi dar e
 Bexê mi dêna xwe didayê taxbûre eskerê Qerenizamê ser Çeneqelê da hate xare
 Min dev û delingê xwe hilda çûme pêşiya başreîs qolqumandar e
 Mi go we çikir Hisiynê mi go pîrê gunê xwedê te hatê herbek li me çêbiye îja me
 Hisiynê te kiriye seresker daye cephê Bulxar e
 Heyla lawo heylo lawo heylo lawo Hisiyn lawo
 Heyla lawo heylo lawo heylo lawo Hisiyn lawo
 Ciya te ûçuncu ordiyê tev gerya yo
 Qawîşa Filîtî milê bexê min kutya yo

Tifinga bejnê bêxayî darda mayo
Birayo mala giran hêviyakê mayo
Bûka dest bi hine nîvê zivistanê mala bavê vegerya yo
Îja seba bexê milê ûrt ocaxê te korbe herdu çavê diya te rijya yo
Heyla lawo heyla lawo heyla lawo Hisiyn lawo
Heyla lawo heyla lawo heyla lawo Hisiyn lawo
Hisiyn lawo bi diyarê Çeneqelê diketim wê bi sîs e
Bexê min dev û delingê xwe hilda çûme pêşiya qolqumandar başreîs e
Mi go we çikir Hisiynê go pîrê gunê xwedê te hatê îro herbek li me çêbûye me
Hisiynê te kiriye seresker daye cephe Êris e
Heyla lawo heyla lawo heyla lawo Hisiyn lawo
Heyla lawo heyla lawo heyla lawo Hisiyn lawo
Ciya te ûçuncuordiyê tev gerya yo
Qawîşa Filîtî milê bexê min kutya yo
Tifinga bejnê bêxayî darda mayo
Birayo mala giran hêviya kê mayo
Bûka dest bi hine nîvê zivistanê mala bavê vegerya yo
Îja seba bexê minê ûrt ocaxê te korbe herdu çavê diya te rijya yo
Heyla lawo heyla lawo heyla lawo Hisiyn lawo
Heyla lawo heyla lawo heyla lawo Hisiyn lawo

2.1.1.18. Surmeli Memed Paşa

2.1.1.18.1. Mijara Kilamê

Mijar şer e

2.1.1.18.2. Lehengên Kilamê

Memed Paşa, Evdila Beg

2.1.1.18.3. Naveroka Kilamê

Ev berhema li ser Memed Paşa ku xanebegê rêveberiya herema Bazîdê bûye. Ev kilam bi devê Memed Paşa û kurê wî yê mezin Evdila Beg ve hatiye ristin.

2.1.1.18.4. Teşeya Kilamê

Teşeya nezmê berhemê serbest e. Çeşnê edebî kilam e. Bi serwa ye.

2.1.1.18.5. Nirxandina Kilamê

Di navbera pênc û heft rêza de ne. Du beş û sê dîsgotin hatine bikaranîn. Herem û zargotin Serhed e. Dengbêj di vê kilamê de jî terza xwe derxistiye pêş.

Di her hal û ehwalî de bav parêzvanê zar û zêçên xwe ye.

Memed Paşa

Olo bavo bi diyarê Erzirmê diketim wê bend e bi bend e

Kuro mîrata deveboyînê şewitî bişewite dev pîrkende

Keko dubirye pêlo dibinê bavê min de ne berteng û quşo sînebende

Min dî Evdila Beg digo Memed Paşa bavo yê ji hali me çawa be

Li pey me diajon hawara Êsbê Sipîkê Sofîkê Hesenî hewara kafirê çerkez

Diwanzdeh taxbûr eskerê Qere Nizamê li pey bavê min diajo def e dewat e waêêê
him govende waêê

Min dî Memed Paşa digo Evdila beg lawo ez bavê te me yaêêêê

Berxê ez kilê çavê têlî Eyşo Xanim, têlî Mahîde Xanim

Bûme xayê şanzdeh girê mezin tîpê sara ber tîpê rûnê de welgerînîm

Hey lo lawo qonaxa bavê te mala begê Qulîcan Axa dev pîrkende
 Wî de bajo de bajo hêdî bajo yaêêêêêê
 Wî de bajo de bajo hêdî bajo yaêêêêêê
 Olo bavo li diyarê Erzormê diketim wê bi saz e
 Kuro mîrata deveboyînê dişewite serjêr e pêhewraz e
 Keko dubirye pilo di binê bavê min de ne dimeşe ne dibeze bi rû saz e
 Min dî Evdila Beg di go Memed Paşa bavo yê ji hali me çawa be
 Li pey me diajon hawara Êsibê Sipîkê Sofîkê Hesenî malxirabo şefeqda diajo
 hewara kafirê Çerkez e
 Diwanzdeh taxbûr eskerê Qere Nizamê li pey bavê min diajo xar û leze
 Min dî Memed Paşa got Evdila Beg lawo ez bavê te me
 Berxê ez kilê çavê têlî Eyşo Xanim, têlî Mahîde Xanim
 Bûme xayê şanzdeh girê mezin tîpê sara ber tîpê rûnê de welgerînîm
 Hey lo lawo qonaxa bavê te mala begê Qulîcano Axa dev Erez e
 Wî de bajo de bajo hêdî bajo yaêêêêêê
 Wî de bajo de bajo hêdî bajo yaêêêêêê
 Olo bavo bi diyarê Erzirmê diketim bi kevire
 Kuro dubirye pilo di binê bavê min de hafya ye nel nagire
 Bavê min bi qamçiya hatiye binê pilo teng û quş û zîne bend nagire
 Min dî Evdila Beg digo Memed Paşa bavoyê ji hali me çawa be
 Li pey me diajon hawara Êsibê Sipîkê Sofîkê Hesenî hewara kafirê çerkez
 Donzdeh taxbûr eskerê Qerenizamê li pey bavê min diajo bire bire
 Min dî Memed Paşa got Evdila beg lawo ez bavê te me
 Ez kilê çavê tilî Eyşo xanim, tilî Mahîde xanim
 Bûme xayê şanzdeh girê mezin serê çavûş onbaşiya jêkim nefera azadkim

Nefer kurê xelkine bira ji xwe re wê bireve
Kurê min tu siwar be siwarekî kar û barbe
Lawo ser darê darimê, ser kujyê nazimê uryande mêl û xar be
Zozanê Sînekê mala begê Gulîcan axa tu peya be
Fîncanek qawê bixwe bira bedena kurê min şifabe
Bira dengbêjê kurê min bi kurê min re be
Bira du qayda bije xem û xiyalê dinyayê ji dora kurê min belabe
Wî de bajo bajo hêdî bajo yaêêêêê
Wî de bajo bajo hêdî bajo yaêêêêê

2.1.1.19. Mîrê Min (Şêx Seîdê Palo)

2.1.1.19.1. Mijara Kilamê

Mijar mirin e.

2.1.1.19.2. Lehengên Kilamê

Şêx Seîd

2.1.1.19.3. Naveroka Kilamê

Serpêhatiya serhildana 1925an ya Şêx Seîdê Palo ye. Navên dîrokî ku di kilamê de derbas dibin hene; wek Mistefa Kemal Paşa, Tevfîq, Silêmanê Ahmed, Ferzende, Şêx Elî Riza û hwd.

2.1.1.19.4. Teşeya Kilamê

Teşeya nezma berhemê serbest e. Behrem bi serwa ye.

2.1.1.19.5. Nirxandina Kilamê

Bi dîsgotin dest pê dike û bi dîsgotin diqede. Çar dîsgotin û sê beş berhemê tamam dikin. Li ser dardakirina Şêx Seîd gotina qasîdeyê ye.

Hawar darxistineke bêçaretîyê ristine. Şexsiyeteke serekeye di civaka kurda de Şêx Seîdê paloyê. Şêx Seîd ji bo parastina dîn li hember dewletê serî radike. Lê ji tereffî dewletê tevgera Şêx Seîd tê şikestandinê. Dengbêj di kilamê de ji şextiyetê kurdan ê sereke alîkariyeke temsîlî dixwaze.

Mîrê Min (Şêx Seîdê Palo)

Were mîrê min mîrê minmîrê minmîrê min

Ez bi qurbana te me dîvan xalîye kanê şêxê min.

Lo lo diyarê Diyarbekir diketim birayo dilê mi te vane

Were çarşiya Diyarbekir mêzeke li polis û cendirmane

Hele were dêna xwe bidê mirîdê şêxê min merkeza Diyarbekir hewciviyane

Hûn bala xwe binê hêsirê bedew çavane

Mi go çima çibû çi qewimî go mala we bişewite derxistine fermana serê me Kurda
ne

Ez kor bim nebînîm hatiye îfada bavê Şêx Elî Riza, Şêx Seîd Efendiyê Qulpê
rûzeman e

Ez bi qurbana mirşidê xwe me canê xwe dike feda di riya Kurda ne

Kesekî xwedanê xêra tunî ne cawabekî bihere bin xetê li cem Tefîq û Silêman e

Îro bihere cem şêxlerê Erebestan e

Bê mala we bişewite îro sêroje Şêx Seîd Efendî hate xeniqandinê darê de maye bi
dardane

Ewdal ezim îro çiyayê Palo çiyayê Mûşê li çiyayê Mûşê bûye mij û tarî bi dûman
e

Were mîrî hayê wayê wayê min mîrê min mîrê min mîrê min mîrê min

Ez bi qurbana te me dîvan xalîye kanê şêxê min.

Birayo ev roj çiyayê Mûşê çiyayê Palo bûye mij û tarî bi dûmane

Min dî Perîzadê bangkir go Perîxanê serkurê were emê herên cinazê xirab nebûye
cinazê kekê me çawane

Birayo heyfa min nayê li kuştina mêra, heyfa min nayê birna serê şêxa û mela ne

Heyfa min tê li wê heyfê golkê kemberê çêleka radibin stûyê xwe istûrûyê kendala
dixin dibêjên em gane

Ez bi qurban çar hev peya diçine welatê jêrê Elmanya yê dixebitin çar quriş pere
tînin potikê solê xwe dileyîzin dibêjên dê, bav û kalê xwe de ket xwede ye em axa
ne

Îro çavê xwe digerînim nagerînim bejna Şêx Seîd Efendî qulpê rûzeman birayo ne
xûyane

Were miri hê wayê wayê min mîrê minmîrê minmîrê minmîrê min

Ez bi qurbana te me dîvan xalîye kanê şêxê min.

Lo lo mîro bi diyarê Varto Gumgum ê diketim bira bişewite tevî ceye

Birayo îro esker rakirine ser bavê Şêx Elî Riza ji Qerekosê, ji Bitlîsê deste bi deste
ye

Kesekî xwedanê xêra tûnîne cawabekî bihere Gola Nehirê li tixûbê Îranê li Sûka
Salo bedena gavurê Emirtuman çepera kilîskemê cem bavê Ferzende Silêmanê
Ehmed kekê Ferzende ye

Bê mala te bişewite here serê xwe sûrê bilindke Mistefa Kemal qanûnek wisa
derxistiye

Fîno daye şewqe daye serê me Qur'ana me kirye latîn, jinê me kirye tango em
misilmanin ji mere pir gûneye

Were mîrî hê wayê wayê min mîrî min mîrî min mîrî min mîrî min mîrî min

Ez bi qurbana te me dîvan xalîye kanê şêxê min.

2.1.2. Kilamên Evînê

Kilamên evînê, carînan eşqa navbera du kesan carînan jî eşqeke yek alî dihûne. Daxwaziya devê evîndaran e kilamên evînê. Hewldana mirazxwaza ne. Lê evîna ku bûye mijara kilaman mixabin pirayî dildar negihîştine hev. Ya ku ev eşq kiriye mijara destan an kilamên dengbêjan jî ev negihîştine.

2.1.2.1. Besra

2.1.2.1.1. Mijara Kilamê

Mijara kilamê evîn e.

2.1.2.1.2. Lehengên Kilamê

Besra

2.1.2.1.3. Naveroka Kilamê

Besra ji dilketiyê xwe re gazinan dike û hest û ramanên xwe pêşkeş dike. Hezdikeye ku bigihîje dilketiyê xwe û pê re bizewuce.

2.1.2.1.4. Teşeya Kilamê

Teşeya berhemê sê dîsgotin û du bend in. Her bend li ser çar rêza ye. Dîsgotin jî sê rêz in. Kêşa wê serbest e.

2.1.2.1.5. Nirxandina Kilamê

Stran bi dîsgotinekî dest pê dike. Ahengeke balkêş bala mirov dikêşîne. Bi ser zimanê keçikê hatiye hûnandin. Dengbêj ev stran mînanî heyranoka bi kar aniye. Keçik methê xwe û dilketiyê xwe tev dide. Keçik di pesin dayîna xwe de bi xwe bawere. Bi hine têgehên fenanî “diranê şekirî, pozê pêjî, çavê belek, enya kever” ve vê pesindayîne dixemilîne.

Besra

Hewar li min hewar li min mala minêêê

Birayo xwedê xirabike sal û zemanê em ketinê yaêêê

Gede lawukê mi di kaviî û dirêz û xirabê û rezîl gunda de
 Hildaye raîş ûsil qanûna berxo û dil ketinê
 Lo lo kuro navê mi Besra ye
 Heylo keko şera serê mi hemaye êêêê
 Birayo ez kê derê rûnê eva rind û bedewbûna mi canikê serê lê mi belayeee
 Lawuko tê xwe kî bi xwedê kî
 Were ramûsanekî dev û diranê şikirî, pozê pêjî, çavê belek, enya kever, çiftê zer
 memika re çeplê erebî taxima sing û bera xala bin guhara nefsa canê mi tewqeke
 Kuro ramûsanê mi ji gede lewkê mi re destûr daye
 Ax way li mi mala minê
 Keko xwedê xirabbike sal û zemanê em ketinê
 Gede lawkê mi di kaviî û dêriz û xirab û rezîlê gunda de
 Hildaye raîş ûsil qanûna berxo û dil ketinê
 Lo lo bira hespê gede lawkê mi dudu ne
 Kuro yekî kihêl yekî di ne
 Bira xwedê bike mirazê mirazxwaza ometa Mihemed biqedîne ser îmanê Mirazê te û
 min e êê
 Tu dibê holka xirabe destê melekê her du şahidê terk û selat
 Nikaha min û te dibire tu ji mi re bibî mêr ez ji te re bibim jin e
 Ax waylê mi mala minê
 Lo lo lawko xwedê xirab bike sal û zemanê em ketinê
 Gede lawkê mi di kaviî û dêriz û xirab û rezîlê gunda de
 Hildaye raîş ûsil qanûna berxo û dil ketinê

2.1.2.2. Evdal

2.1.2.2.1. Mijara Kilamê

Mijar evînî ye.

2.1.2.2.2. Lehengên Kilamê

Leheng tune ye

2.1.2.2.3. Naveroka Kilamê

Di vê kilamê de dengbêj gazinan tîne ziman. Jinên çê û kotî hevberî hev dike. Jinên kotî û mêrê çê dike û jinên çê jî bi mêrê kotî re dizewuce.

2.1.2.2.4. Teşeya Kilamê

Teşeye nezmê berhemê serbest e.

2.1.2.2.5. Nirxandina Kilamê

Sêbend in. Di her bendê de dîsgotin heye. Wezin bi serwa ye. Tema helbestê civakî ye, herem Serhed e, ziman serkeftî ye karê hozaniyê diyar e.

Negihîştina wan bi kasibya dinê ve girê dide. Lê ya balkêş ew e ku sedema kotîtiyê mêra dibîne. Keçan dişibîne teyrê atme, sîmir û seqer. Rindî, bedewî û sipehiya jinan radike asteke bilind. Lewra jinê baş dişibîne teyrên bi esl. Teyran jî diwekhîne Zuleyxa, Belqîza û Siltan Sileyman pêxember.

Evdal

Lo Evdalllll yaêêê yaêêêê

Digo hêêê wî lê lê bedewê zozanê me bişewute Qertewîn e hêêê

Dilo merûmo zozanê me bişewute Qertewîn e

Bişewute hêlîna teyrê baskê şîn e

Ez ê çiqas çar qurnê dinyayê wileyeta, nehya, midurlixa geryame

Çiqa jinê çîl baş e bedew rinde spehî hene qismetê mêrê kotî ne

Birayo ew jî gazin e lomeka ji dûmeka dinyayê nakim
 Temam yazî* ne muqeder û teqdîrê îlahî ne
 Xwedê mêrê kotî têke şong sabûna Helebê dora serê xelqa min e delal bigerîne
 Haşa cimaeta hazir mêrê kotî mînanî kerê Sêirtê yê piştî kurmî ne
 Sibê hetanî êvarê li derê mal û aşakir qêrîn e
 Êvarê yekî mînanî min ê xwedanxêr cil û cola ser piştê hêlîn e
 Çend dara li heyvano xîne
 Heywano rabe xweli kulîfenga bigevzîne
 Xwe ji xwaliyê daşîne
 Berê xwe bide zozanê Eledaxê serê gul û sosina, rihana, pêjeka, piltanê bihêle pêre pêre
 hêsirî beloqê ormanê biçîrpîne
 Ew zeryeke dirêj wisa qismetê mêrê wisa kotîne
 Evdal yaêêêê yoêêêê ya evdalim evdalim
 Xwedê tu xirabbikî lawukê mi ji kasibya malê dinê di rezîlyê gunda de
 Tena kirasekî digere birayo bê mal e bê maaaal e yoêêê yoêê
 Lo evdal yaêêêêêê
 Digo lê lê bedewê mala bavê te li hember e
 Hewşa mala bavê te bi sivder e
 Min dina xwe didayê sê hev derê hewşa mala bavê derketin der e
 Yeke çîl e, yeke qemer e, yeke reng esmer e
 Sê hev teyra ser re girtî bere
 Yek tîpa teyrê atme ye
 Yek di tîpa teyrê sîmir e
 Ya dinê luxata erebî nizanim ji re dibêjin seqer e

*Yazî : nivîs

Mi dêna xwe didayê her sê zerya bi çûyîna qazê bi meşa werdekê meşmeş kir ser hewzê
dador mermer e

Lo birano oooooyoaaaayoaaaa

Her sê zerya meşmeşkir ye ser hewzê dor mermer e

Ya li tîpa teyrê atme teşbîh nebe li tîpa Yûsuf û Zileyxayê

Ya li tîpa teyrê sîmûr teşbîh nebe rêvaçûyîna mina rêvaçûyîna Belqîzayê

Ya dinê luxatê erebî nizanim ji re dibêjin seqer e

Bêşik û bêşûphe silsileta Sileyman pêxember e

Bedevya fenanî bedeya Gozel dinyayê

Ez îşew rojê bihara dirêj şevê payîzan e kanûn e

Dikim ramûsanekî bistînim ji wan re serê dila re çeplê erebî

Serê çifte zer memika çar tilya ji gerdanya zer e

Evdal aaaa waê waê waê waêêêê evdalim evdal

Xwedê tu xirabbikî lawukê mi ji kasibya malê dinê di rezîlyê gunda de

Tena kirasekî digere birayo bê mal e bê maaaal e yoêêêyoêê

Lo evdal yaêêê yaêêêêê

Digo lê lê bedewê îro çiyayê Şengalê bişewute dar û bîne

Were nav û nîşanê jinê baş û kotî û çê ji te re bêjim çê û çî ne

Jinikê xayîn layîqê mêrkê efendîne,

Jinikê çê layîqê mêrê kotî ne,

jinê kotî layîqê mêrê çê ye

Sibê zû rabe serçav neşûştî alikî qafê xwe digerîne

Xwe ber bi teyştan nan dikişîne

Du nana dixwe dibê bismilah jinik teze xurîn e

Birayo jina kotî mînanî kapê qetîne mînanî werîsê rizî ne mînanî kaşê biherîne

Dev û lêvê loperîne wextê dikeve xeberdanê
Dibê weyla mala bavê şewutyê di dêriz û xirab û rezîlê gunda de
Qe jinê mînanê mi xwaşik di dinyayê de tunîne evdal yaooêê
Lo birano yoêêê
Werin nav û nîşanê jinê baş wera bêjim çê û çî ne
Jinê baş e xulqêşirîn e
Dev û lêvê zirav e kaxidî ne
Diranê mircan e sedefî ne
Çavê reş û leylekî ne 'eynî kole meydanî ne
Minê li nava milê sî û sê gûle jimirîne
Birayo di binya me de Qazgol û Bîngol û Şerefdîne
Mîna qulingê ji qulinga perhêşîne
Hênikaya sibê xwe bide serrêkî bê qaza qulinga ser mêrkê misilman da bike qêrîne
Ji berê berê de gotinê mezina ayatê Qur'anê nexşê kevira ne
Serê qisawet qismetê mêrê kotîne
Evdal yaêê yaêê yaêê
Xwedê tu xirabbikî lawukê mi ji kasibya malê dinê di rezîlê gunda de
Tena kirasekî digere birayo bê maaaaal e bê mal e yoêêêyoêê

2.1.2.3. Gewrê

2.1.2.3.1. Mijara Kilamê

Methê evîndariyê ye.

2.1.2.3.2. Lehengên Kilamê

Nav derbas nabe.

2.1.2.3.3. Naveroka Kilamê

Delalî, xweşikbûn û bedewbûna dilketiya xwe dibêje û ji bo nexweşiya evîndara xwe xemgîne. Di nava Kurdan de ji hezkirî an yara xwe re hin kes gewrê dibêjin.

2.1.2.3.4. Teşeya Kilamê

Teşeya çêşna berhemê ne kifşe. Ku nîvcû maye bi tenê çend bend kifşe ne.

2.1.2.3.5. Nirxandina Kilamê

Kilam bi şibandin an wekandinên xweş dihûndirîne. Têgehên ku evîniyê bi me nîşan dide di vê kilamê de jî hene. Bejna delalya/dilketiya dişibîne; gulê, rihanê û piltanê. Heryek di yan din xwaşiktir, naziktir û nazenîntir e. Lê mixabin ev kilam jî ji bo ku nehatiye parastin bi tamemamî negihiştiye destê me.

Gewrê

Lê bedewê çemê gûnde me şirîn e wûîîî

Malxirabê lêpa paşîn tê lêpa pêşîn dixîne wûîîî

Lêpa paşîn tê ji kêfê re tê kelobîne eeee wûîîî

Dibê bejna delalya min fenanî dara gulê û rihanê, sosinê, piltanê dara bi bêhne êê wu êê

Cabek dane mi go kuro Gewrê nexweş e halê xwe tunî ne gundo wuêê woêê

Çûme derê mala bavê Gewrê mi dêna xwe didayê Gewrê li orta her du sivdera pêgermokê digerîne

Hêsira ser hinarê sûreta da dibarîne wuêêêê

Mi go Gewrê were bese megrî nelorîne

Ez û tu yê tev dua bikin Xwedê li jorê yar kerîm e gundo wuêêêêê

Kuro mi go derê mala bavê gewrêya mi bi tirî îîîî

Kuro pişta mala bavê gewrêya mi bi tirî îîîî

2.1.2.4. Gula Ber Qefayê

2.1.2.4.1. Mijara Kilamê

Mijar civakî ye, trajediya evînekî ye.

2.1.2.4.2. Lehengên Kilamê

Di kilamê leheng ne kifş e.

2.1.2.4.3. Naveroka Kilamê

Keçikê bi darê zorê didin yekî din. Keçik dûrê evîndarê xwe bi hêset û kesera dilketiyê xwe jiyane didomîne.

2.1.2.4.4. Teşeya Kilamê

Teşeya kilamê du bendin. Hemanên ahengê bi Serwa ye.

2.1.2.4.5. Nirxandina Kilamê

Ev kilama hanê gelek dengbêja straye. Pergala hozaniyê pêşketî ye. Helbesteke gelerî ye. Keçikê xwe wekandiye gula li ber qefa zinar. Salixê jiyana bêdil a kambax dike.

Evdalê Zeynikê di kilama wey dil de dibêje; “bila dil bi dil be tûrê parsê li mil be.” Hebîb û mehbûb bi hev re bin bi wate ne. Bi hev re nebin kul û der pêşra wan bernade lewra agirê dil rih û cane mirov disote.

Wekhandina gula ber qefayê zehmetiya vê evîne nîşan dide. Evîn ji evîndarê dûr e û bê parêzvan e. Tenêbûn û bêkesî per û baskê wan dişkêne.

Gula Ber Qefayê

Lê gulê merûmê ez gulim gula ber qefayê hê wayêêê lê hê yê lêwayêêêêêê

Lo birano ez gulim gula li ber qefayê

Kuro rengê gula mi mixeyer bûye ji destê sirê û seqemê li bayê ji sermayê

Lê bedewê te sedema xulqê şîrîn wisa kirime fenanî Mem û Zîn ê di nava baxçê mîr de

Memo reş û guliye Zîne digirt davîte bin xûlqumê 'ebayê

Te wisa kirime teşbîh nebe mînanî Yûsûf û Zuleyxayê

Teşbîh nebe te wisa kirime mînanî Siltan Sileyman û Belqîzayê

Te ez dîn û harkirim sedema xulqê şirîn, yanaxê ehmedî ez berda me çolê rû dinyayê

Go de lo lo lawuko belkî Xwedê serê sebeba dê û bavê mi re qebûl neke qe hilnede

Ez nedame xortê mi dil têda ez girtime dame heramî mêra

Rojê bihara dirêjî şevê payîzane kanûn e

Paşla mêrê kotî li ber devê genî, simbêla zivir, tûka şor da xewa mi nayê hey wayê
êêêêê lê hey wayêêêê

Lê lê bedewê bi danê rojê te nabînim danê şevê serê mi diçe ser belîva dikim nakim tu ji
xewna mi dernayê êêê heyê hey wayêêêêê

Lê lê gulê merûmê ez gulim gula li ber zinêr da hey wax hey wayêê lê hê yê lêwayêê

Lê lê gulê merûmê ez gulim gula li ber zinêr da

Birayo rengê gula mi mixeyer bûye ji destê sirê û seqemê dupayê ji sermê da

Ser payîze mi dî Gulê dibêje belgê gulê çawa şîlan pişkivî gulê belgê xwe weşandin ser
dara sosinê da

Go lawuko belkî xwedê serê sebeba dê û bavê mi re qebûl neke qe hilnede, ez nedame
xortê mi dil têda

Ez girtime dame heramî mêra lê dibê zenda mi qerimye li ber serê heramî mêra, ji te
stûyê mi xar e li ser xort û mêrê xelqi da

Ne bixêr ne silamet îsal pêre bûme jina mal û mêr da hey wax hey wayêê lêhê yê lê
wayêê

Lê lê bedewê bi danê rojê te nabînim danê şevê dikim nakim tu ji xewna mi dernayê êêê
heyê hey wayêêêêê

2.1.2.5. Wer Helîmê

2.1.2.5.1. Mijara Kilamê

Mijar evîndarî ye.

2.1.2.5.2. Lehengên Kilamê

Helîm

2.1.2.5.3. Naveroka Kilamê

Ev kilam li ser evîniyê hatiye gotin. Lawik pesnê dilketya xwe dide. Evîndara wî bi mêr e lê ew li benda mirana mêrê keçikê dimîne û dixwaze ku mêrê wê bimre û ew jî keçikê ji xwe re bixwaze.

2.1.2.5.4. Teşeya Kilamê

Teşeya çeşnê bi serwa ye. Bi bend û bi dîsgotin in.

2.1.2.5.5. Nirxandina Kilamê

Helîm straneke kevnare ye. Lê stran ya kî ye em pê nizanin lazime bê kolandin. Xwedî serwa ye. Hozan hezkiriya xwe wekandiye text û payê Ebdulhemîd û M. Reşad ên siltanê desthilatdariya Elî Osman û wekhandiye Serok Komarê Cûmhûriyetê yekem Xazî Mistefa Kemal.

Hozan berdilya xwe derdixe ser ewra û bi peyvên sirûştî tîne zimên. Têgehên xwaşikbûn û sipehiyê şixul zêde zêdeye.

Wer Helîmê

Were were were were wereeîî lê Helîm were ee

Ez ê bi heyrana xulqê şîrîn bejna zirav enya kever gerdana tenik singê zer e

Birayo sing û berê Helîmê wisa bûye

Mînanî text û payê Siltan Ebdilhemît

Text û payê Siltan Mihemet Reşat

Text û payê Xazî Mistefa Kemal

Ji bo mînanî axa Qibrisê yeşilixê hemû duwalan herb û şer e.

Diwanzdeh duwalê ejnebiya tevî gavurê Yûnan Îngîlîz Tirkiyê re danî îî lê qanû şer e e

Ax were were Helîm were eeee

Kuro mi go Helîma mi werdeka ser keska lê perê şînê

Fenanî qaz werdaka li Çûnyê li Maçûnyê li Axonyê li Sînekê devê çem û kanya wîîî lê gola Çîmê

Weyla te dev dosta ziman xweşa lê dil xayînê

Bira bixin dîn îmanê Xwedê re mîzgînî bixwaza ji min re mizgînî bianya

Bigota îşev mêrê Helîma te mir

Min ê şewqa xwe xarkira, simbêla xwe bada, di dêrizê gunda wîîîî de lê ê çûma şînê

Ax were were Helîm were

Ez ê bi heyrana xulqê şîrîn, bejna zirav, enya kever, gerdana tenik, singê zer e

Birayo singê berê Helîmê wisa bûye

Mînanî Text û payê Siltan Ebdilhemît

Text û payê Siltan Mihemet Reşat

Text û payê Mistefa Kemal

Ji bomînanî axa Qibrisê yeşilixê hemû duwalan herb û şer e.

Diwanzdeh duwalê ejnebiya tevî gavurê Yûnan, Îngîlîz ji Tirkiyê re danî îî lê qanû şer e

Wayê ê ê ê ê

2.1.2.6. Lawko

2.1.2.6.1. Mijara Kilamê

Mijara kilamê evîndarî ye.

2.1.2.6.2. Lehengên Kilamê

Werdê

2.1.2.6.3. Naveroka Kilamê

Keçik dil dike hezkiriyê xwe bîne nêzî xwe. Çareseriyê jî di peywêrdanekî de dibîne û dibê ez te têxim melayê gund ku her dem nêzikî min bî. Lê ku dîsa jî nagihîjin hev ew çax dibê mi birevîne bihere bavêje ber bextê axakî bi qudret bira li me xwedî derkeve û em bigihîjin hev du.

2.1.2.6.4. Teşeya Kilamê

Teşeya nezma berhemê sê bend in. Li gorî beşa çar û sê û sê hûnandiye.

2.1.2.6.5. Nirxandina Kilamê

Li gor lêkolîna me qet tu dengbêjekî ev kilam negotiye. Serkeftina hozaniyê heye. Danberhevdana keç û xortên evîndarin.

Dengbêj bi şewazeke xweser têkiliya navbera herduya di kilamê de hûnandiye. Bi gele taswîran ve neqîşandiye.

Lawko

Lo lawko yoo yooooo yyyooo

Mi go bejna te ji mi re zirav e yîîîji dara gulê û rihanê minanî şitla vê çinarêêêê

Lê ez ê te tê me melê mala bavê ji bona nefsa xwe şaşneke bi me serê te da yêêê te dexme memberê hafa vê minarê êêêêêê

Lê îja ez ê li cem dê û bavê xwe ji te re bêjim meleko ez bi qurbana te me ew çi derde tu pê dinalî îîîîîî a

Tu jî bêje heyra mala bavê şewityê di dêriz û xirab û rezîlê gunda de

Ez dikalim ez dinalim ji bona kubarê oyooooo oyoo

Eman eman eman hu emanê hu emanê

Emayê emayê ca vî dilî fîfî êêê

Lawoko mi go bengî fîfî lo sed car fîfîfî bengî fîfî

Hey bê bavê te daye serê xwe şareke reş dorê morî rengî

Lawokê tê xwe bi Xwedê kî her çar stûnê Kabê kî

Kuro were berê mi ji dê û bavê mi bixwaze ku dan ji xwe dan

Heke ku nedane destê mi nav destê xwe xîne

Mi nerevîne mi nevêje welatê jêrê miletekî qeleş û pîrr bê bexte pîr xayîn e

Destê mi bigre birevîne bavêje welatê Serhedê ber bextê axakî pîro pîroo pîr zengîn e

Eman eman hu eman eman

Eman eman emayê ca vî dilî

Gede digo bedewê êêê ez navê te nizamin di dêriz û xirab û rezîlî gunda de li qarişî cînarê nepak, hewalê çev nebar bangî te dikim bi zimanê şîrîn ji te re dibêjim Werdê êêê

Hey bê bavê îro minê ramûsenekî li nava taxima sing û bera reş, çiplê erebî, xala gerdênê, nefsa canê te tewqe kirye heft sal ketye ortê ramûsana te ji mi re bûye mînanî dimis, gezo, hingiv li ser zimanê mi sekiniye di dêriz û xirabê gunda de ez nikarim lê tûkim erdê êêêêêê

Ax lê lê Werdê êêê wayêêêê

Hey bê bavê tu mînanî kihilek ji kihilê mala Cûdî Memed Paşa serê rixt û rişme zînekî Diyardebekir ser pişta te bixîne

Gemeke Meletiyê divê devê te xîne

Di zozanê Qulîxan Begê re di Çawûrma Xelîl Begê re

Meriv te ça xwe bajo yo yoo o pêşiyê cerd be

Lê lê lê Werdê lê lê lê Werdê

Eman eman eman huemanyê hu enemyê

Eman emayêêê êê ca vê vî dilî

2.1.2.7. Lê Bedewê

2.1.2.7.1. Mijara Kilamê

Mijar evîndarî ye.

2.1.2.7.2. Lehengên Kilamê

Leheng ne diyar e.

2.1.2.7.3. Naveroka Kilamê

Dengbêj di vê kilamê de bi devê lawuk bedewbûna keçikê, bi pesindariyeke mezin bi me dide nîşan. Ji bo bedewbûna keçikê dilê mêra ji jinê wan sar dibe.

2.1.2.7.4. Teşeya Kilamê

Teşeya nezma berhemê du bend in. Pergala helbestê kilam e.

2.1.2.7.5. Nirxandina Kilamê

Rêzkirina peyvan bi dilgermî û nerm e. Bi şewazeke rihet dibêje û bandorê li dil û cegera mirov dike. Hem pesin dide dilketiya xwe hem jî serfiraziya bidil zewacê û nerindiya bêdil zewacê hevberî hev dike. Ferq û cudatiya wan dide nîşan.

Helbest bi serwa ye. Benda ewil şeş rêz, ya duduya pênc rêz in. Di dawiya wande dîsgotinek heye. Ev strana li gor kolandina me ji bilî vî dengbêjî hîç kesekî nestraye. Ziman û şewaz serhedî ye. Bi zimanekî serkeftî hûnandiyê.

Wek klamên evînê yên din ev kilam jî bi gotinên bi bandor pesnê jina çê dide. Mirov ku kilamê seranser mêze dike dibîne jina çê beşkirina jiyanê ye jina kotî jî ji mirinê xirabtir e. Bi distûra “jin mirov ezîz jî dike rezîl jî dike” ve giringiya jinê di jiyanê de cihekî sereke ye.

Lê Bedwê

Bedewê bejna te ji mi re zirave ji tañññññ ka rihanêê

Bira hêşîn dike li dêriz û xirab û rezîlî gunda de semtê êêê vê zozanê êêê

Lê bedewê te sedema xulqê şirîn mala gelemêra birye ber wêranê êêê

Malxirabê te sedema çav û biryê belek jinê gelemêra dane berdanê êêê

Bira Rebê alemê emrê ser du heb milayîketên zilmê bikira, ji bo rihê jina kotî

Ji mi bixwesta bigota kanê êêêê îêîêîê mi bigota hanê êêîêîêîê

Îja rihê jina kotî bîstanda orta xaç û xizirnebî meha zivistanê êîêîêîêîêîêîê

Ax bê îêîêîê dilîîî ax bê dilîî îîîî

Birawo di dêriz û xirab û rezîlî gunda de ne sawcî ye ne hakime ji bo xatirê dilê rezîl
herim lo were bigrî wîêîêîêîêîê

Lê bedewê birê malê me danîne li zozana îêîêîlo devbirekê êêêê

Birawo bire qîz û bûkê gundê me dane elb bi gumguma misînê xwe hilşayne kanya
binya mala îîî dev şilekêêê

Îja keko heçî kesê bi lingê xwe geryaye bi çavê serê xwe dîtye bi dilê xwe zewiciye

Birawo bêje mi sî û sê mix kutyaye textê qoce felekê êê

Heçî kesê bi lingê xwe negerya, bi çavê serê xwe nedîtye bi dilê xwe nezewiciye

Cînar gazî dîkin dibê kera wî ketye lerzekê

Îja birawo şepe ser mala bavê de hatiye

Bavê wî birayê wî diya wî kurê wî qiza wî miriye ûrt ocaxê wî korbiye îîî bi carekî wîîî

Ax bê dilîîîîî ax bê dilîîî îîî

Birawo di dêriz û xirab û rezîlê gunda de ji bo xatirê dilê rezîl ne sawcî ye ne hakime
herim lo were virî wîêîêîêîêîê

2.1.2.8. Lê Dîlberê

2.1.2.8.1. Mijara Kilamê

Mijar evîndarî ye .

2.1.2.8.2. Lehengên Kilamê

Leheng tune ye.

2.1.2.8.3. Naveroka Kilamê

Pesindayîna law û keçikê bi hev re ne. Dilxwezî ewe ku bigihîjin hev. Xort keçikê bi Dîlber nav dike û behsa bejna keçikê û liber kirina cil û berga dike. Keçik jî dildarê xwe bi bejna bilind, enya kever û simbêla reş terîf dike.

2.1.2.8.4. Teşeya Kilamê

Teşeya vê berhemê li ser çar benda ne. Sisê sisê - çar çar hûnandiye.

2.1.2.8.5. Nirxandina Kilamê

Ev strana jî ji aliyê gelek dengbêjên Serhedê ve hatiye stran. Hozan dîlbera xwe bi neqşa zêr û bi şarê Diyarbekrê dipesînîne. Keçik bi devê xort, xort jî bi gotinên keçikê dide naskirin.

Di vê kilamê de dengbêj Ahmedê Alîksan wek gelemperiya dengbêjan di vê kilamê de şibandinên bedenî bi kar tîne. Di guhdarkira kilamên dengbêjan de xuyankirina di van têgehên wê de tiştê siruştî tê hesêp. Guhdaran jî vena di nav taybetmendiya hûnerê de guhdar dikin.

Lê Dîlberê

Lê lê dîlber errrrr yaayaa yaa dîlber

Heyran mi go te ra yaê yaê yaê yaêêê lê sed car te ra

Malî xirabê were cote şarê Diyarbekir îro ser qolê zêra re bernede yaê yaê di ber hevra

Mala te şewityê çima tu nizanî ez ji malê dinê kasibim ji nefsa xwe tenikim feqîrim

Ez dimirim dihelim ji bejna te yetope lo gilover re yaê yaê yaê

Ax waê dîlber firarim dîlber yaê yaê

Kuro mi go fistanê li dîlbera yaê yaê mi yaê yaê belek e yaê yaê yaê yaê

Malî xirabê were jidor navikê ber bihara heta çiftê zer memika yaê lê mi ra veke yaê

Mal şewityê çima tu nizanî qanûna meya teze ramûsanê qîza û bûka mi re kirine yasax
du diran ji devê ketine şevê payîza ne kanûn e dirêj bira devê min nava çifte zer memikê
te da li mitaleke

Yaêwaê dîlber firarim dîlber

Lê lê dîne çemê gundê yaê yaê yaê lê me şirîne yaê yaê yaê

Malî xirabê lêpa ortê tê lêpa pêşîn dixîne yaê yaê yaê

Malî xirabê lêpa paşîn ji kêfê re tê yaê yaê yaê lê kelogirîn e yaê yaê yaê

Belkî Xwedê serê sebeba fesadê gundê me re qebûl neke qe hilnede

Du dil ça di rezîlê gunda de hebe yek here qurbetê yek bimîne nahêle birayo yaê yaê yaê
têr hev bibîne

Ax li min yaê yaê yaê xirabo gundo wao waêê êêêêê

Kuro mi go derê mala bavê gewrêya yaê yaê yaê lê mi bi tirî yaê yaê yaê

Mi dîna xwe didayê gewrê digo gede lawkê mi hatibû derê mala bavê êê lê da bihurî

Hûn dî û bala xwe bidinê tirpana ser milê gede lawkê tena kiras û derpê patisqeye lê
çivîkirye

Heke hûn sîwala gede lawkê min ji mi dîkin ji we re bêjim yekî bejn bilindî 'enî kever
simbêl reşî rû bixurî gundîno yaêêêêêêêê

2.1.2.9. Limin Siwaro

2.1.2.9.1. Mijara Kilamê

Mijar evîndarî ye.

2.1.2.9.2. Lehengên Kilamê

Leheng tune ye.

2.1.2.9.3. Naveroka Kilamê

Keçik kêmasiyê tîne ziman û di vê bêçaretiyê de rê û risma nîşanê dilketiyê xwe dixê. Ji bo birîna dilê xwe li dermanan digere.

2.1.2.9.4. Teşeya Kilamê

Behrem sê beş in. Bend di navbera şeş û hefta de ne. Çeşnê edebî kilam e.

2.1.2.9.5. Nirxandina Kilamê

Gelek dengbêjan ev kilam straye. Ev behrem ya kî ye em nizanin. Lê hakimiyeta hozaniyê heye. Dengbêj Ahmed ev kilam bi terzê xwe gotiye.

Di nava kilamê de gelek şibandin hene. Keçikê wekhandiye werdek, xezal, masî hwd. Vê berhemê bi pîvanên wêjeyî bi awayekî serkeftî bi kar tîne. Dengbêj di vir de hûnera xwe derdixê pêş. Hûnera gelek serkeftî nîşanê me daye.

Li Min Siwaro

Saro qurban min go ez ne xezal im êêêê herêm çolê êêê li min siwaro

Birawo ez ne werdek im êêêêê herêm golê êêêêêê li min siwaroo

Keko ez ne mesî me ji bona lawukê xwe werim torê êêêê li min siwarê

Kuro çika qîz û bûkê gundê me hene ez ê bînîm di kavilê û dêrizê xirabê gundê me de

Ji bona lawêkê xwe tême hazirêêêêê li min siwaro êêêê

Kuro malxirabo ez ê destê gede lawukê bigrim berî wî bidim Gazîentabê êêêêê û anedolê li min siwaro

Ez ê yazîkî yazmişkim lê heftê du derga belakim bişînim her çar dergê vê Stembolê li min siwaro

Belkî Rebê alemê biqedîne mirazê mirazxwaza ometa Mihemed(s) ser îmana axret û
Quranê mirazê me tevayî heke ku tunebe ez ê ji bona lavkê xwe dîn û harbim eeeee
bikevme çolê li min siwaro wûf wûf wûf wûf wûf wûf

Ax li min siwaro êêêê li min siwaro birîndara te me

Lo lo siwaro ez bi qurban min go ne li vê me ne li wê me êêêê li min siwaro êêêê

Kuro malxirabo ez ê tavîke stêrkeke geşim li ser Mekê êê Medîne me êê li min siwaro ê

Ez peloteke evrê reş û tarî êêê ser qulbê me wîêêêê êêêê li min siwaro êêêê

Ez tavîke berfê û baranê xîmê û xeyalê wî êêêê tevî bê me eeee êêêê li min siwaro êêêê

Ez ê bi ser kum û kolozê êêêêê lawê xelkê hema kolozê lewkê xwe da bê me êêêê li min
siwaro êêêê

Ez ê jorê hêviya mîrê mîra kana keremê rihma xwedê sekînîme li jêrê para xortê xwe yê
çê me êêêê li min siwaro êêêê

Li min siwaro êêêê birîndara te me êêêê siwaro êêêê

Ax li min siwaro êêêê li min siwaro birîndara te me

Lo lo siwarê qurban diçûm Diyarbekir fena cara êêêê li min siwaro êêêê

Kuro çiyayê Elîpala binhêre rîknê dara êêêêêêêê êêêê li min siwaro êêêê

Malxirabo li Erzormê mêzeke şukir ji rihma xwedê li minara êêêê li min siwaro êêêê

Kuro lo malxirabo li çiyayê Dêrika mazî mêzekim bejn bilinda Elîpalo kofî xara êêêê li
min siwaro êêêê

Kuro malxirabo li deysta Sirûcê bala xwe bidnê wele qîrçîn ye peya êêêê refê siyara êêê
li min siwaro êêêê

Malxirabo derbasbe binê xetê mala Haco li firara êêêê li min siwaro êêêê

Malşewîtyo îro mi dêna xwe didayê tê dibêje wêle wêle ser bi reşa li ser milê xwe zivirî
tê nalîne êêêêê birîndara êêêêê êêêê li min siwaro êêêê

Belkî Rebê alema biqedîne mirazê mirazxwaza êêêêê ometa Mihemed(s) ser îman û
axretê di Quranê

Mirazê min lawkê min tevayî biqedîne nav hevala êê li min siwaro êê ax li min siwaro .

2.1.2.10. Lorî Lorî

2.1.2.10.1. Mijara Kilamê

Mijar civakî û evîndarî ye.

2.1.2.10.2. Lehengên Kilamê

Leheng xuya nake

2.1.2.10.3. Naveroka Kilamê

Ji ber feqîrî û xîzaniyê dûr hev ketina evîndaran hatiye gotin. Hesret mayîna herduya dihûne.

2.1.2.10.4. Teşeya Kilamê

Çeşnê edebî yê berhemê lawêj e.

2.1.2.10.5. Nirxandina Kilamê

Helbesteke civakî ye. Pergala helbestê bi serwa ye. Teşeya berhemê em nikarin bi sînokînin. Dengbêjê me ziman û şêweya strana Genç Xelîl bi kar aniye. Wek stranê din ev stran jî awaza dengbêja ne.

Di hin rêza de gotinên keçikê jî dixûyê. Lê giranî bi peyvên di dev û lêvê lawuk de dirêje û pesnê delaliya dildara xwe dide.

Lorî Lorî

Lê lê dînê îşev şeve eee haê haê li şev baranaaa haê haê

Lê lê bedewê tê bala xwe bidê îro devê te dikan e,

Diranê te hîba mircan e, çavê te leylan e

Pozê te ji nîklê kewan e, tilî û pêçiyê te mûm û şemdan e

Lêvê te kaxizê ser masa ne,

Zimanê te hubra qelema ne,

Enya te medyan e, singê te zozan e

Mînanê zozanê ber û çiya ne

Hûn dibêjin çawa mor û îmza bîst û çar duwalê ecnebiya pêva ne
 Bira bixe dîn îmanê Xwede re şevê payîzane kanûn e
 Dilê şevê nava çifte zer memikê te taxima sing û berê te bibûma mivan e
 Mala te şewityê bira bixwezil dîn û îmana Xwedê re hakimekî adil rabiya binvîsiya halê
 dilê feqîr û fiqara û belengaza û sitûxara îro halê minê êê me herduyanee ax lorêê lorêêê
 Birayo lorî dikim lorî nayêêê
 Keko dergûşa milê min lawîne dikim nakim nahewînim gede lewkê min ne li mal e
 Di rezîlê gunda de sebr û qinyaeta dilê xwe bikelîne lore lorê
 Lê lê dînê îşev şev e eee ax lê şevetirse lore lore ax lore lore waêê
 Bedewê îşev şev e, şevetirse tu bala xwe bidê
 Gede lawikê min dike sibê siwarbe berê xwe bide welatê xerîb û qurbetê
 Ez ê xizêma pozê xwe ji hespê gede lawikê xwe re têxim bizmar e
 Guharê guhê ji hespê gede lawkê xwe re têxim nal e
 Reş keziyê xwe ji hespê gede lewkê xwe re têxim dorhewsar e
 Qîmeta guharê guhên min xizêma pozê min nizanin sade zîvê qulpe êê lore lore
 Bira xwezil dîn û îmana Xwedê re hakimekî adil rabiya binivîsiya halê dilê feqîr û
 fiqara û belengaza û stûxarali halê dilê me herduya bipirsiyaaaaaaa lore lore
 Birayo lorî dikim lorî nabeêê
 Dergûşa min milê min lawîne dikim nakim nahewîne gede lawkê min nelmale
 Di kavil û rezîlê gunda de şevê payîzane kanûne sebra dilê lê xwe bikelîne lore loreee

2.1.2.11. Mûso Mere

2.1.2.11.1. Mijara Kilamê

Mijar civakî û evînî ye.

2.1.2.11.2. Lehengên Kilamê

Mûso, Beyaz

2.1.2.11.3. Naveroka Kilamê

Mûso guh nade liberabûnê Beyazê û Beyazê direvîne. Rêda rastî birayên Beyazê tîn û Mûso Beyazê dihêle û direve. Beyaz tenê dimîne û pey Mûso dibêje min gote te jî niha mi nerevîne madem te ez revandim soz qewlê mêrantiyê wiha nîne. Ku tuyê birevî çekekî bide min, ez ê ji bo dilketiyê xwe ji mala bavê xwe mêra bikujim. Sedeqeta Beyazê serekeyê mijara kilamê ye.

2.1.2.11.4. Teşeya Kilamê

Teşeya berhemê wek çar benda peyra dîsgotin pêva ye. Kilameke bi serwa ye.

2.1.2.11.5. Nirxandina Kilamê

Beyaz piştî ku dide pey Mûso direve kilam dest pê dike. Hûnerên gotinanda serkeftina hozaniyê dixuyê. Wekandina Dewrêşê Evdî, Hemê Mûsikî, Siyabendê Silêvî helandana Mûso ye. Dawetkirina Beyazê ya Mûso ji bêçaretiyê nîşan dide. Li hember hemû astengiyan jî keça Kurd sedeqeta xwe wenda nake.

Dengbêj Ahmed navê xwe jî di kilamê de kêleka navê din zikir dike. Navê ku dizikrîne mirovne gelek jîr in. Beyaz dibîne ku wesfê Mûso ji wan serekeyên eşîran gelekî dûr e. Di gotineke pêşiyana Kurda de ev rewş waha tê zimên “dilê tirsok bi singa gewr şa nabe”.

Mûso Mere

Were mere were mere were mere were mere loMûso mere

Kuro malxirabo were îşev destê min bigree lê ji xwe re biheree

Kuro malxirabo hewar dûr e eeeeeee lê gundî ker e eeeeeee

Kuro mal şewîtyo sibê destê min negre nerevîne pêşiya te cerde lo dû te şer e eeeee

Kuro malxirabo ez dizanim tu soytarî îja kê me kê livê rastê bihêle belkî ser dînê xwe
wegere

Lo Mûso were mere eee lo bext wa nîn e

Kuro lawolafa neke laf karê lo mêra nîn e

Kuro şewqe kum kolozê xarkirî ji nava lo kona nîn e

Lawo te digo ez wisa bûme yekî mina Hecî Necîbê Eyo

Li bajara Diyarbekir mêra dikuje heps û zîndan aşiqê lê tu nîn e

Kuro malxirabo te digo ez wisa bûme yekî mîna Huseynê Qazoskî

Xemsa Baxemsê lê hêlanê jorê sekinye mêra dikuje cinaza lo weldigerîne

Were mere lo hê êê lo sûtalo mere

Were mere lo bext newaye

Kuro malxirabo revê qîzê xelqê benzemîş* nabe şerê Elika lo Bekira ye

Malxirabo benzemîş nabe şerê Mihemedê Dewrêş bavê reîsê êla keçka heft bavê lo eşrê
ye

Birayo Beyaz dike nake emana xwe destê Mûso lavko cahilî nabîne

Mûso destê Beyazê digre ji nava kona wê royê direvîne

Bav û birê Beyazê pê dihisin, pey Beyazê û Mûso dikevên

Mûso dizvire bav û birê Beyazê gava dibîne direve, reva Beyazê lo disekine

Min dî Beyazê zivirî go Mûso mere lo were mere

Sûtalo min ji te re ne go destê min bigire lo ji xwe re bihere

*Benzemek: Şibandîn, Wekandin

Hey bê bextê kurê bêbexta min ji te re ne go hewar dûr e heyî lo gundî ker e
 Kuro min ji te re ne got îro destê min negre nerevîne min ji xwe re nebe li pêşiya te
 cerde lo dû te şere eee
 Îja lawo kê me kê li vê rastê bihêle belkî li ser dînê eeee lo xwe vegere
 Beyazê digo Mûso malxirabo malan daynî li zozana kuro şêniya danî lo guhê pirê
 Malxirabo malan daynî li zozana şêniya danî lo guhê pirê
 Kuro malxirabo ez dizanim tê birevî tu ji min porkurê re dayne lo şeşagirê
 Sûtalo tê birevî xwe bide qefa zinêr hafê hanêdêrêz divê mêzeke şerê lo xwîşk û birê
 Ez ê ji bona Mûskê xwe delalyê dilê xwe serkurê, xortê çarde salî, mêra ji mala bavê
 xwe bikujim cinaza holkim lo binê pirê
 Ax lo were mere lo sûtalo mere
 Lawo min ji te re ne got were destê min bigre ji xwe bihere hewar dûr e gundî ker e
 Kuro malxirabo min ji te re negot îro li pêşiya te cerde lo dû te şer e
 Îja lawo kê me kê li vê rastê bihile belkî li ser dînê lo xwe vegere
 Beyazê digo Mûso malxirabo mala danî li zozana kuro şêniya danî lo devê avê
 Kuro malxirabo mala danî li zozana kuro şêniya danî lo devê avê
 Kuro malxirabo tu dûrbînê rast û çepê pêş çavê xwe bavê çar siwar siwarbûne ji eşîra lo
 mala bavê
 Wey sûtalê kurê sûtala
 Kuro hemî tu direvî gula hewalî li ser milê lo xwe re bavê
 Kuro heke tu nasekîni ji tivingê ji demançê yekî lo ji mi re bavê
 Sûtalo lawo meriv kete îşekî da avê çî li çokê lo çî li navê
 Îja tu direvî xwe bide hafê hanê qefa zinarê lê mêzeke şerê lo qîz û bavê
 Ez ê ji bona Mûskê xwe delalyê dilê xwe xortê çade salî xort û genca mêra mala bavê
 xwe bikujim cinazê wana bime lo ber tavê
 Ax were mere lo were mere

Sûtalo min ji te re negot were destê min bigire ji xwe re birevîne bihere

Kuro hewar dût e gundî ker e

Kuro malxirabo min ji te re negot îro peşiya te cerde dû te şer e

Kuro malxirabo kê me kê li vê rastê bihile li ser dînê lo xwe vegere

Ax were mere sûtalo mere

Beyazê digo Mûso malxirabo mala danî li zozana kuro şênîya danî lo ber vî girî

Kuro avirê çava îşaretê desta îro ber hevra derbas dibûn di nav kona da bejna min ji te re dixemilî dinitirî

Kuro teji mînanî Ahmedê dengbêj şewqî yê xar dikir ji ber çavê min gulîbirê digeriya

ji min wetrê tu Dewrêşê Şêx Evdî çiyayê Şengalê di nava hezar hevsid malê bavê Êzîdyâ de lo tu mêtirî

Kuro ji min wetrê Emer Axayê Şirîkî yê lo axatirî

Kuro ji min wetrê ji Îbrahîm Begê camirtirî

Kuro malxirabo ji min wetrê ji Hemê Mûsekê tu siwartirî

Kuro malxirabo ji min wetrê ji Siyahmedê Silê şivantirî

Mî nizan bû tu him vîrekî him quldirî

Mî n qey go tu rojekî bişkokê mirinê li ser min vekî lawo li ser waêê min bimirî

Mûso malxirabo kuro were mere

Kuro min ji te re negot were destê min bigire îşev ji xwe re bihere hewar dût e gundî ker e

Mî n ji te re negot îro peşiya te cerde dû te şere

Sûtalê kurê sûtala min ji te re negot kê me kê li vê rastê bihile li ser dînê lo xwe vegere

Ax were mere sûtalo mere

2.1.2.12. Seyranê

2.1.2.12.1. Mijara Kilamê

Mijar civakî ye.

2.1.2.12.2. Lehengên Kilamê

Seyran

2.1.2.12.3. Naveroka Kilamê

Dan ber hevdana jina çê û jina kotî hûnandiye.

2.1.2.12.4. Teşeya Kilamê

Teşeya berhemê li ser du benda ne.

2.1.2.12.5. Nirxandina Kilamê

Pergala helbestê herema welatê Serhedê ye. Serkeftiya hêza hozaniyê di herdu beşa da jî dixuyê. Ramûsana xwe wekandiye tîr kebana Hz. Hemze (r.e.). Navê Elaşgirê, Karpalo, Xalyazê weke warê rind, bedew û başa daye nîşandin.

Dengbêjê me fananî kilamên xwe yê evînê yên din bi peyvên bijarte sipehiya jina çê derdixe pêş çav. Di vê kilamê de gavek pêş da diçe û başiyê girê dide esalatê. Evê jî bigotina “ewa qîza dîtyane” da nîşan dide. Jina kotî jî fenanî derdê bê derman resm dike. Ne ji jina kotî xilashûn heye ne jî çare.

Seyranê

Seyranêêêêêêêêêêêê

Minê li hafê Elaşgirê li kêrtê Kurda yaêêê waêêêêêê

Ax birayo minê li hapê Elaşgirê li kêrtê Kurda

Ezîz bira were emê siwarbin manegiya

Dizgînê manegiya jorda berde ji ser bijyan e

Mîn tere gola Elaşgirê li nava çîla û başa û bedewa li rinda li zerya.

Keko sibeye jinika çê heye siltan e emrê meriva roj û dane biqurbane

Meriv ne li mala xwe be bîst siyar lê bibe mivane

Li ber çavê wê du qurêş û deh perane

Ew a qîza dîtyane

Rûsipîka serê meryane waêêêêêê

Êê birayo jinêka kotî ne derde ne dermane

Rîşa pîşe dikeve hestiyê mêrikê misilmane

Ne tê kuştin ne tê berdane

Ne çêlekeke tu biherî meydana Qerekosê serê pira qorik firotanê bi dî çar qurîş û deh peran e

Jinika kotî cîsnê kurebeşka ne tu tû dikî qe nizane

Îja çiqas dikutî lê derman û şifan e wayêê wayêê wayêê wayêê

Lê Seyranêê minê li hafê Elaşgirê li kêrtê Kurda lê temaşe kir

Qîzê begê waêê cihan bega Karpalo li Belukbaşî, Xaylazê xwe berdane gola Elaşgirtê lê keder û kesera dilê min û tere sor û zerkir

Minê di rezîl û dêrizê gundade îsal heft sale dilketiya xwe di nav de naskir.

Minê ramûsanekî taxima sing û berê ara çepîê erebî çena qurtisî çav û biriyê belek tevqe dikir

Ramûsana min fenanî tîr kevana Hz. Hemze pelawanî can û bedena wê eserkir waêê

2.1.2.13. Yar Felek

2.1.2.13.1. Mijara Kilamê

Mijar qasîde ye.

2.1.2.13.2. Lehengên Kilamê

Şêx Ewdila

2.1.2.13.3. Naveroka Kilamê

Naverok olî ye lê dengbêjê me li gorî xwe behsa zerîkî dike. Li gorî xwe rewş daye kilamê. Motifên îslamî li pêş in. Ev li ser Şêx Seîdê Palo hatiye strandin.

2.1.2.13.4. Teşeya Kilamê

Teşeya nezmê serbest e.

2.1.2.13.5. Nirxandina Kilamê

Li gor hemanên berhemê qesîde ye, bi dewrêşkî dibêje. Em nizanin xwediyê vê berhemê kî ye. Gelek dengbêj dibêjin ji wan yek jî Dengbêj Şakiro ye. Ji ber eşqa şêx ku dibêje dermanê birîna te tune ye dengbêjê me di dawîya stranê de bi gihandina espehî kî bi dawî kiriye.

Kilama Şêx Seîd e lê behsa şêxên din jî dike. Her yekî bi cî û keseyetiya wan cuda cuda kiriye. Astengiyan hin rêza de aniye ziman.

“Ez bi qurbana te me dem û dewrana te me min go çiya bilind bû ez pê ketim

Kuro gelî kûr bû ez hedî hedî pê de daketim

Min dî xewka malê xirab zor da min serê xwe danî ser kevira ez raketim

Min nizanî bû di mirinê de malê xirab hespê boz e dewî deynê min kir

Feleka malîxirab ser min re sekinî go qelbo hişyare dilo rezîlo hela serê xwe bilinke te ji wê xewa hanê çi başer kir” rewşa dijwar di nav peyvan de veşartîye.

Piroziya şêxan û şexsiyetên oldar ê di nav kurda de bi şêwazeke xurt aniye zimên.

Yar Felek

Yar felekkk

Ez bi qurbana te me dem û devrana te me

Min go gemî çûne mane kelek

Însan çûne mane kelek

Xelqê da mal û hal û temelê dinya yê pir û gelek

Min ewdalê Xwedê, Xwedê tu ber duayê wî ya xî min ê winda kirî di dirêz û xirabê gunda de Şêx Ewdila şêxê min e bejna zirav çavê belek yar felek

Yar yar felek

Ez bi qurbana te me dem û dewrana te me

Min go çiya bilind bû ez pê ketim

Kuro gelfî kûr bû ez hedî hedî pê de daketim

Min dî xewka malê xirab zor da min serê xwe danî ser kevira ez raketim

Min nizanî bû di mirinê de malê xirab hespê boz e dewî deynê min kir

Feleka malîxirab ser min re sekinî go qelbo hişyare dilo rezîlo hela serê xwe bilinke te ji wê xewa hanê çî başer kir

Go hey Malxirab re dibêje te ji vê xewa hanê çî başer kir

Te hê Rebê alemê ferze mijê meha rojiyê para te nekir

Hevale tamam dinya xwe deyişmişkir* terka tekir

Yar felek. Ez bi qurbana te me çiyayê bilind belekîne

Kevirê mezin di ber de qedîmîne

Di bîniya me de Qazgol û Bîngol û Şerefdîne

Di fêza me de zozanê mala seydayê qedîmî ne

Êleke Xinûsê Kewa Qadî Obayê hatine li cotkaniya danîne

Wîmîmî Hatine li cotkaniya danîne

*Deyişmiş: Guhurî

Borinyê mîhanin li ser deleva sekinîne
 Kamil bira sibe bû wîfînyê civîka re
 Devkilê dewkila re
 Dest berdê lo lepka re
 Bi azan xwendina mela re
 Hokînya şivan û gavanê serê çiya re
 Zerîkî bi çûyîna qazê bi meşa werdekê bi efracê temîzbi xulkê şîrîn bi dev û diranê
 şekirîhatî meşmeş kiriye bi derê me re
 Wextê derbasbiye espehî ye gulê bibine awêrek li min daye li min bûye sê sed û şêst şeş
 elem û birîne
 Yar yar felekkk. Li min bûye sê sed û şêst şeş elem û birîne
 Min berê xwe di da merkeza Diyarbekir şehrekî pir ezîz û pir şîrîne
 Min dîna xwe di dayê dixtor û tebîb tamam tê de sekinîne
 Birayo tamamî hevciwîne tamam dixtorê ecnebîne
 Temamî tarîqe rehbercîne
 Ez hatîm ber mi'ana min dî dixtorek ber lêva xwe de kenîya go lawo dermanê te bal min
 tunîne wêêêê
 Here ser şêx û ziyareta bigere dermanekî ji xwe re bibine yar felek
 Kamil bira min xwe avît ocaxa kekê Şêx Bahadîn e
 Ez ji wê derê derbas bûme Şêrwêranê min xwe avît ser merqeda bavê Şêx Zeynel
 Abîdîn e
 Ez ji wira derbas bûme min xwe avît ser merqeda Şêx Bekrê Soratê mer kiriye qamçîne
 Bira ew jî dîleka me bike ji Rebê alemîne
 Kamil bira min xwe avîte ser merqeda Şêx Abdilqadirê Geylanî ser tacê kulî ewliyane
 ewliyayê serê çaryar ê dimîne
 Lo bira min xwe avîte ser merqeda Şêx Ewdilhekîm li Qesrokê dimîne

Ez ji wê derê derbasbûme ser merqeda Şêxê Xirtê, min avît ser merqeda Şêxê Xirtê li Xirtê dimîne

Ez ji wê derê derbasbûm min xwe avît Şêx Îbrahîmê çavhêşîne

Kamil biraaa ez ji wê dere derbasbûm min xwe avît ser merqeda Şêxê Çoxreşê li Çoxreşê dimîne

Ez ji wê derê derbasbûm min xwe avît ser merqeda bavê Şêx Cesîm Efendî di nava şêxa de şêxekî Gule bibîne

Lo biraa ez ji wê derê derbas bûm min xwe avît ser merqeda Hecî Heyderê Kêrsê

Min ne dî bû digotin wextê goştê wî bi goştê fila re dikirin sitîla dikelandin valayê erdê dikirim dibû zare zara hestiya dîsa digeriya meydanê hev dibîne

Ez ji wê derê derbasdibûm li Bitlîsê min xwe avît ser merqeda Weysil Qeraniyê çolê

Destebirakê Hz. Resûllahe min dî go yawrim were derde xwe ji me re bêje binirxîne

Min go rihê min bi qurbana we be, duh we çava

Wîtnyê civîka re

Devkilê dewkila re

Dest berdê lo lepka re

Bi azan xwendina mela re

Hokinya şivan û gavanê serê çiya re

Bi çûyîna qazê bi meşa werdekê bi qavqavkê Diyarbekir

Bi ku dîkê Şamê bi fistanê Helebê bikirasê melekê

Zerfî hatiye derê min re derbasbûye dibêje çava espehî guleke li min daye

Li min bûye sê sed û şêst û şeş elem û birîne

Min dî go yawrim me te dua kirye, duayê me qebûl biye li bal Rebê jorîne

Dayka me ma here bi ûsila eşîrê bi şer'ane nebî Mihemed bi qewlê xwedê bi hedîsa pixember

Ewê espehiyê ji xwe re bibîne yar felek

2.1.2.14. Zerya

2.1.2.14.1. Mijara Kilamê

Mijar evîn e.

2.1.2.14.2. Lehengên Kilamê

Zerya

2.1.2.14.3. Naveroka Kilamê

Eşqa xwe tîne zimên û serfiraziya mêrê ku jinê wana baş û bedev vedibêje.

2.1.2.14.4. Teşeya Kilamê

Teşeyê stranê çar pencîn e. Çeşnê edebî kilam e.

2.1.2.14.5. Nirxandina Kilamê

Li ser sê beşa hatiye stran. Hemanên naverokê evîn e. Ziman û şêwaz serkeftî ye, hakimî ye, hozaniyeke balkêş e. Her sê beşan da bi destpêk bi dubarekirina rêza ewil bengîtiya xwe dide nîşan. Dawiya beşan da dîsgotin ji rawekirina naverokê nîşan dide. Asta edebî di kilamê de bilinde.

Di vê kilamê de hêmanên şîrên satîrîk xûya dike. Dengbêj serfiraziya xwastina jina çê bi zîrekî tîne ziman. Bi karanîna vegotiniyê di hişê mirov de nexş dike.

Zerya

Zeryê Qurban Kosedax bişewite mîrê çiya

Lê wax hey wayê êêêêêê lê yê wayê lê yê hey wayê

Zeryê qurban Kosedax bişewite mîrê çiya

Birayo mi dêna xwe didayê sibe ye sê qewl neşûşt gundê me derdiket

Berê xwe didane bin darûkê guhira berxa beriya mîha

‘Ezîz bira dî û bala xwe bidê qefla peşiyê qefla qîzê bakîre* ne

Qewla ortê qewla porkurê jine biyana ne

*Bakire: ezeb

Qewla dawiyê qewla bûka ne
 Bêdil mêrkirine lûve lûvê wane
 Li ser hevda digiriyan
 Mi go xayîngno li vê derê qûsûra mi mêze nekin ez jî mîna we bêdil zewîcîme
 Werin emê bi destê hevdu bigirin herin nava dikana kefenê xwe bibirin
 Qazme kurekê xwe hildin bi çavê hêsir qelbê şikestî
 Îro herne nava merzelê li miriya
 Wax lê hey wayêê dê yê hey wayê lê lê hey wayêêê
 Birayo derdê dilê mi giran e kula dilê mi kûr e
 Derdê bejna zirav ji dilê mi dernayê lê lê mi dernayê wayêê
 Zeryê qurban zozanê bilind bişewute zozanê me ne
 Lê hey wayêêê lê yê
 Birayo zozanê bilind bişewute zozanê me ne
 Dewsa wan de li çavkanya derê kendala, derê newala tamam bêbavê dewsa laqirdiyê
 min û te ne
 Eger tu înkarkî li wê dinê li ber serê pira selawatê li ber tereziya xêr û guna li huzura
 Rebilalemîn
 Bêbavê çima tu nizanî qelama ezeli lê ketiye kevirê warge tamam şahidê min û te ne
 Zeryê hey wayêêê lê yê wayê lê yê wayê lê yê wayê
 Birayo derdê dilê mi giran e kula dilê mi kûr e
 Derdê çav û biryê belek ji dilê mi dernayê hê hê mi dernayê wayêêêê
 Zeryê qurban ji Şam û Helebê berjêr bû go goveka dinê Beyrût e
 Berê berê da tarîx e, gotinê mezina ne, ayata Quranê, nexşê kevira ne
 Heçî kesê jinê wane rind e
 Pozê wan quloz e
 Şewqê wana tîk e

Mînanî tucarekî sermiyanê wî ji kîsê wî be

Nava hevala sekînye piyê xwe ser hev re avîtye serfiraz e hût e

Heçî kesê jinê wana kotî û pîs be

Mînanî bibêje çawa îro şewqiyê nav çavada ne

Xîtik bêfilê ketiye mînanî tucarekî sermiyanê wî ji kîsê hevala be

Çavê wî yan destê hevala ne nav hevala sekînye stûxwar û belengaz û rût e

Bêbavê îsal heft salê mi tamam bû ez ê bi şivanyê bi belengazyê stûxaryê ez ketime dû
te

Heyla bêbavê li nava pel û pincarê li karişê qîz û bûkê hevalê te

Nikarim van kelîmê hanê tamam bidim rû te

Zeryê hey wayêêê lê yê wayê lê yê wayê lê yê wayê

Birayo derdê dilê mi giran e kula dilê mi kûr e

Derdê çav û biryê belek ji dilê mi dernayê lê lê mi dernayê wayêêêê

2.1.2.15. Ferzê û Hekarî

2.1.2.15.1. Mijara Kilamê

Mijar lawêj e, çîrok û mêrxasiya Sedûn û Hekarî dirêse.

2.1.2.15.2. Lehengên Kilamê

Ferzê, Hekarî, Sedûn

2.1.2.15.3. Naveroka Kilamê

Qehremaniya Sedûn û Hekarî û bi darê zorê birina Ferzê di hundirîne. Bozbeğ jî ji bo namûsa destebirakê xwe bi lehengên êla xwe yê bi jare ve diçe şer û dîl tê girtin. Bi qehremaniya Sedûn û Hekarî Ferzê û Bozbeğ ji destê kurê Şêxê Mûseka xilas dibe.

2.1.2.15.4. Teşeya Kilamê

Teşeya nezmê serbest e.

2.1.2.15.5. Nirxandina Kilamê

Gotineke şarezaye, hostatiya hozaniyê nîşan dide. Her dengbêj kilamên çîrokî nikarin wek kilam tenê pêk bînin. Lê Dengbêj Ahmed hostatiyeke bi hêz derdixê pêş. Ev berhem him çîrokî him jî kilamkî hatiye gotin. Di dengbêjiyê de ev vegotina xweşhunerî ye. Belkî pêlek jî nirxandina dengbêjan jî ev be.

Di kevneşopiya Kurdan de çîrokên ku bi kilamkî hatine gotin pirin. Wek mînak; Heso û Nazê, Xezala Mendol Axa, Senem Xanim, Siyabend û Xecê, Ker û Kulik û hwd. Lê vegotina van hostatî dixwaze. Dengbêj Ahmedê Alîksan bi “Ferzê û Hekarî” ve xweş hostatiya xwe derxistiye pêş.

Di nav hêmanên kilamê de evîn heye, keseyatiyên dîrokî hene û lehengên çeleng hene. Di vê berhemê de taybetiyên şîrên him lîrîk, him epîk, him jî satîrîk hene.

Ferzê û Hekarî*

Carekî ji caran rehmet li dê û bavê guhdaran.

Go: wextekî du bira hebûn. Navê yekî Bol Beg bû, navê yekî jî Çol Beg bû. Go du hev bira bûn.

*Berhevkar Sîpanî

Go: emrê mutealî, zarên Bol Begê tunebûn. Go zarên Çol Begê kurekî wî hebû navê vî Sedûn bû.

Go: wexta emrê wana û kulfetê wan bû çil salî go emrê îlahî kulfetê herduya bihemle man. Go rojekî Bol Begê gote Çol Begê go bira were emê tiştêkî ji hev re bêjin. Go emê soz û peymanekî bidine hevdu. Soz û qewlê Pêxember. Jina min qîz anî jina te kur anî ez ê qîza xwe bidime kurê te. Yan jî jina min kur anî jina te qîz anî tu qîza xwe bidî kurê min. Go: bira be. Go qewlê wî çaxî soz be, sened be dane hev. Di nava xwe de qeyd û senedek çêkirin go emrê mutealî go çend sal di navbera wande derbasbû. Go îcar kulfetê wana razan. Jina Çol Begê raza qîz anî go jina Bol Begê jî raza kur anî. Navê keçikê danîne Ferzê navê gende danîne Hekarî. Go îcar Ferzê bû xwişka Sedûn. Go çend sal di navbera wan de derbas bû. Go emrê îlahî go dê û bavê wan her û duyan jî mirin. Go emrê wana bû şanzde û hevde salî. Go ku emrê wan gihîşte şanzde û hevde sala go Ferzê dêna xwe dayê ku her kes deweta xwe dike. Bi mirazê xwe şa dibe. Hekariyê kurapê wê ne tiştêkî dibêje ne diaxive. Ne dibê qîzap tu dergistiya minî, yan ez dergistiyê te me tiştêkî nabêje. Rojekî xwe bi qesta bêriyê wextê ku elbêkî davê milê xwe, dêna xwe didê ku wê Hekarî ji wêda tê. Jê ra kilamekî dibêje.

De bira bêje ka çi dibêje:

Ha hî ha hîde lo lo de lo lo

Mi dî Ferzê digo de lo lo de lo lo

Hekarî kurapo serê mi dêşê dilê mi liyane

Malxirabo salê me ketine hejdeh ne

Xelqê hemî def û dewatê xwe kirine, ez û tu di nava êl û eşîrê de mane

Malxirabo dewata xwe bike, şevêkî li nava taxima sing û berê mi bibe mêvan e

De lo lo de lo lo de lo lo de lo lo Hekarî de lo lo

Bira Hekarî bizivire. Jê re bêje ka çi dibêje:

Mi dî Hekarî di go de lê lê de lo lê

Ferzê qîzapê dilê mi liyan e
Mala te şewitîyê ji êl û eşîra kuştine hêsîrekî minê di nav hêsîran e
Kuştine xulamêkî minê di binê sebetane.
Ez hetanî dernexim heyfa hêstîrê di nav hêstîrane
Xulamê di binê sepetane
Tu carî nava taxîma sing û berê qîzapa xwe nabim mêvan e
De lê lê de lê lê de lê lê de Ferzê.

Bira Ferzê bizivire ku bersîva wî bide ka çi dibêje:

Mi dî Ferzê di go de lo lo de lo lo
Hekarî kurapo serê mi dêşe dilê mi liyane
Mala te xirabe nebêje van gilî û gotinê hanê
Mi hetanî nihaka eva kelîma hanê ne bihîstine ji nav dev û diranane
Malxirabo were dernexe heyfa hêstîrê di nav hêstîrane dernexe heyfa xulamê li
bin sepetane
Xelq tamam bi mirazê xwe şa bûn ez û tu mane
Were deweta xwe bike li nava taxîma sing û berê qîzapa xwe bibe mêvan e
De lo lo de lo lo de lo lo de lo lo Hekarî
Hekarî ha Hekarî te liserî kefî bi egalî
Têyê bi şûr û bi mertalî
Bira bixe dîn û îmanê Xwedê re
Mi rojekî ji te re bigota Hekarî malxê
Te ji mi re bi gota Ferzê tu bermalî
De lo lo de lo lo de lo lo de lo lo Hekarî

Dibê evana yanî Sedûn û Hekarî destê wan naçe ku lêxin miletê xwe bikujin. Heyfa herdu merivê xwe derxin. Piştî vê êl û eşîra wana destê wana naçê ku bikujin. Radibin malê xwe bar dikin. Diçine deşta Surûcê li hêsiya Kor Mulûkê deşta Surûcê datînin.

Em bêjin eger salek, eger du sal, eger sê sal derbast dibe, rojekî Sedûn dibêje Hekarî: Dibê kurap îsal sê sal çar salê me ye; em hatine li hêsiya Kor Mulukê deşta Surûcê me daniye. Binê ewqas êrxiyê me, devê me, revoyê me, pezê me, kerf û sûriyê me li erdê wiya diçêre; dibê rojekî tenezul nekiriye negotiye eva pênc quriş, hûnê heqê erdê min bidin. Îja ew însaniyeta ku bi me re kiriye mala te nekeve! Qe ne be îjar em jî hema rojekî ewî bi eşîra wî ve tekîfkin weyne mala xwe. Pariyek nanê me bira bixwe. Ser çavê mere hatiye. Dibê kurap tu dizanî ne jin e mala min da were here bi xwîşka te re dergîstî me ew jî di mala tede ne. Ne diya min e ne bavê min e. Esasî ewe ku tu hezbikî ez dikarim gazîkim. Evana rabûn Kor Mulûkê deşta Surûcê tekîfê mala xwe kirin. Kor Mulûkê deşta Surûcê radibe qedere çil siyarî dide ser xwe. Diçin li konê Sedûn Hekarî peyadibin. Ezet û hurmet îkram. Sitîla kuç dikin. Sê çar heb hogeça davêjine erdê serjêdikin, qeliyê çêdikin nan dixwun. Kor Mulûkê deşta Surûcê dêna xwe didê qîzek xizmet dike, diçe û tê. Kul bikeve mala bavê qîzê. Mînanî lokiza kurê Heci Betal Begê wisa vêdikeve. Gava çav pê dikeve; bi dilekî na bi bîst û heft dila dihebîne. Aqil diçe sewda dimîne. Hema ker radibe. Wextê ku xatirê xwe dixwazin tene cihê xwe. Wextê dikeve nêzika esrê dibê wele ez ê çend heb rîsîpiyê xwe bişînime cem Sedûn û Hekarî bira vê keçikê bidine min. Radibe çend heb rîsîpiyê xwe dişîne mala Sadûn. Dibên: “qurban em hatine bi usûla eşîrê bi şer’a Nebî Muhemed.(s) Em hatine xwîşka te ji Kor Mulûkê deşta Surûcê re bixwazin.” Dibê: “gerî hûn li qusûra min nehêrin. Ez li cem we camêra û Xwedê rûreşim. Lêbelê eva xwîşka min bi Hekarî ye kurapê min re dergîstî ye. Hela hê diya min amojna min bihemle bûne. Apê min û bavê min nav hevda çêkirinê eva jî seneda wane. Eva qewlê hanê danîne nava xwe. Niha Hekarî dergîstiyê Ferzêye. Ê dibê: qurban wexta ku dergîstiya Hekarî ye emê çawa rabin jina xelqê bixwazin. Radibin diçine cem Kor Mulûkê deşta Surûcê. Ji Kor Mulûkê deşta Surûcê re ku dibêjin. Kor Mulûkê Deşta Surûcê dibê ew li Xwedê li vî canî. Ez rojekî çend heb siyara siyardîkim dişînim serê herdukan jî didime lêxistinê Ferzê ji xwe re hildidim tinîm têm. De îjar Xwedê kêmasiya fesada bide. Wextê ku eva

wisa dibêje. Pîrek xwe ji binîva digihîne Ferzê dibê Xwedê mala bavê şewitîyê wele Kor Mulûkê deysta Surûcê plana kuştina birayê te û kurapê te kiriye. Yê herduyan bikujin. Te jî bîzorê kaşkin hildin biherin. Eva wextê ku pîrê wisa ji Ferzê re dibêje Ferzê ji cî radibe ser darê linga. Xwe digihîne derê çadira* Hekarî bira ji Hekarî re bendekî, kilamki bibêje. Ka çi dibêje:

Mi dî Ferzê di go de lo lo lo de lo lo

Hekarî kurapo sibeye serê min dêşê dilê min ji dilanê dîn e

Mala te şewîtyo xebera te jî kuştina te tunî ne

Kor Mulûkê deşta Surûcê pilana kuştina we her du zilama danîne

Yê we her du zilama bikuje

Ferzê stûxwar û belengaz dîl jê ra bimîne

De lo de lo lo lo de lo de lo lo lo lo Hekarî

Birano dilê min ji dilanê dîn e

Wextê van kelima ji Hekarî re dibêje dizikrîne

Hekarî tevî kofikê dikişîne

Ha ji kuştin û mirina xwe tu nîn e

Ha ji bayê felekê tunîn e

Minanî devê girgîn e

Mi dî Ferzê zivirî derê kon:

Bi sê denga li Sedûnê birayê xwe kire qêrîn e

Go Sedûn bira were serê xwîşka xwe bihere

Li dora lingê xwe bigerîne

*Çadir: kon

Malxirabo Kor Mulûkê deşta Surûcê
 Pilana kuştina we herdu zilama danîne
 Yê we bikujin Ferzê jê ra hêsîr û dîl bimîne
 De tu rabe li xulam û xizmetkara re bike qêrîne
 Deva tûlî qantira sultanî bîne
 Çît û perda li erdê bixîne
 Li server da bisimîne
 Li ser pişta deva, qantira, tulî sultanî bişidîne
 Revoyê manegiya li pêşiyê
 Qeyterê deva bipeyxîne
 Sibeye nebêje subeye êvare nebêje êvare
 Çar roj çar şeva bajo li hîmê binê beriyê
 Li hêşya konê axakî daynîne
 Çend sala lezetê û afiyetê ji canê xwe bibîne
 De lo lo lo lo de lo lo lo lo
 Ax de lo lo lo de lo lo lo
 Mi di Ferzê zivirî go Hekarî li min porkurê de lo lo lo

Birayo havîne germê bi ser me da kîn e kîn e
 Ku gava Sedûn evê kelîmê ji devê xwişka xwe hiltîne
 Radibe li xulam û xizmetkaran dike qêrîne
 Deva û tulî qaytira sultanî tîne
 Çît û perda li erdê dixîne
 Di ser hevda disimîne
 Li ser pişta deva tulî qaytira sultanî dişidîne

Revoyê manegiya di pêşiyê dixîne
Qeyterê deva li pey dixîne
Sibe ye ne dibin sibe ye êvare ne dibêje êvare
Çar roj çar şeva dajo li hîmê binê beryê
Li hêşya konê Zor Temir Paşayê Mîrê Mila
Li ser kaniya Çermûkê datîne
De lo lo lo lo lo de lo lo

Birayo havîn e germê di ser me de kîn e kîn e
Êl û eşîra li zozana danîne
Zor Temir Paşayê Mîrê Mila dide misînê destmêjê
Derdikeve destnimêja sibê hilîne
Dêna xwe dayê du heb kona di hêşya wîda danîne
Mina mija rûezmîne
Qîzeke li dora kona dizvire hebinê kona dikişine
Serê mêrkutê wê çerxîn e
Birano serê singaye vizikîn e
Ku gava mirkut dizivrine jor da li sing dixîn e
Minanî ewrê nisanê li ser meriva da qirçîne teqin e reqîn û gurîn e
De lo lo de lo lo de lo lo lo
Ax de lo lo lo lol o de lo lo lo lo
Ferzê tu sebebî de lo lo

Mi dî Zor Temir Paşayê Mîrê Mila
Lez dike û dilezîne

Bi sê denga li navmalî kir qêrîne
 Go navmalî: lawo were serê min bibe li lingê xwe bigerîne
 Lez bike bilezîne xwe bi her konê hêşiyê re bigihîne
 Here dêna xwe bidê herdu kon mîna mija rûezmîne
 Bêje selama axayê min li te heye
 Gotiye heke mal delîsî* ne
 Ez ê bidimê li pêşiya min da bikinê aliş verişiyoy**
 Heke ewana sabiqelîne; ez ê efya wana derxim ji hukumeta derewîne
 Heke ewana ji bona min hatine danîne
 Bira konê xwe piçûkin çend sala di hêşiya minde bimîne
 Heke ewana kêf îçûn*** hatine danîne
 Bira konê xwe li ser kaniya çêrmûkê rakin
 Çavê min wana nebîne
 De lo lo lo de lo
 Wî de lo lo de lo Hekarî

Birano navmalî radibe lez dike dilezîne
 Mi dî gava davê çepela dihejîne
 Xwe li derê konê Sedûn re digihîne
 Dîna xwe dayê sibeye Sedûn derê konê xwe pêgermokê digerîne
 Go selama axayê min li te heye
 Go heke mal delîsî ne ez ê bidimê malê dinê
 Bira çend sala bikine aliş û verişêyo

*Mal delisi: dîne malê dinê

**Aliş veriş: dan û standin

*** kêf îçûn: jib o kêfe

Hege ewana sabiqelîne
Ez ê efya wana derxim ji hukumeta derewîne
Heke ewana ji bo mi hatine danîne
Li qarîşê konê min konê wana zehf mezin in
Bira qederekî piçûk bikin bira di pêşiya mi da bimîne
Heke ewana kêf îçûn hatine danîne
Bira ji ser kaniya Çêrmûkê rakin
Bira çavê mi wana nebîne
De lo lo de lo lo lode lo lo lo
De lo lo lo de lo lo lo Ferzê tu rebenî de lo lo

Birano havîne germê di ser me de kîne kîn e
Sedûn qe ha ji bayê felekê tunîn e
Navmalî kete nava konê paşîn e
Dêna xwe dayê yeke mînanî devê girgîn e
Serê xwe li hemadê xwe dixîn e
Kefê di ser milê xwe de diweşîn e
Birano haj ji kuştin û mirina xwe tunî ne
Go selam û eleykum selama axayê min li te heye
Go heke mal delîsî ne
Ez ê bidimê mala dinê yo
Bira çend sala bikinê aliş û verişiyo
Hege ewana bi sabiqelîne
Ez ê efya wana derxim ji hukumeta derewîne
Heke ewana ji bona mi hatine danî ne

Li pêşberî konê min konê wana zehf mezin in
Bira qedereki piçûk bikin bira di pêşiya mi da bimîne
Heke ewana kêf îçûn hatine danîne
Bira ji ser kaniya Çêrmûkê rakin
Saeteki şûnda bira çavê mi wana nebîne

Birano Hekarî radibe serê xwe li hewedê xwe dixîne
Dest davê herd guhê navmalî ji binî ve diqetîne
Bi derstê navmalî ve datîne
Go here bêje axayê xwe bira laçika jina wî li serê wî be
Qe îro ji bildigiya* xwe nemîne
Du hezar û heft sed siyarê xwe siyarke
Daxe hîmek ji hîmê binê beriya jêrîne
Em ê çend serîka çend pozeka bidne hevdu
Namekê duzmîşkin**
Bira heta hetayê di nava eşîratê de bimîne
De lo lo de lo lo lo de lo lo lo
Şer giran bû Ferzê tu sebebî de lo lo

Lo bira havîne germê di ser me de kîne kîn e
Zor Temir Paşayê Mîrê Mila li derê konê xwe pêgermokê digêrîne
Di go nihaka navmalî yê ji mi re mizgînîke xêrê bîne
Dêna xwe dayê navmalê jorda tê digrî dilorîne
Hêsira ji çav û birû yê belek da dibarîne

*Bilgi: zanîn

**Düzmek: rêzkirin

Birayo wextê Zor Temir Paşa çav pêket
Bala xwe dayê her du guhê navmalî tunî ne
Go axayo ez ketime berbextê te û Xwedê Rebê jorîne
Yekî minanî devê girgîne
Kefê tevê kokinê dikşîne
Serê xwe li hewadê xwe dixîne
Qet haj ji mirina xwe tunîn e
Mi gotiye selama axayê mi li we heye
Go heke mal delîsîne ez ê bidimê mala dinê
Bira çend sala bikin aliş û verişiyo
Hege ewana bi sabiqelî ne
Ez ê efya wana derxim ji hukumeta derewîne
Heke ewana ji bona mi hatine danîne
Li pêşberî konê min konê wana zehf mezin in
Bira konê xwe piçûk bikin bira di pêşiya mi da bimî ne
Heke ewana kêf îçûn hatine danîne
Bira ji ser kaniya Çêrmûkê rakin
Bira çavê mi wana nebîn e
Mi dêna xwe dayê ew meriv rabûye ser darê linga
Her guhê min qetand bi destê mi ve datî ne
Go here bêje axa yê xwe bira laçika jina wî li serî be
Qe bira îro ji bildîgiya* xwe nemîne
Du hezar û heft sed siyarê xwe siyarke
Daxine himek ji himê binê beriyê. Beriya jêrîne

*Bilgi: zanîn

Em ê çend serîka çend pozeka bide hev du

Namekî duzmîşkin; heta hetayê di nav eşîratê de bimîne

De lo lo de lo lo lo lo

Birano wextê ku Zor Temir Paşayê Mîrê Mila evê ecêba hanê dibîne. Dibê heyran ez di bin barê van herdu zilama de derneyem; ji xwe ez nikarim ber tu eşîrêde serê xwe bilind kim.

Dest xwe ra êla xwe dibin konê xwe de li hev dicivîne. Wextê li hevdu dicivîne; ji rûsipî yê xwe, ji giregirê xwe, mezinê xwe re dibêje. Dibê filankes: “Min eva yeka ji van her û du camêran dîtiye. Her û du guhê navmalyê min qetandine. Nihaka gotî nisbetî wana ez ekserê xwe bigrin emê dakevine himê binê beriyê. Serîkî bidine hev û du ji min û ji wana yek ji me yê li meydanê bimîne yekê here.” Rûsipyê wî gotin qurban: “got emê ji te re tişteki bêjin gotî tu zehf eksî wî negirî yek. Yek jî eger tu gotina me qebûl bikî emê ji te re bêjin. Ku tu qebûl nekî em nabêjin.” Got: “Qurban bibêjin. Hûn hem rûsipyê minin; hem ji rûsipyê bavê minin. Bêjin hela ka hûn çi dibêjin.” Qurban go: “Ev herdu zilam hatine ku vî hereketê hanê kirin e. Tu zanî kurê Şêxê Mûseka di hişiya te de datîne. Xweyê du hezar û heft sed malî ye. Salê carekî tê ji te xeracê distîne paşê derbasdibe lêdixe diçe. Em îsal xeracê nadine kurê Şêxê Mûseka emê herdu zilama berdine pisîra hev du. Eger van herdu zilama zora kurê Şêxê Mûseka birye çûye, du heb zilamin hatine gihîştine me, di bin hişiya me de sekinîne. Hema bira xaşbin bisekinin. Emê îcar salê carekî ji kurê Şêxê Mûseka xeracê bistînin. Naxêr me dîna xwe dayê kurê Şêxê Mûseka serê herduyan lêxist; malê wana jî li te helal dibe; kozî kulfetê wana jî weyne têxe nav mala xwe.” Dêbê îjar ez çawa bikim. Dibê tê vê şiklî hereketê bikî. Dibê tu ya me bikî tuyê merivekî bişînf wan herdu zilama teklifki weynî mala xwe. Ezet îkram hurmet te çi kiriye. Îzna wana bide bira herine mala xwe.

Hay hay gotinê xwe dikine yek zor Temir Paşayê Mîrê Mila radibe erebnavmaliyê xwe dişîne dibê: “Herin selama min ji Sedûn û Hekarî bêjin.” Bêjin: Axayê me dibê hûn herdu dewetiyê min in. Wextê ku diçin ji herduyanra dibêjin. Herdu radibin tene mala Zor Temir Paşayê Mîrê Mila. Hekarî dîna xwe didê rojek derbas bû; du roj derbas bû; sisê derbas bû; çar derbas bû; pênc derbas bû. Şeş derbas bû deh derbas bû. Îqtisat mena kurtbirîn. Dîna xwe dayê hurmeta wan ji roja dinê zidetir e. Go:

“Sedûnê kurapê min çawa hebe dergistiya min xwîşka wiye mala wî bê jin nîn e. Yê ku belengaz û stûxwar e ezim. Mala min hêviya Erebnamalî maye. Hêviya navmaliya ve maye, hêviya çilodara ve maye. Eger ewana devê min bidoşin, eger şivan gavan çêlek û pezêmin bidoşin, wekî din kê di mala min da heye. Bîle kese tine ser ra jî bisekine.”
 Dibê: “Mîna gamêşê qol ne mêşa ji xwe diqetîne kurapê min ne jî ji hevalê xwe di diqetîne. Radibe li ber situnê disekine dibê: “Em ji hurmeta Zor Temir Paşa zehf-zehf teşekur* dikin. Lê belê kese li mala me tune gere destûra me bide em jî herne mala xwe.” Ê dibê: “Qurban hûn bi ser çavê min bavê min ve hatine. Hûn îro musadê bide min ez ê we sibê birêkim”. Dadikeve bajarekî mîna bajareki Êntab, Diyarbekir her yekî hespekî Îngilizê xwîntemîz ji wan re distîne. Her yekî deste kincê ku ez bibêjim ji wan re distîne. Xençerê lêxin têda derbas nabe. Mîna cilêt li xwe dikin. Du heb qamçiyê tîr dixne ber gizmê wana. Efendim ser û guhê wana temiz dike. Çek û silahê wana dikire digre didê. Herda li hespa dike dibê hûn ser çavê min re hatine.

Axayê min bira evana herne nav konê xwe. Em bêjin wê çaxê bisal zemana bûye; nihaka bi zar zimana ye. Em nizanin bi meha derbas buye bi sala derbas buye û bi serda hatiye. Zor Temir Paşayê Mîrê Mila dêna xwe didê ev herdu zilam ne ji konê xwe dertên. Ne îşekî dikin, ne şuxulekî dikin, ne emelekî dikin, ne karekî dikin, ne qezencekî dikin ne alvêrekî dikin. Dêna xwe didê hema hetanê êvarê ser piştê xwe di konê xwe de vedilezin. Lingê xwe bi ser hev re avêtin e. Minanî hirça ji wê teêlê xwe dizivirîne ser wê teêlê ji vê teêlê dizivirîne ser wê teêlê. Heyran go: “Mi yeke çawa anî hate serê xwe. Îcar tu were ev kurê kera di hêşiya min de duşkun bikevin. Duşkunê malê dinyayê ne. Axalerê îcar ji pey min re-yê bên min gora bavê niyo; du heb zilama xwe lê girt. Rabûn çûn rûçikandin. Yeşin di destê wanda pere nuqsanî heye. Ez ê erebnamalî yê xwe bişinîm bira werine vê derê heta devê wan digere ez ê pera bidime wan bira ji xwere pê alvêrê bikin. Paşê perê min bigrin bidin e min. Bira gazî navmalî ke çika jê re çî dibêje.

Mi dî di go de lo lo

Navmalî qurban dilê min ji dilanî dîn e

*Teşekkür: spas

Were serê axayê xwe bihere li dora serê xwe bigerîne
 Xwe bi konê Sedûn û Hekarî re bigihîne.
 Selama axayê xwe ji wana re bibêje bizikirîne.
 Bê axayê min pir-pir li we salam dike dibê heger ewana mal delîsîne
 Ez ê bidimê malê dinê yo di hêşiya mi da bikin; aliş û verişiyoy delo lo lo
 Birayo navmalî radibe lez dike dilezîne.
 Xwe bi derê konê Sedûn re digêhîne.
 Evê kelîmê ji re dibê dizikrîne.
 Dêna xwe didayê Sedûn qe ha ji bayê felekê tunîn e
 Li derê konê xwe pêgermokê digerîne
 Dakete hundirê konê dêna xwe dayê Hekarî mîna devê girgîn e
 Serê xwe li hewadê xwe dixîn e
 Kefê tevê toflikê diweşîne
 Go: "Hekarî axayê mi selama wî pir-pir li te heye".
 Gotiyê: "Heke ku mal delîsîne bira werin ez ê bidimê malê dinêyo
 Di hêşya me da bikin aliş û verişiyoy

 Mi dî Hekarî rabû ser darê linga
 Go: "Navmalî qurban dilê min ji dilanê dîn e
 Here selama mi ji axayê xwe bibêje bizikirîne
 Heke perê wî xêr e; bira di kîskê wî de bimîne
 Subê ez ê dakevine himek ji hîmê binê beriya. Beriya jêrîn e
 Ez ê bavêjme ser revoyê manegiyan yan qanterê deva kaşkim bînim
 Ez û axayê yê te tev bixwun
 Bira axayê te lezet û afiyetê ji can û bedena xwe bibîne

De lo lo lo de lo lo lo Hekarî

Birayo havîne germê bi sermeda kîne kîn e

Zor Temir Paşa li derê konê xwe pêgermokê digerîn e

Dîna xwe didayê navmalî jorda tê lez dike dilezîne

Gava davêje; çepila dihejîn e

Wextê xwe Zor Temir Paşa re digihîn e

Go: “Hekarî selama mi ji axayê xwe bibêje bizikrîn e

Bêje axayê xwe heke perê wî xêr e bira di kîskê wî de bimîn e

Sibê ez ê dakevine hîmek ji hîmê binê beriyê. Beriya jêrîne

Ez ê bavêjme ser revoyê manegiyar kaşkim bînim

Ez û axayê yê te tev bixwun

Bira axayê te lezet û afiyetê ji can û bedena xwe bibîn e

De lo lo lo de lo lo lo

Ferzê digo: “Hekarî ha Hekarî

Te li serî keffî û bi egal î

Tê bi şûr û bi mertal î

Bira bi xwezî dîn û îmanê Xwedê re

Rojekî mi ji te re bigota Hekarî kurapo

Ez malxê Ferzê tu bermalî”

De lo lo de lo lo de lo lo

Ferzê tu sebebî de lo lo

Efendim nihaka bira eva ji xwe re wisa bisekin e.

Îja em werne dora Hekarî Sedûn go rojekî Hekarî gote Sedûn ê kurapê xwe. Go: “kurap ne heqê Xwedêye. Eva çend care Zor Temir Paşayê Mîrê Mila eva kelîmê hanê ji mere dişîne. Em jî evê bersîvê digrin didine destê wiya. Evana mêraniya me nizanin. Min jî eva kelîma şandiye ser wiya. Qenebe li hember kelîma xwe; rabe siyarbe, em ê dakevine himê binê beriyê. Yan em ê bavêjine revoyê manegiyan yan qeyterê devan kaşkin bînin werin. Bira ewana jî mêraniya me bibînin bira parîkî ji me dûrkevin. Nizanin em kî ne, kurê kî ne, ji kêderê hatine. Go: xwe gihande dergîstiya xwe Ferzê. go: Ferzê go: “qe nebe ji me re parî nan çêke. Heke hewle be, heke kade be, bişibe, çi hebe em ê berê xwe bidine hîmê binê beriya herin. Go: wextê ku rabûn. Go: Ferzê ji wana re kade bişî go çêkirin. Go heqîbê wana tijîkirin. Go herdu siyarbûn. Berê xwe dane hîmê binê beriyê. Go wextê ku rabûn go îja ketine terqa rê.

Go çolî û çolîstan bû

Berî û berîstan bû

Sêfil û sergirdan bû

Go berê wana kete oxirê pişta wana kete felekê. Seriyê tu biqurbana linga bî bira ewana herne hîmê binê beriyê

Îcar em teze werne dora Zor Temir Paşayê Mîrê Mila û kurê Şêxê Mûseka. Go: mirtivekî kurê şêxê Mûseka hebû navî wî Elik bû navê jina wiya Fatik bû. Go Fatik wisa bedew bû, di dinyayê de bedewî ji tu jinê re nehîştibû. Go: dilê kurê Şêxê Mûseka wisa ketibû jina mirtiv. Go: wextê ku çav pêdiket go ji ser xwe diçû. Go: di go ez ê mirtiv bikujim Fatikê li xwe nikahkim. Go: difikirî go axayê li henberî min; wê bêjin mi di jin makê teniyo. Go yê bêjin rabû dawiyê da bi jina mirtivê xwe ket. Go: ez nekuji im ji bo Fatikê dîn bûme. Go: rojekî Elik gote Fatikê. Go: derê bavê xwe dade; kilîta reş bikişîne derê bavê xwe. Hindik ma êlê dagere. Tu jî bîne were hevanekî ji min re bavêje avê, nerm bike. Bendê hebanê bigre bavêjê ez ê jî rabim herme navêla Zor Temir Paşayê Mîrê Mila heke weke nîv kilekê be; heke weke kilek e deva rûn hildim binîm werim. Em ê ji xwe re tixne zer zewad.

De min zozan neditîne. Dibên wextê ku bişî, kada, çêdikin. Êwir êwir tênê Ji xwe re du roja li cî kî disekin. Şeş roja li cî kî disekin. Heft roja li cî kî disekin. Heta ku xwe digihînin qonax û malên xwe. Go: em ê jî ji xwe re zer zewad çêkin û bixwun heta gihijtine mala xwe. Go: Fatik radibe. Jê re hebanekî nerm dike. Bendê

hebanê davêjê. Elik radibe bendê hebanê davêje stûyê xwe. Xwedê oxir û sitametiye nedê berê xwe dide êla Zor Temir Paşayê Mirê Mila. Li nava êlê tamamî digere. Weke kileke deva rûn berav dike. Wextê ku ji nava êlê yê derê dêna xwe didê du kona di hêşya wîda danîn e. Wextê diçe derê konekî, dêna xwe didê tu kes têda tune. Diçe derê konê dinê ku derê kon vedike. Dêna xwe didê qîzek liser tevnekî rûniştiye şingîniya wê ye tevnê çêdike. Mînanî lokozê dibiriqe. Wextê ku mirtiv çav pê dikeve aqil diçe sewda serîda namîne. Bi dilekî na bist û heft dila Ferzê dihebîne. Hişê wî dice gur difire dikeve. De Ferzê qîza maqûla bûye, qîza dinya ditiya bûye. Gava ku dêna xwe didê yekî feqîr ket. Hankava ser tevnê direve serê wî dide ser çokê xwe. Hebe av serçeva direşîne. Wextê Elik çavê xwe vedike serê xwe li ser çoka Ferzê dibîne. Dibê ez ji te re sond bixwum dilê wî ya ketiye min. Lema serê min girtiye daniye ser çoka xwe. Dibê ya feqîrê Xwedê, tu çima firî ketî. Go: go xanim wextê min derê kon vekir saet ser mira derbas bû ez firîm ketim. Go hey hewara Xwedê. Go: îjar tu li çi digerî. Go wele ez li çiralixekî digirim. Gote erebnavmalî go kuro cê here tesediqa serê Sedûn û Hekarî here kileke deva mihkem rûn bîne were. Hebana wî tijî ke. Bira lêxe here. Go erebnavmalî wextê ku çû kileke deva rûn anî hat kire hevana Elik. Go Elik zivirî ser go: “ji boy Xwedê da be li dinyayê da sade min tu dîtî lo tu jinî, bûkî, qîzî, çiyî ez te bizanibim”. Pî! “go kurê kerê dêmeg tu çav min ketî hişê te serê te çû”. Go darkolkê deva hilda, rast çep da mirtiv. Qar qûr!. Banzda piştî kon ket. Go heban li erdê ket xirp banzda. Banzda go hat xwe gihande êlê go gote Fatîkê gûyê alemê gora bavê xwe ke; zû ciyê min dayne têkevme navê. Halê min tune; hingî ez hatime kutan. Go Fatîkê palas jê re danî ew kete nav palasa. Go kurê Şêxê Mûseka du hezar pênsed malbû. Go icar cimaeta wî çîqa di binê konê wî de biciviya; go hetanî mirtivê wî nehata; di cemaetê de kelîmek negota; go pistîn bi devê kesî nediket, beşera yekî jî xweş nedibû. Go heft rojê wî tamam bû. Dêna xwe dayê êl ser hev ra ber hev ra diçe tê. Go kurê Şêxê Mûseka du hev egîte xwe re go bidine du dara kuro herin evî kurê kerê wisa bikutin. Piştî wî li zikê wî nermtir kin. Heyra îro heftêyeke wî tamam bû ku nehatiye nava cimaeta min. Laqirdî nekiriye êla min ser hev ber hev ra diçe pistîn bidevê kesî nakeve. Bêjne wî kurê kerê axa dibê heke gayê wî miriye ez boyîne ga jê ra bişînim. Heke çêleka wî tine ez sê çêleka bigrim bidimê. Heke jina wî mirîbe ez bizewicînim. Ew çima nayê nav cimaetê.

Fatik li ber derê konê dû sitûnê bûye. Dêna xwe didê du hev babaegît. Du hev

zirfzokan ku kutek didestande ninber bi konê wan tên. Go “Elik mala bavê te şewitî”. Wele ténin wê te bikutin. Go go: “Fatik ez zanim yê mi bikutin. Qe nebe îjar tu divalîde banzde biqesda xeydê ez ê bidme pey te di pişt konade. Ev ha ji me tunene tu xwe bavêj e nava konê kurê Şêxê Mûseka. Go wextê Fatikê banzda, Elik da ser.

-Ehe ez ê te bera bedrim. Ez ê di gora bavê tenim. Darek li vir avêtê; darek li derê han avêtê. Bu qêrîna wê xwe avête nav konê kurê Şêxê Mûseka. Kurê Şêxê Mûseka rabû piya. Dibê: ya! Ya! Ya!. Go Xwedê tu jê razî nebî. Kuro tu cinî buyî?. Tu radibî jina xwe dikutî. Pî! dêbê serê te bixwe ser jina te da, ser axatiya te da. Serê min jî bixwe ser jina minde. Sibê hetanî êvarê te çav berda bû jina min. Te nizan bû tê min bi çî hesabê bikujî jinik ji te re bimîne. Dêmekî tu jî zewicî te jin anî. Ez ji zewicîn. Dikene. Dibê:

-Elikê min lawo. Mirtib dinya dîtîne. De ka te ji axayê xwe re; te yeke maqûl dîtîbe tu axa yê xwe bizewicîne. Dibê wele heke axa bizewice mi yeke wisa dîtiye ji serê axê heftê bavê axê zêdetire. Kuro li kêderêye Elik. Dibê di nava êla Zor Temir Paşayê Mîrî Mila de ye. Weylê dibê min di gora bavê tenî; ser te virê te da. Kurê kerê heram. Ha! kuro lawo ez heska binê dîza wî me. Ez salê carekî dajome ser jê bac û xweracê distînim. Çima ez nizanim kî ye. Lawo ka ji zarê li ber bêşikê heta yê çil salî ez êla wî da heye; ez gişka nasdikim. Ka yeke wisa heye. Dibê mêherin eger ji te zêdetir nebe; bira xwîna min li te jî û tûlê te helal be. Go wisa... Wisa... Go li defa hewarê xist. Go pênsed rispî bi xwe re siyar kir. Elik da teêla xwe. Berê xwe da konê Zor Temir Paşayê Mîrî Mila. Bira Xwedê oxirê nedê bira ewana herin.

Evana wextê ku birê dikevin. Ku ténê dikevîne nav êla Zor Temir Paşayê Mîrî Mila. Zor Temir Paşayê Mîrî Mila dêna xwe dayê ku kurê Şêxê Mûseka bi pênsed rûspî ve lê qelibîn. Li êlê dike qêrîn. Kuro dibê herçî yê tewla, herçî yê sika, herçî yê hespa birevîne. Li fêza kona bitewilîne. Herçî yê mêvana, herçî yê çil berzîngê hespa pênc deqa da ji hevdu belakirin û kêlekî sekinîn. Cimaet hat dibinê konê Zor Temir Paşayê Mîrî Mila de li hevdu civiyan. Wê çaxê mirtiv rabû ber stûna kon, bira kelimeki bibêje ji Zor Temir Paşayê Mîrî Mila û ji kurê Şêxê Mûseka go go axayê min me heta niha dewa malê dinyayê li te dikir. Îjar nihaka em ji axayê xwe re hatine bi ûsula eşîrê bi şera Nebî Muhemed (sx1) dewa canekî li te dikin. Zor Temir Paşayê Mîrî Mila dibê:

“qurban dibê ew canê ku hûn dibên ez dikime qurbana axayê we. Lêbelê ew qîza ku hûn dibêjin di nav êla min de tune”. Ooo Xwedê jê razî bû yo. Dêna xwe didême; mena garis werîs nedayîne. Dilê te tune, dilê te hebe qîzek me ditiye. Wele hebe ji te jî; ji axayê te jî zêdetir e. Ka dibê kîjan e. A dibê di wan her û du konê hêşiyêde ne. Dibê qurban ez li ber Xwedê û mêran rûreşim. Ew herdu jî bi mêvanî hatine dihêşiya konê min de danîne eva çend mehe dihêşiya min de danîne. Lêbelê ew her û du zilam jî ne di konê xwe de nin. Lêxisitne çûne, nizanim kuda çûne. Lêbelê ewa jî ez nizanim jine, bûke, qîze, çiyê ez jî xerîbim mîna we. Dibê êê Xwedê ji razê buyî heke dilê te hebe qiztiya wê, jintiya wê, bûktiya wê, em ê hînbîn. Qîzbe, em ê bixwazin. Bûkbe jinbe em ê pişta xwe bidinê herin. Zor Temir Paşayê Mîrê Mila bindestê wana bûye. Nikari bûye serî bilind ke. Dibê: “qurban ê de herin dêna xwe bidinê ku qizbe , qelesa ezêlî jî lê ketibe, qedera Xwedê ku gotibe, ez ê jî bigrim bidime we. Ez çî bêjim. Mîrtiv derdikeve ber derê kon. Dêna xwe didê pîrek xwe avêtiye ser dar, inte- inte vê ye. Sed û yek lib ji biya devê avê kiriye tizbî avêtiye stûyê xwe. Hire hira wê ye. Hu Allah e.

-Dayê dayê go: “bide xatirê Xwedê hema here evan herdu konê hanê. Yek di van konade ne. Ji pirske çika qîze yan bûke. Dibê pîrê radibe ku diçe derê kon vedike. Bala xwe didê Ferzê şingîniya wêye tevnê çêdike. Selam elêkim dibê. Dibê wey eleykumu selam daka pîr tu ser serê mi hatî. Go min jî dixwest yeke mîna te navsere were li cem min rûnê ku bihna min pê derê. Heger çay, nan, xwurek, qahwe wextê pîrê xwar. Nizîka ku rabe go: “Lawo ez ketime ber bextê te Xwedê ji xêncê te ez dêna xwe didimê qe kes tune vê malê da gelo tu qîzî, bûkî, jinî çiyî? Ji diya xwe re bêje”. Go go: “Dayê ji bo wan têlê porê teyê sipî nebûya. Ez qesem bikim bi zat sîfatê Xwedê minê darkolkê deva hilda minê wisa bikira pişta te ji zikê te nermtir bikira. Lêbelê tu pîrî navsereyî qîztiya min jintiya min bûktiya min bi te ne maye. –Birêkeve!”. Eva ji jorda ji kon tê. Fîsebîlilah tê konê Zor Temir Paşayê Mîrê Mila. Dibêje: “Hûn qelenê wê bibirin gunehê wê li stûyê min û dê û bavê min be. Ewa qîz oxlî qîze”. Wextê ku qelenê wêna dibirin. Go îjar bêriya pezê Zor Temir Paşayê Mîrê Mila go di fêza konê Sedûn û Hekarî da bû. Go qîz û bûk bi hev û du diketin heta ku bihatana neketana milê Ferzê bi xwe re ranekirana, hilnedana, nebirana, neçûna bêriyê pê laqirdi nekirana; gulaşa wê pê nedana kirin beşera wê pê nedana xweşkirin bîna wê pê nedana xweşkirin; ne aniyana li kon nehîştana go tu carî derbast nedibûn nediçûn. Ferzê dêna xwe didê wê rojê temamî wiya kit kit î bûne; cot cotî bûne; piste pistê wane. Bi hev re

xeber didin yekî bigêje Ferzê be tine. Ferzê dibêje erebnavmalî dibê hela rabe derê bavê min dade bi heft kilîta. Kilîta reş bîne derê bavê min xe. Ez dizanim ji birayê min; ji kurapê min teqez yek sax nîn e. Ez nizamim kîjan hatiye kuştinê. Kijan maye. Yan her û du hatine kuştinê. Yan yek hatiye kuştin, yek maye. Tu dakeve nav êlê ka çi xeber hebe di nav êlê de. Erebnavmalî dikeve nav êlê tu xeber tune. Tê heta tê digihêje konê Zor Temir Paşayê Mîrê Mila. Haylo! Dêmeki qelendê Ferzê birîn e, yê ji kurê Şêxê Mûseka re biherin. Mehfê rast dikin. Wê çaxê hema erebnavmalî li nav çavê xwe dixê. Dibe zarezara wî tê. Jêr va wextê ku tê Ferzê destê xwe dixê newqa xwe li navê dixê. Qudûmê çokê wê şikestine. Kuro! dibê çi bû. Gelo kurapê min hatiye kuştin yan birayê min hatiye kuştinê. Daha devê vî nagere devkî bêje. Bira bi kilamkî bêje çika çi dibêje:

Hê ee ee

Mi dî navmalî dîgo de lê lê de lê lê de Ferzê

Weyla stûna konanê lê Ferzê

Dîrega camiyanê lê Ferzê

Xweya bav û biranê Ferzê

Şîrê zikmakê da serê te serê xêrnediyanê lê lê

Lê Ferzê dilê min ji dilanê dîne

Hela serê mi li dora lingê xwe bigerîne

Em li jêrê hildidin Rebê alemê li jorê qe hîlnîn e

Kê dîtiye kê bînaye

Meriv ne li mala xwe be

Xelk jina merya bifroş e

Qelenê wana ji xwe re bistîn e

Çil sakoyê milanî

Çil mihînê çal e bi canê

Çil devê siltanî
Qemeke kose Misirî ye
Ew jî ji axayê me yê bênamus re
Li ser qelenê xanima min birîn e
De lê lê de lê lê de lê de lê

Birayo wextê evê kelîmê ji Ferzêre dibê dizikrîn e
Ferzê diqire li nav çavê xwe dixîn e
Mînanî hirça kazeb peritî gurê dil birîn e
Mîna qulingê derbiharê kir qêrin e
Go hela were serê xanima xwe li dora lingê xwe bigerîn e
Qûdumê çongê min şikestîn e
Dîrega dilê min tunîn e
Hela were kilît û bendê Helebê ji ber pişta min derîn e
Bihere li derê çekmecê bibe bîn e
Xanima teyê du heb kaxêdê Semerqendê jê derîn e
Xanima teyê bi hubra Gêlanê du heb kaxiza binivîs e
Yekê bide erebnavmalî ber bi hîmê binê beriyê ji boy dergisiyê xwe bişîne
Yekê binivîse ezê bidime birayê xwe navmalî malê,
Ber bi Bozerbayê cem destebirakê mêrê xwe bişîne
De bira hewara min kesûkê dara şikestî
Ahîkê min li erdê nemîn e de lo lo de lo lo de lo lo

Ferzê digo de lo lo Hekarî
Te li serî bi kefî bi egalî

Tê bi şûr û bi mertalî
Bira bi xweziya mala Xwedê re
Mi ji te re bigota kurapo malxê
Te ji min re bigota Ferzê tu bermalî
De lo lo de lo lo de lo lo ax
De lo lo lo li min sebebê de lo lo

Birayo havîne germê di sermede kîn e-kîn e
Serê dilê min bi kule bi kedere bi birîn e
Mi dî navmalî lez dike dilezî e
Kilîf û bendê Helebê ji ber pişta Ferzê dertîne
Dibe li derê çekmecê dibe tîne
Duheb kaxizê Semerqendê jê dertîne
Ferzê bi tilî pêçiyê balmumî bi hubra Gêlanê
Mi dî her û du nama dinivîse
Yekî bi destê erebnavmalî va datîn e
Ber bi hîmê binê beriyê ve dişîn e
Yekê dinivîse bi destê navmalî ve datîn e
Go ez ketme ber bextê te Xwedê Rebê jorîn e
Dibêje evê nama min bihere Bozerbayê destê Boz Begê ve daynîn e
Belkî li hewara min were min ahîkê mi kesûkê
Dara şîkestî li erdê nemîne de lo lo lo de lo lo lo
Ax de lo lo lo de lo lo Hekarî de lo lo

Dide destê Erebnavmalî, ber bi degistiyê xwe, birayê xwe ve ber bi hîmê binê

beriyê ve dişîne. Bira ewana wisa wêda herin.

Em werne dora kurê Şêxê Mûseka. Wextê ku mehfê rast dike. Siyarê wî siyar dibin diajone derê konê Sedûn û Hekarî. Bi zorê destê Ferzê digrin bi zorê erdê rekaşdikin, davêjine ser mehfê. Seriyê tu bi qurbana lingan bî. Penî didinê bi rê dikevin û diçin. Wextê ku bi rê dikevin û diçin, diçine nîvekî rê. Kurê Şêxê Mûseka dibêje Elikê mirtiv. Dibê : “Elik lawo qe fiştok bi te re hene”. Elik dibê: “belê demaçek bi min reheye”. Dibê: “here di nav êlê de biteqîn e. Herçiyê ku miriyê wana jî miribe; bira li miriyê xwe nebine xweyî. Bira qirçîn bi êlê keve em herin”. Birayo mirtiv Xwedê oxir û silametiye nedê. Belkî stûyê wî di bin cendekê wîbe. Wextê ku dajo xwe davêje nava êlê.

-Teq! -teq! du gula davêje. Êl ser hev re, ber hev re diçe. Hinekê ji wan dibên gelo cerdê ajote ser terş û talanê me. Gelo jinê bimer hane revandine. Gelo mêr hatine kuştine. Dibêje ezbenî ne terş û talanê me xelqê biriye, ne jinê bimer hatine revandinê, ne jî mêr hatine kuştinê. Lêbelê selama axê li êlê heye; gotiye herçî yê ku miriyê wî jî hebe bira lê nebe xweyî. Qirçîn biêlê bikeve em lêxin herin. Qirçîn bi êlê dikeve bira êl ji xwe re bikişe here. Diha êvir êvir deh roj, pazdeh roj, êwir êwir bira êl ji xwe re here.

Em werne dora navmaliyê ku diçe Bozerbayê li cem Boz Begê. Çar roj çar şeva li rê diçe. De wê çaxê lastik jî nebûne çarix bûne Xwedê xirab ke. Wisa dibe çarix peniyê wi dikutin. Dibe şore şora xwinê di peniyê viyade tîne. Lêvê viya ji germa hîmê binê beriyê diqelişin. Zimanê wî ji tîna deva da reş dibe. Ji destê xewê nehiş dikeve. Ji birçîna qudûmê çokê wî tune. Li ser aveke zirav dikeve pêşiyê, dibê hema ez ê li vir rûnê, hebeki peniyê çarixê xwe bikme nav avê bira nerm be. Ez ê fire av ji vexwum. Pirtî nan bixwum. Parîk jî serê xwe daynim. Ez ê rabim dîsa bi rêkevim. Heta kêderê ez çûme; ji hiş ketime mirime. Eva wextê ku serê xwe datîne xewê. Nebî ketiye tuxûbê Boz Begê. Dêna xwe dayê ku kerî surêyê pez, dewar, êrxî û deve jorda hatin. Nişkava ku eva serê xwe bilid dike, gurinî bi pêz dikeve, duhezar û pênsed pezê hirik li nav hev dikeve. Şivan didne daran. Ehe me di gora bavê te gao. Îcar emê evî pezî çî çaxî ji hevûdu veqetîn in. Evî pezê hirik. Temamî li tipekî li rengeki. Bihêle em te di ber daran da reşkin. Têkne halê komê.

Dibê birao ez ketime ber bextê we û Xwedê namûsa we. Ez peyayê hewar û gaziya me. Gotî hûn li min nexin. Yekî wî dibê bi dî xatirê Xwedê heyran ji re dengê

xwe nekin. Ewê pezî hema ez ê ji hev veqetîn im. Kesek ji we zehmet nebîne. Hela çika eva ji ku tê. Dibê ez peyayê hewar û gaziya me.

-Quban dibê tu ji kutê; tê kuda herî. Mi ji serîde çawa ji we re gotiye neqilkiriye; ew jî wisa yekbiyek ji wan re dibêje. Yekî wan dibêje: eva usûla Boz Begê nizane. Min di gora bavê vîniyao. Hema bira here wêderê Boz Beg şûrekî bavêje serê wî, serê wî jê ke. Yekî wî jî dibê kuro çima tu nanê ber para me xwariye. Kuro tu terş û talanê bavê me li pêşiya vî zilamiye. Kuro feqîr e, belengaz e. Wexta eva hewariya hanê aniye. Kese ji axayî wî li mal tune. Destê xanima vî jî bi destê zorê kaşkirine avîtine mehfê hildane birine çûne. Emê ji re usûla Boz Begê bêjin. Boz Beg paşê lê pirsîye, pirsîye. Lê nepirsîye gor nehse û newhêd û neh bavê wî û Boz Begê.

-Qurban dibê ku tu çûyî, nihaka ku tu li vî pozî bizivirî êla Boz Begê ye. Eva pez, dewar, êrxî, gamêş hemû yê Boz Begê ye. Go eynî bi wê tîpê. Go navmalî rabû bi rê ket. Çû li poz zivirî. Dêna xwe dayê êleke biefir daniye li poz. Dêna xwe dayê konekî li ser fêza konane. Li ser bîst û pênc dîregan e. Dîrega ortê hevirmûşe herî kilê subhanê lê pêçane. Dêmekîwextê ku çawa terîf kirin wisan e. Go qurban wextê ku tu çuyî, berê ji re gotine gotine ku tu çuyî. Nav cimaetê, selama te hildan. Tu tucari ling navêjî, naçî, rûnanê. Tê dêna xwe bidiyê kincê gişka eyniye. Tipa gişka yeke. Kincê gişka sipiye. Lema dibên erdê Bozerbayê û Boz beg. Ewa pênsed mêr li konê Boz Begê da rûniştiye. Temamê wan li pişta Boz Begê nan dixwin. Wextê ku bû nêzikiya nîvro, Wê çaxê; wê yekê li saetê dinihêre. Tu bizanibî ku ewê here dêna xwe bide nan û xwarina wan. Çikanê xwarina wana hazire yan na. Ker wê çaxê yek radibe hêdika şimikê wan datîne. Şimikê Boz Begê. Wê rabe. Şimikê xwe bi serê lingê xwe ve ke. Tu jî li eywanê li piya neçe cîkî. Tu wî çaxî namê derxe. Dirêjî dêst ke. Tişteke ji te re helkir kir; hel nekir wele tîbebû çû. Eva radibe diçe nav êlê. Dêna xwe didê kon eynî kon e. Minanî mijekê rû esman e. Diçe wextê derê kon vedike. Dêna xwe didê ku pênsed mêr di binê kon de rûniştiye û li hev civiya ye.

-Eselamin eleykum

-Dibên weeleykûme selam we rehmetulahî we berekatû hû.

Wextê dibêje ji xwe re li piya disekine. Dêna xwe didê. Kincê gişka yek e. Tîpa gişka yek e. Axa û feqîr û xulama ji hev û du nasnake. Eva difikire. Gelo axa kîjan e. Ha nîv saetî ha saetekî rabe. Ha yê du saetê din rabe. Wisa dibe, av dikeve kapê belengazî.

Dibe nizikî nîvro. Dêna xwe dayê ku xortekî di nav cemaetê de dest avîte saeta xwe. Wextê li saeta xwe nihêrî yek ji eywanê rabû şimikê wiya rast kir careki din ker çû cihê xwe rûnişt. Axê rabû. Boz Begê rabû. Lingê xwe li şimikê xwe xist. Navmalî jî ker name ji cêva xwe derxist; dirêjê destê Boz Begê kir. Boz Beg bi destê wî ya girt. Hilda bir çû pişt kon. Wextê ku hilda bire pişt kon. Namê nihêrî dêna xwe dayê hay lo lo! Dewsa konê destebirakê wî leylek gitmiş yuvasi kalmış*leqleq çûye hêlîna wî maye. Herwisa namûsa destebirakê wî bi destê zorê hatine hildane birine. Destebirak jî bi xwe tune li wê derê. Go: “kurê min qe fiştok bi te re hene”. Go “wele demaçeke xirode bi min re heye”. Go here orta kon. Devê wê bikute orta kon; du gula berî erdê de. Eva zivirî orta kon. Devê demaçê kuta orta kon du gule beri erdê da. Êl ser hev ber her ra çû.

-Axa go: “cerdê ajotser êla me, terş û talanê me birin çûn, Jina bi nikah hate revandin”.

-Axa go kurê min: “ne terş û talanê me çûye. Ne mêrê me hatiye kuştin. Ne jina nikah hatiye revandin. Lêbelê îşeki a wiha li destebirakê min dest daye. Bi xwe li hîmê binê beriyê ye. Kurê Şêxê Mûseka heye hatiye bi heqaret, cebren milê dergîstiya wî girtiye kaş kiriye, avêtiye mehfê hildaye here tunaçî. Ew bi xwe jî ne li wê derê ye. Wele ez bi xwe diçim. Serê min li ser wê oxirê ye. Kê ku ji we were; kê ji we neyê ez têklê we jî nabim. Ne ku hûn bêjin filankes axayê me ye. Bi heqaret bi cebir me bihere ber qirê. Kê ji we hatiye li ser çavê min bavê min; kê ji we nehatiye jî li ser çavê min bavê min”. Evana jî radibin. Herçiyê di malde çar bûne yek diçe sê dimîne. Herçiyê dudu bûne yek diçe yek dimîne. Pênsed siyar bi Boz Begê re siyar dibe. Wextê ku siyar dibe. De êla Kurê Şêxê Mûseka jî ji xwe re êwir bi êwir diçe. Evana kesebir dajon. Çikê minanî deveboyîne. Li wê derê disekinin. Ji hineka dipirsin dibên gelo êl derbas bû. Hinek dibên derbas bû hinek dibên derbas nebû. Dêna xwe didê ku dengê êlê hê bi ser neketiye, êl derbas nebûye, şopa êlê bi ser wan neketiye. Kêlekî disekine; dêna xwe didinê ji nişkêva qirçîn bi êlê ser wanada ket. Weqtê ku qirçinya êlê biser dikeve. Boz Beg dibêje dused û pêncî siyarî xwe, dibê kuro hûn derênê li pêşiya êlê bisekinin. Ez û dused pêncî siyarî jî em ê bikevine pûsiyê di newalê da bisekinin. Kê ku hat xerac-meraca rê ku bide we, bê em nizanin qurişek be deh quriş be, hûn bi çi razî dikin. Axayê me di newalê daye. Werin axayê me razîkin. Bi xêr silamet. Me bihistiye ku we

*leylek gitmiş yuvası kalmış; leqleq çûye hêlîn maye

degistiya Hekarî siyar kiriye, ji Kurê Şêxê Mûseka re hildaye aniye hatiye. Baceki bidine axayê me. Derbasbin herin. Çi siyarê ku verin belki em di wirda bidine windakirin. Dibe ku em bi wî hesabi pêka êlê binin. Heft hezar û heft sed pêncî mal e. Ancax wisabe em pariki pêkê weynin. Cab diçe ji kurê Şêxê Mûseka re dibên cerdê avête pêşiya êlê. Kurê Şêxê Mûseka dibêje herin dêna xwe bidinê. Eger cerdeke baş be sedeqa serê min Ferzê çend qûrişa bidinê. Em derbas bin herin. We dêna xwe dayê ku cerdeke pîs be hema pêpeskin herin. Dibên axa xaşbe cerdeke zehf zore. Yanliz heta em tişteki nedinê nabe. Dibê herin tişteki bidinê bira êl derbas be here, êl nesekin e. Wextê ku evana birê dikevin.

- Qurban hûn çi dixazin.? Em çi bidine we?

- Dibê wele em bi xwe tişteki nizanin. Lêbelê axayê me bihistiye şukir ji Xwedê re Kurê Şêxê Mûseka girtiye dergistiya Hekarî bi destê zorê ji xwe re aniye hatiye. Me jî gotiye ki em qaçax eşqiyayê serê çiyandin. Qe nebe em jî herine pêşiyê. Ji xwe re bexşîşekî, sedeqa serê wî û Ferzê jê bistînin. Werin hatiye di newalêde sekiniye. Hûn bi qurişeki razî dikin, du qurişa razi dikin, em pê nizanin. Dused siyar wextê ku berjêrê newalê dibe. Ev pêncsed siyar lê tê hev û du. Kitekî jê bernade. Du sed siyarî temiz dike. Boz Beg bi pêncsed siyari ve derdikeve pêşiya êlê disekine. Ferzê di hûndirê mehfê de. Darê dûrbînê di dêst de bûye. Dûrbîn avêtiye ber çavê xwe gerandiye. Dêna xwe didê ku Boz Beg bi pêncsed siyari ve lê pêşiya êlê sekinîne. Paşî bû mînanî lim hat li pêşiyê sekiniye. Wextê ku Ferzê çav Boz Beg dikeve jêre bendeki dibêje. Hela ka çi dibêje:

E eh eh hî hî hî

Mi dî Ferzê di go de lo lo lo de lo de lo lo

Boz Bego qurban dilê min ji te re ji dilanî dîn e

Were serê min bihere li dora lingê xwe bigerîn e

Kefî û egala li serê xwe bilefîn e

Teng û berê menegê bişidîne

Dizgînê menegê li destê xwe bialîne

Ser yalê mexrebê de pêkeve yalê meşreqê de
Malbirê manegiyan li hev û du dizivrîn e
Destê mi kesûkê dara şikestî dergistiya deste birakê xwe
Bigire ji nava êla zor û giran de tu derîne
De lo lo lo de lo lo lo ax de lo lo
Ferzê tu sebebî de lo lo lo

Birayo havîn e germê di ser me de kîne kîn e
Serê dilê min bi kul e binê dilê min bi keder e bi keser e bi birîn e
Wextê Boz Beg evê gotinê dibêje dizikrîn e
Evê kelîmê ji devê Ferzê hiltîne
Radibe keffî egalê li serê xwe dilefine
Deng û berê manegiya dişidîne
Dizginêyê manegiyê li destê xwe dialîne
Ser aliyê mexrebê de pê dikeve ser aliyê meşreqê da
Malbirê manegiyan li hev û di dizivrîn e
Boz Beg bi rimekî birîndar dibe
Li ser milê xwe dizivire
Bala xwe didayê dused û pêncî siyar; li pişta Boz Begê tunîn e
De lo lo de lo lo de lo lo
Mi dî Ferzê di go de lo lo Hekarî
Te li serî keffî bi egal î
Tê bi şûr û bi mertal î
Çawa di dêrêz û xwerab û rezîlê gunda de
Ez dimirim min ji te re nego tu Hekarî malxê

Te ji min re nego Ferzê tu bermalî de lo lo de lo lo

Ax de lo lo de lo lo de lo lo

Ferzê bala xwe didê ku wextê du sed pêncî siyar ji pişta Boz Begê hate kuştin. Boz Beg jî bi rimeke mihkem hate birîndar kirinê. Dêna xwe dayê Boz Begê mîna tiştêkî xwe giran digre. Xwîn ji Boz Begê çû. Ferzê go welehî wê serê Boz Begê jêkin. Teze wê derê bavê min dadin. Kiliteke reş bîne li derê bavê min xin. Bihêle ez tenekî lêxim. Belki zutirkî hinekî bi xwe bihise. Belki tiştêkî bike.

Mi dî Ferzê di go de lo lo de lo lo

Boz Bego dilê min ji dilanî dîne

Serê dilê min bi kul e binê dilê min bi keder e bi keser e bi birîn e

Malxirabo tamarê milê te mirîne

Qe tamarê milê te tunî ne

Nutqa mêranyê bi te re tunî ne

Were serê min bihere li dora lingê xwe bigerîn e

Kefî egala li serê xwe bilefîn e

Teng û berê manegiyê bişidîn e

Dizginiyê manegiyê li destê xwe bialîne

Ser aliyê mexrebê de pêkeve yaliyê meşteqê de

Malbirê manegiyê li ser hevde bizivirîn e

Destê min kesûkê dara şikestî degîstiya deste birayê xwe

Bigre ji nava êla zor tu derîne de lo lo de lo lo

Birayo wextê ku Boz Beg evê kelimê ji devê Ferzê hiltîn e

Radibe kefi û egalalê serê xwe dilefîn e

Teng û berê manegiya xwe dişidîn e

Ser yalê mexrebê da pê dikeve ser yalê meşreqê de
 Malpirê manegiyan di ser hevda dizivrîn e
 Boz Beg bi du rima birîndar dibe
 Li ser milê xwe dizivire dêna xwe didayê
 Ji wî pêncsed siyarî kit heb ji siyara tunî ne
 De lo lo de lo lo bi mi sebebê de lo lo

Wextê ku Boz Beg bi du rima birîndar dibe. Dêna xwe didê ku ji wî pêncsed siyarî lib tune li pişta Boz Begê. Boz Begê demekî di nava şer de diçe tê. Birîndar bûye. Bi du rima birîndar e. Gelek xwîn jê çûye, qudûm lê şikestiyê. Kemenda davêjnê Boz Begê digrin. Boz Begê digrin. Kurê Şêxê Mûseka dibê serê wiya lêxin. Em debasbin herin. Wî wextî Ferzê gazî dike. Dibê: “ez qesem dikim bi zat sîfatê Xwedê deqa ku hûn serê Boz Begê lêxin. Eva kêra çirtme destê min dane. Eva fîncana jehrê destekî min daye. Ez ê fîncana jehrê ser xweda kim, kêra çirtme jî li xwe xim”. Hemin we aniye hatiye hesabê mirinê. Destê wiya girêdin bawêjine teêla min mehfê bira êl bikiş e, lêxe here. Wê çaxê Kurê Şêxê Mûseka dibê: “kuro dest pêyî wî mirarê hanê girêdin. Bavêjne teêla Ferzê”. Wextê ku em çûn li cihê xwe êwirin bi xêr silamet. Heft ro heft şeva bû deweta min. Şeva ku ez herme gerdeka xwe. Ez ê wê çaxê li ber şêmikê qubana xwe Ferzê şerjêkim sera derbas bim herim”. Wele dest û pêyê wîna girêdidin. Davêjine mehfê. Bira dîsa qirçin bi êlê keve bikişe here.

Îcar em werne dora Sedûn û Hekarî. Van zilama jî ajotiye hîmê binê beriyê. Ajotiye ser revoyê deva; qeyterê manegiyan aniye hatiye. Şarge devê xwe dajone hûndêrê tewlê. Hekarî dibêje: “kurap eva şeş heft roje ez raneza me. Parikî jî destê xewê hişê min diçe. Tu li êrxîya li qeyterê deva tu bipê. Ez ê parikî serê xwe daynim. Wextê ku Hekarî serê xwe datîne. Bala xwe didê vaye werzebakî hat li konê wana xist hat direga ortê şikênand. Li hev û du pêçand avête ser konê Zor Temir Paşayê Mîrê Mila. Ji xwewê qil da banz da. Sedûn go: “kurap te çîma ji xewê banzda ser xwe”. Go: “kurap Xwedê xewna min xêrke ser xêrê bigerîne. Min xewneke wisa pîs e, xirab dît. Min dî çavê min çû se hev û du. Mi dî werzebak li konê me hat lêxist dîrega ortê şikênand, li hevdû dipêçand avête ser konê Zor Temir Paşayê Mîrê Mila. Weylê! mala te neketî. Go

tu bi tirs radizêyî lema. Mal nexirab ji xwe re li kêfa xwe binihêr e, serê xwe bavêj e xewê. Wextê ku serê xwe davêj e xewê. Dîsa heke pir heke hindik radizê. Dêna xwe didê dîsa werzebak hat li konê wana da dîrega ortê şikênand kon girt avête ser konê Zor Temir Paşayê Mîrê Mila. Dîsa ji xewê qil bu banzda ser xwe. Sedûn dibê kurap te çima ji xewê banzda ser xwe. Dibê kurap dibê Xwedê xewna mi li ser xêrê bigerîne. Eva du care ez serê xwe datînim. Dêna xwe didimê werzebak hat li konê wana da dîrega ortê dişkêne digre davêje ser konê Zor Temir Paşayê Mîrê Mila. Ee mala te nekeve. Tu yekî tirsonekî. Mi jî qe heta niha mêraniya te nedîtibû. Tu were li êrxîya û deva binihêre. Ez ê serê xwe bavêjime xewê. Dibê kurap wexta ku ez ditirsim ez ê li êrxîya û deva binihêrim tu razê. Wextê ku Sedûn serê xwe davêje xewê. Eger pir radizê; eger hindik radizê. Dêna xwe didê werzebak li konê wana hat; lêxist dîrega ortê şikênand. Li hev û du pêça avêta nav konê Zor Temir Paşayê Mîrê Mila. Ji xewê qil da. Banzda ser xwe. Hekarî go Sedûn te çima ji xewê banzda ser xwe. Go kurap Xwedê xewna me bizivirîne ser xêrê. Lêbelê xewna ku te dit eynî min ji ew xewn dît. Lêbelê zehf ji pê emîn nebe. Xewnerojkin. Xwedê silametiye bide, tu guh nede tiştê wisa. Tiştê jî tune. Lêbelêrabe riya me dûr e. Em serê êrxîya û deva bikişnin em herin. Dikişnin wisa têne. Hetanî dikeve germa nîvro. Wê demê Hekarî dizivire dibêje Sedûn. Dibê: “kurap te dît me anî hat ewqas deve û êrxîya xist hat anî hat. Dibê axirî min eva şûrê xwe li kesî neceriband. Dibê êê.. kurap Xwedê li ser xêrê bigerîne. Ka bise ez darê dubûnê bavêjime ber çavê xwe. Darê dûrbînê li hîmê binê beriyê davêje ber çave xwe digerine. Dêna xwe didê ku germa havînê, mînanî germa deysta Surûcê bûye. Mij ketiye erdê. Dêna xwe didê peyak di nav mijê de tê. Hezin hezin tê. Dibê kurap tu serê deva û êrxîya bide min. Here pêşîya ewî merivî. Şûrê xwe lê biceribîne. Hela çika şûrê te tûje yan koye. Hetanî ez hatim min xwe gihande te. Hekarî serê deva digre dide destê Sedûn. Dicedîne. Ha li vir ha li derê hanê. Nêzikê ku peyê dike. Rind dêna xwe didê. Pî! eva Erebnavmalî ye. Dicedîne diçe pîşiyê

-Kuru te xêre. Erebnavmalî digrî. Îdî zimanê wî nagere. Ku bidevkî bêje. Dest davê namê. Namê dirêjî dêst dike. Dema ku li namê dinihêre. Hay lo lo. Kurê Şêxê Mûseka hatiye destê dergistiya wî girtiye hildaye çûye. Kesek li şûna warê vana nemaye. Jina wî lêxistiye çûye. Leqleq çûye hêlûna wê maye. Dizivire ser Sedûnê kurapê xwe. Divê kurap min ji te re nego. Min serê xwe avête xewê. Xewn dît ku werzebak li konê me hatiye lêxistiye dîrega ortê şikênandiye avêtiye nav konê Zor

Temir Paşayê Mirî Mila. Te go Xwedê xewna te ser xêrê bigerîne xewnerojkin. Gere qe guh nedî tiştê wisa. Wele xwîşka te dergistiya min e. Kurê Şêxê Mûseka ji xwe re biriye çûye, bi destê zorê. Dizivire ser erebnavmalî dibê evan deve êrxiyê han bigre bikişîne bihere ser konê me. Ku em hatine dîsa em axayê te tu ewladê meyî malêyî. Ku em nehatine here evan deve êrxî mal navmal gişk qurbana te. Li te xweş helal be. Eva bi Sedûn ve radibin li du hepsê Îngiliz ê baş siyar dibin. Seryo tu biqurbana linga bî. Bi çap û qamçiya têne hespa.

De êl e... Êl jî tê êwir bi êwir. Evana kese dajon. Careka dîn ajotine cikî mîna warê deveboyunê. Li pêşiyê disekinin ji hineka dipirsin. Gelo êl derbas bû hinek dibên êl debast bû. Hinek dibên derbast nebû. Li şopa êlê dinihêrin. Dêna xwe didinê ku tu êl derbas bûye tune ye. Wexteki dêna xwe didinê qirçiniya êlê bi ser wana ket. Hekarî xwe dide fêza rê. Sedûn xwe dide biniya rê. Ferzê darê dûrbînê davêje ber çavê xwe. Dêna xwe didê degîstiyê wê xwe daye fêza rê. Birayê wê xwe daye binya rê. Wê çaxê Ferzê gazî dike. Dibê qe nebe ez kilamekî ji birayê xwe re bêjim. Belkî li Hekarî hinekî eser bike. Mînanî gamêşê qol reşî ne mêşa ji xwe diweşîne; ne jî ji hevalê xwe diweşîne. Belkî parikî lê eser bike. Heke tiştêkî bike.

Mi dî Ferzê digo de lo lo de lo lo

Sedûno birayo serê min diêşê dilê min jî dîne sed car dîne

Were serê min bihere li dora lingê xwe bigerîn e

Kefî egala li serê xwe bilefîn e

Tengê manegiyar bişidîn e

Dizginyê manegiyarê li destê xwe bi alîn e.

Ser yaliyê mexrebê de pêkeve ser yalyê meşreqê

Malperê maegiyar bi ser hevda bizivirîne

Destê mi kesûkê dare şikestî xwîşka xwe bigre

Ji nava êla giran tu derîne de lo lo lo

Ax de lo lo de lo lo de lo lo birayo li min sebebê de lo lo

Birayo havîne germê bi ser me de kîne kîn e
 Wextê Ferzê evê ji Sedûn re dibê dizikrîne
 Evê tena hanê li Hekarî dixîne
 Mi di Hekarî radibe kefi egalê li serê xwe dilefîn e
 Teng û berê maneyiyê dişidîn e
 Dizginê manegiyê li destê xwe di alîne
 Ser yalê mexrebê da pêdikeve yalê meşreqê
 Malperê manegiyên li hev dizivirîne
 De lo de lo lo de lo lo
 Wextê malperê manegiyên li hev dizivirine
 Şûrê hêşîn di destê xwe de dihejîne
 Ne divê kal ne divê pîr ne divê ciwan ne divê zarok
 Pêda pêda siya dara wan ji dinyayê diqelîn e
 De lo lo de lo lo mi dî Ferzê zivirî go Hekarî de lo lo
 Te li serê bi kefi bi egal î
 Tê bi şûro bi mertal î
 Şikir ji mala Xwedê re
 Ez dizanim ez ê dîsa ji te re
 Ji kurapê xwe re bibêjim Hekarî tu malxê
 Tê ji qîzapa xwe re bibêji bermalî
 De lo lo de lo lo ax de lo lo de lo lo
 De lo lo li min sebebê de lo lo

Ferzê dêna xwe didê. Hay lo lo Hekarî wisa dîn bûye serva hatiye ne dibê kal ne dibê pîr ne ciwan ne zar. Dibê ez ê gazîkimê bira li feqîr fiqara nexê.

Mi dî Ferzê digo de lo lo de lo lo Hekarî

Tê li serê kefi bi egal î

Hekarî dilê min ji dilanî dîne

Serê dilê min bi kul e bi keder e bi kerser e bi birîn e

Were serê qîzapa xwe bihere li dora lingê xwe bigerîn e

Mala te şewityo bese li feqîr û fiqara mexîn e

Kurê Şêxê Mûseka di hêşya te de sekiniye

Mînanî teyrê atmece dest bavêjê ji jorda bîne

Wextê ku Hekarî evê kelîmê ji devê Ferzê hiltîne

Mamûza bi manegiyava dişidîne

Orta meydanê xwe bi Kurê Şêxê Mûseka re digihîne

Dest davê minanî teyrêkî serçe ser zînde dildide tîne

Dike ku li ber lingê Ferzê li erdê xîne

Go mala te şewityo li ber lingê min li erdê nexîne

Li ber lingê Boz Begê deste biragê xwe li erdêxîne

Ku gava Hekarî Boz beg dibîne

Dêna xwe dayê ku dest pê girêdaye

Aqil diçe sewda serîda namîne

Li ber lingê Boz Begê li erdê dixîne

Serê Kurê Şêxê Mûseka difirîne

De lo lo de lo lo

Ax de lo lo Hekarî

Te li serî keffî bi egalî
Tê bi şûr û bi mertalî
Şikir ji mala Xwedê re
Ji te re bibêm kurapo malxê
Tu ji min re bibê jîFerzê tu bermalî
De lo lo de lo lo

Birayo evanê pêşiya êlê berdidin, bira êl ji xwe re bikişê. Dibê qurban îşê me karê me bi we neketiye hûn lêxin herin. Qesasê me ew bû. Ew jî me temîz kir. Êl dide pey hev dikişê diçe. Evana jî dest pê Boz Begê vedikin. Birînê Boz Begê melhema lédixin. Êl qederkî diçe dibêjin Xwedê mala me xerake. Evî lêxist axayê me kuşt. Em bûne minanî pezê bê şivan. Me serê daye ser hev da em ê kuda herin. Wele em ê bizivirin. Em diha axakî wisa jî nabînin, mêrikî zorbayê wisa jî nabînin. Em ê ewî ji xwe re axa qebûlkin. Ewî ji eger em êltî qebûl kirine bira me qebûlke qebûl nekiriye bira serê me gişka di binê şûr ra derbas ke here.

Hela hê Sedûn û Hekarî li ser Boz Begê birînê wiya derman dikan. Dêna xwe didinê êl careke din dîsa zivirî hat. Qurban hûn çima hatin. Dibê xwedê ji te razî be. Te axayê me kuşt. Em nihaka bûne mînanî pezê bê şivan. Me serî daye ser hev û du em ê kuda herin. Wele em ji te çêtir mêr nabînin ji te baştir jî axa nabînin. Wele em ê te axa qebûlkin. Tu jî me bi êltî qebûl dikî bike qebûl nakî serê me gişka di binê şûr ra derbast ke here. Dibê qurban we ku ez bi axatî qebûl kiri me, min jî we bi êltî qebûl kiriye. Bidne pey me em herin. Bira êla Kurê Şêxê Mûseka Hekarî lê bibe axa. Qirçîn bi êlê keve bide pey Hekerî were. Tê li hêşiya konê Zor Temir Paşayê Mîrê Milali ser kaniya çermûkê. Dibêjine êlê dibê hebinê kona bavêjine erdê. Kona rakin. Dema ku kona radikin. Wê çaxê Hekarî dibêje Ferzê. Dibê tu hebinê kona bikşîne heta ku ez çûme konê Zor Temir Paşayê Mirî Mila. Wextê ku Ferzê hebinê kona dikşîne. Hekarî jî dadikeve nav konê Zor Temir Paşayê Mirî Mila. Serê rimê dixê nav konê Zor Temir Paşayê Mirî Mila li hev û du dipêçe digire davêje. Ewa pênsed hev rîsipyê wî mezinê

wî tamamî dimînin li açixa* yê. Hekarî dibê ez ê devê jina tenim. Ça ez ne li malbim. Tu jina min bigri bifroşê xelqê. Wî çaxî Zor Temir Paşayê Mirî Mila dibê qurban. Tu jî zanî, Xwedê jî zane, pêxember jî zane. Ez li ber we Xwedê mêra rûreş im. Dibê ewa mêrka meriveki zilimkar bû. Dihât di hêşiya min de salê carekî heta ji min bac û xerac nestanda derbas nedibû nediçû. Qeweta min pêda nediçû. Welehî bi destê zorê ji min standiye hildaye çûye. Wexta te ev mêraniya hanê kiriye. Helala Xwedê li min heram be. Ez jî êla te tu jî axayê min. Bira ew jî bikeve bin mahiyeta Hekarî.

Eva eger deh roj eger danzdeh roj... Sêzdeh roj çardeh roj em kurt bibirin. Alimê xeybê ilelah e. Birînê Boz Beg pakdibin. Boz Beg dibê eger destûra we hebe. Ez ê sibê siyarbim herme nav êla xwe. Wê çaxê Hekarî gazî Sedûnê kurapê xwe dike. Dibê: "kurap hela were vêderê ez ê ji te re tiştêki bêjim". Dibê: "bêje". Dibê: "kurap nihaka çi laiqê vî mêrikiye. Nisbetî pêncsed siyarê xwe daye qirê. Em bigrin. Bidine vî". Ê qurban dibêje: "ew kincê ku tu lixwe dikî eva xulamê vî li xwe dîkin. Hepsê ku tu lê siyar dibi ew tenezul nake lê siyar be. Ê zaten ji malê dinê tu malê êla xwe tamamî top ki nabe weka malê wî. Ka îjar çi laiqê". Hekarî dibê: kurap ezê tiştêki ji tere bêjim tê gora min bikî". Dibê bêje: "îsal hejde sale, nozde sale ez bi xwîşka te bidergîstîme. Hetanî nihaka li ser doşeka pêxember diya min û xwîşka min bûye. Yanliz vextê evî eva mêraniya kiriye. Te girt da min ez ê jî bigrim bidime deste birakê xwe. Dibê qurban mi girtiye daye te tu bigri bikuji azakî mi kar pê nîn e. Eva diçe nav cimaetê. Dibê gelî cimaet sibê destebirakê minê here nava êla xwe. Ez difikirim tiştêki ku em laiqê destebirakê min bibînin tune. Lêbelê îsal ketiye sala nozda ez bi qîzapa xwe Ferzê dergistî bûm. Li ser doşeka pêxember hetanî niha ji diya min xwîşka min e. Yalniz kurapê min girtiye daye min. Tiştê ku laiq ez bibînim ancax ez dergîstiya xwe bigrim bidimê. Hê nikaha min li ser nîn e. Dibê ez ê bigrim bidime destebirakê xwe. Ku ew wisa dibêje. Boz Beg diqîre dest davêje qemê dikişîne ku li xwe xe. Evana xwe davijne ser Boz Begê digrin. Dibê yahû ez ça rabim werim pêncsed siyarê xwe ji pêş namûsa vîve bidime qirê. Ew jî rabe were vê kelîma han ji min re bêje. Wî çaxî xwe davijne ser dest û pê Boz Begê. Hekarî radibe du heqîba tijî zêr dike. Bi Boz Begê re siyar dibe. Diçe nav êla wiya. Herçiyê mirî xwîna wana xweş dike. Eger çend roja li cem Boz Begê dimîne. Dizivêre tê nav êla xwe. Wê demê heft ro heft şeva def deweta xwe û Ferzê dikute. Bira ew herin bi mirazê xwe şabin. Hûn ji bi îman û axiretê şabin.

*Açık: vekirî

ENCAM

Dengbêj Ahmedê Alîksan belkî negihîşte rojên dengbêjan ku xelata wana gakî sor didan, lê bûk bitenê ku denbêj Ahmed bihata bi destûr li male derdiket. Belkî ev li gayê sor bi qîmettir e. Nav û dengê wî ji kêfxwaşbûnê bes bû.

Dil nizm bû. Xwastinê gel di heman demê de dianî dewsê. Xwe ser tu kesî re nedigirt. Hêla digo ew ser min re nin.

Gotineke Kurdî yeke xweş heye dibên 'miriyê dostê xwe ye'. Yanî jibo dostê xwe miriye. Ew qas hej dost û hevalên xwe dike. Ahmedê Alîksan jî miriyê dostê xwe bû. Di malê dinê de cave wî tunebû. Dîsa gotineke Kurda ya xweş 'nan gak ber çava yek bû'. Hîn hevalê wî wiha digotin ku bihata qehwê kesî nikaribû perê çaya wî bide divê ewî bida. Dîsa digotin ku dan û standinek bikira li wir dostekî hebûya ji xwe çî bistanda dostê xwe re jî distan.

Di hawir dora xwe de rewşenbîr e Ahmedê Alîksan. Di herema xwe de di derheq perwerdeya keçan de pêşeng e. Pêwîst girtina perwerdeyê di jiyana wî de dostaniya wî û mamosteyan da kifş e.

Dengbêj Ahmedê Alîksan xwedî jiyanekê bi rûmet, bê şatafat e. Bavekî hêja, evîndarê xanima xwe ye. Di nav gel de hezkirî ye. Di hunermendiya xwe de şareza ye, serkeftî ye.

Ahmedê Alîksan karê dengbêjiyê her tim pêwîst girtiye. Xwastiye bila dengbêjê berdewam bike. Lewra karê dengbêjiyê karekî pîroz dibîne. Hem şagirt perwerde kiriye him jî xwestiye ku zarên wî jî evî karî pêk bînin lê mixabin di nav zarên wî kes nebûye dengbêj.

Bi dengêkî cuda karê ku bi xwe pîroz girtî dike. Xwedî dengêkî akûstîk e. Deng bi hunerê ve derdikeve asteke bilind. Li nêrin û nirxandinên kesan de me deng û şirovekirina kilamên da taybetiya Dengbêj Ahmedê Alîksan dît. Em bê guman dikarin bêjin dengbêjekî şareza ye. Hemû taybetmendiyê dengbêjan nîşanê me dide. Kilam nivîsiye û bi terzê xwe gotiye. Ewî jî wek dengbêjên qedir bilind şahidetiya dema xwe kiriye. Bûyerên qewumî wek kilama Taşlıçay, Werdê û hwd. li bîra dîrokê neqş kiriye.

Ji bo berdewamiya vê saziya dengbêjiyê gelek bi xîret bûye. Di her fîrsetê de bi hunera xwe dengbêjî nîşanê gel daye û hinek bi vî deng û hunerê girêdayê dengbêjiyê dibin. Ji bo domandina vî karî şagirt perwerde kiriye.

ÇAVKANÎ

- Adak, Abdurrahman, **Destpêka Edebiyata Kurdî ya Klasîk**, İstanbul: Nûbihar, 2013.
- Akçan, Sinan, "Anlatıcı Olarak Dengbêj Ve Dengbêj Anlatılarındaki Kahramanın Makûs Talihi", **Yüsek Lisans Tezi**, Kadir Has Üniversitesi, SBE, , İstanbul, 2014.
- Alakom, Rohat, **Folklor û Jinên Kurd**, Stockholm: Nefel, 2002.
- Alan, Ramazan, "Bavê Helbesta Gelêrî û Ferxên Wê", **Kovara Bîr**, 2011.
<http://www.kovarabir.com/remezan-alan-bave-helbesta-geleri-u-ferxen-we/>
(Ragihandin 21 Mart 2015)
- Alan, Ramazan, "Dengbêj(î) û Helbesta Gelêrî", **Wêje û Rexne**, Hejar 4, 2015.
- Alan, Ramazan, **Bendname**, İstanbul: Avesta, 2009.
- Alan, Ramazan, **Kürt Halk Şarkıları İçin Küçük Bir Poetika**, İstanbul: War, 1997.
- Alan, Remezen, **Folklor û Roman**, Stenbol: Peywend, 2013.
- Aras, Ahmet, "Kilama Kurdî û Denbêjîya Serhedê", **Kovara Bîr**, 2010.
<http://www.kovarabir.com/> (Ragihandin:20 Mart 2015)
- Aras, Ahmet, **Şairê Kurda yê Efsanevî Evdalê Zeynikê**, İstanbul: Ağrı Yardımlaşma ve Dayanışma Derneği(Akyad), 2013.
- Baydemir, Osman, **Antolojiya Dengbêjan**, Diyarbekir: Pêwendî, 2011.
- Benek, Abdurrahman, **Gotinên Pêşyan Çîrokên Dawiyan**, İstanbul: Nûbihar, 2014.
- Bozkoyun, Mehmet, "1890î hetanî 2000an Rojname û Kovarên Kurdî", **Semînare Lîsansa Bilind**, Zanîngeha Bîngolê, 2014.
- Burak, Şevki, Mijara Hevpeyvînê "Jiyan û Kilamên Ahmedê Alîksan", Ağrı, 15 Mayıs 2015
- Can, Ali Haydar, Mijara Hevpeyvînê "Jiyan û Kilamên Ahmedê Alîksan", Ağrı, 16 Mayıs 2015
- Celîl, Celîlê ve Naza Celîl, **Stran û Awazên Kurdî**, Wien: Înstîtûya Kurdzaniyê, 2011.
- Celîl, Celîlê, **Keşkûla Kurmancî**, Wîen: Ayhan Matbaası, 2004.
- Celîl, Ordîxanê ve Celîlê Celîl, **Zargotina Kurda**, Amed: Aram, 2013.

- Cizîrî, Şerefhan, **Edebiyata Devkî û Sosyalîzasyon**, İstanbul: Aram, 2011.
- Çifçi, Tekin, **Kilam û Jin**, İstanbul: Nûbihar, 2014.
- Çolemêrgi, İhsan "Sözlü Kürt Edebiyatında Destanlar", **İnatçı Bir Bahar**, Vecdi Erbay (drl), İstanbul: Ayrıntı, 2012.
- Dengbêj, Bekir, Mijara Hevpeyvînê "Jiyan û Kilamên Ahmedê Alîksan", Ağrı, 16 Mayıs 2015.
- Ekîncî, Hayrettin, **Dengbêjî**, İstanbul: J&J, 2013.
- Ergün, Zülküf, **Bajar- Edebiyat û Cizîra Botan**, İstanbul: Nûbihar, 2014.
- Eytemiş, Cesim, Mijara Hevpeyvînê "Jiyan û Kilamên Ahmedê Alîksan", Ağrı, 16 Mayıs 2015.
- Gewerî, Firat, **Kultur, Huner û Edebiyat**, Stockholm: Nûdem, 1996.
- Gültekin, Mehmet, **Zargotina Kurdên Serhedê**, İstanbul: Avesta, 2013.
- Hîkmet, Bedran, "Dengbêj Geleneği", **İnatçı Bir Bahar**, Vecdi Erbay (drl.), İstanbul: Ayrıntı, 2012.
- Izay, Mehrdad R., **Bir El Kitabı Kürtler**, İstanbul: Doz, 2013.
- Jwaideh, Wadie, **Kürt Milliyetçiliğinin Tarihi**, İstanbul: İletişim, 2012.
- Karademir, Fevzi, Nezir Gümüş ve Diğerleri, **Kürtçe-Türkçe/Türkçe-Kürtçe Sözlük**, Ankara: Türk Dil Kurumu, 2014.
- Karasongül, Abdulbari, Mijara Hevpeyvînê "Jiyan û Kilamên Ahmedê Alîksan", Ağrı, 16 Mayıs 2015.
- Kemal, Yaşar, **Yer Demir Gök Bakır**, İstanbul: Yapı Kredi, 2004.
- Kevirbirî, Salihê, **Filtê Quto**, Stockholm: Nefel, 2002.
- Merwanî, Cewad, **Kilam & Stranên Kurdî**, İstanbul: Avesta, 2010.
- Nebez, Jemal, **Kurd (Dîrok û Kultura Wan)**, İstanbul: Avesta, 2007.
- Nezan, Kendal ve Newzat Çelebî ve Diğerleri, "Li Muzîka Kurdan a Kevneşopî Nêrîneke Giştî", **Zend**, bihar-havîn, 2008.
- Ong, Walter J., **Sözlü ve Yazlı Kültür**, İstanbul: Metis, 2013.

- Oremer, Kaşkar, "Dengbêjlik, Edebiyat ve Kadın dengbêjler", **İnatçı Bir Bahar**, Vecdi Erbay (drl.), İstanbul: Ayrıntı, 2012.
- Öncü, Mehmet, "Dengbêj û Dengbêjî", **Antolojiya Dengbêjan** Diyarbakır: Pêwandî, 2011.
- Öz, Sûleyman, "Doğu ve Güneydoğu Anadolu Sözlü Kültüründe Hikaye Anlatıcılığı", **Yüksek Lisans Tezi**, Mimar Sinan Güzel Sanatlar Üniversitesi SBE, 2003.
- Özağaçhanlı, Zelal, "Kürtlerde Sözlü Kültür ve Hikaye Anlatıcılığı: Dengbejlik Geleneği", **Kimlik, Kültür ve Değişim Sürecinde Osmanlı'dan Günümüze Kürtler**, Bingöl, 2013.
- Özdemir, Ayhan, Mijara Hevpeyvînê "Jiyan û Kilamên Ahmedê Alîksan", Ağrı, 22 Eylül 2014.
- Özdemir, Nigar, Mijara Hevpeyvînê "Jiyan û Kilamên Ahmedê Alîksan", Ağrı, 22 Eylül 2014.
- Özdemir, Şenay, (2015, Mayıs 9). Mijara Hevpeyvînê "Jiyan û Kilamên Ahmedê Alîksan", Van, 9 Mayıs 2015.
- Rodi YÜZBAŞI, "Mezopotamya'da Dengbej'likten Sinemaya Anlatı Sanatı 'Miras'", **Yüksek Lisans Tezi**, Mimar Sinan Güzel Sanatlar Üniversitesi SBE, 2012.
- Ronî, Miraz, "Dengbêjlik ve Edebiyat", **İnatçı Bir Bahar**, Vecdi Erbay(drl.), İstanbul: Ayrıntı, 2012.
- Sanders, Barry, **Öküzün A'sı, Elektronik Çağda Yazılı Kültürün Çöküşü ve Şidetin Yükselişi**, İstanbul: Ayrıntı, 2013.
- Taşkın, Hanifi, **Ferzê û Hekarî**, Yayınlanmamış kitap Van: 2011.
- Taştan, Paşa, Mijara Hevpeyvînê "Jiyan û Kilamên Ahmedê Alîksan", Ağrı, 15 Mayıs 2015.
- Thomson, George, **Tarih Öncesi Ege**, Cilt II, İstanbul: Payel, 1997.
- Uygar, "Yusuf, Kültürel Bellek ve dengbêjlik: Doğu Anadolu'daki "Dengbêjlik" geleneğinde Belek Üretimi", **Yüksek Lisans Tezi**, Mimar Sinan Üniversitesi, İstanbul: 2009.

Uzun, Mehmet, **Dengbêjlerîm**, İstanbul: Gendaş Kùltür, 1998.

Uzun, Mehmet, **Detpêka Edebiyata Kurdî**, İstanbul: İthaki, 2010.

Uzun, Mehmet, **Kürt Edebiyatı Antolojisi**, İstanbul: İthaki, 2007.

PÊVEK

Pêvek 1: Bi Ayhan Özdemir veHevpeyvîn 22/09/2014

Ayhan Özdemir kurê Dengbêj Ahmedê Alîksan e. Di sala 25.08.1972 yan de li Agiriyê hatiye dine. Niha li Gebzeyê dijî.

Hûn dikarin behsa jiyana wî bikin?

Ji kîjan eşîretêye? Ji ku derê hatine Agirî yê? Di kîjan salêû kiderê de hatiye dinê?

Ayhan Alîksan: ser çewa hatî. Ahmedê Alîksan gundê Alîksan hate dinê, heta jiyana xwe dest da jî li Alîksan ma. Eşîreta wî Xelesinî ye, Xelesinî digije Sîpka. Li agiriyê gundê Alîksan hatiye dinê 1938 an de hatiye dinê lê dîgo ez du salan piçûk li dame 1940 nivîsîne nasnameyê de. Zaroktiya wî tev li Alîksan derbas bûye. Hetanî jiyana xwe dest dayeeynî li Alîksan maye. 2002 an de jiyana xwe li Alîksan dest da.

Xweda rihma xwe lêke.

Paşnava we Özdermîr e ji bo çi dibêjin Ahmet Alîksan?

Alîksan navê gundê wî ye.

Bi Alîksan tê naskirin?

Nexêr Alîksan bi wî tê naskirin. Mesala em carna diçin ciyên din ku pirs dikin hûn xelkê ku ne? Ku em dibêjin Alîksan dibêjin gundê Ehmed Alîksan e. Em dibêjin belê gundê Ehmed Alîksan. Yanî Ahmedê Alîksan li ser gund ketiye.

Jiyana rojane çawa didomand, aboriya xwe çawa dikir?

Xebata wî rêncberî dikir, eraziyên xwe hildida datînî. Wekî dinê ser wê xebatê di memleketê Agirî yê de di çanda dengbêjiyê de sembolek e. Lê Ahmedê Alîksan di derva hêngî ev trt 6 , kanalên Kurdî ku vebûne zêde nayê behskirin notilê ku tirkî dibêjin urunekî qalîtelîyê bê reklam wisa Ahmedê Alîksan dengbêjekî mezin e lê tariyê de maye zêde nayê behskirin.

Li ser xwarin û vexwerina xwe baldar bû, cixare dikişand an na?

Hindik dikişand hine caran dikişand û şeş meh salek hine caran dikişand 5,6 sala nedikişand. Wisa yanî cixareke dewamlî nedikişand ciwantiya xwe de pir kişandibû lê vê axiriyê em gîhîştne nedikişand.

Di avayê siyasî de çawa difikirî?

Îsanekî bawermend bû. Xwedî taet bû. Yanî Kurd û tirk cudatî nedikir biratî diciband. Hinekî jî zemanê ku dengbêjî dikir wî çaxî dengbêjî yasax qedexe bû zimanê Kurdî qedexe bû. Dihate malê em piçûk bûn tabî tê bîra min, digo dîsa îro polêsa ez hildame birime hinekî ji min re heqeret kirine ez tehdît kirime gotin tu çima kilamên kurmancî dibêjî carke din em nebînin falan.. Îja ber xwe diket digo zimanê meye ka emê kuda herin. Em ê memlektê xwe terkin kuda herin. Ku em zimanê xwe jî xeber nedin em ê çawa bikin. Îja îro eva dûrima hanê ku em qanala de dibînin, ev konrefans ku waha çêdibin ez wan zemanê wî tînim bîra xwe ez jî zehf diqehirim. Îro ev ro bidîta yê daha zehf kêfxweş bû ya. Ev ro nedît ji bo wiya ez zehf ber xwe dikevîm.

Dengê xwe çawa eyar dikir û diparast?

Mesela Ahmedê Alîksan ez niha jî dengbêja dinihêrim hine dengbêj hene dengê wan zelal e bilnd e lê kilamên bi hemdê xwe nikare bibêje, bi tenê kilamên hewale kilamên bilind dibêjin. Hinek jî hene dengê wan bi hemad e nikarin kilamên bilind bêjin. Lê Ahmedê Alîksan hûn jî dizanin kilamên bi hemad be jî kilamên bilind be jî digot. Bi her terzê jî digot. Xweda Teala dengêkî wisa dabûyê her awayî digot.

Perwerdehiya wî hebû an tinebû. Ku hebe li kî derê perwerde bû?

Xwendin û nivîsara wî hebû îlkokul xilaskiribû. Ew çax zemanê îlkokul xilaskiribû mekteb tinebûn gunda da di mala de, digo oxretmen tinebû egîtmen hebûn di gund de îlkokul xilaskiribû.

Kîngê zewêcî, li kî derê leşkerî kir?

1960 de li Tekîrdax Gelîbolû da leşkerî kir. Beriya leşkeriya xwe zewaca xwe kiribû. Zewaca xwe jî diya mi xelqê Gîhadîneye, Gîhadîn navça Agiriyê ye. Dîya mi bavê wê wefat kiriye hatiye mala apê xwe. Apê wê ew, xwîşka wê bi diya wê ve hildaye aniye mala xwe. Beriya leşkeriya bavê min diya mi xastiye.

Çend zarokên wî hene?

8 hev zarê wî hebû. 3 kur 5 hev jî zarê qîzî hene hemû jî li heyatêne.

Li ser zarokên wî helbestên wî hene?

Li ser eqreba û nasê wî helbestên wî hebûn.

Têkîliyên wî û dengbêjiyên çawa dest pê kir?

Di oda, cemaat an dîwana de digot?

Dengbêjiya wî 12 û 13 Salî bûye mi evali diya xwe suwal kir digo gotiye ez 12, 13 salî bûm mi kilam digot dengê wî xweş bûye, zemanê digot kalkê wî hebûye kalkê wî Eslan, ew jî dengbêj bûye dengbêjê dewata na yê rûniştî bûye. Dengê wî xwe bûye hinekî ber destê wî jî hîmê dengbêjiyê bûye. Hîmê qayda bûye. Piştî wiya di cemaeta de, di dîwana de berê cemaetê mezên top dibûn gazî dikirin digotin were me ra kilama bêje. Rihmetiyê bavê mi jî diçû ji wan re kilam digot. Dewat zemanê ku çêdibû dewatada, wê axiriyê tê bîra mi, dewate da digotin hetanê ku Ahmedê Alîksan neyê em bûkê nadin. Dihatin Ahmedê Alîksan dibirin ji wan re kilam digot wisa dewata xwe dikirin.

Kilamê dewata an yê dengbêjiyê digot?

Kilamê dewata nedigot, yê rûniştî digot.

Ekolê wî kî bû?

Ji Nûrûyê Meter zev hizdikir. Hem dostê hev bûn jî. Her daîm cerm hevbûn ji hev nediqetiyen. Digo Nûroyê Meter dengbêjekî cidaye. Ji Reso zev hizdikir. Son zemanê Reso de go carekî ez gûndekî re derbas bûm, go ez bi hespê diçûm gundî hatne pêşiya mi gotin di gund de dewat heye dengbêj jî Resoye tê jî werî çend kilama bêjî, go ez peya kirim ez çûm Reso kal bû ez civan bûm. Mi nihêrî Reso kilama dibêje lê kal bû zemanê wî yê dawiyê bû dengê wî giran bû. Em çûn rûniştin go gundiya go Ahmedê Alîksan jî hatiye hûn dixwazin bira Ahmed jî ji me re çend kilama bêje go mi çend kilam got. Go Reso jî herhal du ro û du şev bû kilam digot westiya bû. Go got ez westiyame ez jî kalim Ahmed him dengê wî xweş e him jî ciwan e bira hinekî ew dewsa mijî we re bêje ez jî bêhna xwe bistînim. Go mi weke sietek du sieta kilam got û mi peyra xatirê xwe ji wan xast.

Naverokên stranên wî bi çi rengî bû?

Ser hemû renga helbestên wîhene; ser evînê ser şera ser qehremaniyê ser eşîra. Ser evînê diha pirin.

Helbestên wî hene an tînene, destnivîsên wî jî hene?

Helbestên wî bi xwe hene lê ez çend hev hene nizanim. Birayê yekî miribû hatin gotin tu ser wî kilamekî bejî mi dît ewî nivîsî, pêşiyê qite qite dinivîsî paşê ser wîna digot.

Dest nivîsê wî di destê wede hene?

Em zev geriyan nabînin. Ez gelek qasetê wî top dikim. Dostê wî yê kevn cerm xwe veşartine ji mi re dişînin. Wê ro yê Şakirê Kopê hatibû vira ew çûbû Qaxizmanê go ez mala dostekî bûm go gotiye du hev qasetê wî li cerm minin. 40 sal berê ji min re tijî kiriye mi zeh rica kir mi go bira wana ji min re bişîne belkî top dikim. Ewêjî ji min re werin. Helbestên wî em pir digerin em nabînin. Gelek jî Qaset di mala de tîn girtin hineka guh nedanê xirabûn.

Çend qaset û vîdeo yê wî hene?

Qasetî ji 100 hevî zêdetirin.

Navên qasetên wî çi ne?

Nav danetîne. Bi teyîba tijî dikirin. Kilam digotin qasetada wisa diman. Nav nedidan. Belkî bi hezaran qaset tijîkiriye di dest me da 100 hev heye.

Texmînen çend helbest gotine?

Go Reso pênc ro pênc şeva bigota kilamê wî xilas nedibû , digo ji Reso şûndatir ez bawer nakim kilamê tu dengbêjî weke kilamê mi pir be. Digo ez sê ro sê şeva qet nesekinim bêjim dikarim bêjim. Ewêjî ez dihesibînim hezarî derbas dibe.

Wefata wî çawa bû, nexweşiya wî hebû?

Nexweşiya wî kin bû. Em dereng pê hisyan penceşêra pişikê girtibû. Apê mi wana li Akdenîzê Denîzliyê Aydinê dijîn. Bi nexweşiya wî hisiyana bavê mi birin wira gotin wira profesorê rind hene belkî çarekî jê re bikin. Hildan birin gelek gerandin doxtora gotibû tişteki ku em bikin tine biherine malê. Hate malê 9 roja ma wefat kir. Nexweşê nav ciya nebû, nexweşê ser piya bû.

Çend salî bû wefatkir?

62 alî bû. Li gundê xwe wefat kir.

Qebra wî li ku ye?

Qebra wî jî li wire.

Li ser qebra wî tiştê hatiye nivîsîn an na?

Ser qebra wî navê wî hatiye nivîsandin.

Ku hûn bi çend peyva behs bikin hûn dikarin çi bêjin? Çend peyvên ku wî bi kurtasî bide naskirin?

Ser çanda dengbêjiyê sembolek bû Ahmedê Alîksan. Jiyana wiya însanekî mûtevazîbû. Însanekîhelîm bû. Kes jê aciz nedibû, cînarê wiya gundiyê wiya zev jê hizdikirin. Duh jînan bikin me cihe kî nan dixwar gûndekî ji gundê me wêda Şeko dibêjin, xelkê wî gundiye me hev dît me kêfxweşî da hevdu çev mi ket girya, mi dêna xwe dayê destmala xwe derxist hêsri xwe paqîş kir. Yanî ji muhebeta bavê mi ji muhebeta Ahmedê Alîksan. Dostê wî bû. Mehekî ewul mi ew cedekî de dît mi kêfxweşî dayê mi go qe tu çanî go ez hinekî nexweşim mi go xwe binhêre tu mirovekîfextyarî girya go yekî mîna Ahmedê Alîksan çû daha ez hebim çiyê. Yanî Ahmedê Alîksan xwe bi herkesî dabû hizkirin. Mirovekî hijêkirîbû. Însanekî bawermend bû tu evdekî xwedê jê açiz nebû. Ku behsa wî dibe herkes rihmetê lê tîne. Rengek bû.

Di nav zarê wî de yê dengbêjiyê pêk tîne hene?

Dengê zarê wî hemen hemen yê hemûka jî xweş bû. Zemande ji mi re zehf got çend kilama hilde zemanê were mi jiyana xwe ji dest da jî tu çûyî cî kî bêjin eva kurê Ahmedê Alksan e xelkê bêje tu kurê Ahmedê Alîksan were ji me re du kilamê Ahmedê Alîksan bêjehema tu jî ji wan re du kilamên mibêjî. Wî çaxî em cahil bûn me nizan bû yek jî wisa dewletê zimanê Kurmancî qedexê kiribû me lê sar dinihêrî me digo ça hebe nahêlin em bêjin. Em bêjin çend pere dike. Ew xwîşkeke min Anadolû lîsesî xilaskir aniha li Wanê mamosteye di navbera lîsa de pêşvaziya kilama hebû çend sal berê li vira Agiriyê de bû yekemîn. Îja gotin em bişînin heremê me nehîşt ji bona dersê wê re nebe pisgêrêk. Plaketek dabûnê cara rihmetiyê bavê mi hinek fikir digot mi emrê xwe da denbêjiyê kesî plaketek neda min keça mi bi du kilma plaketek girt. Dengêherd birayê min jî xweş bû lê me negot ew jî kimasiyeke me bû, em aniha jî zev ber xwe dikevin em dibên xazila em hîmbûna zemande me bigota.

spas

Pêvek 2: Bi Dengbêjê Kurdistanê Xalê Bekir ve Hevpeyvîn 16/05/2015

Dengbêjê Kurdistanê Xalê Bekir hevalê Admedê Aklîksan e. Ji dayîkbûna Dengbêj Xalê Bekir 1954 e. Ji gundê Yoncalı ya girêdayê Bazîdê ye. Bazîd navçeya Agiriyê ye. Lê li navenda Agiriyê dijî.

Ji kerema xwe hûn dikarin behsa xwe û dengbêjiyê bikin?

Baxçê wî welatî zimanê hurdfî xencî min kesî nemeşandiye. Li Diyarbekirê Mehsetîn hebû, bavê xalê Weysî hebû Bazîdê jî ez bûm. Ez niştecihê Bazîdê me. Hemen hemen 25 û 30 sale mala min li vira Agiriyê ye. Ez Bazîdê hatime vira piştî wî 30 salî hemen hemen dikeve sala diwaxdehan da televîzyon gazî min dikin Denge tv, Arîn tv, tek sê cara çûme TRT6ê. Dewamlî Denge tv, Arîn tv, Stêrk tv. Hema hema nezkî 40 salî ye ez ser meşandina zimanê Kurdî dixebitim.

Xweda rihma xwe dê û bavê weke rihmetiyê birayê min ê Ahmed bavê Ayhan Ahmedê Hêlikan bi soyadiya wî nayê naskirin bi navê gund tê naskirin. Gund jî bi wî ve dihate naskirin. Digotin tu xelkê kuyî digotin ez li gundê Ahmedê Hêlikan im. Bi xwedê dengbêjekî nav û deng e. Mi wextê wî de kilam nedistrand. Mi dengbêj dianî mala di xwe de mînanî televîzyona bernamê çêdikir band tije dikir û difiro. Wextekî min ê dewamlî bistranda tunebû. Dengbêjî yan serê mirovê rihet be bi tenê dengbêjiyê bifikire dibe dengbêj, yek jî derd kulê mirov zehf be bengî be dibe dengbêj.

Min ser Kobanê ser Şaredar Sirri kilam çêkir. Niha jî li ser xwîşka Leyla Zana çêdikim.

Xalê Bekir we ça hev naskir?

Naskirina min rihmetiyê birayê min ê Ahmed, Ahmed zehf mirovekî xencî dengbêjiyê misilmanetiya wî jî zehf zêde bû, zehf dirust bû. Li dujminê xwe jî çevêkî xirab nedinêrî. Mirovekî riya wî zehf duz bû xweda rêya wî nede boşê. Dengbêjekî nav û deng bû, li welatê me da bû, hozanekî pîr delal bû. Mi sala 1971de min Ahmed naskir ez xelkê Bazîdê me wî çaxî gundekî vira heye gundê Heyderoxlî heye ez li wira dergîstî bûm ciwantî jî hebû Rihmetî apê Ahmed ji min re bû bira go tu birayê min ê piçûkî. Îja nasya min û wiya li vira qehwa Seyîda vira heye ez hatim mi di millet top bûye dengek tê. Wî çaxî Kurdî jî qedexê bû mi go ev çiyê gotin eva Ahmedê Hêlikan e Ahmedê dengbêj xelkê Hêlikan e. Min jî dixwest ku dengbêj Ahmed nasbikim hele rengê wî,

devê wiya, qabiliyet wiya, şexsê wiya çika çi însan e. Neyse ez çûme qehwa Seyîdan him jî otêl bû. Mi go ez dikarim dengbêj Ahmed bibînim gotin tu ji kuderêyî min go ez xelkê Bazîdê me gotin du hev band anîne dengbêj Ahmed tijî dike go tu herî divê tu dengê xwe nekî. Ez çûm mi dengê xwe nekir mi bi destê xwe selam da go were were niha di bandê de jî deng heye go were ez bi qurbana te tu ji kuyî birayê piçûk birayê delal. Mi birayê Ahmedê dengbêj me wî çaxî mamoste nizanibû me Kurdî jî nizanibû lewra Kurdî qedexe bû. Mi go ez xelkê Bazîdê me go were cem min rûnê go ez tîpa te dinêrim tîpa dengbêja ne. Mi go dengbêj Ahmed destê te ramûsim mirov qet dikare cem te bistrê biaxife. Zehf bi min kenîya kêfa wî zehf ji min re hat xweda cihê wî cinet ke. Mi wê sala 1971kî hetanî jiyana xwe ji dest da naskirina me çê bûye merhebatîya me zêde bû. Ez hatim mala wî çûm ew hate mala min çû hema bê 20 qasetan rojê derbas bûyî ye min tijî kir. Ê bi xwedê ez bi xwe jî dengbêjiyê dikim ser kederê ez bûm dengbêj mi dengbêjekî mîna Ahmed nedît. Min li hember wiya mi mamoste nedît. Dengê wî da, gotnê wî da, xeberdana wî da, terbiya wî da, rabûn û rûniştina wî da min însan nedît.

Xalê Bekir bandora wî li ser gel çawa bû?

Bi xwedê biçûya kîjan qehwê hinek xusûsf dihatin digotin Ahmed kîjane nîşan didanê. Zehf xwe dinêrî Ayhan jî bavê xwe çûye. Rengê wiya tîpa wiya qedrê wiya dewsa wî girtiye. Ew jî dewsa bavê xwe ji min re biratiyê dike dewsa wî wala nehîştiye. Çi wala hîştiye dizanî bi tenê dewsa wî dengbêjiyê doza wî dewan nekir. Sîrf ji wurdê ez hinekî jê dilgiran im. Mi go birazyê Ayhan yekî mîna Ahmed bavê te bû te çima jê hilneda. Go ziman qedexebû me nizanbû ku dinyayê wiha be. Bavê min jî yê heta dinya saxbe ewê jî saxbe ji me ra strana bêje. Go êdî tiştê derbastbûyî feyde wî tune êdî destê me derket. Go min bizanîbûya qet kêlekê ranedibûm hema wisa ber devî wî ber kelîma ketîma herhal jî wisane. Bi xwedê durustîya û misilmanetîya wî jî tu kesî tunebû. Çevî wî li malê dinyayê û pera tunebû. Biçûya qehwê kesî nikaribû perê çaya wî bida ewî ya her kesî dida. Comerd bû mala xwe da jî comerd bû ez zehf dihatim mala wan min zehf hinekê xwe li dikir. Zehf jî li min hezdikir. Min di go Ahmed abê filan gundî filankes nizane di go na yaw mêrik dengbêj e, ji min dengbêjtir e. Wisa jî dilnizm bû.

Rewşenbiriya wî we çawa didît?

Ê bi xwedê Bazîdê, Gihadînê vê çevra me ra hetanî yalê Qersê, Îdirê yalê Qoçbaşiyê heta Kaxizmanê, Sariqmûşê, Erzurimê kê navê Ahmed bihîstibya dewateke xweş heba yek jî hevdu mene bigirtana di gotin tê herî dengbêj bînî digo birêmin ez kê bînim digo hetanî Ahmedê Hêlikсан neyê vira ez qîza xwe nadim kurê te veyaxût ez îzna dewatê nadim. Ahmed jî mirovekî xatirlî bû gava ku şerek hebûya dengbêj Ahmed biçuya wê derê sadece saya dirustiya wiya, saya dengbêjiya wiya, saya hurmeta wiya ewa îşa seba xatirê Ahmed dihate çêkirin nedihîşt têda xeta çêbe. Yan jî mêrik digo ez bûkê nadim. Dibirin digotin me Ahmedê Hêlikсан aniye, Ahmed ber digeriya wê şevê dibû nivanê wî jêra stran digot nesihat lê fikir ewa îşê wan xilas fikir çêdikir. Di nava welêt de dihate hezkirin çimkî tu xirabiya wî tu kesî re tunebû. Mîsal ku kurê wiya ji min re nebaş bûya nedigot Bekir heqsiz e kurê min heqlî ye, belkî jî kurê wiya maftar bûya jî ewî kurê xwe heqsiz fikir ewa dewa dida sekinandinê. Însanekî di nava alemê de hezkirî bû.

Dengbêjê ku jê sûd girt ku behs fikir hebû?

Bi xwedê eva ez jî ketme sala şêst û pênc, mi sala 1971da nas kiriye heta niha bi xwedê ez jî şêst û pênc salîme ez zar bûm zarekî jihatî bûm zehf serwaxt bûm jî. Wê çaxê dengbêjek bihata qarşî Ahmed bistra mi nedît. Xweda rihma xwe lêke rihmetiyê Şakir dengbêjekî nav û deng bû. Yekî mîna Şakir ez bawer dikim nikaribû cem Ahmed bistra. Kesekî ku cem Ahmed bistra min nedît. Vira dengbêj hebû Kazoyê Garisya hebû, Zahiroyê Kopê ku dihate vira hebû, Tahir hebû, vira yekî navê wî Heyder bû hebû, Miheme Salih Hebû, rihmetiyê Cemîl hebû, Nûroyê Meter hebû. Mi digote rihmetiyê Ahmed li hember te kê heye digo tu mîna qezeteciya mirov dinêrxînî ez Nûro dengbêj dibînim. Mîgo mamoste tu ça wiya dengbêj dibînî, bi xwedê mi rojê 1200, 1500 qaset mi çî bifrota nîvê zêde ye Ahmedê Hêlikсан bû. Mi digo qe qasetê wî nayê firotin dî go millet gelek jê fehm nake lê Nûro wisa dengbêje ku kilamekî dibêje kilamê wî yêr bi yêr e. Gi kilama mala Êsibê Seydo serê Kurda zilm kirine zilalet kirine digo kilamê Nûro ye wane. Digo Nûro pir dengbêj e Nûro birayê min ê dinya û axretê ye ez zehf Nûro hez dikim. Mi qet çima rojekî navêjin berhev go gotye devê min ber te nagere dengê te bilinde, tu ser min de diqûrî ez ji te ditirsim Ahmed. Dengê Rihmetî zehf bilind bû digo dengê te nakeve dengê me dikeve. Rihmetî dikenya digote Nûro tu çawa bêjî ezê bi qaydê te werim. Tu dixwazî ez hindik bêjim bila bêjin Nûro dengbêj e digo na tu mamosteyî digo exîtîma te ku Kurdî hildaye zehf zêdeye. Ez jî bi xwedê çiqas dengbêjê

welatê Kurdistanê heye qasetê wana gişka cem min heye. Bi xwedê çûye derbas bûye ez wî webalî, mi bandê Ahmed qasî gişka difiro.

Rihmetî her kilamekî de dengêkî din derdixe tu dibê qey yekî dine hûn evê girêdine çi?

Eva merîfeteke zehf mezine, xwandineke zehf mezine. Her însanekî çawa mirov qaydê wî xeber dide her kilamekî terzê wî cuda ye, gotinê wî cuda ye, meqamê wî cuda ye. Her însanekî angorî wî hurmeteke wî heye. Dengbêjî jî wisaye wexta te kilam go qaydê kilamê heye. Min carna mamoste Ahmed re digotê mamoste carna ez devê te guhdarî dikim ez nizanim dibê yekî dine. Go Bekirê bira ewa kilama wisa tê gotin lewra meqama wî welatî wî gundî wisane. Em tev Kurdin zimanê te diha parçekî cuda ye, yê Agiriyê cuda ye. Digo ezê qaydê zimanê vî şehirî, qaydê zimanê gundî veyaxut qaydê zimanê Wanê yan jî ezê ya Diyarbekirê, Mûşê bêjim. Ewa olaya Mûşê çêbûye ezê ser terzê wan bêjim. Ewa jî femekî zehf mezin e her kes nikare ewî zimanî xeberde.

Hevaltiya we, hinekê we hûn çi dikarin ji me re behs bikin?

Bi xwedê hinekê wiya butunê dengbêja gi hinekçî ne. Wexta dengbêj ku hinekçî nebe nikare bêje. Wî çaxî çêp tilefûnê tunebûn min jî mala xwe anîbû vê derê carna gazî min fikir digo tu kê derêyê kuro Celalî ez howa tîm cete Bekirê Celalî. Digo kuro hûn Celalya dizekin leqeb li min fikir. Kêfa wî zehf ji min re dihat. Min digo ez filan derê me, laqirdî li min fikir, behsa dengbêja fikir behsa Celalya fikir. Bi xwedê mamoste Ahmed mirovekî zehf hinekçî bû behsa tarîqa Kurda fikir. Min digo mamoste mala Seydo çi kiriye ew Yûsif, Eslan, Heydo tu çi dibêjî wana meşhûr dikî. Digo mala Êsibê Seydo Kurdne zehf delal bûne, seba Kurdiyê bi mala xwe ve bi çolîk çocixê xwe ve heta dibêjin jina Dîlo Dilşo jî ewna seba Kurdiyê mucadele kirine dewletê re şer kirine salxê wan ji me re dida. Di go ewa kilama Elîcan wuha kiriye, Feyzo wiha kiriye. Mi digo tamam te kilama Feyzo Fesîhê Mihê Mîrze çima gotiye. Digo Fesîhê Mihê Mîrze zartiya wî hetanî van salê ku êdî yê jiyana xwe dest bide digo gi ser kaçaxiyê ser şer dewa çêbûye. Heta çûye binê xetê Suriyê. Mi bi xwe jî rihmetiyê Fesîh dît wexta Fethêyê kurê wî hatibû girtinê Erzormê hepsê de bû, deh mîr hatibû kuştinê wê arê de, kurê wî Erzormê ku dixebitû ez jî çûme Erzormê mi dî tevî qûrûbekî tê. Min hat ji mamoste Ahmed re jî got. Mi go tu kilama Fesîh dibêjî mi çû Fesîh dît. Tevî qûrûbê tê mi go ewa xêre min ji yekî Erzormê pîrskir li Mehlebaşiyê. Go ewê hanê Fesîhê Mihê

Mîrze ye. Min jî band difirotin navê wî di kilamê Rihmetî Ahmed de şixul bihîstibû. Min jî meraq dikir. Min digo gelo ev Fesîh çi însaneke qilix qiyafetê wî, rengê wiya, boyê wiya û rewşa wî çiyê. Min dî wêda tê yekî kumekî tiftîk seriye, yekî bilind min bilintire ez şîşmanim ewa normal e. Mi mamoste rihmetiyê ji Ahmed re got, min go ez pêşiyê millet jî qedera 40 – 50 mirovî pêra dihat çevê hev nihêrîn gotin dibe eva genca tiştêkî bîne serê Fesîh yan tiştêkî bike. Min go gelî hevala ez xulamê mezinan im ez xelkê Bazîdê me ez hezdikim apê Fesîh bibînim destê wî paçkim xeberdaneke min heye jê ra bikim. Destûra we hebe ez mirovekî xerîbim îro xwedê kiriye nesîb ez ewî bibînim. Go berdî bira were biraziyê min, min go selam eleykum go eleykum selam. Min got apê Fesîh tu dikarî tûyî devê min bikî destê xwe bidî ser serê min. Go min fem nekî çîma tûyî devê te kim destê xwe bidim ser serê te. Min got tu zehf jihatîyê ez dixwazim ew zimanê te bikeve devê min ew cisaretê te bikeve zikê min. Rihmetî kenîya çûye rihmetê bi tevî apê min ê Ahmed xweda rihma xwe lê bike, go navê te çiyê? Min go navê min Bekir e. Go tu ji kêderêyî min go ez Celalî me xelkê Bazîdê me. Go birayê delal destê min destê qetlê ye bi xwedê heyfa te xortî nîne destê xwe serê te xortî bigerînim ez tûyî devê tekim tuyê mîtanî min bi hema wisa perîşan bî. Xwedê destê min serê kevira jî, gura jî nexê gur jî gunene. Go ezê te paçkim tuyê lêxî herî ez hatim Rihmetî kenîya go hûn Celalîya zatî tiştê wisa hezdikin hûn şerûd in.

Rihmetî di derheq zaroktiya xwe de tiştî ku di dilê wî de hebû ku nekî were qe behskîr?

Bi xwedê go ez zarok bûm me heywan xwadî dikir, me karê malê dikir heywîn dinihêrî. Digo min jî kilam digot diçûme ber berxa, ber pêz, ber dewara min kilam digot. Go ez zar im ez çûm yekî mîna te dengbêj e belgî danîne binê wîna, ewî jî xwe daye ser belgî destê xwe kirye gewiya xwe qare qara wî ye go distrê. Go ez jî çûme dewatê go rihmetiyê bavê min wana saxin ez newêrim tîrsa bavê xwe wana kilama jî bêjim. Go lê dilê min kirekire ez dixwazim bêjim. Go min ji yekî re got cê ji cimaetê re bêje bê Ahmedê kurê Îbrahîm dibêje ka musade dike ez jî wê kilamê bendekî jî ez bêjim. Go jê ra gotin dengbêj go kê ye gotin ewî hanê ye. Go ez jî wî çaxî 15 salî me go bêje. Go dengê min ser xwe ye. Ahmed jî dengê wî mîna quling diqîrya go destê xwe kirye pelka guhê xwe go kilam jî ya “Kapê Qersê ya Zero Gula çayê” go ku min benda dinê got go millet go yeke din jî bêje yeke din jî go dengbêj xeyîdî go go we eva aniye mîna barûde eva çiyê we aniye kiriye pêşîra min. Haşa cenabê wî go eva mîna hespê

mirov xamê derxe ser bîst û çar bizmara bireqise eva kê aniye mirov pêşiya vê zarokê dikare bisekine. Gotin eva cem Mistoyê Heyran Mistoyê çiftborî hîmbûye.

Mistoyê çiftborî jî vira li Êranosa ye. Dengê wisa bi hêz bû navî dane çiftborî.

Mistoyê çiftbarî çikese?

Dibe Sîpkî be bi xwe dengbêjekî mina Evdal e. Dengê wî(qaset) tune. Dengê birayê wî jî piyasê da heye dengê wîtune.

Birê wî kiye?

Sebrî ew jî miriye.

Mi go mamoste tu çûyî ba Mistoyê çiftborî? Go bi xwedê Milet dihat diçû cimaet dihat go kê çi bigota digo cara duduya minkilama wî jiwan xweştir digot.

Çi sirê rihmetî heybûya ji min re digot. Olayiyek serî min re derbast bû ya cîneyetê xwede dijminantiyê nede tu kesî mirov nikare bigere ez bi kelê motorê hatim geriyam. Go ev Bekirê birayê min olayî hatiye serî Hêlikсан vire Oncelî jî serê riya Bazîdê ye. Ez jî teze hatibûm xerîb bûm. Ez bi xwedê serê vanrojê ezîzkim. Ez hatim semtê Ahmedê Hêlikсан digerim bîra min nayê çimkî hişê min tevlihev e. Rihmetî Ahmed bîra min nayê min dî hat go kuro tu kê derêyî Celalyê dizek hinek li min kir. Go derbasî be ka were ji te re tiştêkî bêjim em çûne yalê dîwarekî destmala xwe derxist min dî qirmek derxist go ha eva ji te re. Go ez xelkê vira me tu xelkê Bazîdê yî ez pişta te bikim yekê din bêje çima Ahmed pişta yekî Celalî kir eva qirma min bi her du cacora ve ez hubeyê te dikim. Min go dibe bi min re bigrin go ez hubeyî te dikim. Min jî paçkir da serserê xwe min go te damin min bi sed mêrî ve ewa sed mêrî tê hesêb min qebûl kir. Min jî tekrar da birayê xwe yê mezin min got yê min jî sîlahê diha mezin hene. Mirovekî wisa ji dostê xwe re sadîq bû. Bi xwedê Ahmedê Hêlikсан ciyê ku jin lê hebûya belkî nan nedixar. Mi digo dengbêj rûvekirîne tu çima wisanî digo edeba min ferqlî ye.

Tu dikarî behsa hevaltiya we bikî?

Xwedayê alemê herkesî efû bike me jî ez qarşî wiya zehf şermîdarim, çima şermîdarim ez wî çaxî ji derveyê welêt bûm li Îranê bûm. Ez du sala nehatim vira jî hinekî cezayekî min ê piçûk hebû newirbûm bihatama. Mi xwe bi mamoste neda helalkirinê, ez ber serê wiya neskinîm, ez tevî teziya wî nebûm ez ji wî şermîdarbûm.

Yanî emekê wî di zikê min de ma, tu zemanî dilê min jî dernayê. Birazyê min wî çaxî piçûkbû ez di nav gel de zehf tim naskirin. Bi xwedê ez hevaltiya wîna, çûme mala wîna nanê wîna hurmeta wîna min dixwast aha ji min binêriya rihê xwe bida. Min jî keda wiya zehf xwariye. Keda wiya ser banda tijekirinê bû zehf dihate firotinê. Perek jî ji destê me nedigirt îlakî tu yê wî perî bidî na. Mi çi bigota kîjan kilam bigota ew bû. Min jî kilam zehf zanibû. Digo kuro tu navê kilama dibêjî çima tu nabêjî. Min digo mamoste zimanê min neketiye ser. Mîna vî mamostê me yê yazar ez tamamî kilama dizanim kilama Mistoyê Tofan, kilama heft bavê eşîrê Emê Gozê, ya Bişarê Çeto, kilama Sedûn Hekarî pê didane gotinê ya Zer Mihemed, kilama Qutfedînê Tahirxan Begê gi pê da gotinê. Îja tu dengbêjî jî nikaribû qarşî min kilam bigotana. Çima nikaribûn min nestraya jî lê min ji kilamê fehm fikir. Mîna dixtorekî, mamosteyekî ez zanebûm. Tu kelîmeyekî dibêjî eva kelîma te yan wisane yan tu rastiya wê dibêjî yan na . Ez bi xwe jî tarîqa Kurdî zehf dizanim cem mezina mame kê kuda hatiye, eva şera ser çi bûye, çima wisa bûye, xwayê kilamê kê bûye. Rihmetî Ahmed dengbêjekî wisa bû, min ji kilama fehm fikir, ewî butunî kilama çi bigota ew bû. kîjan kilam bigota eynî cî bi cî te digo birye ser kilamê xebitiye.

Xalê Bekir mijarên van kilaman yên ku agahiyên hene kîjanin hûn dikarin behs bikin?

Kilama Qutfedîn Tahirxan Beg sipkî ne, kilam ya mamoste Ahmed e. Mûsa Kazim avûqat bû xelkê Gîhadînê dewa çep rast de hat kuştinê. Taşlıçay du hev oxretmenê ecem bûn hev kuştibûn. Navê jina oxretmenekî Saniye xanim bû, ewûya hat mehkemê dêna xwe dayê cem sawcî wî çaxî axir ceza reîsî Tahir beg hebû Tahir beg zehf hukumdar bû ecem bû xelkê Îdirê zehf jî yeman bû. Dêna xwe didê terefê oxretmen bihêz in yê berdî heta li hevsê cab jî jinêkê re şandibû gotibû ezê derêm te jî ji xwe re bixwazim. Dibê dêna xwe binê eva jî mektûba wî ye ji min re şandiye. Dibêje namûs namûsa me hemûyane him mêrê min kuştîye him jî dewa min dike bi destê zorê. Ewî mêrê kuştîye tu çawa berdidî dibêje qîza min qanûn berdide ez bernadim. Dibê qanûn berdide dibê erê dibê qanûna min bernade destê xwe davêje berfika xwe qirme derdixe heft gule berdabûyê kuştibû. Ewa jî rihmetî mamoste Ahmed eva kilama ser Taşlıçayê ser Saniye xanimê çêkir.

Ahmedê rihmetî aha bala xwe bida mirovekî dilê wî bişewutya ça min got ser kederiyê bawer dikim kilama ser mala Seyda kilama Feqî yalê Mûşê ye qîz diçine pincarê qolê baba jêre dibêjin ez neçûme wira ser kilamê Rihmetî Ahmed yekî feqî kurê wî çarde pazde sal dilê keçikê û feqî ketibû hev hinda pira dar, pira dar çêkirine. Em ser kilamaê dengbêj Ahmed dilê wî j îçî bişewutya li ser kilam çêdikir.

Ez kilamê Ahmed nabêjim. Çima nabêjim ez kilamê wî ji dilê mi hilnayê bêjim, ez nikarim mîna wî bêjim. Ez qêmîş nakim wexta ez bêjim dibêim qey birayê Ahmed ber min sekiniye dibêje te kilama min çewt got lema nabêjim. Ez ekserî kilamên Ahmedê Wanlî dibêjin ew çiraxê Keremê kor bû ez ser terzê wiya ser terzê Kerem dibêjim. Min cem Kerem jî gelek xebat kir. Kerem digot baweriya min ewe rojkî were tê jî kilam çêkî. Ez jî kilama çêdikim. Belkî tu bêjî ez kilama te xweş nabêjim lê ez kilama xwe xweş dibêjim. Carna êvara ku kilama çêkim ber we dibe terke edebî ku dengbêj zehf anî malê û zimanê Kurdî weşandiye ez carna dibêjim qîzê ca xwe bide pêşiya min ezê vê kilamê bêjim hele ka tu çî dibêjî ku rind be bêje dewamke ku rind nebe bêje wirde bisekine. Bi xwedê ez carna dibêjim dibêje temame yan jî dibêje meqamekî jê re bibîne.

Îja ez tiştêkî dîn jî ji te re bêjim hine zarê me hene hevalê Ayhan dizane ewna çûne Boloyê wira dikan vekir. Diya min jî çû kulfeta min jî çû. Zar jî yê mezin virin yê piçûk çûne wir ez tenê mam. Hine heywanê me heye ez jî mam bêna min dernediket mi du sê cara go qîzê were vira go xwedê dizane ez nayim. Ezê cem zarokê xwe bim ezê biharê werim tu were vira min jî got ez nayim bêhna min dernayê toplimek hember min heye zimanê min nav wan de cuda ye ez nayim. Îja mala birayê min jî vire birayê min kulfeta xwe hilda çû gerê qîzeke wiya Gazîentabê ye çû wê derê ez jî tenê mam hema dilê min şewutî qusûra min bibexîşînin min rabû ser xwe kulfeta xwe kilamek got. Min go

Lê lê yarê tu ku mayî

Ez helyame helyame mîna berfa serê çiya

Hêsir çevê bariye mîna ava çem û kaniya

Kamilê birayê min jina xwe hilda xwe re çû geriya

Ez tenê mamem vira qe kesî halê mi nepirsî dil cigerê min heliya

Yarê tu ku mayî tu çima nayê

Ez ditirsim ez li Agiriyê bimrim te nebînim bê te herim wê dinyayê
Eva ez ser dixebitim ezê televiyonêda bêjim
Îja mi go birayê min jina hilda gerya
Mi go her kesî yara xwe hilda gerya
Tu nehatî ez tenê mame vira
Tu tu zemanî dilê min dernakevî dil cîgerê mi helya
Mi ji vî salî qe xêr nedît ez her çeva digiryam
Yarê tu ku mayî tu çima nayê
Tu Boloyê mayî çima nayê
Ez ditirsim te nebînim bê te herme wê dinyayê
Tu ku mayî bêbext were
Erê min ev got mi gotê
Ez ber bayê dilê rezîl ketim
Ez vê yara xwe dûr ketim
Mi şev û roj tu xew nekir
Yarê tu zehf bîram tekir
Yarê wele ez zehf te hezdikim tu ku mayî
Tu ku mayî çima nayê
Ez ditirsim te nebînim bê te herme wê dinyayê
Îja wê rojê mala birayê xwe de got jina mi jî giriya jina birê min jî giriya birê min
jî giriya. Îja go tu çima normal kilama nabêjî mi go bi xwedê carna dilê min dişewute
carna aha hêrsa min tê ez wiha dibêm. Mi go ezê Arîn tv da jî bêjim.

Pêvek 3: Bi Şevki Burak ve Hevpeyvîn 15/05/2015

Şevki Burak di sala 1956an de li gundê Amodê (Hezren Köyü) hatiye dine. Amod girêdayê navenda Agiriyê ye. Şevki Burak mamosteye û rêvebiriya Îsa Fenê jî kiriye. Hevalê Ahmedê Alîksan e û ji mamostetiyê teqawût bûye û li Agiriyê dijî

Nasîna we û mamoste Ahmed çawa çê bû?

Rihmetî Ahmed abê ez aşiqê dengê wî bûm vê heremê da şairekî zehf mezin bû. Beriya wiya jî Mistefayê Erabalî hebû dengê wî jî xweş bû yalniz* vê heremêda şairekî zehf dihate girtin. Dengê wiya zehf xweş bû kilamê wêya di toplimê** de deyer bû. Ez jî neditî min jî fizîkîten neditî bû lê aşiqê dengê wî bûm.

Nasiya min û wiya ve jî kurê wiya nika Fransayê ye. Navê wiya Aslan Özdemir îja telebê min bû hate cem min go xoce tu dikarî îznê bidî min ezê herme gund aliye bavê xwe kim. Min go tê herî kîjan gundî go ezê herme gundê Hêlikan min go tu kurê kiyî go ez kurê dengbêj Ahmed im. Min go kuro lawo ewa bi salane bavê te ez dengê wî guhdarî dikim jê hezdikim ez aşiqê dengê wî me çunkî akûstîka dengê wiya tiştekî pir ecaîbe ez dixwazim bavê te naskim jê ra bibim deste birak. Go xoce em jî seve seve hezdirin tu bibî biraderê bavê min. Min go bi tenê ezê wî qewlî îzin bidim te tu yê du banda ji min re tijîkî çunkî band qedeqe bû dizîkava tijî dikirin. Go xoce ser çevê min go ezê selama te jê re bêjim bira du banda tijeke. Min go tu tiştekî wisa bikî tu çî qas îzîn bixwazî bidim te. Mi îzin dayê rihmetî Ahmed navê min qaseta da zikir kiribû qasetê wî jî qedera çil salî cem min ma piştî mirina wiya dengê wiya diha zêde qîmet hilda. Ewa qasetana qasetên genciya wî da bû ew qasetana hema hema nêzkî 20 – 25 sala cem min ma paşê li min dizîn. Ewa dengê wiya min ji înternetê topkir. En sonê*** da rihmetî Ahmed abê ji min re du qaset tijîkir ew qasetê wiya hilda wisa dewam kir rokî gotibû ezê ziyaretiya xocê te bikim. Min bi mêvanî qebûl kir mala min bû îja em bûne deste birakê hev. Ewa deste birakya mejî hela hê ewa mirye çûye gihîştîye xwedayê xwe ez hêla muhebetiya wiya hurmeta wiya halen* di qelbê mi de dilê mi daye. Me wiha hev naskir. Dû wî re jî dewata Ercanê kurê wî çêbû. Em çûne dewata Ercan wî çaxî pek kamera goruntî tune yanî ewil kamera cem min hebû min guruntuya wî jî qismek hilda. Min bizanibya kî dinyayê ji bo wî ya aha felekê zû ji me biqetîne sevgî mihebata wî ji me bi qetîne. Ewa qasetana wî zaten carekî guruntuya wî hildabû heyata wî da jî ew

*yalniz: bi tenê

**Toplum: civak

***Son: dawî

* Halen: hê jî

guruntu sade cem min e. Me nizanibû kî zeman wiha kurt e, wext aha kurt e hayat aha zû xilas dibe. Min bizaniba Ahmed abê aha zû here huzûra heqê xwe minê bigirta zehf guruntiyê wî na hilda nasya me vî şeklî bû. Xweda meqamê wî cinet ke.

Bi dîtina we bandora wî li ser gel ça bû?

Yanî Ahmed abê cimaetekî rûniştî bitûnî cimaet bitûn millet gişk rûdinişt wî şairî guhdarî dikirin. Dengêkî zîz bû dengêkî mukemel jê çêdibû. Di vê heremê de jî Rihmetî Ahmed abê tu kesekî duzgun şairî bikira tunebû. Feqet eva hinekî jî mamostê mîna we likolîn nekirin tez amade nekirin yanî wî memleketî de mesela dengê Reso dibêjin dengê şiarê cuda dibêjin. Dengê Ahmed abê vê heremê da bê hempa bû. Zaten anatoliyê da şairê, dengbêjê en rind en mukemel yanî mîna wî xîtabê toplimê bikira tunebû. Bûyereq biqewumiya ewî ser wê bûyerê carekî da mînanê ça bêjim mînanê nivîskarê makalê, mînanî nivîskarekî nivîskarekî quncikê rojnemayan de nîv saetê da makalekî dinvîsin çavêherkesî li ser wê makalê ye Ahmed abê jî rihmetî wisa bû. Heqîqaten mirovekî zehf hezkrîbû hûnermendekî şareza bû. kesekî ku wî çaxî lêkolîn bikira tarîqa wî ya rabirdûya wî ya bizaniba tunebû. Mîna we ça ku hûn lêkolîn dikin teza amade dikin ewî jî olayek serê toplimekî, serê qewmekî de serê eşîrekî de derbas bûya mînanî yazarekî** nîv saetekî de ber xwe kilamek derdixist hewqa mukemel bû qabiliyetlî bû. Zehf mukemel zekak hebû. Ev kilamana zehf ferqlîne bala toplimê dikişand. Bala toplimê dikişand dewatek bûya veyaxût îlerî gelenê wî zemanî kî bûya mitlaqa dibirne toplima xwe toplima xwe da olayek wê heremê da qewumî be ser kilam digot.

Derheq rewşenbiriya wî de çi dikarin bêjin?

Di toplimê de şairekî zehf bilînçlî bû ji pêşeroja toplimê dixwaskî zarê wana serkevin. Dixwaskî zarê wana di nava zehf deyer dida xwendinê. Bi rastî herkesî ji bo nefsa xwe dikir ewî ji bo zarên xwe dikir. Îmkanê wî jî ewqas tunebû feqet wan îmkansiziyada* ewî hemen hemen zarê xwe zefên wan dane xwandinê da. Yê ku xwendin xwendin mesela yekî wiya telebê min bû, qîzeke wiya dîsa telebê min bû Rihmetî Ahmed abê qîza wî vira dixwend hate vira me alîkarî kir hilda pansiyona me walî re bi çapemeniyê re xeberda ew jî niha mamoste ye. Qîzeke wî jî li Erzormê baş hemşîre ye.

** Yazar: nivîskar

* Îmkan: derfet

Nêrînê wî yê derbarê dinê da çawa bû?

Ewa bi rastî aşiqê iletê xwe bû, toplima xwe bû. Îdeolojî olarak ewa mirovê berê terefê gel da qebûl dîtibû. Yanê ew şairê ewsa mezin kilamê xwe axaftina xwe nedane cihekî ewna sade toplim bû. Mi îdeolojîke mîna ya îro nedît ewî fidayê miletê xwe gelê xwe kiribû.

Mamoste Ahmed qet dengbêjê pêşiyê teqîbkiriye qe salxê wana wera dida?

Ewî behsa çend dengbêjî wexta wî da mesela dengbêj Wanî Ehmed hebû ew jî dengbêjekî mezin bû vê heremê da behsa wî dikirin. Yek jî behsa Mehmed Alî Erabalî hebû dengê wî jî dikirin feqet min ewana dengbêjana ewana şairana dengê wan jî guhdarî kir wî çaxî yaşê** min jî hemen hemen êpê heye feqet heqîqeten Ahmed abê ku li toplimekî rûniştana bîst û çar saeta bigota nediwestiya.

Wextê hûn rûniştana we behsa çi dikir?

Xeberdane me bi pirayê laqirdiyê me mesela min digo Ahmed abê em rûnên zeman derbasbikin zaten em sewda te têrnabin hurmeta wî ya jî em têrnedibûn. Hîn caran me egle dikir me digo hinekî nan, hinekî çerez, hinekî çay wexwe me digo belkî zeman hinekî dirêj be em hinekî dîsa dengê guhdarî bikin. Îja bi me hinek dikirin xweda rihma xwe lêke xanima wiya zehf jê hez dikir. Jêra abla digo di go abla ez dereng herim derî li min venake laqirdiyê wî yê en xweş ev bû. Îja rokî min dawetî mala xwe kir rojî bû remezanê da me fitara xwe vekir piştî fitarê go ez kilama ji te re dibêjim zaten ez hem abê te me hem birê te me hem jî şairê te me dengbêjê te me got. Min jî bi taybetî gazî wî dikir min digo bira hema were ji min re kilama bêje. Îja em rûniştin go apartmanê de kesek rihetsiz nebe mi go na. Mi go hema çîqa dengê te awazê te heye biqîre. Ewî kilam got wê arê da yekî hevalê min rêvebirê lîsê ye ewna jî Tirkin grûba MHP da bûn. Kurmancî fehm dikir îja em çûn ji me ra kilam go ewî jî yarim yamalak* fehm dikir feqet weke me hewesliyê vî îşî nebû sade guh didayê. Go yaw êdî ez jî bû aşiqê dengê wî Ahmed abê go te ez jî en dawiyê da te jî rê derxistim ez kirme aşiqê dengbêjan. Me nanê xwe xwer hetanî danzda ji me re kilam got. De bifikire 7 êvarê dest pê kir heta danzdê êvarê. Me ra kilam got go diha bes nîne go ez herim ablayê ji min re hêrs bikeve mi go tamam bes e. Min çend hevalê xwe jî hilda em hema derketin erebê

** Yaş: temen

* Yarım yamalak: nîvcî

siwar bûn ewî hetanî gund dîsa ji me re got. Em zivirîn ew hevalê me yê wisa yarim yamalak Kurdî dizane yaw go arkadaş** ewa çi nefes bû ewa çi seda bû go ewa çi deng bû. Go min go yê bibece haşa cenabê wî mi go yê bimre. Yalnız go qe newestiya. Min go ewa şairê mey ê em vê bolgê*** hezdikin Ahmed abê deste birakê min e ewa bixwaze dikare heta siba dinê jî ji me re kilama bêje. Aniyekê**** me wisa derbas bû xweda rihma xwe lêke.

Kekê derhek zaroktiya xwe de behs dikir serpêhatiyên zaroktiyê?

Ji mi ra digot kî piçûktiya xwe da digo min zehf qehir kişan, zehf çîle kişand bi tenê kar û pîşeyê min ser vî îşî bû. Çawa min got mukemel bû tu kesekî nikaribû mîna wî kelîma kîta bîne rex hevdu bixûne bêje. En zehf jî donema ew kê muzdarîp bû wextê rêvebirîya Demirel da digo me nikaribû meslekê***** xwe îcra bikira. Dihatne qehwa koşekî de odekî da dengê xwe yê qasetekî dostekî xwe re tijî bikira dizîkava tijî dikirin. Wî şeklî meslekê xwe îcra dikirin. Ê mînanê îro bûya wî dengî ve wî sedayî va eva îmkan wî çaxî hebûya Ahmed abê belkî dinê da yê yekemîn bûya. Yanî bifikirin bi tenê dengê xwe ve ew qas rihê însanda canê însan dil û can mukemel cihek girtibû.

Piçûktiya xwe da jî behsa feqîrtiya xwe dikir. Yanî dunema wî çaxî zehmeta wî çaxî xelkê wê dunemê anlatmiş***** dikir. Hêdî hêdî êdî kurmanc diha serbest bû yê diha bihata seviyekî xwedayê aliya emir wefa nekir wî şeklî.

Kekê şagirtê wî re têkiliyên we dewam dike an na?

Mi sade dengê wana guhdarî kiriye xêncî Ahmed abê tu dengê mi tesîr nake. Kurtasiya wiya vî şekliye ez dengê dinêna mesela dinlemiş dikim mi etkilemiş nake. Seda wî ayrî bû axaftina wiya sozê wiya axaftina wiya ayrî bû. Hene ez nav olarak hatırlamış nakim feqet zevk nade. Donema* wî ya me dil û can dinlemiş dikin artik sanatçîkê** wisa ez bi xwe şahsen yapıya xwe da anegorî Ahmed abê nabînim.

Pişî wî tunebûna wiya çawa we xûya kir?

** Arkadaş: heval

*** Bölge: herem

**** Anı: serpêhatî

***** Meslek: pîşe

***** Anlatmak: vegotin

* Dönem: dem

** Sanatçı: hunermend

Wele tunebûna wiya piştî wextê ewî wefat kir ji min re zehf acî hat zor keder hat. Yanî em ji wiya re bibûne bira yanî mirov çawa birayekî xwe yê biyolojîk ê dê û bavekî hezdike me wisa hevdu hez dikir. Dewamlî ewî gazî min bikira ez diçûm gazî min wî bikira ew dihat. Sevgî muhabetêke wisa nava meda hebû wexta wefata wî da ez baya berxwe ketim. Yanî nexweşiya wiya jî nêjkê ve çêbû. Mehekîda ewa qanser jê peyda bû bi tenê rihmetî Ahmed abê dû mirina wiya ewa sevgî muhebete wiya di hûndurê min daye di rihê min de ye. Yalniz piştî wî mîna apekî heqîqî ew muhebete bo zarê wiya yanî zeman zeman diçime rojavayê zarê wî wirin suwal wî dikim ewna tîn mi dipirsin. Pisgirêkek wan heke îhtiyaciyeke wan hebe ez hertim wana suwal dikim ew jî min dipirsin. Yanî ewlat iyale wiya mîna saxya wîda muhebete wî dewam dike.

Wextê wî yê ku here herderî tunebû. Milet herkesî jê hezdikir û dibirin dewata xwe diwana xwe.

Kilama Taşlıçayê oxretmenekî hevalê oxretmen çev berdide jina wiya lêdixe hevalê xwe dukuje. Dibê ez ê te ji xwe re bixwezim jinik dengê xwe dernaxe firsendê digere heyfa mêrê xwe veke jineke pir bi heysê bûye. Tê mehkemê wexta îfadê dide hakim qirarekî xeta dide. Dibê wiha qirar didî ewa qirara xeta ye. Edeleteke*** heq nîne ezê edeleta xwedayê aliya bînme dewse ezê cezayê wî bidmê. Pêşiya hakim sîlaha xwe jî paşla xwe derdixe lêdixe ewî dukuje. Ahmed abê ewa kilama tek celseyekî da avîte ser wiya. Ewa oxretmena xelkê Taşlıçay bû jinik jî qerepapaxbû kurmanç nebû. Heyfa mêrê xwe hilda.

Pêvek 4: Bi Paşa Taştan ve Hevpeyvîn 15/05/2015

Paşa Taştan 13.01.1956an de li gundê Sirdo (Gümüşyazı Köyü) hatiye dinê. Sirdo girêdayê navenda Agiriyê ye. Mamoste ye û teqawût bûye. Beriya mamostetîya xwe dikanê dide xebatê. Di navbera Dengbêj Ahmedê Alîksan û gel de peywira pîrekî dibîne.

Nasiya we û mamoste Ahmed çawa çê bû?

Ez lîsê da di pola dawiyê de bûm. Min ji xwe dikana zada vekiribû. Gundê me nêzî hev e. Xweda rihma xwe lêke dewamlî dihate dikana min muşteriyê dikana min bû. Wî çaxî qaset zehf bû bandê doksanlik me jê re digot. Ahmed abê dengbêjekî heqîqî bû.

*** Adalet: dad

Di çewrê de naskirî bû. Dihatne dikanê digotin eva qaseta me eva lista kilamê me eva jî, wî çaxî ceyran tunebû digo eva jî deste pilî min ê pilipis marqe jî digotin bira rind be. Ahmed abê hat tê selama min jê re bê jî bira evê bandê ji min re tijî bike. Min ew lîstana hildidane cem xwe. Ahmed abê zemanê bihata rihma xwedê lê be Grundig marqe teyîbeke wî hebû ku çarşiyê bigeriya cem min bû ku biçûya gund dibir. Ku çente dayna dikanê mi digo Ahmed abê eva lîsta ya filankesê ye eva banda wiya pîlê wiya digo tamam. Genelde* dibire gund carna jî Otêla Seyîda hebû diçû odek vedikir tijî dikir dianî digo bira qe aciz nebe. Hijêkirina Ahmed abê pir bû her kesî jê hez dikir. Digo madem îro aniye hema banda wî camêrî bidê.

Wisa jî muhîm digirt?

Zehf muhîm digirt. Zaten Ahmed abê mirovekî xwe hezkirî bû giyîma wî zehf baximlî bû. Xwe hez dikir yanî nefsa xwe bedena xwe hez dikir. Boy wî jî ku em ji bo xwedê bêjin karê xwe zehf teqîp dikir.

Dianî digo banda wî hazir e. Bi pirayê wî çaxî belî ucreteke wî hebû mi digo Ahmed abê ez çi bîstinim digo çi daye veyaxût te çi standiye. Carna hêviya min dihîşt ez jî ciwan bûm ew muşteriyana bihata min digo hema dilê teda çi derbas bûye. Ahmed abê wisa got. Te dengê wî hezkiriye, te banda xwe aniye hema te çi bexşîş daye. Çaxê Ahmed abê dihat min digo min evqas stand yan jî ewqas bexşîş danîn digo xwe bereketê bide. Rihma xwedê lêbe li yênga min re digo abla. Digo ablayê lîste daye tu vê lîstê çêkî heke ku maye tu tişteki bidî min nemaye emê cardin bidin.

Tekiliyên we ser dengbêjiya wî bû an ser muşteriyê bû?

Na ser muşteriyê bû. Dengbêjiya min tunebû min di ciwantiya xwe de dikan dewr hilda. Muşterîkî meyê rind bû. Heta ez serpêhatiyêke wî û xwe bêjim. Dema ez bûme mielim tayîna min derket çûm. Gedê birayê min bi kurxalê min ve dikanê nihêrîn. Wana lîse xilaskir mi dikan teslîmê wan kir. Ez havîne hatme memleket carekî ez li sûkê dîtîm yaw go tu kê derêyî mi go de Ahmed abê ez bûme mielim ez çûm. Yaw go ew çi mielimtiye te derxistiye de biterikîne were ber dikana xwe eva mielimî kura derket. Mi go Ahmed abê mi wisa mielimiyê hezdikir mi go rihmetiyê bavê min jî zehf israr dikir. Yaw go te hêviya van zara hîştîye evna çizanin esnafî çiyê. Rihma xwedê lê be serpêhatiyêke me wisan derbas bû. Ahmed abê zehf deyerlî bû ji bo riza xwedê. Sê hev

*Genelde: gelemperî

çar hev bandê wiya cem min hebû ji min re jî tîjî kiribû ez bûme mielim 1979da çûme Çorimê mi ew bandan jî bi xwe re bir. Gundê ez lê bûm gundê tirka bû kurmanc tunebûn. Mi carna hey xwe re teyîp vedikir seyrdikir. 12 Îlonê çêbû mi teslîmê gundîkî kir paşê tayîna min derket ez çûme Adiyamanê peyra hatme vêderê bandên min winda bûn.

Li gor we bandora wî li ser gel ça bû?

Ahmed abê mirovê cimaet û toplima bû. Dewatê me yê wî çaxî gazî dengbêja dikirin û dibirin da ku cimaeta da kilama bêje. Wextê Ahmed abê wisa dewamlî her dewatê qebûlke jî tunebû. Ahmed abê mirovekî ehlî sohbet bû. Xencî dengbêjiya xwe jî Ahmed abê xeberdaneke xweş dikir.

Feyda wî ji me re jî hebû ewnê dihatin suwala wî dikirin ewnê dihatin band û qaset tîjîkin qet bîra min naçe dihatin digotin bira Ahmed abê kilamê keçika tîjîke. Mi digotê digo hayhay kilamê rûniştî hebû yê dewata hebû

Hinekê wî yên tê bîra we hene?

En hineka wî ya mezin ku tê bîra min ji xanima xwe re digo abla. Min hîn caran digo abê mirov xwîşka xwe ya ji xwe meztir re dibêje. Dikena digo tê çibikî ablayê ev lîste daye min ku kêmbê yê hêrsa xwe li me bîne.

Ez dîsa bizvirme dikanê digo yaw ev mielmî ku derket, were ber dikanê te ev zar danîne vir. Dême zara qedrê wî tam nezaniyê û deyerekî mîna Ahmed abê wek muşteriyê din dîtine. Go îşê te nerind bû mi go wele rind bû lê mi mielmîyê hez dikir lema ez çûm.

Çaxê tu dikanê da bûyî eleqedariya Milet ça bû?

Tabî muhebeta Ahmed abê her zeman zehf bû. Mesela vê axiriyê ez bibûm mielim ku em bihatana me hev bidîta devdorê wiya her dem tîjî însan bû. Sohbetên Ahmed abê hez dikirin. Îlgî elaqe pîrr bû min got jî ehlê cimaet bû. Însanekî etkilî bû bi xeberdana xwe ve baxima xwe ve rind xwe dinhêrî bi xwedayî.

We ra behsa dengbêjên din jî dikir?

Welehî gele zeman kete arê ji bo riza xwedê niha bîra min zehf nayê. De em jî wî çaxî tam hiş û mêjûyê xwe dabû ser Ahmed abê. Tu çevê me yekî din nedidît kî veyaxût guhê me yekî din nedibihîst.

Dengbêjekî baximlî bû di gundada rûdinişt lê traşa wiya, berê şewqiyê çar goşe hebû bi pirayî şewqiyên mezin didane serê xwe. Şewqiyê wiya diha piçûk diha kîbar yanî şehir beyefendîsî bû tizbiya wî hebû. Ayhan diha rind dizane xebata gund jî zêde nedikir. Ewa rihet huzurlî xwe hezkirî, xweşbînî evna tamam cem wî hebû

Dan û standanê xweda çabû kêmasî dikirê an na?

Min got ya pere ce min bû. Wirda qezanca min jî çê dibû gele caran min pîl jî difirote wan muşteriya. Muşterî ji xwe re band dianî di go cixarekî bide min eşyayên din hildida mi digo gere deste pîl jî bikirî seba pê banda te tîjîke. Zemanê perê bandê bidana ucret bexşîş navê çibe belî nedikir ji min re digot mi gava din jî gotya digo te çi standiye di go eva lîsta ablayê ye çika çi digre min fîla wî tîjî dikir. Hincaran min digo eva pera jî ma Hilde an hinde deyndar mayî ew jî careke din. Bazar nedikir bazarî tunebû çim bawerî hebû.

Genelda ku gund bihatana mîna niha erebe zêde tunebû digotin eva banda gelo Ahmed abê yê biqedîne îro tîjîke mi digo Ahmed abê li filan gundî filankes hatiye dibê dikare îro tîjîke hildida diçû otelê tîjî dikir dianî zatî min ji wan re digot îro Ahmed abê li vêderêye yê banda te tîjîke ew jî saetek du saet şûnde dihat banda xwe hildida diçû

Pêvek 5: Bi Dengbêj Elbarî Karasongul ve Hevpeyvîn 16/05/2015

Dengbêj Elbarî hevalê wî yê hemdem e. di sala 1941 de ligundê Başçavûşa Şeko (Karaköse Köyü) hatiye dinê. Li Agiriyê dijî

Hûn dikarin behsa dostaniya xwe bikin?

Em dostê hevên bav û kalanin. Ez û ew em yek bûn. Ez jite re bêjim dengbêj hemû yekbûn. Lê min weke wî nikaribû bêjim. Ahmed mirovekî wisa bû alemê tev nanê wî dixwar. Biçûya dewatekî maqûl bû pere davîtin ihtiyaciya wî bi perê kesî tunebû. Di vê Agiriyê me de ji xencî Mistoyê Çiftborî kesekî wî hêztir tunebû. Dengê Mistoyê Çiftborî dewsa dengê wî nedigirt lê kilamê Mistoyê Çiftborî zêde bû.

Sepêhatiyên we yê tev em hez dikin hûn ji me re bêjin ?

Min û ewî me hev hez dikir. Ewî û Miheme Salih jî hev hez dikirin. Miheme Salih Jî çûye emrê xwedê. Di wan dengbêjan de hema ez mame. Ez jî êdî dibêm yek û dudu (giriya).

Xweda silametiye bide.

Miheme Salih pizmamê min bû Ahmed jî deste birakê min bû. Ahmed ji Miheme Salih zêdetir bû. Ahmed qonax bû, însan bû mirovekî wisa bû ser re tune bû. Ewa dengbêjên din ku biçûna dewtekî digotin bira weke qelenekî bidî min ez herim bûka wana siwar bikim. Lê Ahmed ne wisa bû diçû bûk siwar dikir ditît dihat. A Ahmed mirovekî wisa bû.

Nêrîna wi ya dinê çabû?

Mirovekî mêjker û taetkar bû. Mirovekî bi her aliyê ve ser ra tune bû.

Hevaltiya we ya çend sala bûn. Hevaltiya we ya dengbêjiyê bû?

Dostê mey ê bav û kala ne. Me ji hevdu hez dikir. Îja vê axiriyê dibêjin filankes bi devê me re gihîşt. Ez jî hinekî bi wan re gihîştim lê felekê li me stand.

Însanekî bi kêf bû?

Wey mala te, wey mala te

Te û Rihmetî we qe da ber hevdu?

Me bida ber hevdu mi şevêkî bigota şevadin mi nikaribû bigota. Em ya rast bêjin ew çûye ber emrê xwedê. Dengbêj bû. Dewata gedê wiye xwedê silametiye bide hatiye vê derê go Elbarî dengbêj li min qut bûne tu Tahiro ve werin. Mi go birabe ez hatim mi Tahir re got mi Tahir emê herne dewata gedê Ahmed mi go tu jî were emê du saeta bêjin werin. Ez çûm rûniştin qelenê xwe birîn me êmîşê xwe xwar go bavo ne îşekî dinê jî heye mi go keremkin bijên qet şem nekin go Ahmed gotî yan tu yan dengbêjê te yê ji me re kilama bêje mi go hayhay ezê bêjim. Mi go Ahmed de îja bixwaze ez ji we re bêjim. Go filan filan filan kilamê bêje de tu ser çevê min re hatî wele min got mi xatirê xwe ji wan xwast ez hatim.

Bi we kilam en xweş digot kîjan bû?

Bi xwedê kîjan bigota hê ya din xweştir digot.

Pêvek 6: Bi Ali Haydar Can ve Hevpeyvîn 16/05/2015

Ali Haydar Can xwarziyê Dengbêj Ahmedê Alîksan e. di sala 15.02.1962an de li Agiriyê hatiye dinê. Li Agiriyê dijî.

Hûn dikarin behsa xalê xwe dengbêj Ahmedê Alîksan bikin?

Dihate sūkê em benda wî diman ku were mala me. Îja dereng dihat me suwal dikir tu çima derne mayî? Digo me qaset tijî dikir polêza em birin qereqolê 3-4 saeta em lipirsînê da aciz kirin ji bo Kurdî kilama nebêjin.

Eşqa me ji kilama re dihat. Ewî mînanî ya Leyla û Mecnûn, Ferhad û Şîrîn ji me re ya Heso û Nazê digot.

Ez serpêtiyeke xwe ji we re bêjim. Rojekî mirovek li Almanyayê hatibû. Em çûn dîtnaya wî. Ewî mirovî ji xwe re teyîbek anîbû go tuyê jimin re qasetekî tijî bikî. Kulfeta wiya jî kilama Tefîq û Refîq* xwast. Xalê min dest bi gotinê kir xanima malê ji xweve çû. Meyer ew her du zilam birayên wê bûne.

Bi dîtina we bandora wî li ser gel çawa bû?

Hêjikirineke gelî mezin nîşan didan. Mirovekî pirr hezkirî bû. Ewna jî hem hozan, hem şair hem jî dengbêj bûn.

Hûn dikarin behsa rewşenbiriya bikin ?

Mirovekî aqil bû, pêşeng bû, baş bû xwedî pêşdîtin bû.

Nêrîna wî ya dinê çawa bû?

Di kilamê xwe de zaten gişk diyar dikir.

Dengbêjên ku jê sûd girtibû hene?

Me qet ewa suwal nekir nizanîm.

Kekê kilama Tefîq û Refîq li ku bûye ew jinêk kêye?

* Tefîq û Refîq li yalê Patnosê du hev birane hatine kuştinê.

Herhal li aliyê Milazgirê aliyê Patnosê bû. Jinêk Patnosê bû hatibû vira mêrkiribû. Navê jinikê nizanim bûka mala Pirendik digotin navê mêrê wê Esker bû Almanayê bû. Jinêk vira rûdinişt mêrik diçû Almanayê dixebitî dihat.

Pêvek 7: Bi Cesîmê Dengzêrîn (Eytemîş) ve Hevpeyvîn 16/05/2015

Cesim Eytemiş şagirtê Dengbêj Ahmedê Alîksan e. di sala 1972an de li gundê Gezgezk (Dumanlı Köyü) agirêdayê navenda Agiriyê hatiye dineê. Li Agiriyê dijî.

Nasîna we ça çê bû?

Mamoste Ahmed dengbêjekî hêja bû, naskirî bû ne ku ez tenê naz bikim tamamî Agirî gişka nasdikir. Temamî Agirî û Serhed ez dikarim bêjim du payê Serhedê nasdikir. Îja hevalê bavê min bû. Bavê min û wiya pir ji hevdu hezdkirin. Ez jî aha 10-12 saliya xwe virda ez gihîştme. Dihate vira bajêr em jî dihatin ez pêra digeriyam ez cem wiya hîmê kilama bûm. Dengbêjekî hêja bû, naskirî bû mi dengbêjiya xwe ji wiya hilda. Xweda rihma xwe lêke şake.

Metod nîşanê we dida?

Wextê ku ez jê hîm bûm mi digo ka mamoste ev kilama yê çabe tabîkî ewî jî ji me re digot. Digo a vî qaydî bêjin. Piştî wî îja me lê suwal dikir me digo ka em ji te dielimin kilama îja ka tu ji kê elimî tu kê hîmbûyî van kilama. Digo evna kilamê Evdalê Zeynikê ne. Go min Evdal nedît lê ez gihîştme cimaeta wî ser zanebûna wiya û me jî ji wî hilda.

Nav tune bû?

Digo me bi Evdal xwe da naskir ev kilam jî du pay ê Evdal in. Ji xwe Evdalê Zeynikê jê re gotin tune ye efsane ye. Me aha mamoste Ahmed naskir ez 6-7 sala pêra geriyam .

Bandora wî ser we ser cimaetê çawa bû?

Kekê etkiya wî cimaetçî bû dema ku ew mijul bibya mirov ji mijulbûya wiya têr nedibû. Bi xebirdan bû dengbej ji xwe efsane ne. Cimaeta ku disekine dengbêj tiştê baş xebirdide. Tiştêtarîqî xebirdide û mijuliya wiya pir baş bû destê me jî jê nedibû beriya

me cimaeta me meztir yaşlî guh didanê em jî jêra cimaeta wî rûdiniştin me jî xwe re lê guhdarî dikir.

Qe hûn hişyar dikirin?

E. Îjaçakî digo hinek me li derva ji der û cînara bidîta me digo eva ahakiye digo nexêr we virda şaşî kiriye.

Serpêhatiyên we yê di vê derbarê de tê bîra we hene?

E mi kilama Surmeli Memed Paşa got. Go wextê çû xozanê go bi vî qaydî bû me jî jê hilda, ya wî jî heye eynî. Kilamê mala Elmecîd begê, yê Sîpka, yê eşîra, yê kor Huseyn paşa, yê serhildanê Qerekosê, Bazîdê em bêjin hetanî bigre gelyê Zila çîqa kilam hebûna te jê bipirsiya ji mirova re digot di go bi vî qaydiye. Ewî jî yê berya xwe hildabûne, yê ji ber xwe gotine pirin. Ji xwe zatî kilamê wî ya evîne jî kilamê wî pir bû hesabê wan tune.

Kilamê ser jina çê û Jina Kotîzefh dibêje çima gelo qesteke wî hebû?

Aha dikarim bêjim wextê cimaetê jê dixwast niha cimaeta ku mirov lê rûnişt cimaet çî bixwaze ew jî ser wê disekin. Heta heftek deh ro beriya niha ez li civatekî rûniştibûm civat pireya wana ji min kilama jinên çê û xirab ji min xwastin. Gotin kilama rihmetiyê Ahmed tê ji me ra bêjî. Min ew ji wan re got îja hildane qanalekî hewce nîne niha navê wê qanalê bêjim. Ji bo wê gava ku civat zehf lê bixwazin daxwazî pirbin em jî ewê kilamê dibêjin.

Rewşenbiriya wî pêşdîtinê wî hebû?

Digo Cesîmêmin lawo go dema me, emrê me çû go ji min re wer qinaet çêdibe demê bê em nagihîjnê, go lê pêşîya we vekiriye hûnê bigihîjnê. Go pêşîya kilama jî vebe pêşîya Kurda jî vebe lê go em nagihîjnê. Îja me bawer nedikir erê qinaeta me çêdibû me digo gelo bibe nebe. Îja îmkane niha xazila ewna jî şûnda vegeyriyana di nav mede bûna .

Kilamê ku mamoste got lê poşmanî dikir hebû?

Digo em aciz dikirin ne eşîra ne Kurda teref dewletê. Digo xaziliya pêşîya me vekirîbûya em serbest bûna meyê tiştên di dilê xwe de diha xweş bianya ziman

Zarê mala Memed Paşa ra têkiliyên wî hebûn ?

Yê ez zamin ji kura nemane bawerbikim ji qîza hene e jî bime re zêde têkiliya me tune.

Wefata rihmetî ser we çi etkî çêkir?

Ji me re her tim digot van esera qeyb nekin. Me dewrî wekir lazim tê ku hûn jî dewir bikin yê mayî. Eva pireke ku em derbasdibin lazime dewir bikin yê pey met ê.

Ku hayatê bûya te yê niha kîjan kilam jê bixwasta?

Bi xwedê ew li heyatê bûya çiqas kilam hene zanibûn. Pir kilamê mala Bişar Seydo xweş digo. Kilamê hêla Bişiriyê jî me bi wiya naskir. Qe me nizanibû Bişirî kaliye. Yek jî kilama ku pirrî digo derheqî Gelyê Zîla da ewana ku digot mirov rûdinişt digiriya. Em jî dibêjin lê ne wekî wî. Me hezdir ku ji mamostê xwe derbasbin lê nexêr em ji mamosê xwe derbas nebûn.

Tu denbejiya wî çaxî ça dibînî ya niha ça dibînê?

Ya wî çaxî zêde bû. Niha herkes dibê ez dengbêjim radibe ber ekranekî li gor mûzîkê diçin ewî kilamî xera dike. Dengbêjî namîne jê re dibêjin stranbêjî. Ez bawer dikin ku ew heyatê bûya ewî ewna begem nedikir.

Hûn dibêjim em vê dengbêjiyê hîm bûm divê em dewrbikin?

Belê dilê me de derbas dibe emdibe em evê dengbêjiyê dewr bikin.

Yên ku hûn perwerde dikin heye?

Pir in lê dewsa wana nagrin. Dibêjin dengbêjî girane dibên zor e.

Rihmetî dengbêjê dema xwe de kî diciband qe behs dikir?

Behs dikir. Carkî mi go apê qe tu hez dikî ji kê ra bêjî te bi kî re got. Go beriya min digotin Mistefayê Çiftborî pir xweş digot. Ji xwe dengê wî hema nêzikî dengê Mistefayê Çiftborî heye. Ew jî çend ewî wîna hene. Dengê wî pirî gur bû jê re gotine çiftborî. Ewiya jî ji wî hezdir. Me cara digo rihmetiyê Reso digo belê dengbêj e.

Dengbêjekî ku ewî apê Ahmed dane ber hev hene ?

Dema wî da Kazoyê Garisya hebû, rihmetiyê Şakir hebû. Rihmetiyê Şakir ji xwe li Navik da bû. Navik û Hêlikan ber hev dane. Mistefa di Gergeskê de ez jî ji Gergeskê me. Ji xwe dewateke wana ez gihîştimê ez zarbûm rihmetiyê apê Ahmed bi Mistefa re

tev gotin Mistoyê Mêrgezê, Mistoyê Emikê dane ber hev him kilamê cimaetî him jî yê govendî. Lê ku me bigota mamoste tu kîjan dengbêjî dicibînî dîgo Evdal. Yek jî behsa Nesoyê Zado dîkir. Dengbêj bû, mintîqa meda bû ew jî şagirtê ber destê dengbêjê Qizqapanê bû. Nûroyê Meter ew jî dengbêj bû di Meter de ne gundê êntabê gişka nasdikim. Lê rihmetiyê mamoste Ahmed jî xwe bê qusûr bû.

Serpêhatiyên kutê bîra te qe bîra te naçe heye?

Em li gundê me bûn mamoste Ahmed hatibû gundê me, me ew çax hesp dajotin di dewata de niha tune ne. Hespê belgî, me belgî dajot ez bi xwe jî ew çax 16 salî bûm. Hespa min derneket ez dihatim pirr laqirdî li min dîkir. Dîgo ezê te têkme kilam ez ber geriyam mi mamoste hespa min nerevî. Îja bi qaydekî dîgo hesp dibeze siwar pesna dide xwe. Îja ku kê derketa Îşlik didanê de îja hespa min derneket. Dîkenya dîgo şagirtê min lawo niha tu derketayî minê bigota;

Îşlikê te belek e

Tu diçî terkê li min neke

Delalya dilê min yeke

Bejn zirav e çav belek e

Ji xwe pir laqirdiçî bû. Ji rûdinişt kilam derdixist. Ewa rind tê bîra min. Li malekî rûniştê hinekî laqirdî dîkirin. Bardexek av bixwastana bi kilamkî dixwastin

Kekê ev kilamên cem me hene yê ku hûn çîrokên wan dîzanin hûn dîkarin behs bikin?

Mîro

Eva kilama ya mala Eladîn Begê ye û bawerim yalê Bişêryê ne. Wana xwe bi xwe eşirtayî mêr kuştine îja dewlet li pey digere evana diçine mala mixtar. Mixtarê Qubînê bawerim mixtar qeleşiyê dîke eskeriyê radîke ser Wehyedîn dide kuştinê ser wêya kilam çêdibe.

Ya Kerem û Nazê

Li vira Qazlikayayê derbas dibe sema zozana Mêrgekûlavê bawerim nêzikî Batmanê ye. Dîkeve gundê Kosedaxê. Li ser Goma Xesîlê Mêrgekulavê

Mala Misto mala Qaso

Ewa li ser kaxa ew jî ya xal û xarziyane. Ewa li Bazîdê ye Qaso lê dide wana kuştiye.

Mûso Mere

Mamoste, Mûso xortekî ciwan bûye. Beyaz qîz bûye di gund da malê wana têne zozana ez bawer bikim nêzikî Şengalê bûye. Ça dibê Şengal kilamê da dibêje Mûso lawo mi go qey tu Dewrêşê Şêx Evdiyî li çiyayê Şengalê di nava hezar malê Êzdiya de tu mêrtirî. Mi go qey tu Emer axayê Şirikî qonaxtirî, mi qey gotiye tu Hemê Mûsekê tu wartirî, mi qey gotiye tu Siyahmedê Silivîn şivantirî yanî nêçîrvantirî. Dengbêj tîne hevdu çimkî efsaneyê. Ew li zozana çêbûye Mûso Beyazê direvîne. Bavê Beyazê sê hev birayên wê pey dikevin Mûso beyazê dihêle direve Beyaz li pey Mûso diqîre ewa ya evîniye

Mûsa Kazim

Li Tûtaxê ne. Mûsa Kazim endazyar bûye. Evana ji mala Elmecîd Begê ne Sîpkî ne. Kurapê wiya jî zarê Kerem begê bûye. Mûsa Kazim kurapê wiya lê didin dikujin .

Mala sêrxûn dibêje ji mala Elmecîd begê re dibêje çima sêrxûn gotine?

Elmecîd beg kurê Hesên beg e, Hesên beg kurê Elmetorê ye. Sêrxûn navê kalkê kalkê wan e. Kuştina wana tune Sîpkî bûne. Çend gundê Elmecîd begê hene

Seyîd betal kî ye?

Seyîd Betal nêzkî gundê dora Elaşgirê ye li wî alî Qereyazî. Esas ji Qereyaziyê nebûye hevalê wî ji Qereyaziyê bûye. Seyîd Betal ekser bûye neyarê wî hebûne dilnexwazê wî hebûne. Bişev tî çar hev kurê wî di xewê de dikujin, şerjê dikin. Seyîd Betal jî li eskeriyê firar dike tê digîje Mihemedê Qanciya, Qanciya navê gundê wiya ye. Bi hev re sê çar sala hevaltîya bi qaçaxî dikin. Quto hebûye li Qutê berxê mala **Muxlişîya** hevdixin heyfa kurên xwe hiltîne

Hespê bavê min betal e

Behsa Hewê dike Hewê kê ye?

Hewê qîza mêrik bûye bavê wê tê kuştinê ser bavê xwe kilam dibêje. Kilam ya vira qolê Mota ye. Yalê Kosedaxê fêza Kosedaxê da ye. Di kilamê de behsa Diyarbekirê heye ew jî ji bo mezinkirina kilamê ye.

Mîrze Beg

Ew kilama Ewranê ya Mûşê ye. Resûl xalê wî bûye. Mîrze beg di hemla diya xwe da bûye Resûlê xalê wî lê dide bavê wî dikuje diya wî dide mêr. Pey wêra Mîrze Beg mezin dibe bawerim navê mehla ku tê da rûdinê mehla Çerkeza ye. Di kilamê de jî derbas dibe yan jî cînarî wî yê Çerkez hebûne. Ten lê xistine jê re dibêjin 45 sale bavê te hatiye kuştin xalê te bavê tekuştîye tu mêrî hayfa bavê xwe hilde. Îja li Mîrze Begê zor tê radibe Sîlahêkî hildide diçe gundê Ewranê xalê wî ew çax mezin bûye 70-80 sal emrê wî bûye. Tê êla gund peya dibe xalê xwe dibîne. Dibê xalo te 45 sale bavê mi kuştîye diya min daye mêr, ezê heyfa bavê xwe hildim. Xalê wî ji wî re dibêje Mîrze Beg lawo emrê mi çûye, emrê min derbas bûye tu niha mi bikujî jî qîmeta min tune êdî ez mirî me ez ber xwe nakewim ez berte dikevim. Tu bikevî hefsa Mûşê çevê teyê pey goruşçiyê te bimîne yan tê bibî qaçaxê serê çiya. Xwe jê xilas nake Mîrze beg debançê ji ber xwe derdixe berdide xalê xwe, xalê wî dikeve gula wî sahil bûye. Mîrze Beg car din poşman dibe tê ser xalê xwe digrî. Dibê xalo ferqa bavê xalê tune serda digrî nizane Resûl xayîn qeleşiyê dike. De li erdê eba lê bûne Resûl bin koşê ebayê re leganê derdixe Mîrze Beg dora Resûl pêgermoka digêrne digrî nizane Resûlê lêxe bikuje. Resûl lê dixê Mîrze Begê dikuje ew kilam jî wisa derdikeve

Werd

Werdê keçike navê wê werdek bûye. Tê dibê mamoste tê kilamêkî çê kî dibê ser kê dibê werdek. Dibê werdê belkî laqabek be jî

Li min siwaro

Geleriye. Gele dengbêjan gotiye. Ev terza apê Ahmed e.

Yar felek di Evdalê Zeynikê da maye. Bi xwe digot ev ali Evdal maye. Em ça dizanin coxrafî terîfa cihê vir dike.

Zerya

Ya mamoste Ahmed e. Ser jinê bê dilê xwe zewucîne gotine. Ya nîgarê bi xwe serjina xwe çêkiriye.

Pêvek 8: Bi Şenay Özdemir ve Hevpeyvîn 09/05/2015

Şenay Özdemir keça Dengbêj Admedê Alîksan e. Mamoste ye û li Vanê dijî.

Resma wî fanorîkî bi qirik xwe kiriye heyê. Divê em nav albûma tevayî binêrin. Albûmek min jî a wextê bêkariyê amade kiriye heyê lê li vir nîne li bal diya min e. Ewê jî ez îro pir xemgîn kirim min dixwest ku li vir bûya minew jî nîşanê we bida. .

Cixare kişandina bavê min qet nayê bîra min. Di malbata me de birayê min ê piçûk niha li Fransayê ye dikişîne ji bilî wî kes nakişîne. Lê wek xeyelan tê bîra min mînanî bavê dikişand lê diya min pê rihetsiz dibû.

Wefata wî çawa bû, Nexweşiya wî hebû?

Di pişêka wî de penceşêr hebû. Penceşêra pişikê bi gelemperî cixarê çêdibe lê qet nayê bîra min ku bavê min cixare kişandiye. Pêşiyê kişadibûye lê zêde na. Piştî teşhîskirinê birin zanîngeha Egeyê lê dereng mabûn piştî demekî nûjdar dibê êdî îmkan tune ye tînin malê çend roj şûnda jî wefat dike.

Li ser comerdiya bavê min tiştêk din hat bîra min ez hez dikim ewê bêjim. Ku mêvan dihatin malê şivanekî gundê me hebû Kerem, belkî hêjê şivanê gund be. Bi salan şivantiya gund dikir. Kerem ku dihat malê jî sifre dida rastkirin, mamoste Şevkî Bûrak, rêvebirîya Fen Lisesi yê jî kir jî dihat eyni sifre dida rastkirinê. Bifikirin li gundekî mêvanekî mamostebe, rêvebir be an şivan be çawa tê muamelekirin tê zanîn. Di wî de ew fiq tunebû mamoste Şevkî re çawa be şivan Kerem re jî eynî bû. Carînan diya min îtfraz dikir di go çima du qat xizmet didî kirin bavê min qebûl nedikir. Li mal çî hebûya îkram dikir nedigot ev rêvebir e, ev şivan e, evê kêrî min were qet wisa lê mêze nedikir. Tevaya yek digirt wisa jî muamele dikir. Ew aliyê Wî pir baldar bû.

Ev jî rojek mabû wefata wî ez ne li mal bûm. Abla (hek) min a min mezintir malê paqijiyê dike. Êdî yê ew roj bimire gelek mivan tîn diçin. Li Agiriyê, li navçan li derdoran. Abla mi go lê şibakê mize kir go ew kî ne dibê min kes tune. Dibê bavê min go ew zarên Îsamîl in an yê Îbrahîm in. Êdî em nizanin Îbrahîm û Îsamaîl pêxember dît çawa bû. Lê malbata me da jî bi navê Îbrahîm an Îsamail kes tune. Hûn dizanin Hz. Îbrahîm bi comerdiya xwe jî tê naskirin ez jî dinêrxînim comerdiya wî.

Ku feqîrek an parsekçîk bihata gund digotin herin mala dengbêj Ahmet, nedigotin mala mixtar. Tev dihatin mala me. Çarekî qumaşfiroşek li Rihayê tê, ez wî çaxî li pansiyonê dimam, rêvebirê wir jî destebirakê bavê min bû, ez hatim malê mi dina xwe dayê mal tijî qumaş. Mêrik li gund ra derbas dibe cihê mayîna wî tune ye dibên here mala dengbêj Ahmed. Mala mele na, mala mixtar na kî oda gund jî hebû wisa mêvan

dihatin malê. Mal tev bibû qumaş. Me ev tev ji bavê xwe dît. Diya min an (yenge) min hêrsbe jî ewî qet ev xuhê xwe neguhirand.

Bavê te tenê bû an apanên te jî malda hebûn?

Min apanên xwe qet nedît lê apekî min hê ez piçûk bûme em tev jiyane li ewî zar û zêçê xwe hildaye çûye Denizliyê bi cih bûne. Bi salan hevsê de maye. Ew apê(Yusuf) min nayê bîra min de jî bîranînên wî ku zefin li bal me dewsa wî cuda ye.

Bavê te jiyana xwe tev li eynî gund derbaskir?

Eynî gund ma. Apanê min heter(îsrar) kirin bona ku ew jî here bal wan. Di gund de pisgirêgek di navbera me û malbeteke din de çêbibû. Eşîrekî li eşîreke din zilm dikir. Eşîreta me jî li hember eşîra zilimkar disekine, bavê min ne têdane, ji wan yek tê kuştin apê min Yûsûf tê girtin. Hê li hevsê da bû malbat parçe parçe diçin. Bavê min jî digo bila nebêjin tirsiya revî çû neçû. Fikreke çawaye nizamim lê nikarim rexnekim jî. Bavê min ew zeviyana parast, xwedî derket.

Yanî aboriya xwe bi wan zeviyana pêk dianî?

Zevî diçand, cotkarî dikir, ajal xwadî dikir. Hinde tengasiyên aborî dikişand jî dîsa li perwerdeya zarên xwe tawîz nedida. Kekê min ê mezin Ayhan heka (abla) min a mezin ji vê rewşa aboriyê nexwandin. Piştî wan ji xwendina zaran gelek xîretkir. Ji bo Abla(hek)yeke min bi zehmeti kişand. Ji bona erkgirtina wê torpîl ne têda çî îmkan hebûn serf kir bû hemşîre. Ser perwerdeya me wisa baldar bû hekeke(abla) min a dinê tu têkiliyên wê û xwendinê tunebû go tu werzîşê dikarî em te wî alî de têxin xwedî nan got na, nexwest nihajî şadyar e.

Ji bo xwendina min pansiyon didît ez herdem ziyaret dikirim. Ev kulfet ji gundîkî wî çaxî re hisay nîne. Jê re digotin nede xwendinê çî hewceye zara qîzîn e, yê mêr (şû) bike here. Xwendina keça dijwar bû ez jî di gund de yê dixwendin ez tenê qîz bûm. Ez şandim Anadolu Lisesi 'yê. Rêvebirê dibistanê Sidik Gulçîn ji bo qeydê go hin pere lazime, em ji Oxfordê pirtûka tînin. Bavê min jî got niha perê min tune hûn qeydkin ez ê filan mehê bînim bidim we. Yani dikaribû pes bikira lê nekir.

Hûn dikarin behsa jiyana wî bikin? Ji kîjan eşîretêye? Ji ku derê hatine Agirî yê? Di kîjan salê û kiderê de hatiye dinê?

Em Sipkî ne. Sê şaxên Sipkî heye; Xelesinî, Malikî û yeke din em Xelesinî ne. Qismek malbata me jî li Erzorimê ne. Li aliyê qersê Golayê hatine. Hinek Tekmana Erzorimê mane em jî hatine Agiriyê.

Dîroka ji dayîkbûna wî dizanin?

Nayê bîra min. Lê wefata wî 2002an da bû.

Xweda rihma xwe lêke.

Paşnava we Ozdermîr e ji bo çi dibêjin Ahmet Alîksan?

Gundeki tê naskirin heznakim tişteki çewt bêjim. Bawerim ew navê gung hildide deng jî heye lê berhmeke, Kürt Antolojîsî, Mehmed Uzun de behsa gund tê kirin dibê gundekî Êrmena ne. Aleksan tê zanîn paşê jî dibe Hêliksan.

Li ser xwarin û vexwerina xwe baldar bû?

Baldariya wî li ser xwerin û vexwarinê nayê bîra min lê hertim prova dikir. Di nêzikaiya extiyariya xwe pir xemgîn dibû ji xwe re pir dikir keder digo ez dengê xwe hêdî hêdî winda dikim. Cihê ku divê dirêj û bilind bêjim nikari wek cuwantiya xwe bêjim.

Tiştêkî din jî heye nizam bêjim an na bi diya min re davêtin berhev diketin lecê. Diya min jî ji wî hînbibû di malê de tev digotin.

Cixare dikişandina wî nayê bîra te?

Nexêr nayê bira min. Wek xeyalekî dibêim qey dikişand. Nizanim çend salbûm çar an pênc. Lê diya min aciz dibû. Diya min çiqas jê dûr diket ew jî ji cixarê dûr diket. Diya min pir bi cixarê aciz dibû. Di derheq diya min de pir hesas bû. Bavên min jî ji wê berda. Bavê min pir li diya min hez dikir. Zaten dibêin evîndarên hev û dixaze. Gele kesa xwestibû lê bi bavê min re dizewuce.

Diya te xelqê ku ye?

Diya min bi eslê xwe li Hekarîyê ne. Pinaşî ne. Li gor gotina diya min kalkê diya min eqrebê Ehmedê Xanî ne. Hemû tevayî tên Bazîdê hûn dizanin Ehmedê xanî jî li Hekarîyê ye. Bavê diya min, bavê bavê wî û yê wî tev mola ne. Ji ber mola(mela) ne gund gund digerin. Xalkê min jî tê Diyadînê. Diya min digo nêzî mirina wî ku Quran dixand hin ayet ku dihate xwendin go digo ev ayet di Încîl, Tewrat an Zebûrê de wiha

derbas dibe. Bavê wê zivistanekî qurana pîroz dinivîsî. dîsa nêzî mirina wî dewlet ezmûnekî vedike û dibe miftî. Îcazeta miftiyê hildide û çend meh şûn da jî diçe emrê xwedê. Ku ew dimre di malbatê de mêr namînin. Apanên wê li Hêlikan tên û dibin gund.

Dê û bavê te hev nasdikin an na?

Nasnake. Hê piçûk bûye. Xwûşkên wê ên mezin dine mêr. Gelek kes diya min jî dixwazin lê bi bavê min re dizewuce. Heta şera gustîla diya min çend ciya da qelişî bûye. Diya min digo apanên min û yê ku dewa xwastina min dikin di nav hev de dibin tînin û diqelîşinin. Dibêjin hûnê gustîla Ahmed binê emê qîzê bixwazin. Paşê bavê min dixwaze. Tê bîra min bavê min tizbiya xwe hildida bi dilxwaşî digot filankesê xwest, filankesê xwest, filankesê xwest, lê min hilda. Pir hij diya min dikir. Bawerim cixarejî ji bo wê terikand.

Di awayê siyasî de çawa difikirî?

Biratiya gelê Kurd û tirk diparast. Birastî di derheq qiyama şêx Seîd û bûyerên Desimê de hasas bû. Lê şerê di navbera herdu miletan de tiştê nebaş didît.

Pekî çaxê ev hûnera îcra dikir pişgirêk dernediketî pês?

Derdiket, bi rastî min qet ji bavê xwe nebihîst lê mi li diya xwe bihîst go çend caran polêzan ew tehdît kirine gotine carek din em nebînin tu bêjî. Her çiqas nas bûne, di navbera wan de hiqûq hebûye jî dibêjin tu carek din bibêjî em te efû nakin. Carek du caran jî mêrê meta min, ew jî paşê çûn Denizliyê, dibîne hinek dikevin milê bavê min dibin nahêle biherin. Bavê min ferqê da nebibû ji bo xeberdanê diçû. Çend car din jî tiştên wisa qewumîbû, dizanibûn ku mirovên dewletê ne.

Dengê xwe çawa eyar dikir û diparast?

Bi min rewşa rindbûna dengê wî kalitsal e. Ez wisa difikirim. Bi rastî malbata me da dengê tevaya xweş e dayîneke xwedê ye. Hûn dizanin helbest nivîsîn û gotin qabîliyetê hûnerî ye. Bi min ew jî di bavê min de heye. Ez heyranê şêwaza wî me. Ez wê hestê di gotina Ahmed Kaya de jî dibînim. Di dilê xwe de his dikim.

Perwerdehiya wî hebû an tinebû? Ku hebe li kî derê perwerde bû?

Di xaniyê tendûrê a gund de heta pola 3yê xwendibû. Mamoste ji bo ku germ be piyên xwe dixê tendûrê lê xwendevan di xanî de dicemidin. Dibê me ku darekî serî şewutî bidîta me pê dinivîsî. Dîsa jî xuhê bavê min ê pirtûk xwendinê hebû. Paşê min ferq kir ku xweşiya pirtûk xwandinê, zewqa wê li bavê xwe hildaye. Ne ji kekê xwe an yekî din. Bavê min herşev heke pêşbaziya hespa hebûya temaşe dikir. Ku tunebûya û stran jî negota pirtûka Siyera Nebî dixwend. Diha zêde peyvên farisî hebûn wek Rîsaleyên Nûr, vedikir dixwend.

Meraqê wî yê taybet hebû?

Meraqê wî yê ser hespa meraqeke pir mezin bû. Ez ghiştme ya herî dawiyê. Navê hespê xwe danîbû qûrtboxan. Hespêkî pêşbaziye nebû hespekî îş kar bû. Bavê min pir hij hespê bi cins dikir. Meraqê wî yê pêşbaziya hespa pîrbû. Tê bîra min dewata kekê min ê mezin da pêşbaziya hespa da kirin.

Çend zarokên wî hene?

3 law 5 keçin ez ya heştta me.

Kîngê zewêcî?, Li kî derê leşkerî kir?

Beriya leşkeriya xwe xewucî bû. Leşkeriya xwe jî ecemîtî Tekîrdaxê ya hotetiyê jî li Trabzonê kir. Lewra bavê min Trabzon Spor digirt.

Li ser zarokên wî helbestên wî hene? Ku hebin kîjan in?

Na

Têkiliyên wî û dengbêjiyê çawa dest pê kir û li kêderê digot?

Hêla piçûk bûye çûye cimaetê dengbêjan. Tam çawa bû ez nizanim lê di dema zaroktiya xwe de meraq dike û dibêje.

Ekolê wî kî bû?

Şakiro nedeciband. Nûroyê Meter dieciband. Di navbera wan de dostaniyek hebû.

Naverokên stranên wî bi çi rengî bû?

Bi angorî min yê ser şera diha zêdene. Yê evînê jî hebûn

Helbestên wî, destnivîsên wî hene an tinene?

Tiştêkî wisa nayê bîra min.

Çend qaset û vîdeo yê wî hene?

Belkî tişteki qaba taslak bêjim belkî 100 qaset. Lewra li malê herdem divê me xwe kerkira ji ber ku qaset titf dikir.

Vîdeoyê wî tunene em wê kêmasiyê pir hisdikin ji bo wê jî vîdeoyên diya dikşînin.

Çend salî bû wefatkir?

6 meh berî mirina wî bi nexweşiya wî hisiyân. Mirin nedihat bîra min. Bi min yê başbe were. Lê anîn çend roj şûnda wefat kir.

Qebra wî li ku ye?

Li gund e.

Li ser qebra wî tişteki hatiye nivîsîn an na?

Ser bi tenê navê wî heye Ahmed Cemîl Özdemîr. Bavê wî ku navê hevalê xwe yê ku hosteyê kişik bû lê dike. Bavê wî jî hosteyê kişik bû. Malbatê de kişik pêşveçûyî ye. Kek Ayhan jî kişikê de pispor e, ewî jî fêrî qîza xwe kiriye. Qîza wî li Agiriyê di nava dibistanan de bûye yekemîn.

Di nav zarê wî de yê dengbêjiyê pêk tîne hene?

Kekê min ê piçûk niha li Fransayê ye dibêje. Dibê kilama mîro dibêje li ser yê wir bandoreke mezin datîne.

Ku hûn bi çend peyva behs bikin hûn dikarin çi bêjin? Çend peyvên ku wî bi kurtasî bide naskirin?

Pesindayîneke ne li cî mi aciz dike. Lê derheq kesatiyê da, em bîn diya min nîvekî Quranê zêdetir jiber dizane, malbata diya min tev molane û digihîjin Ehmedê Xanê jî lê ez di malbata xwe de ser keseyeta bavê xwe tu kesî nabînin. Vê tevgera dinê ya bi berjewendî, dinêya xirabda bavê min qet tunebû. Min qet nedît piştî xwe da dostekî xwe. Bê hevî qencyên xwe dikir.

Di nav eqrebayên wêda yê ku teşwîq dikir hebûn?

Nav binav jibîr naynim lê wexta qaset dagirta salona me tev tijî dibû. Bi coş beşdar dibûn. Li Qersê, li Mûşê, li navenda Agiriyê kî bihata bigota Ahmet Aliksan ji me re qaset tijîke tev dihatin guhdarî û şahidetiya wê qaset tijîkirinê dikirin.

Daxwaza wî ya hec hebûye qey firsend nedît ku here?

Zarê xwe dida xwedinê. Bavê min cotkar bû, ajal xwadî dikir. Birayên wî tev ji bo jiyana xwe li Denizliyê bi cih bibûn. Kekên min ku ji bavê min re gihîştin wana jî hemalî dikirin û alikarî didan bavêmin. Nedixwastin ku êdî biweste. Havîne hersê jî diçûn xebatê zivistanê kekê min ê herf mezin diçû her du yên din diçûn dibistanên xwe dixwandin. Bavê min qet rihetî nedît. Nêzî mirina wî wextê heka(abra) min bû xwadî kar hevekî rihetî dit lê emir wefa nekir.

Kekê min ê piçûk nexwast ku here zanîngehê. Digo ev dinê dinêyeke bê edelete ezê herim Lubnanê şer. Hîn caran jî digo ezê herim çiyê li hember vê bê dadiyê. Bavê min ji ber ev rewşa wî ew bi rêyên qaçax şand Fransayê.

Şewqe dida serê xwe?

Dema biçûya Agiriyê dida serêxwe.

Dengbêjên ku diavîtin ber hev hebûn?

Nûro Meter.

Di kilamên wî de bi taybetî yê ciwantiya wî de mijarê kilaman de behsa jinê baş û kotî dike sedemekî heye an na?

Ez sedema wê çand difikirim. Navbera wî û diya min xweş bû.

Gelo ewî tişt li çandê hilda an ewî da çandê?

Ez dibêm çand bingeha denbêjiya wî digirt. Belkî rê vekirina ciwana re bandor dabe çandê. Lewra daxwaz anîna ziman azadiye.

Rahmetlî çîrokên ku ji we ra digot hebûn?

Ji bîr naynin

Pêvek 9: Bi Nîgar Özdemirve Hevpeyvîn 22/09/2014

Nigar Özdemir xanima Dengbêj Ahmedê Alîksan e. Jidayîkbûna Nîgar Xanimê 1935 e. Li Gebzeyê dijî.

Hûn dikarin behsa jiyana wî bikin, Ji kîjan eşîretêye, Ji ku derê hatine Agirî yê, di kîjan sale û kî derê de hatiye dinê?

Huseyn, şukrî, zekeriya hersêbira kurê Ezîz axa bûn di Temekora de rûdinên. Çend cara hatne malê gotin Ahmed em rica ji te dikin mala te zarê te bişînin Îranê yê erazî mulkiyetê bidinin te got wê derê zehf te dixazin lê bavê wî hez nekir. Bavê got ku tu van dera herî ez ê qaf lêxim.

Ahmed 64 salî bû wefat kir. Ji min meztir bû. Ez xelkê Doxûbeyaztê me. Pinanişî me. Ahmed xelesinî ye.

Li vir bû ne an cihekî din hatine Agiriyê?

Ewana ji mamikê hatine. Mamik gundeke li vira. Hinda darebiyê dikeve. Berê li Qersê bûne. Di hêsiriyê de Qersê bûne, li golayê bûne. Îja ku seferberlîk xilas bûye hatine mamikê ser eraziyê bavê xwe. Îja eraziyê bavê xwe li wir jî bi hev nekirine xezûrê min hatiye ser eraziyê diya xwe li vê derê.

Paşnava we Ozdermîr e ji bo çi dibêjin Ahmedê Alîksan?

Alîksanlî Ahmed aşiq Ahmed

Jiyana rojane çawa didomand?

Siyar bû ser pişta hespê bû millet dibir diçû. Dibirne gundê Mûşê, dibirne Qersê dibirne Wanê heta Elazixê jî çû. Kilam digot ji hez dikirin. Li vira Agiriyê di komînê de çend heva lavayî kirin gotin tu were em ê qadroya te bine te tu ji me re kilama bêje.

Aboriya xwe çawa dikir?

Zevî û çayirê wî hebû ekin direşand. Silq direşand. Wekî din jî millet destê hev direvand ji bona dengbêjiyê.

Li ser xwarin û vexwerina xwe baldar bû, Cixare dikişand an na?

Cixare dikişand ku deng wî jê aciz bû berda nekişand.

Perwerdehiya wî hebû an tinebû? Ku hebe li kî derê perwerde bû?

Pênc xilaskiri bû

Ji kerema xwe hûn dikarin qala leşkerî û zewaca wî bikin?

Belê

Li kî derê leşkerî kir?

Tekîrdaxê

Çend zarokên we hene?

8 hev zarê wî hene. 3 kur 5 hev jî zarê qîzîn hene hemû jî li heyatêne. 2 kur jî piçûktiyê wefat kirin.

Li ser zarokên wî helbestên wî hene?

Li ser eqreba û nasê wî helbestên wî hebûn.

Kîjan ?

Têkîliyên wî û dengbêjiyê çawa dest pê kir, Kengê dest bi dengbêjiyê kir?

Çawa salixê ku dida 8-9 Salî bûye. digot kalkê min Hesên, Hesên birayê kalkê wî bû mala wana vira bû ûçûne Qeyserê. Digo kalkê mi Hesên dinava ciya de bûye go digo ka were bavê kalkê xwe were xwe bide teêla mi ji min re kilama bêje ez bi qurbana te bim dengê te çiqas xweşe. Bila ew hesreta di dilê mi de neçe. Digo mi wî çaxî teze kilama silo bego jiber kiribû.

“Goşteke çêkir seran sere

Heqê hosta dayê zêrê zere

Mi dî silo begê min cabek hatiye

Dibê nexwaşe mela ser e”

Digo mi dî hêsirên wî hate xwarê. Digoerê wele mele ser kalkê te jî. Hesên mirovekî mezin û pêşketî ye.

Hecî Evdîleyê xalê wî jî dengbêj bû. Mala wan niha li Axriyê taxa teryarê dimîne. Digo mi wisa xweş digot xalê Evdîla tûyê devê min kir. Go bila dengê te mîna dengê min diha xweş be.

Di oda, cemaat an dîwana de digot?

Milet li destê hev direvandin. Gelek millet di dewata de bûk nedidand digotin hetanî Ahmedê Alîksan neyê em bûkê nadin. Yê bihatana bi qasî giranya wî pere bidana û bibirana.

Kilamê dewata an yê dengbêjiyê digot?

Kilamê dewata nedgot, yê rûniştî digot.

Ekolê wî kî bû, li kê derê stran digot, naverokên stranên wî bi çi rengî bû?

Ser şera wisa xweş digot. Mexlûq bi xwe ve nedima digiriya. Ser evîniyê jî xweş digot.

Helbestên wî, destnivîsên wî hene an tinene?

Belê ya Ehmed û Mihemed Reşît digot. Ehmed û Mihemed Reşîtli yali Milazgiri bûne. Dîsa du eşîr bûne li hev xistine. Ehmed û Mihemed Reşît bûne qaçax. Digo

Ehmed bi sê denga li Miheme Reşît kir qîrîne

Go birayo xêra firarya serê çiyê tunîne

Dibê were em ê li hev werin em ê herin mala Xalisê Elmecîd Begê bînin bira hildin qurana mubîn e

Bikeve orta me zarê mala Mamik ve hevdi bîne

Bira çevê kozî kulfetê li rêya me nemîne

Wisa xweş digot millet gi digiriyan.

Ehmed û Mihemed Reşît ku xwe digihîne serê çiyayê zengil ziranê jêrîne

Ehmed li Mihemed Reşît kir qîrîne go dengê xeberdanê pêşiya me tê

Dibê ez nizanim malê mihacirane

Nizamim koterê serê vî çiyayî ne

Nizamim birê ticara ne



Nizamim mufreza dewletê ne tetbîqata me digerîne

Nizamim dijminê dil gawûr pêşiya me da rûniştîne


Dibê hê gotin devê wandane gule serda barandine

yanî zehv acixlî digot.


Wêne 1. Dengbêj Ahmedê Alîksan




Wêne 2. Dengbêj Xalê Bekir



Wêne 3. Xwarziyê Dengbêj Ahmes Alîksan Ali Haydar Can




Wêne 4. Mala Dengbêj Ahmes Alîksan



Wêne 5. Dengbêj Cesîmê Dengzêrîn (Şagirtê Dengbêj Ahmes Alîksan) û Ayhan Özdemir(kurê wî)



Wêne 6. Mamoste Şevkî Bûrak




Wêne 7. Qebra Dengbêj Ahmes Alîksan




Wêne 8. Dengbêj Elbarî




Wêne 9. Xîzkirina resma Ahmed Alîsan




Wêne 10. Otêla Seyîdan



Wêne 11. Paşa TAŞTAN



Wêne 12. Ayhan Özdemir



KURTE JIYAN

Fehmi Yeşilçınar di sala 1977an de li Bêgiriye(Muradiye) gundê Devetaşê hatiye dinê. Dibistana seretayî li Bazidaxa(Çaldıran) gundê Dêro dixwîne. Dibistana navîn û lîse jî Erciş Lisesi ya Erdişê mezûn dibe. Di navbera 1998 û 2002an de Zanîngeha Ataturkê ji mamosteya perwerdeya polê mezûn bûye.

2002an li Saray a navçeya Wanê dest bi karê mamostetyê dike. Li navenda wanê çend dibistana mamostetî û cîgirê rêveberiyê dike. Fehmi Yeşilçınar zewiciye û çar zarên wî hene.

ÖZGEÇMİŞ

Fehmi Yeşilçınar 1977’de Muradiye’nin Devetaş köyünde dünyaya gelmiştir. İlkokulu Çaldıran ilçesinin Dêro(Güngören) köyünde okumuş ortaokul ve liseyi Erciş’te okumuş ve Erciş lisesinde mezun olmuştur.1998-2002 yılları arasında Atatürk Üniversitesi Sınıf öğretmenliğinden mezun oldu. 2002 yılında Van’ın Saray ilçesinde öğretmenliğe başlamıştır. Van merkezde birkaç okulda öğretmenlik ve müdür yardımcılığı yapmıştır. Fehmi Yeşilçınar evli ve dört çocuğu babasıdır.